| Y | Yekdil | y | yek |
| Z | Zagros | z | zêr |

## Pêşgotin

Ev xebata rêzimanî di navbera salên 2003 û 2009'an de bi sernivîsa *Qursên Kurdî-ders/rêziman* hatibû amadekirin. Hin mijarên wê bi hêsanî di kursan de û li çend malperan jî tevayî dihatin xwendin. Careke din hatin berçavkirin, bi kûrayî hatin dahûrandin, hin mijar hatin derxistin, hinek jî hatin lêzêdekirin.

Bo vê sererastkirina dawiyê jî rezimana Celadet Bedirxan, ya Feqî Sagniç, bi sedema nûjenî û standardiyê "Rêzimana Kurmancî, çapa berfirehkirî" ya Samî Tan û ji aliyê çavkaniyên ferhengî ve jî yên Zana Farqînî bingeh hatin hilbijartin. Der barê hin mijaran de min ramanên xwe veşarî hiştin. Ji ber ku hevgirtina perwerdeyî ya zimanê Kurdî, ji ramanên cur bi cur ên mamoste û zimanzanan hê pêştir e.
Rastnivîs jî mijareke girîng e. Di hemû mijarên vê berhemê de gelek xalên wê hatin nasandin, lê hinek jî ji pêşeroja zimanê niviskî re man. Wekî ku tê zanîn rastnivîsa Kurmanciyê hîn tam rûneniştiye. Ligel vê pêdiviya rênîşa vekîteyê heye ku ew jî karê ferhengçêker û saziyên ku xwe berpirsyar dibînin in.

Ev rêziman ji bo astên bilind û kesên ku Kurmancî dipeyîvin û dixwînin, hate vehandin. Mijar bi şêweyên fehmbar hatin ravekirin û rêbaz bi mînakan hatin şidandin.

Jêwergiranên berhemên wêjeyî yên ku di vê xebatê de cih digirin, li gorî rêz û rêzikên rêzimana nûjên hatin bêjandin û bicihkirin.

Bi navê *Veser a Rêzimana Kurdî ya Kurmancî*, der barê kêşana lêkeran de pirtûkçeyek hate ramandin û ew vesera vê berhemê ye.

07.05.2013, Lozan, A. Karabax

**Jimar : 1**

**Mijar : Zaravaya Kurmancî**

**Ziman pergala ragihandina dengan e. Ev pergal bi devkî û nivîskî di herikîna dem, dîrok û pêvajoya mirovbûnê de ji aliyê mirovan ve birêkûpêk, bi razberkirin û nîşanekirina tişt, heyîn, çalakî û hestan pêk tên. Ziman xwe nûjen dikin, bi rê û rêbazên nuh bi pêş dikevin. Yên ku nikarin xwe biparêzin, yan tevde ji holê radibin an jî di nava zimanên mirî de tên hewandin û ew dibin mijarên pisporên xwe.**

**Nasnameyên hevpar ên qewm, kêmnetewe û neteweyan zimanên wan in; ew di navbera çand, aborî û rêveberiyên civakî de pêdivî û rolên jiyanî radikin ser xwe.**

**Ziman ji aliyê binyadê ve tên senifandin : Hind-Ewropa, Ural-Altay, Samiyan, Çîn û Tîbet, Bantûyan. Ji van her kom jî di nava xwe de tê beşkirin.**

**Zimanê Kurdî, di koma herî mezin a Hind-Ewropî û beşa wê ya Îranî de tê dahûrandin. Di Kurdî de pênc zarava hene : Kurmancî, Soranî, Kurmanckî, Goranî, Lorî. Babeta vê berhemê rêzimana Kurmancî ye.**

**Rêziman bi rêz û rêzikên xwe; pêkhatin, erk û bikaranînên deng, peyv, hevok û nîşandekên rêzimanî dikole. Rêzimanên nûjen, bes di qadên peyvsazî û hevoksaziyê de namînin; dengsazî, dengzanî, watenasî û rastnivîsê jî didin ber xwe.**

**Em dikarin beşên vê mijarê wisa bidin diyarkirin û kolandin :**

**Alfabeya kurdî ya kurmanciyê**
**Hin taybatiyên tîp û dengan**
**Peyvsazî**
**Peyv û wate**

**Alfabeya kurdî ya kurmanciyê :**
**Di zimanan de tîp, dengan şanî dikin in û alfabe jî ji tîpan tên holê. Di zaravaya Kurmancî de 31 tîp hene û ew dengên bingehîn dinimînin. Jê pê ve pevdengek heye û ew jî bi du tîpên vê alfabeyê pêk hatiye.**

**Ji aliyê zayenda rêzimanî ve tîpên alfabeya kurmanciyê mê ne û bi serê xwe nav in.**

**Ji aliyê dirûvê ve tîpên hûr, “hûrdek” û yên gir, “girdek” tên navandin.**

**• Tîpên alfabeya kurmanciyê ev in :**

**Tîpen girdek :**
**A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z**

**Tîpên hûrdek :**
**a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z**

**Di kurmanciyê de pevdengek heye : xw**

**• Dengdêr û dengdar :**
**Di riya dengan de hin tîp bê asteng û hinek bi asteng dertên. Ji yên bê asteng re *dengdêr* û yên ku bi asteng re jî *dengdar* tên gotin.**

**Tîpên dengdêr : Di kurmanciyê de pênc heb dirêj û sê heb kurt, heşt dengdêr hene. Dengdêr li gorî bilêvkirinê jî ji hev cuda dibin.**

**♦ Tîpên dengdêr : a, e, ê, i, î, o, u, û**

**★ Tîpên dengdêr du bir in :**

**Yên dengdêrên dirêj : a, ê, î, o, û**

**Yên dengdêrên kurt : e, i, u**

**★ Li gorî cîderka dengan tîpên dengdêr :**

**Yên pêşderkî : e, ê, î**
**Yên navderkî : i, u**
**Yên paşderkî : a, o, û**

**★ Li gorî awayê vebûna devê mirov tîpên dengdêr :**

**Yên gilover : o, u, û**
**Yên nîvgirtî : ê, i, î**
**Yên vekirî : a, e**

**★ Li gorî asta derketina dengan tîpên dengdêr :**

**Yên bilind : i, î, u, û**
**Yên navincî : ê, o**
**Yên nizm : a, e**

♦ **Tîpên dengdar bîst û sê heb in :**
**b, c, ç, d, f, g, h, j, k, l, m, n, p, q, r, s, ş, t, v, w, x, y, z**

**Dengên dengdar li gorî cîderkê û awayê derxistinê ji hev cuda ne.**

★ **Li gorî cîderka dengan tîpên dengdar :**

**Yên lêvkî : b, m, p, w**

**Yên diranlêvkî : f, v**
**Yên diranî : d, n, s, t, z**

**Yên pêşezmandevî : c, ç, j, l, r, ş, y**
**Yên ezmandevî û qirikî : g, h, k, q, x**

★ **Li gorî awayê derxistina dengan tîpên dengdar :**

**Yên girtiya hişk : k, p, q, t**
**Yên girtiya nerm : b, d, g**
**Yên girtiya difinî : m, n**

**Yên fîzeka hişk : f, s, ş**
**Yên fîzeka nerm : j, v, z**

**Ya herikiya lerzokî : r**
**Ya herikiya rexkî : l**

**Yên nîvdengdêr : h, w, y**

**Ya domdara hişk : x**

• **Ji aliyê ferhengî ve eger tîpên dengdar bi serê xwe bên xwendin :**
**Ev tîp( v, w, x) bi alîkariya " e "yê û yên din bi alîkariya " ê "yê tên dengandin.**

**Hin taybatiyên tîp û dengan :**
**Alfabeya kurdî ya kurmancî fonetîk e. Ango her tîp ji bo dengekî bingehîn hatiye danîn. Bilî dengên bingehîn hin dengên din jî hene ku di bilêvkirina hin bêjeyan de ew tên dîtin û bo wan tîp nehatina nîşankirin.**

**Dema ku Celadet Bedirxan alfabeyê amade dike, wan dengên bêtîp,**

**mîna rengedengên dengên bingehîn dipejirîne û divê ev taybetî di bilêvkirina peyvên têkildar de bên sererastkirin.**

**Di wateya peyvê de rengedeng guhartinê pêk nayîne. Di bilêvkirinê de awayê peyvê ya hilmî bi tîpa "h"yê tê nîşankirin.**

• **Dengên hilmî û nehilmî :**
**Dengên hilmî bi hilmê û yên nehilmî bê hilm tên bilêvkirin.**

**Ev tîp di hin pêyvan de bi dengên ji hev cuda dertên : ç, k, p, t**

**Mînak 1 : Bo bilêvkirina hilmî :**
**çh ( çal, çel, çol )**
**kh ( kar, ked, kel)**
**ph (paç, pêl, pûr)**
**th (tajî, tevde, tov)**

**Mînak 2 : Bo bilêvkirina nehilmî :**
**ç ( çam, çinar, çend )**
**k ( keç, kin, kum )**
**p (pembe, pêş, pîn )**
**t ( tam, tek, tîp )**

• **Ev tîp dengên ji hev cuda dide : h**

**Ya ku di peyvên kurdî de nerm e :**
**Heval, hêlîn, hilm**

**Ya ku bi hin peyvên biyanî ve derbasî kurdî bûye, hişktir e :**
**Hecî, Hesen, Heran**

• **Dengên lerzok û bişid : l, r**
**Di hin peyvan de nivîsandina wan tîpan bi gengeş in. Hin zimanzanê û nivîskar, bikaranîna cotetîp û hinek jî ya yeketîp guncan dibînin.**

★ **Tîpek an du tîp " l "**

**Mînak 3 : Peyv : gellek**

**Di peyva "gellek"ê de eger tîpek "l", jê bê avêtin, ji aliyê wateyê ve tu cudatî nayê holê, lê ya ku di peyvê de dimîne, divê piçek bi şid bê bilêvkirin :** gellek → gelek

/Em in ên ku gelek caran dadikevin jêr û radibin jorê/

(Tavên Stêrîn, A. Karabax)

★ **Tîpek û du tîp “r ”**

**Mînak 4 : Her du şêweyên vê peyvê jî karîger in : pirr, pir :**

**Di hin peyvan de bikaranîna her du “rr”yan pêwîst in. Ji ber ku her yek bi serê xwe yekedeng e, ango her yek dengekî raber dike. Di hin peyvan de jî “r”yek cih digire û piçek xurt tê xwendin.**

**Encam : Nivîsîna bi tîpa “ r ”yekê ya vê peyvê(pir), her ku diçê bo her du şêweyên jorîn jî di zimanê nivîskî de rûdine.**

Zilamekî pirr kevneperest bû. (Cembelî, Îhsan Cûlemêrgî)

Li aliyê din jixwe dengê “o”yê ji kurdî re ne biyan e û rêjeya bikaranîna wê ya li dawiya peyvan jî pir û pir e. (Zana Farqînî)

• **Dengên kelijandinê :**
**Di kurmanciyê de, di peyvekê de du dengdêr li piştî hev cih nagirin. Ger du dengdêr li pey hev bên, wê demê dengekî alîkar dikeve navbera wan. Ji wan tîp an dengan re, *tîpên kelijandinê* yan jî *dengên kelijandinê* tên gotin.**

★ **Di kurmaciyê de tîp an dengên kelijandinê ev in : h, w, y**

**Mînak 5/1 : Di pêkhatina peyvan de : h, w, y**
**agahî, kurtahî, mirovahî, ronahî**
**dinyewî, duwemîn, ewrewî, gewrawî**
**badayî, bûyîn, dayîn, efbûyî, zanayî**

**Mînak 5/2 : Di ravekê(qedînek) de : y**
**deriyê malê, kaniya gund, xaniyên spî, piyên min**

★ **Bikaranînên dijî rêbeza jorîn hene, ango di kêşana lêkeran de du dengdêr li pey hev tên.**

**Mînak 6 : Di kurdiya kevn de hin peyvên ku bi tîpa “h”yê dest pê dikin, di wan de ev tîp ji holê rabûye.**

★ **Di hin lêkeran de :**

**Lêker : hanîn → anîn**
▸ **Rewşenê du berxik dianîn.**

**Lêker : êşîn**
▸ **Ew ê serê te biêşîne.**

★ **Ev tîp( y ), li ber van tîpan( i, î ) mîna nivdengdêrekê tê karandin :**

**Li ber " i "yê : Bilêvkirina " i "yê, wekî ya " î "yê ye.**

▸ **Li çiyayê biçûk baran nedibariye.**

**Li ber " î "yê :**
**Ev tîp mîna " i "yê tê nivîsandin, lê di bilêvkirinê de wekî ya berê ye :**

**gundî → gundiyên me, xanî → xaniyê wan**

★ **Hin zimanzane û nivîskar, tîpa " î "yê, li ber tîpa " y "yê jî bi eynî dirûvê dinivîsînin :**

**gundî → gundîyên me, xanî → xanîyê wan**

**Encam : Ji wan her du bikaranînan dê kîjanê mayînde bibe, bersiv a pêşerojê ye.**

• **Dubarekirina tîpekê :**
**Hin dengdar li pişt hev tên û ji aliyê bilêvkirinê ve jî her yek fonem e.**

**Di payeya hevrûkirinê ya rengdêran de : t**
**sert + tir : serttir**
**kort + tir : korttir**

**Di peyvên hevedudanî de : k, r**
**yek + kîte : yekkîte**
**ser + rût : serrût**

• **Di hin peyvên biyanî de hin dengdêr li peyv hev tên û di bilêvkirinê de jî her yek bi serê xwe fonem e.**

**Dengdêr : a, e, i, î, o, u**
**kakao, saet, şair, teorî, suîqest**

**Kîte :**
**Ev ji aliyê dengzaniyê ve perçeya peyvê ye ku bi carekê re ji devê mirov derdikeve. Hin kîte bi xwe jî peyv û dengek dibin.**

**Dengdêr bi serê xwe kîte û kîtedeng in, lê dengdar bi serê xwe nabin.**

**Mînak 7 : Kîte û kîtandin :**

★ **Li gorî jimarên tîpên xwe kîte :**

**Dengdêr bi serê xwe yekkîte dibin : a, e, ê, i, î, o, u, û**

**Ew saet a min e.**
**Ew zilam ê wan e?**
**Wî tu jin û mêr nedîtine.**

Bi du tîpan kîteyek : **ah, aj, ba, çê, dê, du**
Bi sê tîpan kîteyek : **ard, ast, bar, cot, çap**
Bi çar tîpan kîteyek : **bang, deng, merc, şert**
Bi pênc tîpan kîteyek : **stewr, stêrk, stran, strih**

★ **Di peyvan de kîte û kîtandin :**

Bo peyvên yekkîteyî : **ar, çam, dû, paş, tirs, zor**
Bo yên dukîteyî : **a-la, ma-se, kan-î, şa-hî, Roj-hat**
Bo yên sêkîteyî : **a-jal-nas, ber-de-wam, der-hê-ner**
Bo yên çarkîteyî : **a-bo-rî-nas, ber-nam-ze-dî, ce-ri-ban-din**
Bo yên pênckîteyî : **pir-zi-ma-nî-tî, we-lat-pa-rê-zî**
Bo yên şeşkîteyî : **ro-na-yî-pa-rê-zî, zer-ze-wat-fi-ro-şî**

**Kirpandin :**
**Ji aliyê peyivîn û xwendinê ve di peyvan de hin kîte ji yên din xurttir tên bilêvkirin. Bi kurtasî ji vê rêbazê re *kirpandin* tê gotin.**

**Di peyvan de cihên kirpandinê cuda ne. Di yên xwerû de li ser kîteyên dawî ne, lê carinan derbasî ser yên berî wê jî dibin.**

**Kurt û dirêj, hemû dengdêr dikarin kirpandinê bidin ser xwe û digel vê xwezayên dengên xwe diparêzin. Ew nayê vê wateyê ku di kirpandinê de dengdar bê rol in.**

**Mînak 8 : Di peyvan de cihên kirpandinê :**

★ **Di peyvên yekkîteyî de kirpandin li ser dengdêran in :**
**av, der, têr, cil, dîk, hov, kurd, bûk**

★ **Di hin peyvên dukîteyî de ew li ser kîteyên pêşîn jî dibin :**
**îro, nîvro, êvar**

**★ Di yên pirkîteyî de ew bi gîştî li ser kîteyên dawî ne :**
**bajarî, bawermendî, kirpandin, mamostetî**

**★ Di hin yên pirkîteyî de ew li ser kîteyên din jî dibin :**
**jêbirîn, gerînek, serokkomar, têrkirin**

**★ Di navdêr û rengdêran de ew bi piranî li ser kîteyên paşî ne :**
**evîndarî, kulîlk, Riha, derbeder, mezin, zerîn**

**★ Hin qertaf di peyvan de kirpandinê digirin ser xwe.**
**Bo hin qertafên pirjimariyê, ya (-an)'ê : gul ➞ gulan**

**★ Hin qertaf jî di peyvan de kirpandinê nagirin.**

**Ji yên nebinavkirî, ya (-ek)'ê nagire : kûr ➞ kûrek**
**Lê hinek jî digirin, ya (-ekî )'yê : mirov ➞ mirovekî**

**★ Di lêkeran de kirpandin :**

**Di raderên xwerû de kirpandin li ser kîteyên dawî ne :**
**hatin, ketin, kutan, xwarin, zanîn,**

**★ Di kêşana lêkeran de cihên kirpandinê cuda ne :**

**Li ser hin qertafên raweyî : (bi-, di-, na-, ne-, ni-) :**
**Bimeşe!**
**Rojda ji vir diçe.**
**Em bi wê re naçin.**
**Mem ji wir nayê.**
**Hûn nikarin wan bibînin.**

**Li ser qertafa dema bê : ê(dê) : Ez ê bixwînim.**

**Li ser pêşgirên lêkersaz : (da-, hil-, ra-, ve-, wer-) :**
**dadan, hildan, rakirin, vegotin, werdan**

**Li ser hin bêjeyên rawesaz : divê, heke, xwezî**
**Li ser rayeka dema borî : hat, ket, dît**
**Li ser hin rayekên hevedudanî : dikarîbû, ketibûye**

**Lerze(ton) :**
**Ev di peyivîn û xwendinê de pêkanîneke bi hest û ahengî ye. Lerze û kirpandin ji hev cuda ne, lê ji hev re alîkar in.**

**Di xwendina helbestî û gerandina berhemên şanoyî de lerzekirin digihîjin asta hunerî.**

Pîrê Defîneger :
- Muhebeta çûkan li qefesa çiyayên evîndar in!
Etarê Dilan :
- Dilo, baz in! Dîno, bahoz in! Dînê, bi awaz in!
(Dîmenên Digerin, şano, A. Karabax)

**Peyvsazî :**

**Peyvsazî(morfolojî) pekhatin, darîştin û kêşana peyvan vedikole. Em ê li vir bi hêsanî li ser hin mijarên peyvsaziyê rawestin.**

**• Peyv(bêje) :**
**Ev hêmanên watedar, dengî, devkî û nivîskî ne ku herî kêm bi yek an jî bi çend kîteyan pêk tên.**

**Ji aliyê pêkhatinê ve peyv li du beşên bingehîn tên senifandin : Yên xweru û yên nexwerû.**

**⋆ Peyvên xwerû :**
**Ev yên sade ne û ji hev nabin. Eger bên jihevkirin, bê wate dimînin.**

**Mînak 9 : Bav, baş, diyar, erd, Med, şîn, xew, zîv**

**⋆ Peyvên nexwerû :**
**Ev çend hêmanan di xwe de dihewînin. Yên serbixwe û qertafan digirin. Peyvên nexwerû jî du beş in : Yên hevedudanî û yên pêkhatî.**

**Peyvên hevedudanî : Ev peyv herî kêm ji du peyvên serbixwe pêk tên.**

**Mînak 10 : Avhewa, bareş, bavkal, destsivik, dilêş**

**Peyvên pêkhatî : Ev bi qertafên bêjesaz tên darîştin. Hin darîştin li ser hêmanên serbixwe jî çêdibin.**

**Mînak 11 : Alozdar, behrewer, carek, çireçir, deverî**

**Peyvên kompleks : Hin peyvên nexwerû, hevedudanî û pêkhatî yan jî pêkhatî û hevedudanî dibin. Ew in ku dirûvên kompleks pêk tînin.**

**Mînak 12 : Bidestketî, bêdayikmayîn, jorejêr, serbixwetî**

**Qertaf :**
**Ev hêmanên alîkar in ku di pêkhatina bêjeyan û tewangê de karîger in. Hin pêşgir, paşgir, navgir in û hinek jî di çêkirina hin raweyan de mîna peyvekê, bi serê xwe cih digirin.**

**Di tewangê de, tewandina bêjeyan û kêşana lêkeran tên beşkirin ku ev her du beş jî bi alikariya hin qertafan pêk tên.**

**Qertaf li du beşên sereke kom dibin : Yên kêşanê û yên bêjesaz. Ji bo destpêkê, em ê li vir wan bi kurtayî bidin nasandin. Ji ber ku gelek qertaf hene û ew di babetên têkildar de bi berfirehî têne dahûrandin.**

**• Ji qertafên kêşanê hinek :**
**Ev di kêşana lêkeran de dem, kes, rawe, mêjer û zayendan dinimînin. Ji wan hinek pêşgir, hinek paşgirin û hinek pêşgir jî dibin navgir.**

**★ Di raweya fermanî de :**

**Qertafa erêniyê : bi-**
**Lêker : çûn → Biçe!**

**Ya erêniyê di hin lêkeran de bi kar naye :**
**Lêker : rabûn → Rabe!**

**Qertafa neyîniyê : me-**
**Lêker : çûn → Meçe!**

**Hin nivîskar li şûna (me-)'yê, (ne-)'yê bi kar tînin :**
**Lêker : çûn → Neçe!**

**Paşgirên kesandinê yên raweya fermanî :**

**Yekjimar : -e**
**Lêker : xwendin → Bixwîne!**

**Pirjimar : -in**
**Lêker : xwendin → Bixwînin!**

**★ Di dema niha de :**

**Qertafa erêniyê : di-**
**Lêker : xwarin → Ez dixwim.**

**Ya neyîniyê : na-**
**Lêker : xwarin → Ez naxwim.**

**Bo hin lêkerên awerte ya neyîniyê : ni-**
**Lêker : karîn → Ez nikarim.**

**★ Di dema boriya têdeyî de :**

**Ji lêkerên negerguhêz : hatin**

**Awayê erênî : Ez hatim.**
**Awayê neyînî : Ez nehatim.**

**• Ji qertafên kêşanê, paşgirên kesandinê :**
**Hin zimanzane ji wan re "cînavkên kesandinê" dibêjin.**

**Paşgirên kesandinê yên yekjimariyê : (-im, -(y)î, -e)**
**Paşgirên kesandinê yên pirjimariyê : (-in, -in, -in)**

**Mînak 13 : Di dema niha de bikaranîn.**
**Lêker : nivîsîn**

**Awayê erênî :**
**Ez dinivîsim/Tu dinivîsî/Ew dinivîse**
**Em dinivîsin/Hûn dinivîsin/Ew dinivîsin**

**Awayê neyînî :**
**Ez nanivîsim/Tu nanivîsî/Ew nanivîse**
**Em nanivîsin/Hûn nanivîsin/Ew nanivîsin**

**• Tewanga bêjeyan û qertaf**

**★ Ji qertafên tewangê :**

**Yekjimar :**

**Bo navdêrên mê, paşgir : -ê**
**Serdar bi hevalên xwe ve çûn sazdêranê.**

**Bo navdêrên nêr, paşgir : -î**
**Du sal in ku em wî endezyarî dinasin.**

**Pirjimar :**
**Bo navdêrên nêr û mê, paşgir : -an**

**Çi mezin û çi biçûk, her kes li ser piyan bû.**

★ **Di banglêkirinê de qertaf :**

**Yekjimar :**

**Bo navdêrên mê, paşgir : -ê**
**Lê keçê, li deştê binêre, ew çi berfa spî ye!**

**Bo navdêrên nêr, paşgir : -o**
**Lawo, bike bilezinê, ji min re hekîmekî bibîne!**

**Pirjimar :**
**Bo navdêrên nêr û mê, paşgir : -(i)no**
**Keçino, lawino, hûn ê di saet diduyan de biçin sazgehê.**
**Keç û lawino, hûn ê di saet diduyan de biçin sazgehê.**

★ **Ji qertafên veqetandekê :**

**Yekjimar :**

**Bo navdêrên mê, veqetandek : -a**
**nêrgiz → nêrgiza gulistanê**

**Bo navdêrên nêr, veqetandek : -ê**
**pel → pelê defterê**

**Pirjimar :**
**Bo navdêrên nêr û mê, veqetandek : (-an → -ên)**
**nêrgizan → nêrgizên gulistanê**
**pelan → pelên defterê**

★ **Ji qertafên nebinavkirinê(nenasiyê) :**

**Yekjimar :**

**Bo navdêrên mê, paşgir : -ek**
**dar → darek**

**Bo navdêrên nêr : -ek**
**bar → barek**

**Pirjimar :**
**Bo navdêrên nêr û mê, paşgir : -in**

**dar → darin**
**bar → barin**

**• Qertafên bêjesaz :**
**Hin peyv bi alîkariya hin qertafan tên holê û ew qertaf ên bêjesaz in. Ew di dariştina bêjeyan de pêşgir, paşgir, navgir û navbend in.**

**Qertafên bêjesaz di navdêran de yên navdêrsaz, di rengdêran de yên rengdêrsaz û di lêkeran de jî yên lêkersaz in. Di kurmanciyê de yên bêjesaz gelek in.**

**Ji qertafên bêjesaz :**

**★ Pêşgir : Ev li ber hêmanên bingehîn cih digirin, şêwe û wateyên nû yên bêjeyî didin wan.**

**Di navdêran de : ( bele-, make-, man-, kele-)**

**Mînak 14 : Beleguh, makeraman, manker, kelereq**

**Di rengdêran de : (bele-, ber-, bê-, çele-, şip-)**

**Mînak 15 : (beleder, berçewt, bêkes, çelevîçî, şipşîn)**

**Di lêkeran de : ( da-, hil-, ve-, wer-)**

**Mînak 16 : dahûrandin, hilçandin, vekolîn, wergerîn**

**★ Paşgir : Ev tên dawiyên hêmanên bingehîn, şêwe û wateyên nû yên bêjeyî didin wan. Li gorî qertafên din, ji aliyê paşgiran ve kurmancî hîn dewlemend e.**

**Di navdêran de : (-ak, -anî, -istan, -î, -ger )**

**Mînak 17 : ronak, apanî, gulistan, bedewî, avger**

**Di rengdêran de : (-ar, -bel, -dar, -ek, -în, -tir )**

**Mînak 18 : xewar, çavbel, famdar, jîrek, zêrîn, şîntir**

**Di lêkeran de : (-in, -în, -n, an, -andin )**

**Mînak 19 : hatin, anîn, dan, kutan, gerandin**

★ **Navgir : Ev qertafa bêjesaz e ku di nava peyvê de cih digire û bi vî awayî peyvên nuh pêk tên : (-a-)**

**Mînak 20 : barîn → baran, gerîn → geran**

**Nîşe : Her qertafên navgir ne bêjesaz in. Hin qertafên din jî dibin navgir.**

**Mînak 21 : Ji qertafên kêşanê : (di-, -ne-) :**
**Şîlanê çaya reş venedixwar.**

Lê ez ji yekî ku derketibe devereke weha bilind û giyana wî ji laşê wî derneketibe, bêhtir jî dibînim. ( Navê Min Sor e, O. Pamuk, werger : M. Aydogan)

★ **Navbend : Ev qertafên bêjesaz in ku dikevin navbera du peyvan û yên nû tên darištin : (-e-, -o-, -an-)**

**Mînak 22 : tekedest, sarogermî, seranser**

**Nîşe : Di bêjesaziyê de hin daçek û gihaneka "û"yê jî bi erkên navbendî tên xebitandin : (-bi-, -li-)**

**Mînak 23 : berbiçav, çavlider, tarûmar**

**Peyv û wate :**
**Peyv, bi dirûv û wateyên xwe peyv in. Di watenasiyê de li gorî wateyên xwe tên vekolandin. Bi yekwate yan pirwate dibin, bi wateyên bingehîn û yên alîkar tên nirxandin.**

**Ji aliyê pêwendiyên wateyî ve peyv tên ravekirin : Hemwate, dijwate, hevdeng, hevreng, cotepeyv.**

• **Peyven hemwate :**
**Ew peyv in ku dirûvên wan cuda, lê ji aliyê wateyê ve hemwate ne. Ligel vê di hemwatebûnê de her peyv wekî hev bi wateyan ranabin (**li ferhengê binêrin**).**

**Mînak 24 : hejmar/jimar, nîşe/têbinî, saet/demjimêr**

• **Peyven dijwate : Ev peyv ji aliyê wateyê ve dijî hev in.**

**Mînak 25 : çû ↔ hatin, mê ↔ nêr, mirî ↔ zindî, reş ↔ spî**

• **Peyven hevdeng : Ev ji aliyê dirûv û bilêvkirinê ve mîna hev in,**

**lê wateyên wan cuda ne(**li ferhengê binêrin**).**

**Mînak 26 : fer ≠ fer, hûr ≠ hûr, şîn ≠ şîn**

- **Peyven hevreng : Ev ji aliyê dirûvê ve wek hev in, lê bilêvkirin û wateyên wan cuda ne(**li ferhengê binêrin**).**

**Mînak 27 : kar ≠ kar, ker ≠ ker, ter ≠ ter**

- **Cotepeyv :**

**Cotepeyv ji du peyvên têkildar û bi alîkariya gihanekê ya "û"yê pêk tên. Ev pêkhatinên bêjeyî ne ku bi xurtkirin, gelemperîkirin û ahengên fonetîk xwe dişidînin. Hin cotepeyv hemwate, hinek nêzwate û hinek jî dijwate ne.**

✔ **Yên hemwate : Ev bi du peyvên hemwate ne.**
**Mînak 28 : dê û dayik, pisap û pismam, şert û merc**

✔ **Yên nêzwate : Ev bi du peyvên nêzwate ne.**

**Mînak 29 : dem û dewran, gul û kulîlk, kurm û kêzik**

✔ **Yên dijwate : Ev bi du peyvên dijwate ne. Di nivîsaran de tên dîtin ku di hin peyvên dijwate de wekî gihaneka "û"yê, bendik(-) jî karîger e.**

**Mînak 30 : jêr û jor, kurt û dirêj, kêm-zêde, şev-roj**

**Jimar : 2**

**Mijar : Navdêr**

**Nasîn : Ew peyvên ku candar û bêcandar, heyberan bi mirov didin nasîn re *navdêr(nav)* tê gotin.**

**Mînak 31 :** Azad, bajar, Berîvan, çav, çem, deng, Riha, zarok

**Li gorî hestpêkirina heyberan navdêr : Li du beşan kom dibin.**

- **Yên şênber :**
**Piraniya wan bi pênc lebatên sehekê yên mirov tên destnîşankirin.**

**Mînak 32 :** Amed, av, dest, ferheng, Hewlêr, Rojhat, Zîlan

- **Yên razber :**
**Ev navdêr bi pênc lebatên sehekê yên mirov nayên destnîşankirin. Ew bi rê û rêbazên bawerî, felsefî, civakî û zanistî tên bidestxistin.**

**Mînak 33 :** azadî, berxwedan, evîn, mêjî, ronahî, zarokatî

**Li gorî taybetiya heyberan navdêr : Ew li du beşan debaş dibin.**

- **Yên serenav :**
**Ji aliyê hebûnê ve ji wan her yek bi serê xwe yekta ne. Nivîsandina wan bi tîpên girdek dest pê dikin.**

**Mînak 34 :** Berlîn, Dîcle, Dîlan, Dîlok, Ehmedê Xanî, Firat

- **Yên hevenav :**
**Bilî yên serenav, hemû navdêr hevenav in û nivîsandina wan bi tîpên hûrdek dest pê dikin.**

**Mînak 35 :** agir, hozan, mirov, netewe, war, xwandin, zilam

**Ji aliyê peyvsaziyê ve navdêr :**
**Peyvên navdêrîn; xwerû û nexwerû, li du beşên sereke dabeş dibin. Yên nexwerû jî di nava xwe de du beş in : hevedudanî û pêkhatî.**

- **Yên xwerû : Ev navdêr sade ne û bêjeyên wan yek hêman in.**
**Ev hêman parçe nabin û eger bibin, tiştekî watedar li holê namîne.**

**Mînak 36 :** Cizîr, dar, dezî, keç, kevir, kur, rê, rû, sal, tilî, zava

**• Yên nexwerû :**
**Ev navdêr du beş in : Yen hevedudanî û yên pêkhatî. Ligel vê peyveke hevedudanî, pêkhatî û yeke pêkhatî jî hevedudanî dibin û dirûvên hîn kompleks jî hene.**

**♦ Yên hevedudanî :**
**Ev herî kêm ji du hêmanên serbixwe pêk tên. Dema ku bên jihevkirin, ji wan her yek bi serê xwe jî watedar in.**

**Mînak 37 : Ji navdêrên hevedudanî :**

**Ji bo yên ku herî kêm bi du hêmanên serbixwe :** Çarçira, çavkanî, Çiyayê Nemrûd, nexweşxane

**Ji bo yên hevedudanî û kompleks :** gulberfîn, hechecik, jinenîgarî, serpêhatî

**Mînak 38 : Pêkhatina navdêrên hevedudanî :**

**Ji bo yên bi du navdêran :**
**ademzade, avtav, jinap, kevirşûşe, kurxal, rojhilat**

**Ji bo raderên hevedudanî yên ku bi erkên navdêrîn :**
**avakirin, bêmalmayîn, dengdan, nîşegirtin**

**♦ Yên pêkhatî :**
**Ev bi alîkariya bêjeyên watedar û qertafên bêjesaz pêk tên. Qertafên bêjesaz: Pêşgir, paşgir, navgir û navbend in.**

**Mînak 39 : Ji pêşgir û paşgirên ku navdêran pêk tînin :**

**★ Pêşgir : Ev qertaf kêm in û piraniya wan jî navdêrîn in :**
**(ber-, bi-, bin-, jê, kele-, li-, ma-, mak-, make-, man-, mê-, nav-, ne-, nêr-, nîv-, zir-) :**

**berçile, bivîl, binax, jêderk, kelebest, ligam, maker, makder, makerê, manga, mêkew, navrêz, nebaşî, nêrkund, nîvdeng, zirberaz**

**★ Paşgir : Ev qertaf pir in : (-ak, -al, -anî, -ar, -asî, -atî, -ahî, -awî, -ayî, -bat, -çe, dank, -de, -e, -ek, -ing, -geh, -ger, -ik, -inc, -ing, -istan, -î, -înî, -îtî, -tî, -kar, -ker, -ok, -mendî, -menî, -van, -yar, -xane) :**

**✔ Ev ji navdêrên şênber ên razber çêdikin :**

**(-ahî, -atî, -awî, -ayî, -înî, -îtî, -tî) :**

**ronahî, zarokatî, gewrawî, sermayî, nermînî, kurdîtî, şervantî**

- **Ev ji navdêran ên cihan pêk tînin : (-geh, -istan, -xane) :**

**stargeh, wargeh, Kurdistan, daristan, çayxane, dersxane**

- **Ev ji rayekên lêkeran ên dema niha, navdêran tînin holê :**
**(-ar, -er, -ek, -i(î/a)ng) :**

**kirin : kir**
**kir + ar : kirar**

**hûrîn : hûr**
**hûr + ek : hûrek**

**kuştin : kuj**
**kuj + er : kujer**

**jimartin : jimêr**
**jimêr + îng : jimêrîng**

- **Ev ji navdêran navdêran çêdikin : (-dank, -emendî, -emenî) :**

**avdank, cegermendî, çapemendî, çapemenî, hunermendîtî**

- **Ev ji rengdêran navdêran çêdikin : (-asî, -î) : kêmasî, rindî**

- **Ev wateya biçûkatiyê dide navdêran : (-çe) : baxçe, navçe**

- **Ev wateya biçûkkirinê û delalokiyan didin navdêran : (-ik, -ok) :**

**bajarok, canik, canok, çavik, devik, devok, karik**

- **Ev di çêkirina navdêran de : (-ak, -al, -anî, -bat, -bend, -de,**
**-e, -êr, ger, -inc, -ist, -î, -k, -kar, -ker, -or, -van, -yar) :**

**ronak, heval, kuranî, malbat, sazbend, kirde, deste, kunêr,**
**rojger, sarinc, zanist, diyarî, germavk, nivîskar, karker, gulor,**
**şervan, zanyar**

### Mînak 40 : Bi alîkariya navgiran pêkhatina navdêran :

**Ev rêbaz kêm bi kar tê.**

★ **Navgir : (-a-) : Navdêr çêkirina wê bi lêkeran ve têkildar in :**
**kêşîn ➞ kêşan**

★ **Navgir : (-bi-, -li-) : Daçek dikeve navbera du navdêran :**
**derbiderî, çavliderî**

**Mînak 41 : Bi alîkariya navbendan çêkirina navdêran : (-e-, -o-, -an) :**
**keskesor, girodarî, beranberî**

**Ji aliyê yekjimarî û pirjimariyê ve navdêr : Li du beşan parve dibin.**

**Yekjimar :**
★ **Ger di resenên xwe de navdêrên yekjimar nêr an jî mê nebin,**
**ew nêtar in.**

**Mînak 42 : Jı navdêrên nêtar : mirov(mêr û jin), zarok(kur û qîz)**

**Yekjimar :**
★ **Navdêrên nebinavkirî yên yekjimar bi paşgira (-ek)'ê tên diyarkirin.**

**Mînak 43 :**
**nêr ➞ mêrek**
**mê ➞ jinek**
**nêtar ➞ mirovek(mêr û jin)**

**Pirjimar :**
★ **Nêr, mê û nêtar hemû navdêr bi paşgira pirjimariyê (-an)'ê pêk tên.**

**Mînak 44 : kuran, keçan, pelan, giravan**

**Pirjimar :**
★ **Navdêrên nebinavkirî bi paşgira (-in)'ê şanî dibin.**

**Mînak 45 :**
**nêr ➞ kurin**
**mê ➞ keçin**
**nêtar ➞ mirovin(mêr û jin)**

★ **Komenav :**
**Ev navdêr di wateyên xwe de him yekjimar, him pirjimar in û bi her du awayan jî bi kar tên.**

**Mînak 46/1 : Ji aliyê ferheng û mêjerê ve çend bêje :**

**Şûr :** Ev bêje **nêr** e.
Di yekjimariyê de **şûrek** e û di pirjimariyê de **şûran** dinimîne.

**Behr :** Ev bêje **mê** ye.
Di yekjimariyê de **behrek** e û di pirjimariyê de **behran** dimêrîne.

**Kurd :** Ev bêje **nêtar** e.
Di yekjimariyê de **kesek** e û di pirjimariyê de **kurdan** an ji wan **çend kesan** an jî **komekê** dest nîşan dikin.

**Mînak 46/2 : Yekjimarî û pirjimariya komenavan, bi alîkariya kêşana lêkeran jî tên bidestxistin.**

Yekjimar :
**Bizin hat.**
**Dar dişewite.**

Pirjimar :
**Bizin hatin.**
**Dar dişewitin.**

**Zayendên navdêran :**
**Di kurmaciyê de du zayend hene : Ya xwezayî(biyolojîk) û ya rêzimanî.**
**Nêr û mê heyberên candar zayenda xwezayiyê pêk tînin.**
**Zayenda duyemîn a rêzimanî ye ku bi alîkariya tewangê û veqetandekê tê bidestxistin.**

- **Zayenda xwezayî :**

**Ev heyber ger nêr û ger mê bin, zayendên wan berbiçav in :**

**Mînak 47/1 : Ji navdêrên nêr :**

**Ji yên mirovan ên serenav :** Azad, Baran, Feqiyê Teyran, Memê Alan

**Ji yên mirovan ên hevenav :** ap, bav, bira, kalik, kur, mam, mêr, xal

**Ji yên ajalan :** beran, conge, dîk, ga, nêrî, nêreker, nêrekew

**Mînak 47/2 : Ji navdêrên mê :**

**Ji yên mirovan ên serenav :** Berîvan, Leyla, Şîlan, Xezal, Zerîn

**Ji yên mirovan ên hevenav :** dê, dotmam, jin, keç, met, pîrik

**Ji yên ajalan :** bizin, çêlek, maker, mih, mehîn, mêkew, mîrişk

**Mînak 47/3 : Ji navdêrên nêtar : Nêrzatî û mêzatiyên wan bi alîkariya tewang û veqetandekê tên zelalkirin.**

**Kar :** Bi serê xwe peyveke nêtar e.

**Kar mê ye : Kara wan hatiye.**
**Kar nêr e : Karê me nehatiye.**

**Hesp** : Bi serê xwe peyveke nêtar e.

**Hesp mê ye : Hespa wan hatiye.**
**Hesp nêr e : Hespê me nehatiye.**

• **Zayenda rêzimanî :**
**Nêr û mê ev zayend, bi alîkariya tewangê û veqetandekê tên pêkanîn.**

★ **Bo navdêrên mê, veqetandek : (-a) ye.**

**Mînak 48 : Bikaranîn, yekjimar :**

**pênûs** ➙ (pênûs + **a**) **: pênûsa min**
**mase** ➙ (mase + **y** + **a**) **: maseya mezin**

★ **Bo navdêrên nêr, veqetandek : (-ê) ye.**

**Mînak 49 : Bikaranîn, yekjimar :**

**agir** ➙ (agir + **ê**) **: agirê topan**
**derî** ➙ (derî + **y** + **ê**) **: deriyê reş**

**Mînak 50 : Bikaranîn, nêr û mê, pirjimar : (-an ➙ -ên) :**

**agir** ➙ (agir + **an**) **: agirên topan**
**mase** ➙ (mase + **y** + **an**) **: maseyên mezin**

**Tewanga navdêrîn :**
**Ji cihekî, tiştekî yan kesekî de ber bi cihekî, tiştekî, kesekî ve çûyînekê yan bûyînekê yan jî li cihekî hatin dîtinekê wekat dike.**

★ **Paşgira tewangê (-ê) :**
**Ev paşgir tê dawiya navdêrên ku tên tewandin :**

✔ **Bi tîpên hûrdek :**

Amed bajarekî dîrokî ye.
**Bavê min diçe Amedê.**

✔ **Bi tîpên girdek :**

Amed bajarekî dîrokî ye.
**BAVÊ MIN DIÇE AMEDÊ.**

★ **Di zayend de tewang :**

✔ **Yekjimar : Bo navdêrên mê, paşgira tewangê (-ê) ye :**

Hesp mehîn e.
**Ez li hespê siwar dibim.**

✔ **Yekjimar : Bo navdêrên nêr, paşgira tewangê (-î ) ye :**

Hesp nêr e.
**Tu li hespî siwar dibî.**

✔ **Pirjimar : Nêr û mê, bo navdêran paşgira tewangê (-an) e :**

Du hesp hene.
**Em li hespan siwar dibin.**

★ **Tewanga ku di peyvê de li ser tîpên dengdêr ên jêrîn pêk tê :**

**(-a → -ê )**
**(-e → -ê )**
**(-î → -î )**

**Mînak 51/1 : Tewang li ser tîpa dengdêr a dawiyê.**

**Yekjimar, nêr :** çiya

**Rovî li çiyê jiyana xwe didomîne.**
**Rovî li çiyayê jiyana xwe didomîne.**

**Yekjimar, mê :** sehne

**Ew jin derneket ser sehnê.**
**Ew jin derneket ser sehneyê.**

**Mînak 51/2 : Tewang li ser tîpa dengdêr a ku di kîteya dawî de ye.**

Yekjimar, **nêr :** bajar
**Hevalek çû bajêr.**

Yekjimar, **nêr :** Erzem
**Ez Erzêm dibînim.**

**Mînak 51/3 : Tewang li ser tîpa dengdêr a yekkîtê ye.**

Yekjimar, **nêr :** mar
**Ez mêr dibînim.**

**Mînak 51/4 : Tewang li ser tîpa dengdêr a dawiyê.**

**Yekjimar, nêr :** cî(cih)

**Ew di cî de dimîne.**
**Ew di ciyê de dimîne.**

**Di navdêran de biçûkkirin û tewang :**
**Paşgirên biçûkker ên navdêran; ecibandin, jêhezkirin û delaliyan raber dikin.**

**Mînak 52 : Ji paşgirên biçûkker : (-ik/uk, -ok, -o, -ê, -çe)**

★ **Bo navdêran, nêr û mê : (-ik/uk) :**

**keç + ik : keçik**
**kur + uk : kuruk**
**berx + ik : berxik**

★ **Bo biçûkkirin û çêkirina navdêran : (-ok) :**

**dev + ok : devok**
**ferheng + ok : ferhengok**
**zar + ok : zarok**

✔ **Bo navdêrên nêr : (-ko) :**

**cîran + ko : cîranko**
**heval + ko : hevalko**
**Mem + ko : Memko**

✔ **Bo navdêrên nêr : (-o) :**

**kalik + o : kaliko**
**kuruk + o : kuruko**
**reşik + o : reşiko(reşko)**

✔ **Bo navdêrên mê : (-ê) :**

**hirçik + ê : hirçikê**
**karik + ê : karikê**
**pîrik + ê : pîrikê**

✔ **Bo biçûkkirin û çêkirina navdêran, mê : (-çe) :**

**bax + çe : baxçe**
**nav + çe : navçe**
**nîv + çe : nîvçe**

## Di navdêran de banglêkirin û tewang :

### Mînak 53 : Pêkanîn :

★ **Bo navdêrên nêr, yekjimar, paşgira banglêkirinê : (-o) :**

**Rêzan + o : Rêzano**
**law + o : lawo**
**kar + o : karo**

★ **Bo navdêrên mê, yekjimar, paşgira banglêkirinê : (-ê ) :**

**Zîlan + ê : Zîlanê**
**keç+ ê : keçê**
**kar + ê : karê**

★ **Bo yên nêr û mê, pirjimar, paşgira banglêkirinê : [-(i)no ] :**

**nêr :**
**mêr + ino : mêrino**
**zilam + (i)no : zilamno**
**kar + ino : karino**

**mê :**
**xwişk + ino : xwişkino**
**jin + (i)no : jinno**
**kar + ino : karino**

**Ravek(qedînek) :**
**Ev bi alîkariya paşgirên veqetandekê, herî kêm bi du hêmanan pêk tê û navên wan du hêmanan, *raveber* û *raveker* in.**

**Raveka navdêrîn(qedîneka navdêrîn) :**
**Bi alîkariya paşgirên veqetandekê û herî kêm bi du navdêran tên holê.**

**Mînak 54/1 : Ji aliyê raveberê ve ravekirina ravekê :**

**Yekjimar :**

★ **Bo navdêrên nêr, veqetandek : (-ê)**

**Lawê Zînê hat.**

**raveber : law(**ev yek e**)**
**raveker : Zîn**

★ **Bo navdêrên mê, veqetandek : (-a)**

**Keça Zînê hat.**

**raveber : keç(**ev yek e**)**
**raveker : Zîn**

**Pirjimar :**

★ **Bo navdêrên nêr û mê, veqetandek : (-an → -ên)**

**Lawên Zînê hatin.**

**raveber : law(**ev ji yekî pirtir in**)**
**raveker : Zîn**

**Keçên Zînê hatin.**

**raveber : keç(**ev ji yekê pirtir in**)**
**raveker : Zîn**

**Mînak 54/2 : Ji aliyê ravekerê ve ravekirina ravekê :**

★ **Yekjimar :**

♦ **Navderên raveker nêr in :**

✔ **Raveker bi tîpa "o"yê diqede, tewangê nagire, lê bi xwezayî erka wê bi cih tîne.**

**Destê Ferho şikeştiye.**

✔ **Raveker bi tîpeke dengdar diqede, paşgira tewangê digire : (-ê )**

**Destê Memê neşikeştiye.**

✔ **Di nivîsaran de ev dirûv jî tê dîtin, ji bo pêyvên nêr :**
**Raveker bi tîpeke dengdar diqede, paşgira tewangê digire : (-î )**

**Destê Memî neşikeştiye.**

✔ **Raveker peyveke dukîteyî û kîteya wê ya di dawî de tîpa "-a-"yê heye, tewang xwe diavêje ser wê tîpê : (-ê)**

**Kê destê Barên badaye?**

✔ **Di nivîsaran de tên dîtin, ji bo peyvên nêr : Paşgira tewangê tê dawiya ravekerê : (-î )**

**Kê destê Baranî badaye?**

♦ **Navderên raveker mê ne :**

✔ **Raveker peyveke yekkîte ye, bi tîpeke dengdar diqede û paşgira tewangê tê dawiya wê : (-ê)**

**Kê destê qîzê girê daye?**

✔ **Raveker peyveke dukîteyî ye, di kîte dawî tîpa "-a-"yê heye, lê tewang xwe navêje ser wê, diçe dawiya peyvê : (-ê)**

**Kê destê Şîlanê hildaye?**

★ **Pirjimar :**

♦ **Ji bo navdêrên raveker, nêr û mê, paşgira tewangê : (-an)**

✔ **Bo navdêrên raveker, nêr :**
**Ma jin, di vê demê de bi destên mêran jin dibin?**

✔ **Bo navdêrên raveker, mê :**
**Evdelê Zeynikê bi zimanê çûkan jî dizaniye.**

**Mînak 54/3 : Di raveka zincîrîn(rêzilkî) de bikaranîn :**

★ **Yekjimar :**

✔ **Hêmanên ravekê : hesp, kal, mîr, eşîr**

**Hespê kalê mîrê eşîrê hatibû xemilandin.**
**Hespê kalê mîr ê eşîrê hatibû xemilandin.**

✔ **Hêmanên ravekê : hesp, qîz, xatûn, eşîr**

**Hespa qîza xatûna eşîrê hatibû revandin.**
**Hespa qîza xatûnê ya eşîrê hatibû revandin.**

★ **Pirjimar :**

✔ **Hêmanên ravekê : hesp, kal, mîr, eşîr**

**Hespên kalên mîrên eşîran hatibûn xemilandin.**
**Hespên kalên mîran ên eşîran hatibûn xemilandin.**

✔ **Hêmanên ravekê : hesp, qîz, xatûn, eşîr**

**Hespên qîzên xatûnên eşîran hatibûn jimartin.**
**Hespên qîzên xatûnan ên eşîran hatibûn jimartin.**

**Navdêrên jimarîn :**
**Cander û necander, eger tişt û heyîn bên jimartin an pîvandin an jî wezinandin; kirariyên wan ên mêjerî, bi hin hêmanên arîtmetîkî tên diyarkirin ku ew hêman *jimar* in û ji aliyê rêzimanî ve jî *jimarnav* in. Jimar bi serê xwe navdêr in, wek gelek navdêran bi erkên rengdêrîn û yên hokerîn bi kar tên, dibin jimarên rengdêrîn û yên hokerîn jî.**

**Jimarên navdêrîn li çar beşên sereke parve dibin :**
**Jimarên bingehîn**

**Jimarên debaşiyê**
**Jimarên rêzkirinê(rêzîn)**
**Jimarên pareyî(şikestî)**

- **Jimarên bingehîn :**

**Ev jimar ên tam in û bi erkên navdêrîn tişti û heyînan didin nasîn.**

**Mînak 55/1 : Jimarên yekan : ji sifirê de heta nehan :**
sifir, yek, du(didu, do, dido), sê(sisê), çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh

**Mînak 55/2 : Jimarên dehan :**

**Ji dehan de heta nod û nehan :**
deh, yazdeh, dozdeh, sêzdeh, çardeh, pazdeh, şazdeh, hevdeh, hejdeh, nozdeh, bîst, sih, çil, pêncî, şêşt, heftê, heştê, nod

**Ji bîstan şûn de bi yekê dest pê dikin :**
bîst, bîst û yek, sih, sih û yek, çil, çil û yek, pêncî, pêncî û yek

**Mînak 55/3 : Jimarên sedan :**

**Ji sedî de heta neh sed û nod û nehan :**
sed, du sed, sê sed, çar sed, pênc sed, heft sed, heşt sed, neh sed

**Ji sedî şûn de bi yekê dest pê dikin :**
sed û yek, du sed û yek, sê sed û yek, çar sed û yek, pênc sed û yek, heft sed û yek, heşt sed û yek, neh sed û yek

**Mînak 55/4 : Jimarên hezaran :**

**Ji hezarî de heta neh hezar û neh sed û nod û nehan :**
hezar, du hezar, sê hezar, çar hezar, pênc hezar, şeş hezar, heft hezar, heşt hezar, neh hezar

**Ji hezarî şûn de bi yekê dest pê dikin :**
hezar û yek, du hezar û yek, sê hezar û yek, çar hezar û yek, pênc hezar û yek, heft hezar û yek, heşt hezar û yek, neh hezar û yek

**Mînak 55/5 : Jimarên mêzin :**

**Yên milyonan :**
**milyon**(milyonek), milyon û yek, milyon û yazdeh, çar milyon û çil

**Yên milyaran :**

**milyar**(milyarek), milyar û yek, milyar û hevdeh, deh milyar û şêşt

**Yên trîlyonan :**
**trîlyon**(trîlyonek), trîlyon û yek, trîlyon û nozdeh, bîst trîlyon û nod

**Yên katrilyonan :**
**katrilyon**(katrilyon), katrilyon û yek, du katrilyon, sê katrilyon û sed

◂◂ Ji deh hezarî re lek, ji pênc sed hezarî re kirûr tên gotin. ▸▸

**Mînak 56 : Bikaranînên wiha jî hene :**

**du → didu, do, dido**
**sê → sisê**

**yazdeh → yanzdeh**
**dozdeh → danzdeh**
**pazdeh → panzdeh**
**şazdeh → şanzdeh**

**sih → sîh, sî**
**çil → çel**
**pêncî → pênce**
**heftê → heftî**
**heştê → heştî**

★ **Tewang û bikaranîna jimarên bingehîn :**

**Mînak 57 : sifir û yek mê ne.**

✓ **Yekjimar, bo jimarên mê paşgira tewangê : (-ê) :**

**Gulê bi sifirê dest pê kiribû.**
**Çar ji yekê pirtir in.**

✓ **Pirjimar, nêr û mê, bo jimaran paşgira tewangê : (-an) :**

**Kar û xebat bi sifiran dest pê nakin.**
**Lê hin kar û xebat bi yekan dest pê dikin.**

**Mînak 58 : Di pirjimariyê de :**
**Jimarên bingehîn paşgira (-an)'ê digirin û di jimarên hevedudanî de ev paşgir tê dawiya jimarê ya herî dawiyê.**

**Di diduyan de çend yek hene?**
**Sisê ji çaran kêmtir in.**
**Gulçîn bi bîstan ve ketibûn ezmûnê.**

**Memê, ji çil û nehan yek hilbijart.**
**Gulê, ji sed û pêncî û heftan sê pel çirandibûn.**

**Mînak 59 : Ev jimar mîna navdêrên nêr, paşgira (-î )'yê digirin :**
**sih, çil, pêncî, şêşt, heftê, heştê, nod, sed, hezar, pênc sed hezar...**

**Ji sihî de heta pencî bijimêrin!**
**Li ser sedî li hev nehatin.**
**Wî, cil bi hezarî kirîbû.**
**Min, ew xanî bi pênc sed hezarî xwast, lê nedan.**

**Mînak 60 : Ev jimar mê ne û wek navdêrên mê tên tewandin :**
**milyon, milyar, trîlyon, katrilyon...**

**Xaniyê bavê Gulçînê, bi milyonekê hatiye firotin.**
**Xaniyên bavê Dîlanê, bi du milyonan hatine avakirin.**

**Mînak 61 : Ji jimaran : du(do), didu(dido), sê(sisê)**

- **Didu yan dido : Ev dirûv di forma jêr de bi kar nayên :**

**Li wê bazerê du sed firoşger hene.**

- **Sisê : Ev dirûv di forma jêr de bi kar nayê :**

**Li wê bazerê sê sed mirovî kar dikir.**

- **Jimarên debaşiyê :**

**Ev jimar bi parîkirinên yeksan ên jimarîn pêk tên. Jimarên debaşiyê bi erkên hokerîn hîntir karîger in.**

**Mînak 62 : Rêbazên pêkhatina jimarên debaşiyê :**

★ **Bi ducarkirina sade ya jimarên bingehîn :**

**yek → yek yek**
**du → du du**
**sê → sê sê**

**deh → deh deh**

**yazdeh → yazdeh yazdeh**
**bîst û du → bîst û du bîst û du**
**sed → sed sed**
**deh hezar → deh hezar deh hezar**

**★ Bi alîkariya daçeka (bi) û ducarkirina sade ya jimarên bingehîn :**

**yek → yek bi yek**
**du → du bi du**
**sê → sê bi sê**
**çar → çar bi çar**

**deh → deh bi deh**
**şêşt → şêşt bi şêşt**
**sed → sed bi sed**
**milyon → milyon bi milyon**

**★ Bi alîkariya gihaneka (û) û ducarkirina sade ya jimarên bingehîn :**

**yek → yek û yek**
**du → du û du**
**sê → sê û sê**
**neh → neh û neh**

**deh → deh û deh**
**çil → çil û çil**
**hezar → hezar û hezar**

**★ Bi alîkariyên navbendên (-e -o)'yê : Bi ducarkirina sade ya jimarên bingehîn :**

**yek → yekeyek, yeko yeko → yek bi yek, yek û yek**
**çar → çare çar(çareçar) → çar bi çar, çar û çar**
**şeş → şeşe şeş(şeşeşeş) → şeş bi şeş, şeş û şeş**

**deh → dehe deh(dehedeh) → deh bi deh, deh û deh**
**çil → çile çil(çileçil) → çil bi çil, çil û çil**
**sed → sede sed(sedesed) → sed bi sed, sed û sed**

**★ Hin jimarên pareyî, wekî yên bingehîn bi awayê debaşiyê bi kar tên :**

**nîv → nîv nîv, nîv bi niv**
**sêyek → sêyek sêyek**

**çaryek → çaryek çaryek**
**yek û nîv → yek û nîv yek û nîv**

**★ Hin bêje hene ku wek jimarên dabeşiyê bi kar tên :**

**cot → cot cot, cotecot, cot bi cot, du bi du**
**zo → zo zo, cot bi cot, du bi du**

**fer → fer fer, fer bi fer, yekeyek, yek bi yek, tek bi tek**
**tek → tek tek, teketek, fer bi fer, yekeyek, yek bi yek, tek bi tek**

**• Jimarên rêzkirinê :**
**Ev jimar bi payeyên jimarîn ên tişti û heyînan didin nasîn.**

**Mînak 63 : Rêbazên pêkhatina jimarên rêzkirinê :**

**★ Bi paşgira rêzkirinê (-em)'ê :**

**yekem, duyem, sêyem, heftem, dehem, yazdehem, bîstem**
**bîstî û yekem sihem, sih û duyem, çilem, sedem, hezarem**

**★ Bi paşgira rêzkirinê (-emîn)'ê :**

**yekemîn, duyemîn, sêyemîn, heftemîn, dehemîn, yazdehemîn**
**bîstemîn, bîstî û yekemîn, sih û duyemîn, çilemîn, pênciyemîn**
**sê sed û nod û nehemîn, hezar û duyemîn, milyon û hezaremîn**

**★ Bi paşgira tewangê ya pirjimariyê, nêr û mê : (-an) :**

**yekan, duyan(diduyan), sêyan(sisêyan), pêncan, heftan, dehan**
**yazdehan, bîstan, bîst û yekan, sihan, sih û duyan, çil û çaran**
**pênciyan(pênceyan), sedan, hezar û diduyan, şeş milyonan**

**★ Bi paşgira tewangê ya yekjimariyê, nêr : (-î) :**

**dehî, bîstî, sihî, çilî, pencî, şêştî, heftî, heştî, nodî, sedî, hezarî**
**deh hezarî, milyonî, sed milyonî, milyarî, çar milyarî**

**• Jimarên pareyî :**
**Ev jimar, ji parçeyên jimarên bingehîn pêk tên. Bi bikaranînên xwe yên navdêrîn, parçeyên tişt û heyînan didin nasandin.**

**Mînak 64 : Rêbazên pêkhatina jimarên rêzkirinê :**

★ Bi alîkariya paşgira (-ek, -yek)’ê û nîv :

nîv → nîvek
sê → sêyek
çar → çaryek
yek û nîv

Memê nanek anî, jê nîvek da hevalekî min.
Sê zarok bûn, zebeşek kirîn, sêyek parve kirin.

★ Bi alîkariya daçeka (ji) : yekjimar, mê : (-ê) :

ji yekê nivek
ji yekê çaryek

Ji hezarî sifirekê bikuje, çi dimîne?
Ji sifirê çi bidim te!

★ Bi alîkariya daçeka (ji) : yekjimar, nêr : (-î) :

ji sihî sisê
ji çelî şeş

Ji şêştî pazdehan dide dostekî xwe.
Ji hezarî du sedî ji te re dinivîsînim.

★ Bi alîkariya daçeka (ji) : pirjimar, nêr û mê : (-an) :

ji diduyan yek
ji sisiyan du

We ji bîst û çaran şeş ji bîr kirine.
Dîlanê ji dehan sisê veşartine.

Mînak 65 : Jimarên pareyî, bêyî qertafên tewangê jî pêk tên :
şeş û çaryek
çaryek kêm heft

Saet şeş û çaryek in.
Saet çaryek kêm heft in.

Mêjer, navdêrên binavkirî û yên nebinavkirî :
Bi gotineke giştî; hin navdêr bi serê xwe heyberekî(ê) û hin jî him xwe û him jî komekê didin nasîn û di wan danasînan de mêjarên wan jî tên

**pêş mirov. Lê ev rewş ji bo her navdêrekê ne misegor e. Kêmasiyên ku tên dîtin, bi hin rêgezên rêzimanî(zayend, veqetandek, tewang, kêşana lêkerîn) çareser dibin.**

**Mêjera navdêrîn :**
**Ev bi danasîneke sade, yekjimarî û pirjimariya navdêran dide derbirîn.**

**Mêjerên navdêran bi hin rêgezên bingehîn tên bidestxistin :**
**Bi veqetandekê**
**Bi alîkariya tewangê**
**Bi kêşana lêkerê**

- **Bi alîkariya veqetandekê mêjer :**

★ **Di navdêrên binavkirî de :**

**Mînak 66/1 : Veqetandeka binavkirî, yekjimar, nêr : (-ê) :**

**bajar ➞ bajarê gelan**
**çem ➞ çemê kul û kederan**

**Mînak 66/2 : Veqetandeka binavkirî, yekjimar, mê : (-a) :**

**kel ➞ kela avê**
**stran ➞ strana gelêrî**

**Mînak 66/3 : Veqetandeka binavkirî, pirjimar, nêr û mê : (an ➞ -ên) :**

**kel ➞ kelên avê**
**bajar ➞ bajarên gelan**

★ **Di navdêrên nebinavkirî de :**

**Mînak 67/1 : Veqetandeka nebinavkirî, yekjimar, nêr : (-ekî) :**
**bajar ➞ bajarekî gelan**
**çem ➞ çemekî kul û kederan**

**Mînak 67/2 : Veqetandeka nebinavkirî, yekjimar, mê : (-eke) :**

**kel ➞ keleke avê**
**stran ➞ straneke gelêrî**

**Mînak 67/3 : Veqetandeka nebinavkirî, pirjimar, nêr û mê : (-ine) :**

**kel → keline avê**
**bajar → bajarine gelan**

- **Bi alîkariya tewangê mêjer :**

**Mînak 68/1 : Bo navdêrên binavkirî, yekjimar, nêr û mê : (-ê) :**

**Rizgar → Rizgar pelê jêdike.**
**qîz → Qîzê şîr vedixwar.**

**Mînak 68/2 : Bo navdêrên binavkirî, pirjimar, nêr û mê : (-an) :**

**Rizgar → Rizgar pelan jêdike.**
**qîz → Qîzan şîr vedixwar.**

**Mînak 69/1 : Bo navdêrên nebinavkirî, yekjimar, nêr û mê : (-ek) :**

**nêr : kur + ek → kurek**
**mê : gul + ek → gulek**

**Mînak 69/2 : Bo navdêrên nebinavkirî, yekjimar, nêr : (-î ) :**

**Ez kurekî dibînim.**

**Mînak 69/3 : Bo navdêrên nebinavkirî, yekjimar, mê : (-ê) :**

**Ez gulekê dibînim.**

**Mînak 70/1 : Bo navdêrên nebinavkirî, pirjimar, nêr û mê : (-in) :**

**nêr : kur + in → kurin**
**mê : gul + in → gulin**

**Mînak 70/2 : Bo navdêrên nebinavkirî, pirjimar, nêr û mê : (-inan) :**

**nêr : kur → kurin + an → kurinan**
**mê : gul → gulin + an → gulinan**

**Mînak 70/3.1 : Bo navdêrên nebinavkirî, pirjimar, nêr û mê : (-inan) :**

**Ez kurinan dibînim.**
**Hûn gulinan dibînin.**

**Mînak 70/3.2 :**
**Bo navdêrên nebinavkirî, pirjimar, nêr û mê : (-inan → -inên) :**

**Ez kurinên din dibînim.**
**Hûn gulinên zer dibînin.**

- **Bi alîkariya kêşana lêkerê mêjer :**

**Mînak 71/1 : Bo mêjera navdêran, yekjimar, nêr, veqetandek : (-ê) :**

Bi lêkera “**çûn**”ê → **Kurê wî diçe.**
Bi lêkera “**şûştin**”ê → **Kalê destê xwe şûşt.**

**Mînak 71/2 : Bo mêjera navdêran, yekjimar, mê, veqetandek : (-a) :**

Bi lêkera “**çûn**”ê → **Keça wî diçe.**
Bi lêkera “**şûştin**”ê → **Bûkê destmala xwe şûşt.**

**Mînak 71/3 : Bo mêjera navdêran, pirjimar, nêr û mê : (-an → -ên) :**

Bi lêkera “**çûn**”ê → **Kurên wî diçin.**
Bi lêkera “**şûştin**”ê → **Bûkê destmalên xwe şûştin.**

**Lêşikandina navdêrîn(gelemperîkirina navdêran) :**
**Peyvên navdêrîn dikevin forma lêşikandinê. Bi awayên gelemperî û nebinavkirî, yekjimar û pirjimar bi kar tên.**

- **Bi alîkariya gihaneka “û” bi tîpa “m”yê :**

**Mînak 72 : Yekjimar û pirjimar, nêr û mê :**

**xanî → xanî û manî**
**pênûs → pênûs û mênûs**

✔ **Bikaranîna yekjimar :**

**Wan xanî û manî ava nekiriye.**
**Wî pênûs û mênûsek daye Dîlanê.**

✔ **Bikaranîna pirjimar :**

**Wan xanî û manî ava nekirine.**
**Wî pênûs û mênûs dane Dilanê.**

✔ **Di zimanê gelêrî de tên dîtin :**

Yekjimar :
**Wan xanî manî ava nekiriye.**

Pirjimar :
**Wan xanî manî ava nekirine.**

• **Bi alîkariya gihaneka "û" û bi tîpên dengdêr(a, e, ê, i, o, u, û) yên peyvên ku dikevin forma lêşikandinê :**

**Mînak 73/1 : Yekjimar û pirjimar, nêr û mê :**

**hez → hez û hûz**
**Jiyan bê hez û hûz nabin.**

**kes → kes û kûs**
**Min kes û kûs nedît.**
**Wê rojê kes û kûsên xebatkar nehatibûn.**

**Mînak 73/2 : Yekjimar û pirjimar, nêr û mê :**

**kar → kar û mar**
**zer → zer û mer**
**kêr → kêr û mêr**
**dil → dil û mil**
**tîr → tîr û mîr**
**tor → tor û mor**
**kur → kur û mur**

**Bi tevayî navdêr :**

• **Navdêrên nêr :**

★ **Yên heyberên candar ên mirov û ajalan :**

**Mînak 74 : Ji yên mirovan :** Alan, bav, kal, law, Şerko

**Mînak 75 : Ji yên ajalan :** beran, conge, ga, kavir, nêrî

★ **Yên dirametên sewalên kedî û şîr û yên ku ji şîr çêdibin :**

**Mînak 76 :** şîr, mast, dew, penêr, rûn, goşt, hestî, çerm, mû

♦ **Bêjeyên awerte hene, ew mê ne :** Çolik, hirî, liva, lorik, xwîn

★ **Yên piraniya lebatên(organ) mirovan ên ku li der in :**

**Mînak 77 :** dev, çav, guh, poz, rû, serî, çenge, dest, ling, mil

★ **Yên robaran(çem û zêyan) :**

**Mînak 78 :** Aras, Avareş, Dîcle, Ferat, Mûrad, Xebûr, Zêrinçem

♦ **Bêjeyên awerte hene, ew mê ne :** coav, coge

★ **Yên rengan :**

**Mînak 79 :** kesk, reş, sor, spî, gewr, şîn, xemrî, zer

★ **Yên jimaran :**

**Mînak 80 :** du, sê, çar, deh, yazdeh, bîst, çil, sed, hezar

♦ **Bêjeyên awerte hene, ew mê ne :** sifir, yek, milyon, milyar

**Di zimanê gelêrî de :**
**Jimarên mezin( milyon, milyar...) him nêr û him mê tên bikaranîn.**

★ **Yên tişt û heyînên bi qoqizî yan jî yên bilind nêr in, lê gelek bêjeyên awerte jî hene :**

**Mînak 81 :** çakûç, çiya, gir, girik, hevraz, hors, kevir, mil, stirî, til

♦ **Bêjeyên awerte hene, ew mê ne :** das, keleh, tîr, xardos

• **Navdêrên mê :**

★ **Yên heyberên candar ên mirov û yên ajalan :**

**Mînak 82 : Ji yên mirovan :** Ajîn, Nazê, Perwîn, pîrik, jinap, jinxal

**Mînak 83 : Ji yên ajalan :** nogin, mî, dêl, dêlik, dêleseg, dêlegur

★ **Yên hêwirgehan, cihên ku têde tên rûniştin û yên derdanan :**

**Mînak 84 :** mal, ode, baregeh, dêr, birc, qul, tûnel, şikeft, hêlîn, pîn

♦ **Bêjeyên awerte hene, ew nêr in :** axur, kon, xanî

★ **Yên erdnîgarî :**

**Mînak 85 :** deşt, girav, gol, behr, kendav, komgirav, nexşe, zozan

♦ **Bêjeyên awerte hene, ew nêr in :**

**Navdêrên çem û zêyan :** Avaşîn, Mûnzir, Zap
**Ji yên din ên erdnîgarî :** Bajar, çiya, gund, welat

★ **Yên navgînên(wesîteyên) ragihandinê :**

**Mînak 86 :** balafir, erebe, gerdûm, keştî, metro, otobus, taksî, trên

★ **Yên nexweşiyan, êş û birînan :**

**Mînak 87 :** arsim, bêhntengî, çavêşî, çîk, peta, ta, tîfo, werem, zikêş

★ **Yên xwarinên ku hatine çêkirin û biraştin :**

**Mînak 88 :** girar, kebab, lepe, mehîr, savar, selete, şorbe, şîv, tirşik

♦ **Bêjeyên awerte hene, ew nêr in :** Goşt, kutilk, nan

★ **Yên tişt û heyînên asmanî û yên mehwayî :**

**Mînak 89 :** Roj, Dinya, Hîv, Merîh, avî, baran, berf, cemed, zîpik

♦ **Bêjeyên awerte hene, ew nêr in :** asîman, ezman, ba, ewr

★ **Yên tîpan, yên têgînên rêzimanî, yên razber :**

♦ **Ji bo yên tîpan :**

**Mînak 90 : Hemû tîpên alfabeya kurdî yên kurmanciyê mê ne.**
**A → Aya mezin**
**a → aya biçûk**
**d → deya kesk**

♦ **Ji bo yên têgînên rêzimanî :**

**Mînak 91 :** alfabe, kîte, dengdar, hevok, navdêr, rengdêr, lêker, daçek

♦ **Bêjeyên awerte hene, ew nêr in :** nav

♦ **Ji bo yên razber :**

**Mînak 92 :** aborî, aşitî, evîn, felsefe, xewn, xiyal, zanistî, zihîn

♦ **Bêjeyên awerte hene, ew nêr in :** cin, dîn, milyaket, rih, Xwedê

★ **Hemû rader bi serê xwe navdêr in û wek wan bi kar tên :**

**Mînak 93 :** anîn, avakirin, barandin, bûn, hatin, geşbûn, jêkirin

★ **Yên pêkhatî û ji yên ku paşgirên wan bi ( -î, -dank, -geh, -xane, -istan) ê diqedin :**

**Mînak 94 :** aşitî, bajarîtî, guldank, stargeh, çayxane, daristan

★ **Yên pêkhatî û ji yên ku paşgirên wan bi (-ahî, -anî, -ayî, -î, -tî )'yê bi dawî dibin :**

**Mînak 95 :** agahî, daxuyanî, mezinayî, bajarî, bajarvanîtî

**Jimar : 3**

**Mijar : Cînavk**

**Nasîn : Peyvên ku di hevokan de şûna navdêran digirin û peywirên wan pêk tînin re *cînavk* tên gotin.**

**Peyvên ku di hevokên jêrîn de hatine reşkirin, cînavk in : Ew, wî, wê, çi, xwe, kê**

Çima **ew** her di heşê **wî** de bû? Ji bo **çi** dihat ber çavên **wê**? Di xewn û xeyala **wê** de her **ew** hebû. Li **çi** dinêrî, Ehmed li ber çavên **wê** bû. Destên **xwe** dida **kê** û dida **çi**, digot qey berê destên **xwe** dide Ehmed. (Çiyayê Agirî, Y. Kemal)

**Cînavk li deh beşên sereke kom dibin :**

**Cînavkên kesane**
**Cînavkên şanîdane**
**Cînavka qertafî**
**Cînavka vegerok**
**Cînavkên berbihevîn**
**Cînavkên lihevxistî**
**Cînavkên xwedîtiyê**
**Cînavkên girêkî**
**Cînavkên pirsyarî**
**Cînavkên nebinavkirî**

**Cînavkên kesane(kesanî) :**
**Li şûna navdêrên mirovan digirin. Digel vê yên kesên sêyemîn li şûna yên hemû heyberan jî bi kar tên.**

**Cînavkên kesane du beş in : Yên xwerû(netewandî) û yên tewandî.**

- **Cînavkên kesane yên xwerû :**

**Yekjimar, nêr û mê :**

**Ez : Li şûna kesê/a yekemîn, yê/a ku dipeyive.**

**Tu : Li şûna kesê/a duyemîn, yê/a ku pê re tê peyivîn.**

**Ew : Li şûna kesê/a seyemîn, yê/a ku li ser peyivîn dibe.**

**Pirjimar, nêr û mê :**

**Em :** **Li şûna kesên yekemîn(nêr, mê), yên ku dipeyivin.**

**Hûn :** **Li şûna kesên duyemîn(nêr, mê), yên ku pê re tên peyivîn.**

**Ew :** **Li şûna kesên sêyemîn(nêr, mê), yên ku li ser peyivîn dibin.**

**Mînak 96/1 : Cînavkên kesane yên xwerû, cihên kesan digirin :**

**Gulçîn hatibû, wê got : -Ez ji Hewlêrê hatim.**
**Mem ji hevalekî dipirse : -Tu çima nehatî dibistanê?**
**Alan heta malê beziya. Ew heta wir ranewestiya.**

**Diya Narê hatibû, wê got : -Em bi balafirê çûn Stenbolê.**
**Narê ji hevalên xwe pirsî : -Hûn li sînemayê bûn?**

**Mînak 96/2 : Ew : li cihên navdêrên din jî bi kar tê :**

**Yekjimar :**
**Çûkek firiya, bilind bû û çû. Ew careke din neziviriya.**

**Pirjimar :**
**Du çûk firiyan, bilind bûn û çûn. Ew careke din neziviriyan.**

**Mînak 96/3 : Ew di hevokê de kirde dibin :**

**Ez ji Hewlêrê me. Ez ji wir çûm Wanê.**
**Tu ne ji Hewlêrê yî. Tu ji wir nehatî Wanê.**
**Ew ji Rihayê ye. Ew ji wir çûye Dîlokê.**

**Em ji Hewlêrê ne. Em ji wir çûn Wanê.**
**Hûn ne ji Hewlêrê ne. Hûn ji wir nehatin Wanê.**
**Ew ji Rihayê ne. Ew ji wir çûne Dîlokê.**

**Mînak 96/4 : Ew di hevokê de bireser dibin :**

**Gava ku ez diçûm bin darê, te ez ditîm.**
**Gava ku tu diçûyî bin darê, min tu dîtî.**
**Gava ku em diçûn bin darê, wî ew dît.**

**Gava ku em diçûn bin darê, wan em dîtin.**
**Gava ku hûn diçûn bin darê, me hûn dîtin.**
**Gava ku ez û tu diçûn bin darê, me ew dîtin.**

**Mînak 96/5 : Di ravekê de bi formeke awerte raveber cih digirin :**

**Yekjimar**

**nêr :**
**Ezê brîndar**
**Tuyê bêkes**
**Ewê pîşikestî**

**mê :**
**Eza brîndar**
**Tuya bêkes**
**Ewa pîşikestî**

**Pirjimar, nêr û mê :**

**Emên brîndar**
**Hûnên bêkes**
**Ewên pîşikestî**

- **Cînavkên kesane yên tewandî :**

**Yekjimar :**

**Min : Li şûna kesê/a yekemîn(nêr, mê), yê/a ku dipeyive.**

**Te : Li şûna kesê/a duyemîn(nêr, mê) yê/a ku pê re tê peyivîn.**

**Wî : Li şûna kesê seyemîn(nêr), yê ku li ser peyivîn dibe.**

**Wê : Li şûna kesa seyemîn(mê), ya ku li ser peyivîn dibe.**

**Pirjimar, nêr, mê :**

**Me : Li şûna kesên yekemîn, yên ku dipeyivin.**

**We : Li şûna kesên duyemîn, yên ku pê re tên peyivîn.**

**Wan : Li şûna kesên seyemîn, yên ku li ser peyivîn dibin.**

**Mînak 97/1 : Cînavkên kesane yên tewandî, cihên kesan digirin :**

**Ez Şiyar im, min kovara mehane kirî.**
**Tu Dildar î, te jî ew xwend.**
**Şêro nameya Narê girtibû. Wî name girtibû.**

**Rewşenê xelat negirtibû. Wê xelat negirtibû.**

**Dilbirîn û Rojhat, em sê heval in. Me peyam bihîstin.**
**Rojda û tu, hûn du heval in. We jî peyam bihîstine.**
**Gulçîn û Memê kovar nekirîn. Wan tu kovar nekirîn.**

**Mînak 97/2 : Wî/wê, wan : li cihên navdêrên din jî bi kar tên :**

**Yekjimar :**
**Beranekî av venexwar. Wî av venexwar.**
**Mihekê av venexwar. Wê av venexwar.**

**Pirjimar :**
**Beran û mihê av venexwarin. Wan av venexwarin.**

**Nîşe : Ev dirûv di nivîsaran de tên dîtin :**
**hûn → hun, hon**
**wan → ewan**

**Mînak 97/3 : Ew di hevokan de kirde dibin :**

**Min li defterê nivîsand.**
**Te li ya xwe nenivîsandiye.**
**Wî nedizanî ku ew ê navê xwe bide min.**
**Wê gotibû ku ez nikarim werim cem te.**

**Me nivîsarên xwedekaran xwandin.**
**We jî pirtûk xwandin.**
**Wan ne li me û ne jî li we guhdarî kirin.**

**Mînak 97/4 : Ew di hevokan de bireser dibin :**

**Ez te dibînim, çima tu min nabînî?**
**Binêre, ew jî wî û wê baş dibîne!**

**Wan li me xist, me li wan nexist.**
**We nebihîstiye, ji we re negotine.**

**Mînak 97/5 : Cînavkên tewandî di ravekê de raveker in û cihên navdêrên tewandî digirin :**

**Porê Alên(Alan) reş e. Porê wî reş e.**

**Porê Nazê dirêj e. Porê wê dirêj e.**

**Cano pelên darê jê kirin. Cano pelên wê jê kirin.**

**Pîrekê birîna Memê derman kir. Pîrekê birîna wî derman kir.**

**Te wêneyên zarokan kişandin. Te weneyên wan kişandin.**

**Cînavkên şanîdanê :**
**Ev cihên heyberan digirin û wek bêjeyên bi zayend jî dikevin bandora tewangê. Di hevokan de bi erkên kirdeyî û bireserî radibin.**
**Cînavka şanîdanê "ha/han" jî di beşa yên şanîdanê de de tê nimandin.**

**Mînak 98/1 : Cînavkên şanîdanê yên xwerû :**

**★ Cihên wan nêzîk in : ev**

**Yekjimar :**

**nêr : ev**
**Azad xwendevan e. Ev xwendevan e.**
**Xanî nû ye. Ev nû ye.**

**mê : ev**
**Avşîn xwendevan e. Ev xwendevan e.**
**Behr ji golê mezintir e. Ev ji golê mezintir e.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê : ev**
**Azad û Avşîn xwendevan in. Ev xwendevan in.**
**Xanî nû ne. Ev nû ne.**
**Behr ji golan mezintir in. Ev ji golan mezintir in.**

**Mînak 98/2 : Cînavkên şanîdanê yên xwerû :**

**★ Cihên wan dûr in : ew**

**Yekjimar :**

**nêr : ew**
**Kurê wan ji malê derket. Ew ji malê derket.**
**Kevirê reş şikestiye. Ew şikestiye.**

**mê : ew**

**Keça we ji malê derket. Ew ji malê derket.**
**Kêra tûj şikestiye. Ew şikestiye.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê : ev**
**Kurê wan û  keça we ji malê derketin. Ev ji malê derketin.**
**Kevirên reş şikestine. Ev şikestine.**

**Mînak 99/1 : Cînavkên şanîdanê yên tewandî :**

★ **Cihên wan nêzîk in : vî, vê; van**

**Yekjimar :**

**nêr : vî**
**Ez Memê digirim. Ez vî digirim.**
**Ez kalê digirim. Ez vî digirim.**

**mê : vê**
**Ez Arînê dibim. Ez vê dibim.**
**Ez kulîlkên wê jî dibim. Ez vê jî dibim.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê : van**
**Ez Memê û kalê digirim. Ez van digirim.**
**Ez Arînê û kulîlkên wê jî dibim. Ez van dibim.**

**Mînak 99/2 : Cînavkên şanîdanê yên tewandî :**

★ **Cihên wan dûr in : wî, wê; wan**

**Yekjimar :**

**nêr : wî**
**Tu Bengîn dinasî. Tu wî dinasî.**

**mê : wê**
**Tu Berfînê dinasî. Tu wê dinasî.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê : wan**

**Tu Bengîn û Berfînê dinasî. Tu wan dinasî.**

**• Di zimanê gelêrî de dirûvên cînavkên şanîdanê yên tewandî :**
**Ev bi dirûvên jêrîn jî bi kar tên û bi yên jorîn ve hemwate ne.**

**Mînak 100/1 : Cihên wan nêzîk in : evî, evê; evan**

**Yekjimar :**

**nêr : ev → evî**
**Memê helbestek xwand. Evî helbestek xwand.**

**mê : ev → evê**
**Arînê helbestek xwand. Evê helbestek xwand.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê : evan**
**Memê û Arînê helbest xwandin. Evan helbest xwandin.**

**Mînak 100/2 : Cihên wan dûr in : ewî, ewê; ewan**

**Yekjimar :**

**nêr : ew → ewî**
**Bengîn helbestek xwand.**
**Ewî helbestek xwand.**

**mê : ew → ewê**
**Berfînê helbestek xwand. Ewê helbestek xwand.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê : ewan**
**Bengîn û Berfînê helbest xwandin. Ewan helbest xwandin.**

**Mînak 100/3 : Di zimanê gelêrî de ev bikaranîn jî hene :**

**Yekjimar : Eve/eva, ewe/ewa**
**Pirjimar : Evene/evana, ewene/ewana**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Eve hat ku te bibe seyranê.**

**mê :**
**Ewa çû ku li zarok binêre.**

**Pirjimar :**

**nêr :**
**Evene hatin ku wan bibin seyranê.**

**mê :**
**Ewana çûn ku li zarokan binêrin.**

- **Ji cînavkên şanîdanê : Han/ha :**

**Ev cînavk wateyên cînavkên şanîdanê yên bingehîn him xurt û him jî bi sînor dikin. Eger bi peywirên rengdêrîn bi kar bên, rengdêrên şanîdanê ne, erkên hokerîn jî di xwe de dihewînin.**

**Bikaranîna cînavka “han(ha)”yê :**

**Mînak 101/1 : Ev cuda tê nivîsandin û di ravekê de raveker e.**

**Yekjimar û pirjimar : nêr û mê**

**Kurê han salnameya nû bi dîwêr ve kir.**
**Qîza han salnameya nû bi dîwêr ve kir.**

**Kurên han salnameya nû bi dîwêr ve kir.**
**Qîzên han salnameya nû bi dîwêr ve kir.**

**Kevirê han hat çêkirin.**
**Dara han hat dapeşkandin.**

**Kevirên han hatin çêkirin.**
**Darên han hatin dapeşkandin.**

**Mînak 101/2 : Ev dirûv hemwate ne û di yekjimarî û pirjimariyê de wek xwe dimînin : han û ha**

**Yekjimar, pirjimar : nêr û mê**

**Ew mastê ha dixwazim.**

**Ez berçavka ha dixwazim.**

**Ew mastên ha dixwaze.**
**Ez berçavkên ha dixwazim.**

**Mînak 101/3 : Cînavka "han"ê bi ravekê re kirde dibe :**

**Ew mêrê han li bin darê ye.**
**Ew jina han li ber mala we ye.**

**Mînak 101/4 : Cînavka "han" ê bi ravekê re bireser dibe :**

**Min ew mêrê han li bin darê dît.**
**Min ew jina han li mala we dît.**

**Mînak 101/5 : Han, bi cînavkên şanîdanê yên bingehîn ve :**

**Ev ê han kursiyekê çêdike.**
**Ev ên han kursiyan çêdikin.**

**Ew ê han maseyekê radike.**
**Ew ên han maseyan radike.**

**Vî yê han ji bo te kovar anîn.**
**Vê ya han ji bo te kovar anîn.**
**Van ên han ji bo te kovar anîn.**

**Wî yê han ji bo kê mesref kiriye?**
**Wê ya han ji bo kê mesref kiriye?**
**Wan ên han ji bo kê mesref kirine?**

**Mînak 101/6 : Di nivîsaran de tên dîtin : hanî û hanê**

**Ew şûrê hanî, kîjan mirovî aniye?**
**Ew kêra hanê, kîjan keçê biriye?**

**Mînak 101/6.1 : Li hin deveran : Ev dirûvên hevedudanî, bi serê xwe kirde jî dibin : (evî/vî, evê/vê, evan/van; ewî/wî, ewê/wê, ewan/wan) û (han/ha) :**

**Yekjimar :**

**nêr : evî/vî**

**Evî han → vîna :**

**Vîna em gerandin. Yê ku em gerandin, vîna bû.**

**mê : evê/vê**
**Evê han → vêna :**

**Vêna erebe diajot. Ya ku erebe diajot, vêna bû.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê : evan/van**
**Evên han → vana(vanan) :**

**Vana em dîtin. Yên ku ew anîn, vana bûn.**

**Yekjimar :**

**nêr : ewî/wî**
**Ewî han → wiya(wînan) :**

**Wiya navên we pêşkêşî me kiribûn.**

**mê : ewê/wê**
**Ewê han → wêya(wênan) :**

**Wêya navnîşanên we ji me re şandibûn.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê : ewan/wan**
**Ewên han → wana(wanan) :**

**Wana em xapandin. Yên ku em xapandin, wana ne.**

**Mînak 101/6.2 : Li hin deveran zayend ji holê radibin : (evî/vî, evê/vê, evan/van; ewî/wî, ewê/wê, ewan/wan) û (ha/han)**

**Yekjimar :**

**nêr û mê : evî/vî, evê/vê; ewî/wî, ewê/wê**

**Vaya → Evî ha, evê ha :**
**Vaya ji em re ferheng anîbûn.**

**Waya → Ewî ha, ewê ha :**
**Yê(ya) ku bi trenê hatibû navçeyê, waya bû.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê : evan/van, ewan/wan**

**Vana(n) → Evên ha :**
**Vana(n) ne yên ku helbestan bixwînin.**

**Wana(n) → Ewên ha :**
**Wana(n) ji zarokan re çîrokan dibêjin.**

**Cînavka qertafî :**
**Cînavka qertafî (-ê) ji aliyê dirûve ve dişibe paşgira tewangê ya (-ê)'yê. Ev cînavk di hevokê de li şûna kes û tiştên sêyemîn bi kar tê û tu carî nabe kirde. Di kêşanê de tê dawiya lêkerê û bi hev ve tên nivîsandin.**

**Eger lêker bi tipa (-e)'yê biqede, ev tîp vediguheze (-ê)'ye, lê lêker bi dengdarekê biqede, cînavka qertafî tê dawiya wê.**

**Mînak 102 : Ji aliyê bireserê ve têkildariyên cînavka qertafî(-ê) :**

**Bi ya paşgira tewangê(-ê) ve, bi ya cînavka kesane(wî, wê) ve û bi yên cînavkên şanîdane(vî, vê; wî, wê) ve :**

**★ Paşgira tewangê, cînavka kesane(wî, wê) û ya qertafî :**

**Nazê jêbira te daye Rojhêt(Rojhat).**
**Nazê jêbira te daye wî.**
**▸ Nazê jêbira te dayê.**

**Narê kilamek ji Nalînê re got.**
**Narê kilamek ji wê re got.**
**▸ Narê kilamek gotê.**

**Rojda pênûsê dixe berîkê.**
**Rojda pênûsê dixe wê.**
**▸ Rojda pênûsê dixê.**

**★ Paşgira tewangê, cînavkên şanîdane (vî, vê; wî, wê) û cînavka qertafî :**

Nazê jêbira te daye Rojhêt(Rojhat).
Nazê jêbira te daye vî.
▸ Nazê jêbira te dayê.

Narê kilamek ji Nalînê re got.
Narê kilamek ji vê re got.
▸ Narê kilamek gotê.

Rojda pênûsê dixe tûrikê.
Rojda pênûsê dixe wî.
▸ Rojda pênûsê dixê.

Rojda pênûsê dixe berîkê.
Rojda pênûsê dixe wê.
▸ Rojda pênûsê dixê.

Cînavka vegerok : Xwe :
Ev peyveke neguherbar e, ango nakeve bandora tewangê û di yekjimarî û pirjimariyê de jî wek xwe dimîne.

★ Bikaranîna cînavka vegerok :

Mînak 103/1 : Li şûna hemû kesan : xwe

Ez xwe vedişêrim/Tu xwe vedişêrî/Ew xwe vedişêre
Em xwe vedişêrin/Hûn xwe vedişêrin/Ew xwe vedişêrin

Min xwe veşart/Te xwe veşart/Wî(wê) xwe veşart
Me xwe veşart/We xwe veşart/Wan xwe veşart

Mînak 103/2 : Cînvka xwe nêtar e : Li şûna herdu zayendan :

Baran pirtûka xwe dixwîne.
Dîlan jî porê xwe şe dike.

Rovî xwe diavêje avê.

Mînak 103/3.1 : Li şûna bireserê, cînavka xwe yekjimar e :

Berivanê xwe xemiland.
Rewşenê jî xwe xemiland.
Wan xwe xemiland.

Mînak 103/3.2 : Li şûna bireserê, cînavka xwe pirjimar e :

**Hesen û Alan xwe diparêzin.**
**Ew xwe diparêzin.**

**Berîvan û Rewşenê xwe hemilandin.**
**Wan xwe xemilandin.**

**Mînak 102/4 : Di awayê xwedîtiyê : xwe**

**Ew ê *pênûsa* xwe bide Rewşenê.**
**Min navê Rewşenê li *deftera* xwe nivîsand.**

**Mînak 103/5 : Di pêkhatina lêkerên vegerok de :**

**xwe kuştin : Şîlanê xwe kuşt.**
**xwe şûştin : Bangîn xwe şûşt.**

**Mînak 103/6 : Di pêkhatina lêkerên biwêjî de : xwe**

**xwe pê firandin : Narê xwe pê firand.**
**xwe dan hev : Çawa ez hatim, wan xwe dan hev.**

**Cînavkên berbihevîn :**
**Ji aliyê peywirê ve hemû cînavkên berbihevîn yek in û hemwate ne. Pirjimar bi kar tên. Cînavkên berbihevîn ev in : Hev, yek, êk**

★ **Ev dirûv di devokên hêremî de tên dîtin :**

**Hev : hev û din, hevûdî, hevdi, hev û du, hevdu, hevdû**
**Yek : yek û din, yekûdî, yekdî, yek û du, yek û dû, yekdû**
**Êk : êk û din, êkûdî, êkdî, êk û du, êk û dû, êkdû**

**Mînak 104 : Bikaranîna cînavkên berbihevîn :**

✔ **Li şûna navdêran :**

**Newîn û Perî hevalên hev in.**
**Gulçîn û Perî hevdu nas dikin.**

**Gulçîn û Rewşen, ew cîranên yekdû ne.**
**Mem, Berîvan û Rojda, ew gundiyên êk in.**

✔ **Li şûna cînavkên kesane :**

Ez, tu û ew, em dostên hev in.
Ew, hûn û em, em merivên hev û din in.

Tu û ew, hûn hevalên yek û din in.
Min û wê, me êkdû agahdarî kiribûn.

✔ Li şûna bireseran :

Divê ez te bibînim. Divê tu jî min bibînî.
▸ Divê em hev bibînin.

Hûn me şiyar dikin. Em jî we şiyar dikin.
▸ Em hevdu şiyar dikin.

Ew hevala te ye. Tu jî hevalê wê yî.
▸ Hûn hevalên êkdû ne.

✔ Di pêkhatina lêkeran de :

bi hev girtin : Xortan bi hev girtibûn.
hevdu dîtin : Narê û Nazê hevdu dîtin.

Cînavkên lihevxistî :
Cînavkên berbihevîn bi hin daçekan ve cînavkên lihevxistî pêk tînin. Daçek bi serê xwe wek bêjeyên bingehîn ne watedar in. Digel vê di hevokan de, di navbera peyv û hêmanan de alîkar in.

Yen ku di pêkanîna cînavkên lihevxistî de cih digirin :
Bi pêşdaçekên bingehîn ve : bi, di, ji, li

Mînak 105/1 : Pêşdaçekên bingehîn û cînavka berbihevîn : hev

bi + hev } pev :
Beran bi hev ketin.
Beran pev ketin.

di + hev } tev :
Rojda tirşikê di hev dide.
Rojda tirşikê tev dide.

ji + hev } jev :
Mem û Alan dê ji hev biçin.
Mem û Alan dê jev biçin.

**li + hev } lev :**
**Bareş û Aras li hev hatin.**
**Bareş û Aras lev hatin.**

**Mînak 105/2 : Pêşdaçekên bingehîn û cînavka berbihevîn : -êk**

**bi + êk } pêk :**
**Xwendekaran spartek pêk anîn.**

**di + êk } têk :**
**Di sporê de koma me têk neçû.**

**ji + êk } jêk :**
**Ew du heval in, hûn çima wan jêk dikin?**

**li + êk } lêk :**
**Dîlan û Zinar lêk çûn, lê ew lêk venegeriyan.**

**Mînak 105/3 : Daçekên bingehîn bi cînavka qertafiyê (-ê) ve cînavkên lihevxistî pêk tînin :**

**bi + ê } pê :**
**Xwendekaran spartek pê anîn.**

**di + ê } tê :**
**Di sporê de koma me tê neçû.**

**ji + ê } jê :**
**Ew du heval in, hûn çima wan jê dikin?**

**li + ê } lê :**
**Dîlan û Zinar lê çûn, lê ew lê venegeriyan.**

**Mînak 105/4 : Cînavka kesane ya tewandî(wî, wê) û têkildariya cînavkên lihevxistî :**

**ji + wî } jê :**
**Dema ku ez çûm min ji wî re gotibû.**
**Dema ku ez çûm min jê re gotibû.**

**ji + wê } jê :**
**Dema ku em hatin me ji wê re gotibû.**
**Dema ku em hatin me jê re gotibû.**

**li + wî } lê :**
**Rojda li wî dixist.**
**Rojda lê dixist.**

**li + wê } lê :**
**Rojda derî li wê vedikir.**
**Rojda derî lê vedikir.**

**di + wî } tê :**
**Kun li wir bû. Berîvanê av di wî werda.**
**Berîvanê av tê werda.**

**di + wê } tê :**
**Tas li wir bû. Berîvanê av di wê werda.**
**Berîvanê av tê werda.**

**Mînak 105/5 : Cînavkên şanîdanê(vî/vê, wî/wê) û têkildariya cînavkên lihevxistî :**

★ **Cîhên wan nêzîk in : vî, vê**

**ji + vî } jê :**
**ji + vê } jê :**
**Dema ku ez hatim, min ji vî(vê) re xelat anîbû.**
**Dema ku ez hatim, min jê re xelat anîbû.**

**li + vî } lê :**
**li + vê } lê :**
**Rojhat li vî(vê) dinêrî.**
**Rojhat lê dinêrî.**

**di + vî } tê :**
**Kun li vir bû. Berîvanê av di vî werda.**
**Berîvanê av tê werda.**

**di + vê } tê :**
**Tas li vir bû. Nazê av di vê werda.**
**Nazê av tê werda.**

★ **Cîhên wan dûr in : wî, wê :**

**Ev cînavk jî bi yên lihevxistî ve wek cînavka kesane ya tewandî (wî/wê)**

**bi kar tên, ne pêwîst e ku em hemûyan ducar bikin :**

**ji + wî } jê :**
**Dema ku ez çûm, min ji wî re gotibû.**
**Dema ku ez çûm, min jê re gotibû.**

**ji + wê } jê :**
**Dema ku em hatin, me ji wê re gotibû.**
**Dema ku em hatin, me jê re gotibû.**

**Mînak 105/6 : Di pêkhatina lêkeran de cînavkên lihevxistî :**

**lê gerîn : Ez li sîwane digerim.**
**Cano jî lê digeriya.**

**jê birin : Dîlanê sê pirtûk ji Gulşenê birine.**
**Duh jî Zîlanê çar jê biribûn.**

**Cînavkên xwedîtiyê :**
**Ew hêmanên bêjeyî ne ku bi serê xwe ne cînavk in, lê şûna navdêran digirin; navdêr, rengdêr, cînavk û bêjeyên din ên ku piştî wan tên ve û bi alîkariya veqatendeka binavkirî, cînavkên xwedîtiyê pêk tînin.**

**Hêmanên cînavkên xwedîtiyê yên bingehîn ev in : (ê, a; -ên)**

**Yekjimar :**
**nêr : ê**
**mê : a**

**Pirjimar :**
**nêr û mê : ên(an →-ên)**

**• Cînavkên xwedîtiyê û rastnivîs :**
**Peyvên ku berî cînavkên xwedîtiyê tên, eger bi dengdarekê biqedin, ev cînavk tîpa (y)'ê digirin û bi hev ve tên nivîsandin.**

**Eger li piştî peyvên berî wan bêhnok û xalebêhnok hebin, bi piranî dirûvên bi tîpa (y)'ê tên tercîhkirin. Eger hevok bi van cînavkan dest pê bikin, dirûvên bi tîpa (y)'ê bêhtir karîger in.**

**Hin nivîskar bo hemû xalan jorîn dirûvên bi tîpa (y)'ê bi kar tînin.**

**Yekjimar :**

**ner : ê → yê**
**Rojînê pelê defterê yê çirî sor kir.**

**mê : a → ya**
**Dîlanê pêla avê ya mezin dîtibû.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê : ên → yên**
**Rojînê pelên defterê yên çirî sor kirin.**
**Zîlanê pêlên avê yên mezin dîtibûn.**

**Mînak 106 : Bikaranîna cînavkên xwedîtiyê :**

✔ **Li şûna navdêran :**

**Yekjimar :**

**nêr : por, porê Şîlanê**
➦ **ê Şîlanê, yê Şîlanê**

**Porê Narê reş e, lê yê Şîlanê zer e.**

**mê : gul, gula darê**
➦ **a darê, ya darê**

**Ew gul a dara mezin e.**

**Pirjimar :**

**nêr : poran**
**Porên qîzan dirêj bûne.**
**Ên(yên) qîzan dirêj bûne.**

**mê : gulan**
**Gulên darê weşiyana.**
**Ên(yên) darê weşiyana.**

✔ **Bi cînavkên kesane yên tewandî ve : min, te, wî/wê; me, we, wan**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**ê min, ê te, ê wî/wê**

**ê me, ê we, ê wan**

**Destê min bi birîn e, yê te ne bi birîn e.**

**mê :**
**a min, a te, a wî/wê**
**a me, a we, a wan**

**Kulîlka me teze ye, ya wan çilmisiye.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**
**ên min, ên te, ên wî/wê**
**ên me, ên we, ên wan**

**Destên me bi birîn in, yên we ne bi birîn in.**
**Kulîlkên me teze ne, yên wan çilmisîne.**

✔ **Bi cînavkên şanîdanê ve :**

**Cihên van nêzik in : vî/vê, van**
**Cihên wan dûr in : wî/wê, wan**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**ê vî/vê, ê van**
**ê wî/wê, ê wan**

**Destê vî bi birîn e, yê vê ne bi birîn e.**
**Destê wî bi birîn e, yê wê ne bi birîn e.**

**mê :**
**a vî/vê, a van**
**a wî/wê, a wan**

**Kulîlka van teze ye, ya wan çilmisiye.**

**Pirjimar :**
**nêr û mê :**
**ên vî/vê, ên van**
**ên wî/wê, ên wan**

**Destên van bi birîn in, yên wan ne bi birîn in.**

**Kulîlkên van teze ne, yên wan çilmisîne.**

- **Bi cînavka xwe ve :**

**Min navê te li destê xwe nivîsand.**
**Min navê te li yê xwe nivîsand.**

**Wan destên xwe dane me.**
**Wan ên xwe dane me.**

**Ew ê navnîşana xwe bide Zîlanê.**
**Ew ê ya xwe bide Zîlanê.**

**Hûn ê navnîşanên xwe bidin me.**
**Hûn ê yên xwe bidin me.**

- **Li şûna kirdeyan :**

**Kurê te li cem apê xwe maye.**
**Yê te li cem apê xwe maye.**

**Qîza wî çûye cem pîrika xwe.**
**Ya wî çûye cem pîrika xwe.**

- **Li şûna bireserê :**

**Divê ez helbesta te bixwînim.**
**Divê ez a te bixwînim.**

**Divê em çavên xwe bişon.**
**Divê hûn jî yên xwe bişon.**

- **Bi kêşana lêkerê û bi parenga dema niha ve :**

**Kurê dixebite û yê nexebite ne wek hev in.**
**Qîza bixwîne û ya nexwîne ne wek hev in.**

**Kur û qîzên bixwînin û yên nexwînin ne wek hev in.**

- **Bi raweya çêbiwar ve :**

**Kurê xwendî û yê nexwendî wek hev nabin.**
**Qîza xwendî û ya nexwendî wek hev nabin.**

**Kur û qîzên xwendî û yên nexwendî wek hevnabin.**

**✔ Bi veqetandeka nebinavkirî ve :**

**Zêrekî wan î(yekî) sultanî hebûye.**
**Zêrekî wan ê(yekî) sultanî hebûye.**
**Zêrine wan ên sultanî hebûne.**

**Zêrekî wî yî(yekî) spî hebûye.**
**Zêrekî wî yê (yekî) spî hebûye.**
**Zêrine wî yên spî hebûne.**

**Pênûseke dirêj e(yeke) rengîn bide min!**
**Pênûsine dirêj ên rengîn bidin wan!**

**Pênûseke spî ye(yeke) rengîn bide min!**
**Pênûsine spî yên rengîn bidin wan.**

**✔ Bi raveka navdêrîn vê :**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Birayê Rewşenê diçe.**
**Yê Rewşenê diçe.**

**mê :**
**Xwişka Memê hat.**
**Ya Memê hat.**

**Pirjimar :**

**nêr :**
**Bireyên Rewşenê diçin.**
**Yên Rewşenê diçin.**

**mê :**
**Xwişkên Barêş hatin.**
**Yên Barêş hatin.**

**✔ Bi rengdêran vê :**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Kevirê min ê spî ye.**

**mê :**
**Sola wî ya reş e.**

**Pirjimar :**

**nêr :**
**Kevirên min ên spî ne.**

**mê :**
**Solên wî yên reş in.**

**Cînavka girêkî : ku :**
**"Ku" peyveke neguherbar e, bi serê xwe ne cînavk e. Lê carinan bandora tewangê digire û bi serê xwe jî wek cînavkekê bi kar tê.**

**Heger bi hin hêmanên din ve û bixwe bi erka cînavkî bê karandin, "cînavka ku" ye û di xwe de peywira girêkî jî dihewîne, ev peywendî jî cînavkî ye. Ango dibe cînavka ku ya peywendiyê. Cînavka ku, bi awayê pirsyariyê jî şûna navdêran digire.**

**Taybetiya girêkî, bêyî ya cînavkî peywira "gihaneka ku"yê pêk tînê.**

**Mînak 107 : Bikaranîna cînavka "ku"yê :**

- **Bi veqetandekê ve kirde dibe :**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Mêrê ku erebeyê diajo, li ber deriyê wan e.**
**mê :**
**Jina ku qursê dide, em vexwandin.**

**Pirjimar :**

**nêr :**
**Mêrên ku erebeyan diajon, li ber deriyê wan in.**
**mê :**
**Jinên ku qursan didin, em vexwandin.**

**✓ Bi cînavkên xwedîtiyê ve di ravekê de raveker e :**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Xortê ku erebeya xwe difiroşe, hat ba me.**
**Yê ku erebeya xwe difiroşe, hat ba me.**

**mê :**
**Jina ku kulîlkan difiroşe, li taxê ye.**
**Ya ku kulîlkan difiroşe, li taxê ye.**

**Pirjimar :**

**nêr :**
**Xortên ku erebeyên xwe difiroşin, hatin ba me.**
**Yên ku erebeyên xwe difiroşin, hatin ba me.**

**mê :**
**Jinên ku kulîlkan difiroşin, li taxê ne.**
**Yên ku kulîlkan difiroşin, li taxê ne.**

**✓ Him bi bireseran û him jî peyvên ku şûna wan digirin ve :**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Navê ku tu dibêjî, ji bîra min çûye.**
**Yê ku tu dibêjî, ji bîra min çûye.**

**mê :**
**Pirtûka ku Memê xwendî, Dîlanê jî xwendiye.**
**Ya ku Memê xwendî, Dîlanê jî xwendiye.**

**Pirjimar :**
**nêr :**
**Navên ku tu dibêjî, ji bîra min çûne.**
**Yên ku tu dibêjî, ji bîra min çûne.**

**mê :**
**Pirtûkên ku Memê xwendî, Dîlanê jî xwendine.**
**Yên ku Memê xwendî, Dîlanê jî xwendine.**

**Mînak 108 : Der barê peyva “ku”yê de :**

- **Di nivîsaran de tên dîtin : ku, kû, ko, ki**
**Ji bo rastnivîsê, “ku” tê tercîhkirin.**

- **Peyva ku neguherbar e, digel vê yek caran bandora tewangê digire û bi serê xwe jî wek cînavkekê bi kar tê :**

**Ka kuyê wê xezalê xweşik e?**

- **Peyva ku, rengdêr dibe :**
**Ew diçe ku derê?**

- **Peyva ku, bi serê xwe bes gihanek dibe :**
**Ez bawer nakim ku Nalîn bê cem Narê.**

- **Peyva ku, di komepeyvên hokerî de cih digire :**
**Hespê bi ku ve berdidî, berde, ez ê lê binêrim.**

- **Peyva ku, di komepeyvên daçekî de cih digire :**
**Karê we zû qediyaye, ji ber ku hûn baş xebitîne.**

**Cînavkên pirsyariyê :**
**Ev cînavk bi erkên pirsyarî şûna navdêr û cînavkan digirin û wan nîşan dikin.**

**Cînavkên pirsyariyê yên sereke ev in :**

- **Cînavkên kî û kê :**
**Ev cînavk şûna kesan digirin, yekjimar û pirjimar ji bo her du zayendan jî tên karandin. Ew di hevokê de kirde û bireser dibin.**

♦ **Cînavka kî : Pirsa mirovan dike. Bersivên wê peyvên netewandî ne. Ew bersiv; navdêr, cînavkên kesane, ji yên şanîdanê yên xwerû dibin.**

**Mînak 109 : Bikaranîna cînavka kî’yê :**

- **Li şûna navên mirovan û kirde : kî**

Yekjimar :

**nêr :**
**Azad dilîze.**

**Kî dilize?**

**Azad dilîze.**

**mê :**
**Gulçîn dilîze.**

**Kî dilîze?**
**Gulçîn dilîze.**

Pirjimar :

**nêr û mê :**
**Azad û Gulçîn dilîzin.**

**Kî dilîzin?**
**Azad û Gulçîn dilîzin.**

✔ **Li şûna cînavkên kesane yên xwerû û kirde : kî**

Yekjimar :
**Kî nivîsarê dixwîne?**

**Ez nivîsarê dixwînim.**
**Tu nivîsarê dixwînî.**
**Ew nivîsarê dixwîne.**

Pirjimar :
**Kî nivîsarê dixwînin?**

**Em nivîsarê dixwînin.**
**Hûn nivîsarê dixwînin.**
**Ew nivîsarê dixwînin.**

✔ **Li şûna cînavkên şanîdanê yên xwerû û kirde : kî**

Yekjimar :
**Kî li ber malê digere?**

**Ev li ber malê digere.**
**Ew li ber malê digere.**

Pirjimar :
**Kî li ber malê digerin?**

**Ev li ber malê digerin.**

**Ew li ber malê digerin.**

**Mînak 110 : Bo mirovan : kî :**
**Di demên borî de bi lêkêrên negerguhêz ve : lêker : çûn**

- **Li şûna navên mirovan û kirde : kî**

Yekjimar :
**Kî çû kargehê ku bixebite?**
**Azad çû kargehê ku bixebite.**

Pirjimar :
**Kî çûn kargehê ku bixebitin?**
**Karker çûn kargehê ku bixebitin.**

- **Li şûna cînavkên kesane yên xwerû : kî**

Yekjimar :
**Kî çû kargehê ku bixebite?**
**Ew çû kargehê ku bixebite.**

Pirjimar :
**Kî çûn kargehê ku bixebitin?**
**Ew çûn kargehê ku bixebitin.**

- **Li şûna cînavkên şanîdanê yên xwerû û kirde : kî**

Yekjimar :
**Kî çû kargehê ku bixebite?**

**Ev çû kargehê ku bixebite.**
**Ew çû kargehê ku bixebite.**

Pirjimar :
**Kî çûn kargehê ku bixebitin?**

**Ev çûn kargehê ku bixebitin.**
**Ew çûn kargehê ku bixebitin.**

- **Li şûna bireserê : kî**

**Yekjimar :**

**bireser nêr e :**

**Gulçînê Azad dîtibû.**

▸ **Gulçînê kî dîtibû?**
**- Gulçînê Azad dîtibû.**
**- Gulçînê ev(ew) dîtibû.**

▸ ***Yê ku* Gulçînê dîtibû, kî bû?**
**-*Yê ku* Gulçînê dîtibû, Azad bû.**
**-*Yê ku* wê dîtibû, ev(ew) bû.**

**bireser mê ye :**
**Azêd Gulçîn dîtibû.**

▸ **Azêd kî dîtibû?**
**- Azêd Gulçîn dîtibû.**
**- Azêd ev(ew) dîtibû.**

▸ ***Ya ku* Azêd dîtibû, kî bû?**
**-*Ya ku* Azêd dîtibû, Gulçîn bû.**
**-*Ya ku* wî dîtibû, ev(ew) bû.**

**Pirjimar :**
**Birser ji navdêrên nebinavkirî ne.**

**bireser nêr e :**
**Gulçînê kurin anîbûn.**

▸ **Gulçînê kî anîbûn?**
**- Gulçînê kurin anîbûn.**
**- Gulçînê ev(ew) anîbûn.**

▸ ***Yên ku* Gulçînê anîbûn, kî bûn?**
**-*Yên ku* Gulçînê anîbûn, kurin bûn.**
**-*Yên ku* wê anîbûn, ev(ew) bûn.**

**bireser mê ye :**
**Azêd keçin anîbûn.**

▸ **Azêd kî anîbûn?**
**- Azêd keçin anîbûn.**
**- Azêd ev(ew) anîbûn.**

▸ ***Yên ku* Azêd anîbûn, kî bûn?**

*-Yên ku* **Azêd anîbûn, keçin bûn.**
*-Yên ku* **wî anîbûn, ev(ew) bûn.**

♦ **Cînavka kê : Pirsa mirovan dike ku bersivên wê peyvên tewandî ne. Ew bersiv; navdêr, cînavkên kesane û ji yên şanîdanê yên tewandî dibin.**

**Mînak 111 : Bikaranîna cînavka kê'yê :**

✔ **Li şûna navên mirovan û kirde : kê**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Memê hevokek nivîsand.**

**Kê hevokek nivîsand?**
**Memê hevokek nivîsand.**
**Vî(wî) hevok nivîsand.**

**mê :**
**Narînê hevokek nivîsand.**

**Kê hevokek nivîsand?**
**Narînê hevokek nivîsand.**
**Vê(wê) hevokek nivîsand.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**
**Mem û Narînê yek hevok nivîsandin.**

**Kê yek hevok nivîsandin?**
**Mem û Narînê yek hevok nivîsandin.**
**Van(wan) yek hevok nivîsandin.**

✔ **Li şûna cînavkên kesane yên tewandî û kirde : kê**

**Kê av vexwar?**

**Min av vexwar.**
**Te av vexwar.**
**Wî(wê) av vexwar.**

**Me av vexwar.**

We av vexwar.
Wan av vexwar.

✔ Li şûna cînavkên şanîdanê yên tewandî û kirde : kê

Kê ava sûsê çêkir?

Vî(vê) ava sûsê çêkir.
Wî(wê) ava sûsê çêkir.

Van ava sûsê çêkir.
Wan ava sûsê çêkir.

✔ Li şûna bireseran : kê

Yekjimar :

bireser nêr e :
Gulçîn Azêd dibîne.

▸ Kî kê dibîne?
- Gulçîn Azêd dibîne.
- Gulçîn vî(wî) dibîne.

▸ *Yê ku Gulçîn dibîne, kî ye?*
*-Yê ku Gulçîn dibîne, Azad e.*
*-Yê ku ev(ew) dibîne, ev(ew) e.*

bireser mê ye :
Azad Gulçînê dibîne.

▸ Kî kê dibîne?
- Azad Gulçînê dibîne.
- Azad vê(wê) dibîne.

▸ *Ya ku Azad dibîne, kî ye?*
*-Ya ku Azad dibîne, Gulçîn e.*
*-Ya ku ev(ew) dibîne, ev(ew) e.*

Pirjimar :

bireser nêr e :
Gulçîn ji kuran re dibêje.

**▸ Kî ji kê re dibêje?**
**- Gulçîn ji kuran re dibêje.**
**- Gulçîn ji van(wan) re dibêje.**

***▸ Yên ku Gulçîn jê re dibêje, kî ne?***
***-Yên ku Gulçîn jê re dibêje, kur in.***
***-Yên ku ev(ew) jê re dibêje, ev(ew) in.***

**bireser mê ye :**
**Azad ji keçan re dibêje.**

**▸ Kî ji kê re dibêje?**
**- Azad ji keçan re dibêje.**
**- Azad ji van(wan) re dibêje.**

***▸ Yên ku Azad jê re dibêje, kî ne?***
***-Yên ku Azad jê re dibêje, keç in.***
***-Yên ku ev(ew) jê re dibêje, ev(ew) in.***

**✔ Bi cînavkên xwedîtiyê ve : kê**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Porê Gulçînê xweşik e.**

**Porê kê xweşik e?**
**Yê kê xweşik e?**

**mê :**
**Pênûsa Azêd li ber dolabê ye.**

**Pênûsa kê li ber dolabê ye?**
**Ya kê li ber dolabê ye?**

**Pirjimar :**

**nêr :**
**Porên qîzan xweşik in.**

**Porên kê xweşik in?**
**Yên kê xweşik in?**

**mê :**
**Pênûsen Azêd li ber dolabê ne.**

**Pênûsên kê li ber dolabê ne?**
**Yên kê li ber dolabê ne?**

**• Cînavka çi :**
**Ev cînavk bêyî navên mirovan li şûna yên heyberan û ji bo wan li şûna cînavkên kesane û yên şanîdanê jî bi kar tê.**

**Cînavka çi, peyveka nêtar e. Yekjimar û pirjimar tê bikaranîn. Di hevokê de kirde û bireser jî dibe.**

**Hin nivîsaran de tên dîtin ku peyva "çi" yek caran bi xwe jî dikeve bandora tewangê.**

**Mînak 112/1 : Bikaranîna cînavka çi'yê :**

**⋆ Bêyî navên mirovan li şûna yên din : çi**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Kewenêr firiya.**
**Çi firiya?**

**mê :**
**Kewemê firiya.**
**Çi firiya?**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**
**Kewenêr û kewemê firiyan.**
**Çi firiyan?**

**nêr û mê :**
**Lê kewên Berîvanê nehatin firandin.**
**Çi nehatin firandin?**

**⋆ Bes li şûna cînavkên kesane yên xwerû : ew, ew :**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Dîk li ser darê ye.**

**Çi li ser darê ye?**
**Ew li ser darê ye.**

**mê :**
**Mirîşk li ber koxikê ye.**

**Çi li ber koxikê ye?**
**Ew li ber koxikê ye.**

**Pirjimar :**

**nêr :**
**Du dîk li ser darê ne.**

**Çi li ser darê ne?**
**Ew li ser darê ne.**

**mê :**
**Sê mirîşk li ber koxikê ne.**

**Çi li ber koxikê ne?**
**Ew li ber koxikê ne.**

**nêr û mê :**
**Dîk û mirîşk hevdu dibînin.**

**Çi hevdu dibînin?**
**Ew hevdu dibînin.**

★ **Bes li şûna cînavkên kesane yên tewandî : wî/wê, wan**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Dîk li ser darê bang da.**

**Çi li ser darê bang da?**
**Wî li ser darê ye.**

**mê :**

**Mirîşkê li ber koxikê guhdarî kir.**

**Çi li ber koxikê guhdarî kir?**
**Wê li ber koxikê guhdarî kir.**

**Pirjimar :**

**nêr :**
**Dîkan li ser darê bang dan.**

**Çi li ser darê bang dan?**
**Wan li ser darê bang dan.**

**mê :**
**Mirîşkan li ber koxikê guhdarî kirin.**

**Çi li ber koxikê guhdarî kirin?**
**Wan li ber koxikê guhdarî kirin.**

**nêr û mê :**
**Dîk û mirîşkê hevdu dîtin.**
**Dîk û mirîşkan hevdu dîtin.**

**Çi hevdu dîtin?**
**Wan hevdu dîtin.**

★ **Li şûna cînavkên şanîdanê yên xwerû : ev, ew; ev, ew**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Kevokê nêr li nêzî zinarê ye.**

**Çi li nêzî zinarê ye?**
**Ev li nêzî zinarê ye.**

**mê :**
**Kevoka mê li dûrî yê nêr e.**

**Çi li dûrî yê nêr e?**
**Ew li dûrî yê nêr e.**

**Pirjimar :**

**nêr :**
**Kevokên nêr li nêzî zinarê ne.**

**Çi li nêzî zinarê ne?**
**Ev li nêzî zinarê ne.**

**mê :**
**Kevokên mê li dûrî yên nêr in.**

**Çi li dûrî yên nêr in?**
**Ew li dûrî yên nêr in.**

**nêr û mê :**
**Kevok hevdu dibînin.**

**Çi hevdu dibînin?**
**Ew hevdu dibînin.**

★ **Li şûna cînavkên şanîdanê yên tewandî : çi**

✔ **Cihên wan nêzîk in : vî/vê, van**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Berên giha xwar.**

**Çi giha xwar?**
**Vî giha xwar.**

**mê :**
**Mihê giha xwar.**

**Çi giha xwar?**
**Vê giha xwar.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**
**Beran û mihê giha xwar(**giha yekjimar e**).**

**Çi giha xwar?**
**Van giha xwar.**

🗸 **Cihên wan dûr in : wî/wê, wan**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Nêrî xwê xwar û av vexwar.**

**Çi xwê xawar û av vexwar?**
**Wî xwê xwar û av vexwar.**

**mê :**
**Bizinê xwê xwar û av vexwar.**

**Çi xwê xwar û av vexwar?**
**Wê xwê xwar û av vexwar.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**
**Nerî û bizinê xwê xwar û av vexwar.**

**Çi xwê xwar û av vexwar?**
**Wan xwê xwar û av vexwar.**

**nêr û mê :**
**Nerî û bizinê xwê xwar û av vexwarin.**

**Çi xwê xwar û av vexwarin?**
**Wan xwê xwar û av vexwarin.**

★ **Bêyî yên mirovan li şûna kirdeyên din : çi**

Yekjimar :
**Sêvek ji darê ket.**
**Çi ji darê ket?**

Pirjimar :
**Şeş sêv ji darê ketin.**
**Çi ji darê ketin?**

★ **Bêyî yên mirovan li şûna bireserên din : çi**

Yekjimar :
**Dîlanê karek kirî.**

**Dîlanê çi kirî?**

Pirjimar :
**Narê du kar kirîn.**
**Narê çi kirîn?**

**Mînak 112/2 : Yek caran bi xwe jî bandora tewangê digire : çi**

★ **Bi cînavkên xweditiyê ve : -ê, -a; -ên**

**Yekjimar :**

**nêr : çi + yê } çiyê :**
**Mem çiyê Gulçînê ye?**

**mê : çi + ya } çiya :**
**Dîlan çiya Gulçînê ye?**

**Pirjimar :**

**nêr û mê : çi + yên } çiyên :**
**Mem û Dîlan çiyên Gulçînê ne?**

★ **Çi û kê : Bi cînavkên xweditiyê ve : -ê, -a; -ên**

**Yekjimar :**

**nêr : çi + kê } çikê :**
**Rojhat çikê Nazê ye?**

**mê : çi + ka } çika :**
**Şîlan çika Nazê ye?**

**Pirjimar :**

**nêr û mê : çi + kên } çikên :**
**Rojhat û Şîlan çikên Nazê ne?**

**Mînak 113 : Cînavka çi : Li hin deveran çî bi kar tê :**

**Çî Gulçînê heye?**
**Ew nexweş e.**

**Çî wan heye?**
**Ew dewlemend in, çî wan tune ku!**

• **Cînavka kîjan(kîjik) :**
**Ev cînavk yekjimar û pirjimar, nêr û mê bi kar tê. Şûna hemû navan, cînavkên kesane û yên şanîdanê digire. Ew dikeve bandora tewangê jî.**

**Mînak 114 : Ev peyv ji aliyê peyvsaziyê ve hevedudanî ye :**

**Kîjan : kî + ji + van/wan**
**Kîjik : kî + ji + van/wan + yek**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Du kur hene.**

**Kî ji van(wan) hevalê te ye?**
**Kîjan hevalê te ye?**
**Hevalê te kîjan e?**

**mê :**
**Du qîz hene.**

**Kî ji van(wan) hevala te ye?**
**Kîjan hevala te ye?**
**Hevala te kîjan e?**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**
**Kî ji van(wan) havalên te nê?**
**Kîjan hevalên te ne?**
**Hevalên te kîjan in?**

**Mînak 115/1 : Bikaranîna cînavka "kîjan"ê :**

★ **Li şûna kirdeyan :**

**Yekjimar :**

**nêr û mê :**
**Mêr û jin, du kes dîwarên dibistanê lê dikin.**

**Kîjan hoste ye?**
**Kîjan şagirt e?**

**Mem û Dîlan li ber destan wan dixebitin.**
**nêr :**
**Kîjanî kevir dihanîn?**
**mê :**
**Kîjanê av dihanî?**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**
**Keç û kur, çar ciwan hatin û ew jî dixebitin.**

**Kîjanan kevir dihanîn?**
**Kîjanan av dihanîn?**

★ **Li şûna bireseran :**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Bajarî û gundî, du mêr hene.**

**Hevalê te kîjanî dinase?**
**Hevalê min yê bajarî dinase.**

**mê :**
**Bajarî û gundî, du jin hene.**

**Hevalê te kîjanê dinase?**
**Hevalê min ya gundî dinase.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**
**Bajarî û gundî, mêr û jin hene.**
**Hevalê te kîjanan dinasin?**

★ **Li şûna cînavkên kesane yên xwerû : ez, tu, ew; em, hûn, ew**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Ji çar kuran yek nehatiye kursê.**

**Kîjan nehatiye?**
**Ew ê biçûk nehatiye.**

**mê :**
**Ji du qîzan yek nehatiye kursê.**

**Kîjan nehatiye kursê?**
**Ew a biçûk nehatiye.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**
**Ji şeş zarokan didu nehatine kursê.**

**Kîjan nehatinê kursê?**
**Ew ên biçûk nehatine kursê.**

★ **Li şûna cînavkên kesane yên tewandî : min, te, wî/wê; me, we, wan**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Ji du hozanên mêr, yekî helbest nexwand.**

**Kîjanî helbest nexwand?**
**Wî helbest nexwand.**

**mê :**
**Ji du hozanên jin, yekê helbest nexwand.**

**Kîjanê helbest nexwand?**
**Wê helbest nexwand.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**
**Du hozanan helbest nexwandin.**

**Kîjanan helbest nexwandin?**
**Wan helbest nexwandin.**

★ **Li şûna cînavkên şanîdanê yên xwerû : ev, ew; ev, ew**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Ji du zilaman, yek çû ber avê.**

**Kîjan çû ber avê?**
**Ev çû ber avê.**

**mê :**
**Ji du qîzan, yek çû ber avê.**

**Kîjan çû ber avê?**
**Ev çû ber avê.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**
**Zilam û qîzek çûn ber avê.**

**Kîjan çûn ber avê?**
**Ev çûn ber avê.**

★ **Li şûna cînavkên şanîdanê yên tewandî : vî/vê, van; wî/wê, wan**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Ji du zilaman yekî çay venexwar.**

**Kîjanî çay venexwar?**
**Vî çay venexwar.**

**mê :**
**Ji du qîzan yekê çay venexwar.**

**Kîjanê çay venexwar?**
**Vê çay venexwar.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**
**Zilam û qîzekê çay venexwarin.**

**Kîjanan çay venexwarin?**
**Van çay venexwarin.**

**Mînak 115/2 : Kîjan(i)k/kîjik : Ev dirûv ên biçûkkirinê ne û mîna kîjan'ê dikevin bandora tewangê jî.**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Ji wan kurikan yekî silav da me.**
**Kîjankî(kîjikî) silav da me?**

**mê :**
**Ji wan qîzikan yekê silav da me.**
**Kîjankê(kîjikê) silav da me?**

**Pirjimar :**

**Kur û qîzekê silav dan me.**
**nêr û mê :**
**Kîjankan(kîjikan) silav dan me?**

• **Cînavka kengê(kengî) : Ev cînavk şûna navên deman digire.**

**Mînak 116 : Bikaranîn :**

**Rojhat kengê dest bi xwendinê dike?**
**Ew roja duşemê dest pê dike.**

**Tu yê kengî kompîtureke bistinî?**
**Ez ê di vê mehê de bistînim.**

**Hûn ê kengê biçûna bazarê?**
**Erebeyek kengê bihata, em ê pê biçûna.**

• **Cînavka çend :**
**Ev peyveke guherbar e, pirjimar bi kar tê, li gorî mêjere ditewe, lê li gorî zayendê natewe. Ev cînavk şûna navdêrên jimarîn digire, pirsa wan dike, di hevokê de jî kirde û bireser dibe.**

**Mînak 117/1 : Ji aliyê peyvsaziyê ve çend :**

★ **Ev peyv di binyata xwe de hevedudanî ye :**

**Çend : çi + hend(hind)**

**Gelek mirov bi trênê çûn.**

Li vir rengdêr e :
**Çend mirov li wir man.**

Li vir cînavka pirsyarî ye :
**Çend li wir man, tu dizanî?**

★ **Peyvên nû jî jê tên darîştin : Çendek : çend + yek**

**Meşvan bi rê ketin.**

Li vir cînavk e.
**Ji wan çendek navsal bûn.**

**Mînak 117/2 : Bikaranîna cînavka "çend"ê :**

♦ **Ji aliyê zayend û mêjerê ve : çend**

**Pirjimar : nêr û mê :**

♦ **Ji aliyê zayendê ve natewe :**

**Hin zarok di ezmûnê de bi ser neketin.**
**Çend di ezmûnê de bi ser neketin?**

♦ **Ji aliyê mêjerê ve ditewe :**

**Ji mêvanan hinekan nan nexwar.**
**Çendan nan nexwar?**

★ **Li şûna kirdeyan : çend**

**Du xwendekar beşdarî wê ezmûnê nebûne.**

**Çend beşdarî wê ezmûnê nebûne?**
**Di wê ezmûnê de çend bi ser ketine?**

★ **Li şûna bireseran : çend**

**Dîlanê li kolanê şanoger dîtine.**

**Dîlanê li kolanê çend dîtine?**
**Dîlanê li kolanê sisê dîtine.**

**Mem bi şanogeran re peyiviye.**

**Mem bi çendan re peyiviye?**
**Mem bi yekî(ê) re peyiviye.**
**Dîlan jî bi duduyan re peyiviye.**

★ **Di ravekê de raveker e : çend**

**Bajarên me gelek in.**

**Hûn dikarin navên çendan bijmêrin?**
**Hûn dikarin yên çendan bijmêrin?**

**Ev roja çendan e ku tu li otelê dimînî?**
**Ev roja heftan e ku ez li wir dimînim.**

**Cînavkên nebinavkirî :**
**Ev cînavk şûna navan, bi awayên nenas digirin û mîna cînavkên din dikevin bandora tewangê. Ji wan hinek ji aliyê zayendê, hinek ji yê mêjerê û hinek jî him ji yê zayendê û him jî yê mêjerê ve ditewin.**

**Piraniya wan peyvan di bingahên xwe de ne cînavk in û eger bi erkên cînavkî bên bikaranîn, wê demê bi rolên cînavkî radibin.**

• **Cureyên cînavkên nebinavkirî :**
**Ev cînavk ji aliyê peyvsaziyê ve li du beşên sereke kom dibin :**
**Yên xwerû û yên hevedudanî/pêkhatî.**

♦ **Ji yên xwerû :**
**Yek, hin, giş/gişk,  kes, pir, tişt hemû/hemî, bêvan, falan/filan.**

♦ **Ji yên hevedudanî :**
**Gelek, çend, çendek, hinek, bêvan kes, bêvan tişt, filan kes, filan tişt, çiqas(çi qas), ewqas(ew qas), hemû kes, hemû işt, herdu(her du), herçî, herkes(her kes), her tişt, tevde, tu kes, tu tişt.**

**Mînak 118 : Bikaranîna cînavkên nebinavkirî :**

★ **Bikaranîn 1 :**

✔ **Ji wan cînavkan :**

**yek, hin, hinek, kes, hin kes, tişt, hemû**

**Çar mêvan çûn û yek hat.**
**Yekî ji yekê re diyariyek şand.**

**Hin dixwînin, hin guhdarî dikin.**
**Hinek dest bi karekî dikin, hinek jî didomînin.**

**Hinan wisa digot û hinan jî red dikir.**
**Hinekan guh dida, hinekan jî guh nedida.**

**Dema ku ez hatibûm, hin kes li wir bûn.**
**Kesekî ji min re tiştek negot.**

**Govenda zarokan geş bû.**
**Dê û bavên wan, hemû li wir bûn.**
**Hemûyan lê temaşe dikir.**

**✓ Ji wan cînavkan :**
**gelek, çend, çendek, herdu, her tişt, pirek**

**Ji taxa jorîn gelek hatibûn cejnê.**
**Gelekan ji me xwarin xwastin.**

**Firoşger gelek bûn, çend diçûn û çend dihatin.**
**Çendek jî li ber karê xwe bûn, qet nedigeriyan.**

**Her du çûne dereke din, li wir jî şahî hebûye.**
**Her duyan bi hev re nanê tenûre firotine.**

**Li navendê her tişt buha bû, pirekan nedikarin bikirin.**

**✓ Ji wan cînavkan : filan, falan, bêvan, filan û bêvan**

**Derdê wî min jî bihîst, filanî digot.**
**Narê jî ji falan û bêvanan bihîstiye.**
**Bêvanê jî bo wî ji filanê re xeber şandiye.**

**✓ Ji wan cînavkan : çiqas, ewqas, çi, gişk, tu/ti**

**Çiqasan temaşe kirin, ewqasan jî nekirine.**

**Ji temaşevanan çiqasî wan kêfxweş bûn,ewqasî wan jî ne kêfxweş bûne.**

Mixabin gişkan jî bilêt kirîne!

Kê çi digot, kê çi nedigot, me nedizanî.

Wî tu(ti) nedabû çêkirin.

★ Bikaranîn 2 : Ji cînavkên nebinavkirî :

✔ Li şûna kirdeyan :

Giş ketibûn dîlanê û bi çoş dilîstin.
Yek li benda yekê mabû.
Her tişt li gorî amadekariyê dimeşiya.

✔ Li şûna bireseran :

Yekî ji duduyan re digot.
Kesekî der barê filan kesê de tu tişt negot.
Çendek jî tevî falan û bêvanan ketibûn giliyan.

✔ Di ravekê de raveker e :

Çavên hinan li riya navçeyê bû.
Solên yekê çiriyabûn.
Destê filanî şikestiye.

Ji aliyê rastnivîsê ve cînavkên nebinavkirî :
Cînavkên hevedudanî/pêkhatî, wek hin peyvên din, di ferheng û nivîsaran de bi du dirûvan tên dîtin. Li gorî nêrîna min, heta zimanekî standard nayê holê, ew aloziyên wisa dê bidomin.

Mînak 119 : Ji wan hinek :
herkes : her kes
herdu : her du
çiqas : çi qas
ewqas : ew qas

---

• Di beşên cînavkan de yên ku nîqaşên girîng li ser çêdibin :

✂ "Cînavkên kesandinê" :
Ew qertaf ji aliyê zimanzaneyan ve curbecur hatine navandin: "qertafên kesandine", "cînavkên kesandinê", "cînavkên kesane", "parkîtên kesandinê", "cînavkên paşgînkirî".

★ **Ew qertaf di kêşana lêkeran de bi hev ve, lê bi bikaranîna navdêr, cînavk, rengdêr, hokeran ve cuda tên nivîsandin :**
**im, (y)î, (y)e; in/ne, in/ne, in/ne**

**Divê em bi kurtasî vê mijarê bi mînakan bidin vekolandin.**

**Mînak 120/1 : Ew qertaf bi cînavkên kesane yên xwerû ve :**
**Ez im/tu yî/ew e**
**Em in/hûn in/ew in**

**Mînak 120/2.1 : Bi navdêrê ve dirûvê yekemîn : Bêjeya berî qertafan bi dengdêrekê dawî dibe :**

**Ez hoste me/tu hoste yî/ew hoste ye**
**Em hoste ne/hûn hoste ne/ew hoste ne**

**Mînak 120/2.2 : Bi navdêrê ve dirûvê duyemîn : Bêjeya berî qertafan bi dengdarekê dawî dibe :**

**Ez hozan im/tu hozan î/ew hozan e**
**Em hozan in/hûn hozan in/ew hozan in**

★ **Ew qertaf di kêşanê de bi lêkeran ve tên nivîsandin, digel ve li gorî deman hin guhertin pêk tên : -im, -(y)î, -e(-) ; -in, -in, -in**

♦ **Di berhemên wêjeyî de bikaranînên awerte tên dîtin.**
**Nimûne : Kurdin serbilindin, naxwazin bindestî** (Cigerxwîn)

**Mînak 120/3 : Ev qertaf bi lêkerê ve : bûn**

**Ez bim/tu bî/ew be**
**Em bin/hûn bin/ew bin**

**Mînak 120/4 : Ev qertaf bi lêkerê ve : çûn**

**Ez diçim/tu diçî/ew diçe**
**Em diçin/hûn diçin/ew diçin**

**Mînak 120/5 : Ev qertaf bi lêkerê ve : hatin**

**Ez hatim/tu hatî/ew hat**
**Em hatin/hûn hatin/ew hatin**

**Mînak 120/6 : Ev qertaf bi lêkerê ve : girtin**

**Cînavkên kesane yên xwerû bireser in :**

**Te ez girtim/min tu girtî/wî(wê) ew girt**
**Te em girtin/min hûn girtin/wî(wê) ew girtin**

**Encam : Ji van mînakan şûn de em dikarin wisa vebêjin :**

**Ew qertaf bi serê xwe ne cînavk in. Eger em bi cînavkên kesane ve wan wekî daçekên hevedudanî bifikirin, peywira cînavkî sereke tê xuyakirin.**

**Lê ev qertaf bi serê xwe qertafên kesandinê û ji wan jî paşgirên kesandinê ne, cihên kesan nagirin û di kêşana lêkeran de wan nîşan dikin.**

**Li gorî hin raweyan di wan qertafan de hin guhertin têne holê. Ew qertaf li ser bingeha lêkera "bûn"ê pêk hatine.**

**✄ "Cînavkên jimarîn" :**
**Jimar bi serê xwe navdêr(nav) in û di hevokê de wek navdêrên din hin erkên rengdêrîn û hokerîn jî digirin.**
**Jimar li şûna navdêran bi kar tên û li wir jî navdêr in, erkên cînavkî jî di wan peywirên xwe de dihewînin; ligel vê çawaniya navdêrîn sereke ne.**

**Mînak 121/1 : Jimar binyata xwe yên navdêrîn diparêzin :**

**Heşt mirov hatin.**
**Şeş dixebitin, lê didu nexebitîn û vegeriyan.**

**Mînak 121/2 : Di bikaranîna hevedudanî ya jimarê de jî çawaniya navdêrîn tê parastin :**

**Çar kevok firiyan.**
**Çar firiyan.**
**Ji çaran sisê yên kedî bûn.**

---
**✄ : Divê ev navandin ji rêzimanê bên avêtin.**

**Jimar : 4**

**Mijar : Rengdêr**

**Nasîn : Peyvên ku navdêran didin nasîn re rengdêr(hevalnav) tê gotin. Ev peywirên xwe; bi wesfandin, şanîdan, pirsan, jimaran, binavkirî, nebinavkirî û bi payedanan pêk tînin.**

**Piraniya rengdêran guherbar in. Tên tewandin, yekjimar û pirjimar bi kar tên, dikevin ravekan. Di hevokê de kirde, bireser û pareng dibin. Bi hoker û daçekan bandorên girîng digirin.**

***Peyvên ku di teksta jêrîn de hatine reşkirin, rengdêr in :***

Di şevên **tarî** de, Agirî di nav tariya şevê de wenda nedibû û nediket rengê şevê. Di şevên **tarî** de, ew dibû cîhaneke ji şevê hîn **tarîtir** û li ser cîhanê **sîdar** dibû. (Çiyayê Agirî, Y. Kemal)

## Cureyên rengdêran

**Rengdêr li pênc birên sereke kom dibin :**
**Yên çawaniyê(wesfîn)**
**Yên şanîdanê(îşarkî)**
**Yên pirsyariyê**
**Yên jimarîn**
**Yên nebinavkirî(nenas)**

- **Rengdêrên çawaniyê :**

**Ev rengdêr, dirûv, reng û rewşên heyberan diwesfînin.**

**Nimûne :** bedew, biçûk, jîr, mezin, qiloz, rind, sor, zîrek

**Pirs :** Rendêrên çawaniyê çawa tên kifşkirin?
**Bersiv :** Ew bi hêsanî, bi pirsên "çawa" û bi yên "**kîjan**"ê tên dîtin.

**Nimûne : gula sor**

**Gul çawa ye?**
**Gul sor e.**

Di bersiva jorîn de **sor,** rengdêra çawaniyê ye.

**Nimûne :** Memê deftera **nû** daye Berfînê.

**Memê kîjan defter daye Berfînê?**

**Memê deftera nû daye Berfînê.**
**Memê ya nû daye Berfînê.**
**Wî ya nû daye wê.**

Di bersivên jorîn de **nû,** rengdêra çawaniyê ye.

**Mînak 122 : Bi vegotin û bikaranînan rengdêrên çawaniyê :**

★ **Mîna navan bi kar tên :**

**Yekjimar :**

**nêr :**
Li vir **qiloz** rengdêr e.
**Mêrê qiloz direve.**

Li vir **qiloz** nav e.
**Qilozê taxa we direve.**
**Ew qiloz hatibû ba me jî.**

**mê :**
Li vir **bedew** rengdêr e.
**Qîza bedew hêdî hêdî dimeşe.**

Li vir **bedew** nav e.
**Bedewa wan hêdî hêdî dimeşe.**
**Ew bedew hatibû ba me jî.**

**Pirjimar :**

**nêr :**
Li vir **qiloz** rengdêr in.
**Mêrên qiloz direvin.**

Li vir **qiloz** nav in.
**Qilozên taxa we direvin.**
**Ew qiloz hatibûn ba me jî.**

**mê :**
Li vir **bedew** rengdêr in.
**Qîzên bedew hêdî hêdî dimeşin.**

Li vir **bedew** nav in.
**Bedewên wan hêdî hêdî dimeşin.**
**Ew bedew hatibûn ba me jî.**

★ **Di hevokê de wek navekî kirde dibe :**

**Hespê qemer ê me rewan e.**
**Qemerê me rewan e.**

**Hespa we ya qemer ne rewan e.**
**Qemera we ne rewan e.**

★ **Bi bireseran ve :**

**Hûn ê berxekî nêr bidin Narê.**
**Em jî berxekê mê didin Nazê.**

★ **Rengdêrên çawaniyê di piştî navên ku tên wesifandin de cih digirin. Bi giştî ji aliyê zayend, mêjer û dirûvê ve di wan de cudatî pêk nayên :**

**Yekjimar û pirjimar :**

**nêr : ciwanê mêrxas**
**Ciwanê mêrxas li ser hespê bû.**
**Ciwanên mêrxas li ser hespan bûn.**

**mê : jina rind**
**Wî mirovî jina rind nedîtibû.**
**Wî mirovî jinên rind nedîtibûn.**

★ **Di veqetandekê de :**

**Yekjimar û pirjimar :**

**nêr : pelê spî**
**Dîlanê pelê spî bi darê ve nekir.**
**Dîlanê pelên spî bi darê ve nekirin.**

**mê : pirtûka zer**
**Reşo pirtûka zer xwast.**
**Reşo pirtûkên zer xwestin.**

★ **Di hevokê de bi peywira pêveberî ya rengdêrîn :**

**mezin**
**Şîrmija wê mezin bûye.**

**rast**
**Tu rast dibejî.**

★ **Di raveka rengdêrîn de bi hêmanên din ve :**

✔ **Bi nav û rengdêrekê ve : dara mezin**
raveber : **dar**
raveker : **mezin**

✔ **Bi nav û du rengdêran ve : bejna zirav û dirêj**
raveber : **bejn**
raveker : **zirav û dirêj**

✔ **Bi nav, cînavk, sê rengdêran ve : qîza wan zîrek, zana û çeleng e.**
raveber : **qîz**
raveker : **wan**
Ev rengdêr li vir ravekê diwesifînin : **zîrek, zana û çeleng e.**

✔ **Bi navdêrên nebinavkirî ve :**

Yekjimar :
**nêr : porekî reş**
**mê : tiliyeke dirêj**

Pirjimar :
**nêr : porine reş**
**mê : tilîne dirêj**

✔ **Bi cînavkan ve :**

**Min şîrîn û tirş, du hinar kirîn.**
**Ya şîrîn a te ye û ya tirş a min e.**

**Du xam û du jî sor, çar zebeş hene.**
**Yên xam ên wî ne û yên sor jî yên wê ne.**

• **Rengdêrên şanîdanê :**
**Ev rengdêr li pêş navan cih digirin û wan bi şanîdanan didin nasîn.**
**Peyvên cînavkên şanîdanê û yên rengdêrên şanîdanê wek hev in,**
**lê peywirên wan ji hev cuda ne.**

**Rengdera şanîdanê "ha/han" û yên şibandinê jî di vê beşê de tên senifandin.**

**Rengdêrên şanîdanê du cure ne : Yên xwerû û yên tewandî.**

**♦ Rengderên şanîdanê yên xwerû : Ev, ew :**
**Li ber hemû navan cih digirin û wan bi xwe re natewînin, yekjimar û pirjimar, nêr û mê bi kar tên.**

**Mînak 123 : Rengdêrên şanîdanê yên xwerû :**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Cihê kur nêzîk e : ev kur**
**Ev kur ji bo kursa kurdî hatiye.**

**Cihê zilêm dûr e : ew zilam**
**Ew zilam ji bo hevala xwe hatiye.**

**mê :**
**Cihê keçê nêzîk e : ev keç**
**Ev keç ji bo kursa folklorê hewl dide.**

**Cihê bûkê dûr e : ew bûk**
**Ew bûk di amadekariya firavûnê de ye.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**

**Cihên kur(an) û keçan nêzîk in.**
**Ev kur ji bo kursa kurdî hatine.**
**Ev keç ji bo kursa folklorê hewl didine.**

**Cihên zilam(an) û bûkan dûr in.**
**Ew zilam ji bo hevalên xwe hatine.**
**Ew bûk di amadekariya firavînê de ne.**

**♦ Rengdêrên şanîdanê yên tewandî : vî/vê, van; wî/wê, wan :**

**Ev rengdêr qertafên tewangê(-î, -ê; -an) digirin. Li gorî zayend û mêjerê, li ber hemû navan bi kar tên û wan jî bi xwe re ditewînin.**

**Mînak 124/1 : Rengdêrên şanîdanê yên tewandî :**

**Yekjimar :**

**nêr :**

**Cihê lêw nêzîk e : vî lawî**
**Vî lawî çîvanokek xwand.**

**Cihê kalê dûr e : wî kalî**
**Wî kalî destanek nivîsandiye.**

**mê :**

**Cihê qîzê nêzîk e : vê qîzê**
**Vê qîzê kovara heftane anî.**

**Cihê dayikê dûr e : wê dayikê**
**Wê dayikê birîna qîzê derman kiriye.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**

**Cihên law(an) û qîzan nêzîk in.**
**Van lawan çîvanok xwandin.**
**Van qîzan kovarên heftane anîn.**

**Cihên kal(an) û dayikan dûr in.**
**Wan kalan çend destan nivîsandine.**
**Wan dayikan birînên qîzan derman kirine.**

**Mînak 124/2 : Bikaranîna rengdêrên şanîdanê :**

**Yên xwerû, yekjimar û pirjimar, nêr û mê : ev, ew**
**Yên tewandî, yekjimar û pirjimar, nêr û mê : vî/vê, van; wî/wê, wan**

**★ Bi kirdeyan ve :**

**♦ Yên xwerû, yekjimar û pirjimar, nêr û mê : ev, ew**

**Ev rêwî giran giran dipeyiviya.**
**Lê ew firoşger ne wekî wî mirovî bû.**
**Ew darên mezin tevde keskeşîn bûn.**

♦ **Yên tewandî, yekjimar û pirjimar, nêr û mê : vî/vê, van; wî/wê, wan**

**Vî siwarî tu carî ew der nedizanîn.**
**Vê xezalê her roj ji wê kaniyê av vedixwar.**
**Van seydvanan du kew girtibûn.**

**Wî marî xwe dabû benda çûkên avî.**
**Wê hunermendê bi stran wisa dirist.**
**Wan kesan li wê jinê guhdarî kiribûn.**

⋆ **Bi bireseran ve :**

**Min ev diyarî pêşkêşî wê kiribû.**
**Berîvanê ev xoxên xweşik kiriyabûn.**

**Dîlanê ew şagirt şandiye.**
**Jineke ew zarok dabûn dû xwe û diçûn.**

**Kî yê vî şagirtî bibe ba yên din?**
**Hûn ê vê xelatê ji bo sersala nû veşêrin.**
**Helbet yekê van kesan bibe odeya mezin.**

**Hinekan ji wî dengbêjî re alîkarî nekiriye.**
**Me jî ji wê mêvanê re şûn amade kiriye.**
**Yê ku wan biyaniyan bibe otelê, ka li ku ye?**

⋆ **Di ravekê de û bi cînavkên xwedîtiyê ve :**

**Ev peyker ê vî helbestvanî ye.**
**Ew dozîne ya wê lêkolînerê ye.**
**Ew wêne yên wan wênekeşên klasîk in.**

**Mînak 125 : Di bikaranîna rengdêrên şanîdanê de mêjerên navdêran bi veqetandekê jî tên bidestxistin :**

**Di dibistanê de ev kur ê herî zîrek e.**
**Ji qîzan ew qîz jî ya herî zîrek e.**
**Lê di pola me de şagirtên biyanî yên herî baş in.**

**Mînak 126 : Rengdêrên şanîdanê yên tewandî, mîna yên cînavkên şanîdanê bi dirûvên cuda jî tên dîtin.**

⋆ **Ev herdu dirûv hemwate ne û wekî hev bi kar tên :**

Rengderên şanîdanê : **vî/vê, van; wî/wê, wan**
**Di zimanê gelêrî de : evî/evê, evan; ewî/ewê, ewan**

✔ **Yekjimar :**
**nêr : vî kurî → evî kurî**
**mê : vê keçê → evê keçê**

**Pirjimar :**
**nêr : van kuran → evan kuran**
**mê : van keçan → evan keçan**

✔ **Yekjimar :**
**nêr : wî kurî → ewî kurî**
**mê : wê keçê → ewê keçê**

**Pirjimar :**
**nêr : wan kuran → ewan kuran**
**mê : wan keçan → ewan keçan**

**Mînak 127 : Di zimanê gelêrî de navdêrên piştî rengdêrên şanîdanê yên xwerû hin paşgirên cuda digirin, mêjer û zayendên wan peyvan jî diyar dikin.**

Rengdêrên şanîdanê yên xwerû : **ev, ew**
**Di zimanê gelêrî de : Paşgirên ku piştî peyvên wan digirin :**
**-e, -a; -ene, -ana**

★ **Bi rengdêra şanîdanê : ev**

**Yekjimar :**

✔ **Bo navên nêr, paşgir : -e**
**Ev pele → Ev pele weşiyaye.**

✔ **Bo navên mê, paşgir : -a**
**Ev jina → Ev jina çûye.**

**Pirjimar :**

✔ **Bo navên nêr, paşgir : -ene**
**Ev pelene → Ev pelene weşiyane.**

✔ **Bo navên mê, paşgir : -ana**

**Ev jinana → Ev jinana çûne.**

**★ Bi rengdêra şanîdanê : Ew**

**Yekjimar :**

**✔ Bo navên nêr, paşgir : -e**
**Ew pele → Ew pele weşiyaye.**

**Bo navên mê, paşgir : -a**
**Ew jina → Ew jina çûye.**

**Pirjimar :**

**✔ Bo navên nêr, paşgir : -ene**
**Ew pelene → Ew pelene weşiyane.**

**✔ Bo navên mê, paşgir : -ana**
**Ew jinana → Ew jinana çûne.**

**♦ Ji rengdêrên şanîdanê : Han/ha :**
**Ev rengdêr wateyên rengdêrên şanîdanê yên bingehîn him xurt û him jî bi sînor dikin.**
**Ev rengdêr bi du erkan bi kar tên, bi ya şanîdanê û ya şibandanê.**

**Ev hêman eger bi peywirên cînavkî bi kar bên, cînavkên şanîdanê ne. Di hin bikaranînan de erkên hokerîn jî radikin ser xwe.**

**Mînak 128 : Di bikaranîna rengdêrin û çêkirina peyvan de :**

**★ Bikaranîna rengderîn a şanîdanê : han/ha**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Biçûk û mezin, du zêr hene.**

**Ez zêrê mezin dixwazim.**
**Ez zêrê han dixwazim.**

**mê :**
**Teze û ne teze, du gul hene.**

**Ez gula teze dixwazim.**

**Ez gula han dixwazim.**

**Pirjimar :**

**nêr :**
**Du biçûk û du mezin, çar zêr hene.**

**Ez zêrên mezin dixwazim.**
**Ez zêrên han dixwazim.**

**mê :**
**Du teze û du ne teze, çar gul hene.**

**Ez gulên teze dixwazim.**
**Ez gulên han dixwazim.**

**★ Di çêkirina peyvan de : Han/ha :**
**Ev peyv bi hin cînavkên şanîdanê û hêmanên din ve peyvên nû pêk tînin. Ji wan peyvan hinek bi erkên rengdêrîn, hokerîn, daçekî û baneşanî jî bi kar tên.**

Nimûne :
**Ew ê ha → wiha**
**Ew î ha → wiha**

**♦ Ji rengdêrên şanîdanê yên şibandinê :**
**Ev rengdêrên şanîdanê yên şibandinê, watêyên navdêran xurt an jî bi sînor dikin. Ji wan peyvan hinek bi erkên cuda(cînavk, hoker, daçek, baneşan) jî tên karandin.**

**Ji wan çendek : han/ha, hanî/hanê, wiha, wisan/wisa**

**Mînak 129 : Bikaranîn :**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Evdalê Zeynikê dengbêjekî navder bû.**

**Dengbêjekî han hîn nehatibû wî welatî.**
**Gel, li dengbêjekî hanî guhdarî nekiribû.**
**Her kes li dengbêjekî wiha digeriya.**
**Gelek dengbêj jî li benda yekî wisa dibûn.**

**mê :**
**Evîna Mem û Zînê gelek bi kul û keder e.**

**Evîneke han, gelo kê kişandiye?**
**Evîneke hanê, wê mirov dîn bike!**
**Êdî evîneke wiha nayê jiyandin.**
**Belê, evîn hene, lê yeke wiha heye?**
**Evîneke wiha, ji evînan wêdetir evînek e.**

**Pirjimar :**

**nêr :**
**Çend in evîndarên wekî Memê?**
**Evîndarên wiha, pir hendik in.**

**mê :**
**Çend in evîndarên weke Zînê?**
**Evîndarên wiha, pir hendik in.**

**• Rengdêrên pirsyariyê :**
**Ev peyvên rengdêr in ku tên ber navdêran û bi pirsên xwe; rewş, cih û jimarên wan bi dest dixin.**
**Her cureyeke rengdêrên pirsyariyê bo cureyeke rengdêran yê ku pê re têkildar e, ji bo wî karîger dibe.**

Nimûne :
**Rengdêra pirsyariyê ya "çend"ê, rengdêrên jimarîn nîşan dide.**

**Şeş zarok hatin.**
**Çend zarok hatin?**

**Rengdêrên pirsyariyê yên sereke ev in :**

**♦ Ji yên ku pirsên rengdêrên çawaniyê dikin :**
**Ev bêje ji aliyê mêjer û zayendê ve ne guherbar in : çawa/çawan**

**Mînak 130 : Bikaranîn :**

**★ Ji bo rewşên navan :**

**Azad çawa ye?**
**Azad nexweş e.**

**Bejna Gulşahê çawa ye?**

**Bejna Gulşahê direj e.**

**Gulşah çawa ye?**
**Gulşah bejnzirav e.**

**Gulşah û Dilbirîn çawa ne?**
**Gulşah û Dilbirîn baş in.**

★ **Ji bo rengên navan :**

**Çawên Narê çawa ne?**
**Çavên wê kesper in.**

★ **Ji bo dirûvên navan :**

**Gopalê wî kalî çawa ye?**
**Gopalê wî kalî xwar e.**

**Çiya, ji çiyayan çawa dibin?**
**Belê, çiya ji çiyayan bilindtir dibin.**

**Mînak 131/1 : Peyvên ku wek çawa/çawan'ê bi kar tên, hene : çer, çilo, çito, çitol, çiton :**

**Te guleke çer hilbijartibû?**
**Min guleke sor hilbijartibû.**

**Xwendekarê we çilo ye?**
**Xwendekarê me jêhatî ye.**

**Xwendekarên wan çito ne?**
**Xwendekarên wan ne jêhatî ne.**

**Şagirtên wî çitol in?**
**Şagirtên wî zîrek in.**

**Şagirtekî te heye, ew çiton e?**
**Ew ji gişkan zîrektir e.**

**Mînak 131/2 : Peyvên ku bi nêzwateya çawa/çawan'ê bi kar tên, hene : çi**

★ **Çend bikaranîn :**

✓ **Ji bo pişeyan :**

**Bavê te çi karî dike?**
**Bavê min wênesaz e.**

**Diya te çi karî dike?**
**Diya min paqişiyê dike.**

**✔ Ji bo rewşan :**

**Mirovek :**
**- Hoste, ev çi kar e?**
**Peykersaz :**
**- Ev karekî mêjîxur e!**

**✔ Ji bo diyarkirina çawaniyê :**

**Ew nanê çi ye?**
**Ev nanê genimî ye.**

**Ew nameya çi ye?**
**Ev nameya kesîde ye.**

**♦ Ji yên ku pirsa jimara navdêrên dikin : Çend :**
**Ev rengdêr pirjimar bi kar tê û bi pirsên wê, jimarên navan diyar dike.**

**Mînak 132 : Bikaranîn :**

**★ Li ber navan cih digire :**

**Wan çend ferheng kirîn?**
**Wan pênc ferheng kirîn.**

**Xortan ji heft lepikan sê birin.**

**Xortan çend lepik birin?**
**Xortan sê lepik birin.**

**Xortan çend lepik nebirin?**
**Xortan çar lepik nebirin.**

**Du hezar bûk hatine xemilandin.**
**Çend hezar bûk hatine xemilandin?**

**★ Pirs pirjimar, lê bersiv yekjimar dibin :**

**Çend dilên te hene?**

**Dilekî min heye.**
**Yekî min heye.**

**★ Di ravekê de :**
**Piştî navê ku tê tewandin, cih digire û bi xwe jî ditewe.**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Ev berxê çendan e?**
**Ev berxê pêncan e.**

**mê :**
**Ev berxa çendan e?**
**Ev berxa şeşan e.**

**Pirjimar :**

**nêr : du berx**
**Ev berx, ji yên koma çendan e?**
**Ev berx, ji yên koma heştan e.**

**mê : du berx**
**Ev berx ji yên koma çendan e?**
**Ev berx ji yên koma dehan e.**

**♦ Ji yên ku pirsa tebaba(mîqdar) navdêran dikin : Çiqas/çi qas**

**Ev rengdêr ji bo tebaba navdêrên nebinavkirî hîn karîger e :**

**Mînak 133 : Bikaranîn :**

**★ Li ber navan :**

**Rewşenê çiqas av vexwar?**
**Rewşenê piçek av vexwar.**

**Wan çiqas erebe bi rê kirin?**
**Wan deh erebe bi rê kirin.**

**★ Bo payeya rengdêran :**

**Dîlan ji Narê çiqas bejntir e?**
**Ew ji wê piçek bejntir e.**

**Dîlan û Rewşen, ji Narê çiqas bejntir in?**
**Ew ji Narê piçek bejntir in.**

**★ Ji aliyê tewangê ve di zimanê gelêrî de :**

**Tu yê çiqas şekir binî?**
**Ez ê tûrek şekir bînim.**

**Tu yê çiqas şekirî binî?**
**Ez ê tûrekî bînim.**

**Ew ê çiqas helaw bişîne?**
**Ew ê du kîlo helaw bişîne.**

**Ew ê çiqas helawê bişîne?**
**Ew ê du kîloyan bişînê.**

**♦ Kîjan : Ev rengdêr pirsa navdêrên ku bi şanîdanan tên diyarkirin, dike.**

**Mînak 134 : Bikaranîn :**

**★ Li ber navan cih digire û wan natewîne :**

**Ji wan mirovan yek mamoste ye.**

**Kîjan mirov mamoste ye?**
**Ew mirovê ku diçe xwendegehê.**

**Hin jin çûne sînemayê.**

**Kîjan jin çûne sînemayê?**
**Ew jinên han çûne sînemayê.**

**★ Navên piştî xwe ditewîne :**

**Sazbendê kal ji kîjan gundî hatiye?**
**Ew ji gundekî dûr hatiye.**

**Ev turîst diçe kîjan parkê?**

**Ev turîst diçe parka kevn.**

**Kîjan xortan cil û berg li xwe kirin?**
**Wan xortan cil û berg li xwe kirin.**

**Pênûsa reş a kîjan zilamî ye û ya şîn a kîjan keçê ye?**
**Pênûsa reş a vî zilamî ye û ya zer jî ya wê keçê ye.**

★ **Ji aliyê mêjer û zayendê ve neguherbar e :**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Ew kîjan pisîk e?**
**Ew pisîkê kovî ye.**

**mê :**
**Ew kîjan pisîk e?**
**Ew pisîka kedî ye.**

**Pirjimar :**

**nêr û mê :**
**Kijan pisîk kovî û kedî ne?**
**Ew pisîkên han kovî û kedî ne.**

**Mînak 135 : Kîjik/kîjan : Kîjik, bi qasî kîjan'ê ne karîger e.**

**Yekjimar :**

**nêr :**
**Wê hevalê, ji kîjik hevalî re gotibû?**
**Wê hevalê, ji hevalê bajarî re gotibû.**

**mê :**
**Wî hevalî, ji kîjik hevalê re gotibû?**
**Wî  hevalî, ji hevala bajarî re gotibû.**

**Pirjimar, nêr û mê :**

**Wan hevalan, ji kîjik hevalan re gotibûn?**
**Wan hevalan, ji hevalên bajarî re gotibûn.**
**Wan, ji hevalên bajarî re gotibûn.**

**• Rengdêrên jimarîn :**
**Jimar bi serê xwe navdêr in. Eger bi erkên rengdêrîn bên bikaranîn, wê demê rengdêr dibin.**

**Rengdêrên jimarîn ên sereke ev in :**
**Yên jimarên bingehîn**
**Yên jimarên rêzkirinê(rêzîn)**
**Yên jimarên debaşiyê**
**Yên jimarên pareyî(şikestî)**

**♦ Rengdêrên jimarên bingehîn :**
**Ev rengdêr bi jimarên bingehîn pêk tên.**

**Mînak 136 : Ev jimar xwerû û nexwerû li ber navan cih digirin :**

**★ Navên piştî wan dirûvên xwe diparêzin. digel vê ew nav, wateyên pirjimariyê ji jimaran digirin û pirjimar bi kar tên.**

**Heşt xort rabûn dîlanê.**
**Heft qîz jî hatin ku temaşe bikin.**

**Heşt xort û heft qîz zehf kêfxweş bûn.**

**★ Navên piştî wan dirûvên xwe her tim naparêzin :**

**Şeş xort û bi şeş qîzan ve ketin reqsê.**
**Temaşevanekî du destmal dan du zilaman.**

**Çar xortan şîranî dixwar.**
**Pênc qîzan li wan meze dikirin.**

**★ Di ravekê de : Him bi hêmanên raveber, him jî bi yên raveker ve cih digirin.**

**Sê lîstikvanên şanogehê li wir bûn.**
**Li nik wan, deh ciwan ên du komên din jî hebûn.**

**Mînak 137 : Ev jimar bi dirûvên cuda bi kar tên : yek, didu/dido(du, do), sisê(sê)**

**★ Taybetiya wê : yek**

**yek pel → pelek**
**Narê pelek kaxiz da Nazê.**

**sih û yek pel → sih û pelek**
**Rewşenê sih û yek pel dane wan.**
**Rewşenê sih û pelek dane wan.**

**⋆ Didu/dido, sisê : Ev dirûv di awayê jêrîn de bi kar nayên :**

**Do fatimok firiyan.**
**Wan du fatimok dîtin.**

**Me sê kevok kedî kirin.**
**Sê kevokên zinarî bi davikê ketine.**

**⋆ Didu/dido, sisê : Ev dirûv di awayê jêrîn de karîger in :**

**Ev kevok dido ne.**
**Ew kevok jî didu ne.**

**Ew kewên han sisê ne.**

**Mînak 138 : Rengdêrên jimarîn ên bingehîn û tewandina navên piştî wan.**

**⋆ Bi alîkariya qertafa pirjimariyê(-an) :**

**Ew deh sêvan dikire.**
**Em bi bîst û yek zilaman ve digerin.**

**⋆ Nêr û mê, bi alîkariya paşgira tewangê ya (-î )'yê :**

**Hûn çil sêvî dikirin.**
**Ew sed û heştî zilamî derdixin qada pêşbaziyê.**

**⋆ Ji bo jimara "yek" ê, bi paşgira tewangê ya (-ê )'yê :**

**Ez ê sêvekê(yek sêvê) bixwim.**

**⋆ Ji bo jimarên mezin :**

**Em ê hezar ciwanî bidin xwendin.**
**Ew ê ji milyon zêrî kêmtir nade xezîneyê.**
**Bankayek bi du milyar û sê sed dolarî hatiye firotin.**

♦ **Rengdêrên jimarên rêzkirinê :**
**Ev rengdêr bi payeyên jimarîn, navdêran didin nasîn û ji aliyê peyvsaziyê ve jî paşgirên rêzkirinê digirin.**

**Mînak 139 : Bikaranîn :**

★ **Bi paşgira rêzkirinê ya (-em)'é :**

**Dara yekem kulîlk weşandine.**
**Mirovê sêyem bi erebe neçûye.**

★ **Bi paşgira rêzkirinê ya (-emîn)'ê :**

**Pirtûka yekemîn nehatiye firotin.**
**Mirovê sêyemîn çûye çayxaneyê.**

★ **Bi paşgira tewangê ya rêzkirinê ya (-an)'ê :**

**Îro, roja çaran e ku ansîklopedî tê xwandin.**
**Ew, ji berga yekê de heta ya sêzdehan hatiye weşandin.**

**Çar pakêt pel hene û her yek ji sed pelî pêk tê.**
**Berîvanê bi xwe pelên sedan derxistin.**
**Berîvanê ji pakêtan pelên sedî derxistin.**

★ **Bi paşgira tewangê ya rêzkirinê ya (-î )'yê : Ji bo jimarên dehanî û qatên wan :**

**dehî, bîstî, sihî, çilî, pencî, şêştî, heftî, heştî, nodî, sedî, hezarî, du hezarî, milyonî, sed milyonî, milyarî, çar milyarî...**

**Memê deftera heftî ji Narê re kiriye.**
**Dîlanê jî pirtûka nodî ji bo Nazê biriye.**

♦ **Rengdêrên jimarên dabeşiyê :**
**Ev rengdêr bi parîkirinên yeksan ên jimarîn, navan didin nasîn û bi piranî li piştî wan cih digin.**

**Mînak 140 : Bikaranîn :**

★ **Bi jimarên bingehîn, bi yên ducarkirina xwerû :**

**Pênûs yek yek hatin jimartin.**
**Wan morik sê sê veşartin.**

**Dîlanê pel çar çar pê ve kirin.**

★ **Bi jimarên bingehîn, bi alîkariya daçeka (bi)'yê :**

**Pirtûk yek bi yek hatin dayîn.**
**Wî hin jimarnav deh bi deh jimartin.**
**Memê darik sed bi sed rêz kirin.**

★ **Bi jimarên bingehîn, bi alîkariya gihaneka (û)'yê :**

**Perde sê û sê hatin şuştin.**
**Mase çar û çar hatin bicihkirin.**
**Min masî deh û deh biraştin.**

★ **Bi jimarên bingehîn, bi alîkariya qertafên (-e, -o)'yê :**

**Pirtûk yekeyek hatin xwendin.**
**Ciwanên wan şeşeşeş dilîstin.**

**Zilam yeko yeko dibeziyan.**

★ **Bi jimarên pareyî, sade û bi (bi, û)'yê :**

**Me zebeş çaryek çaryek birîn.**
**Nan nîv nîv didan.**

**Nan nîv bi nîv didan.**
**Nan nîv û nîv didan.**

★ **Bi jimarên dabeşiyê û bi alîkariya daçeka ( ji )'yê :**

**Sêv gelek in :**

**Ji çaran yek sêv hatine xwarin.**
**Ji çaran sêvek hatiye xwarin.**

**Hêk gelek in :**

**Ji pencî hêkî şeş şikeştibûn.**
**Ji pencî, şeş hêk hatine avêtin.**

★ **Rengdêrên jimarên dabeşiyê di ravekê de :**

**Mirovên çareçar, diçûn xebatê.**

**Keçên şeş bi şeş, ketin dibistana sereteyî.**

**Mînak 141 : Hin bêje hene ku mîna rengdêrên jimarên dabeşiyê bi kar tên :**

**Em li sûkê tek tek digeriyan.**
**Gûz, tek bi tek hatin şikandin.**

**Li bazarê, berx cot cot girê didan.**
**Giraniyên wan, ducar ducar hatin nivîsandin.**

♦ **Rengdêrên jimarên pareyî :**
**Jimarên pareyî, ji parçeyên jimarên bingehîn pêk tên û di peywirên xwe yên rengdêrîn de navdêran bi pareyî didin nasîn.**

**Mînak 142 : Bikaranîn :**

★ **Ev rengdêr bi yên jimarên bingehîn ve zêde bi kar tê : nîv :**

**Ez nîv sêvî dixwazim.**
**Ew jî nîv nanî dixwaze.**

**Ew yek û nîv kîlo(kîlo û nivek) şekir jê kê re maye?**
**Wan deh û nîv ton genim birin ambarê.**

★ **Ji bo rengdêrên jimarên pareyî yên din.**

Sêv çar in :
**Ji çaran yek sêv hatiye xwarin.**

Sêv komek in :
**Ji çaran sêvek hatine xwarin.**

Qase qase hek hene :
**Ji pencî hekî şeş şikeştibûn.**
**Ji pencî, şeş hêk hatine avêtin.**

**Ji tonekî, ji sedî neh kîlo îsot hatibûn şikandin.**

• **Rengdêrên nebinavkirî :**
**Ji aliyê peyvsaziyê ve ev bêje ji yên cînavkên nebinavkirî ne. Eger bi peywirên rengdêrîn bi kar bên, rengdêr dibin.**

**Rengdêrên nebinavkirî gelek in : filan/falan, bêvan, çend, çendek, din,**

**eynî, gelek, çendîn, çi, çiqas(çi qas), ewqas(ew qas) giş/gişk, hemû/hemî, tev, tevde, tu/ti/çu, her, herdu(her du), hin/hind, hinek, hindik, piçek**

**Mînak 143 : Bikaranîn :**

★ **Ev bêje hemwate ne. Him bi hev re, him cuda bi kar tên û gelek jî karîger in : filan, falan, bêvan :**

**Filan keçê sê gulnesrîn birin.**
**Falan bûkê çar gulasor anîn.**

**Filan û falan kur û keç li wir bûn.**

**Bêvan jin li ba zarokê xwe bû.**
**Filan bêvan mirov nehatibûn.**

**Sibehê nîşana qîza filan malê heye.**

**Defên falan gundan şên dibin.**
**Zeviyên filan falan erdî baş in.**

**Zeviyên filan falan erdan bê av in.**
**Aboriya filan û bêvan malan ne baş in.**

★ **Ev gelek karîger e : çend :**

**Çend mase li vir bûn.**
**Çend kursî li wir bûn.**

**Çend kuran ew dîtin.**
**Çend qîzan em dîtin.**

**Çend kur û qîzan gulnesrîn ber hev kirin.**
**Çend qîz û kuran gulnesrîn ber hev kirin.**

**Wê pênûsên çend kuran ji ku rakirin?**
**Wî pênûsên çend qîzan ji ku rakirin?**

★ **Çend û çendek nêzwate ne, lê çendek kêm bi kar te :**

✔ **Ev hevedudanî ye : çendek → çend + (y)ek**

**Ji çendek nanî, nîvek nehatiye xwarin.**
**Yên ku ez dibînim, çendek mirovên nenas in.**

★ **Ev di erka nebinavkirî de ne karîger e : çi**

**Ew çi tişt be jî, tu yê bidî wî mirovî.**
**Ev çi pênûsê ku heya niha bala tu kesî nekişandiye!**

★ **Ev li ber û piştî navan bi kar tê, wan ditewîne, lê bi xwe nakeve bandore tewangê : din**

**Min careke din ji te re gotibû.**

**Nalînê sîwana din bi xwe re biriye.**
**Di destê wê yê din de tiştekî din hebûye.**

**Ew di maleke din de bi cih bûye.**
**Yek çûye wir, lê çarên din li ku mane?**

★ **Ev eynîtiya navan nîşan dike : eynî**

**Em bi eynî trênê çûn bajêr.**
**Ya ku ew pê hatibûn jî eynî trên bû.**
**Te ew helbest li eynî pelî nenivîsiye.**

★ **Ev zehf tê xebitandin : gelek**

**Wan gelek gulsosin danîbûn ber deriyê wê.**
**Gulçînê gelek gizêr anîbûn sûkê.**

**Ji gelek pelan hinek çirisiyane.**
**Ev name yên gelek mirovan in.**

★ **Çendîn : Ev nêzwateya "gelek"ê ye, lê kêm bi kar tê :**

**Çendîn mirov diçûn kolana nû.**
**Çendîn ciwan jî ji wir dihatin.**

★ **Ev navan bi tevayî diyar dikin : gişk/gişt**

**Zarok gişt hatibûn salonê.**
**Dîlanê şekir da gişk zarokan.**

**Jin gişk li ber deriyê dibistanê bûn.**
**Mêr gî ketibûn hewşa dibistanê.**

★ **Ev navan bi tevayî nîşan dike : hemû/hemî**

Gulê hemû turîst vexwendibûn.
Gulê diyarî dan hemû turîstan.

★ Ev navan bi tevayî nîşan dikin : tev, tevde

Tev qîz hatin cem wê.
Gulçînê, tev stran li wir hilbijartin.
Qîz tevde rabûn ser sehneyê.

★ Ev bi erkên hemwateyî bi kar tên : tu/ti/çu

Me li wir tu erebe nedîtin.
Memê ti şerab venexwariye.
Tu çi dibêjî, wî çu şerab vexwariye ha!

★ Ev gelek karîger e : her

Rewşen di her karî de qarok e.
Her kes dizane ku ew pir jîr e.

★ Ev nêzwate û hemwate bi kar tên : hin/hind, hinek

Hin gul xweş bêhn didin.
Hin gulên wê ne teze bûn.

Hinek mirov li ber dîwêr rûniştibûn.
Yekî ji hinek gulan yek rakir û çû.
Gulê hinek gul li ba wan hiştin.

★ Ev nêzwate û hemwate ne : hindik, hindek, piçek

Wê keçê hindik nan dixwest.
Karê wê hindik û rindik bû.

Berîvan hat û hindek nan dayê.
Jê re hindek xwarina din jî anî.

Rewşenê jî piçek şîranî da wê keçê.
Ma ev keça çawa bi piçek xwarin bibe!

Di rengdêran de paye :

Ji aliyê wateyê ve di rengdêran de payeyên xwerû hene. Wateyên ku

**ew bêje di binyatên xwe de dihewînin; jêkêmkirin, wekhevkirin an jî lêzêdekirin, bi alîkariya hinek daçek, hoker û qertafên bêjesaz çêdibin. Ji aliyê payeyê ve rengdêrên çawaniyê yên herî karîger in û ew bingeh tên hilbijartin.**

**Payeyên rengdêrîn li sê beşên sereke kom dibin :**
**Ya asayî(xwerû)**
**Ya hevrûkirinê**
**Ya berztirîn**

• **Payeya asayî :**
**Ev paye di wateyên binyadî yên peyvên rengdêrên çawaniyê de hene.**

**Mînak 144 : Ji rengdêrên çawaniyê :**
baş, bedew, bilind, çavşîn, dirêj, giran, hêsan, jîr, kesk, kinik, biçûk, mezin, porzer, qelew, rind, sivik, sor, tiral, şîrîn, vala, xweş, zivîn

★ **Di hevokên hêsan de :**

**Hewa sar e.**
**Ew erebe baş e.**
**Xaniyê wan bilind e.**

★ **Di hevokên ne hêsan de :**

**Ji wan yekî kinik, qelew û mêrxas kete hundir.**
**Bi awireke kûr dinêrî û bi zimanekî şîrîn dipeyiviya.**
**Ji jinan a bedew, esmer, narîn û nazene li nik wî bû.**

★ **Di hevokan de neyînî, payeyan ji holê radikin an kêm dikin :**

**Ew keç ne çavşîn e.**
**Rewşa wê ne xweş e.**
**Ew ne keçeke rind û rûken e jî.**

• **Payeya hevrûkirinê :**
**Ji bo pêkhatina wê, divê herî kêm du navdêr li holê hebin û bi wan ve ew paye bi alîkariya hinek daçekan çêdibe.**

**Mînak 145 : Bikaranîn : bi qasî, bi qandî, bi çendî, wek/wekî/weke, mîna/mînanî/wanî/fena**

★ **Ev bo tiştekî wekheviyên navan diyar dikin :**

Azad bi qasî Memê bezok e.
Tu bi qandî bavê xwe zana yî.
Gul bi çendî Gulçînê dirêj e.

Baran wekî Memê bezok e.
Gul, Gulçîn û Dîlan mîna hev jîr in.

★ Neyînî, wekheviyê ji holê radike :

Azad bi qasî Memê ne bezok e.
Gul, Gulçîn û Dîlan mîna hev ne wêrek in.

• Payeya berztirîn :
Ev ji aliyê payedan û hevrûkirina rengdêran ve payeya herî bilind e.
Bi alîkariya paşgirên (-tir, -tirîn) û hinek daçek û hokeran pêk tên.

Mînak 146 : Paşgirên (-tir, -tirîn) bi rengdêran ve tên nivîsandin.

★ Bi alîkariya paşgira (-tir ) û daçeka ( ji )'yê :

Qurnefîla te sor e.
Lê ya min ji ya te sortir e.

Tiliyên te dirêj in.
Tiliyên min ji yên tê dirêjtir in.

★ Neyînî, berztirê ji holê radike :

Gul ji Gulçînê jîrtir e.
Dîlan jî ji Gulê jîrtir e.
Gul û Gulçîn ji Dîlanê ne jîrtir in.

★ Di payeya berztirîn de radeya herî mezin :

✔ Bi alîkariya paşgira (-tirîn)'ê :

Di pola me de Alan baştirîn e.
Şagirtê baştirîn, Alan e.

Dîno ne baştirîn e.
Şagirtê ne baştirîn, Dîno ye.
Ferho ji Dîno baştir e.
Digel vê Dîno jî baş e.

**Ji sê şagirtan yek baştirîn e û ew jî Alan e.**
**Yê baştir Ferho ye û yê baş jî Dîno ye.**

★ **Neyînî, berztirînê ji holê radike :**

**Ew roj germ bû, lê ne tavtirîna demsalê bû.**
**Ew şevereşî, ne reştirîna şevên evîna wî bû.**

✔ **Bi hevrûkirina du paşgiran : (-tir, -tirîn) :**

**Ava kaniya me ji ya çemê we zelaltir e.**
**Belê, ya wê zelaltirîn e.**

**Ava çemê we ji ya kaniya me ne zelaltir e.**
**Rast e, ya kaniya we zelaltirîn e.**

★ **Payeya berztirîn û tewang :**

**Di vê parkê de xweşiktira daran, ya han e.**
**Di vê parkê de bikulîlktira daran jî ew e.**

**Di wê taxê de çalaktirê ciwanan, ew ê han e.**

**Wî, di şanogehê de çelengtirîna keçan dîtiye.**
**Lê çelengtirînên wê deverê ne yek e, gelek in.**

**Mînak 147 : Bi alîkariya hokeran paye tên xurtkirin an qelskirin :**

★ **Ji bo xurtkirinê :**

**Ev zarok mezin e.**
**Ew zarok hîn mezin e.**

**Çavên wê mîna çavên te ne.**
**Lê yên wî gelek mîna yên te ne.**

**Nalîn ji Şîlanê ziravtir e.**
**Lê Berfîn hîn ziravtir e.**

**Cano ji Canê leztirîn e.**
**Lê Hêjar hîn leztirîn e.**

★ **Ji bo qelskirinê :**

Belê, navçeya me biçûk e.
Lê navçeya we hîn biçûk e.

Hevalên min kêm in.
Lê yên te ji yên min kêmtir in.

Ev kevir ê girantirîn e.
Na, ew kevir ji yên piçek girantirîn e.

Mînak 148 : Payeya berztirîn, bi alîkariya hin hoker û qertafan jî tên holê.

★ Di zimanê gelêrî de bi alîkariya van hokeran û ev peyv hemwate ne :
herî, tewrî

Di welatî me de çiyayê herî bilind, Agiriyê Mezin e.
Di welatî me de çemê tewrî dirêj, Firad e.

★ Ev qertaf pêşgir in, bêjeyên ku tên berztirîn ve tên nivîsandin.

Pêşgir : çîl-
bêje : spî

çîlspî → berxeke çîlspî
Cano li bazarê berxeke çîlspî kiriye.

Pêşgir : qîl-
bêje : spî

qîlspî → hirçeke qîlspî
Memê li çolê hirçeke qîlspî dîtiye.

Pêşgir : sip-
bêje : sor

sipsor → gula sipsor
Min gula sipsor da Nalînê.

Pêşgir : şip-
bêje : şil

şipşil → cilên şipşil
Rewşenê çend cilên şipşil anîn.

Ji aliyê peyvsaziyê ve rengdêr :

**Ji aliyê peyvsaziyê ve rengdêr li du beşên sereke parve dibin :**
**Yên xwerû û yên nexwerû.**

**• Rengdêrên xwerû :**
**Ev rengdêr di teşeyên xwe de yek hêman in. Dirûvên wan parçe nabin û heger bibin, tiştekî watedar li holê namîne.**

**Mînak 149 : Ji rengdêrên xwerû :**

baş, bedew, berz, ciwan, dirêj, gêj, geş, germ, jîr, kal, kesk, kin, pîr, rind, sar, sax, sor, spî, şor, tiral, tûj, xweş, zirav, zîrek, zer

**• Rengdêrên nexwerû :**
**Ev rengdêr du bir in : Yen hevedudanî û yên pêkhatî. Lê hin rengderên nexwerû him di nava hevedudanî û him jî ya pêkhatî de cih digirin. Hin dirûvên kompleks jî hene.**

**♦ Yen hevedudanî :**
**Ev rengdêr herî kêm bi du hêmanên serbixwe pêk tên. Dema ku bên jihevkirin, ji wan her yek bi serî xwe jî watedar in.**

**Mînak 150/1 : Rengdêrên hevedudanî :**

**★ Ji bo yên ku herî kêm bi du hêmanên serbixwe :**

**bargiran, berjin, çavreş, ciwanmerd, dilkoçer, dudilî, mêrxas, navsal, pordirêj, serbilind, serzer, stûxwar, şoreşger, zordest**

**Mînak 150/2 :**
**Rêbazên bingehîn ên pêkhatina rengdêrên hevedudanî :**

**★ Bi navdêr û rengdêrekê :**
**bejnzirav, cangiran, dilsar, guhdirêj, xwîngerm, zimantûj**

**★ Bi rengdêr û navdêrekê :**
**hûrker, kêmaqil, piraqil, xweşdil, ziravpaye, zirbar**

**★ Bi du navdêran :**
**aşitîhez, dilkeser, malwêran, nîvkoçer, serdest, zarşîrîn**

**★ Daçekek dikeve navbera du navdêran :**
**çavlixew, çavlirû, devjidev, destliser, devliken, dilbikovan**

♦ **Yên pêkhatî :**
**Ev rengdêr bi alîkariya bêjeyên watedar û qertafên bêjesaz çêdibin. Qertafên bêjesaz; pêşgir, paşgir, navgir û navbend dibin.**

**Mînak 151 : Ji pêşgir û paşgirên ku rengdêran pêk tînin :**

**Pêşgir : Ev qertaf ne pir in : (bê-, bi-, ho-, ji-, çele-, kele-, li-, ne-, çîl- ,qîl-, sip-, şip, zir-) :**

**Bênav, bidev, hozan, jixweser, çelexare, kelekor, lidar, nediyar, çîlspî, qîlreş, sipsar, şipşil, zirbira**

**Paşgir : Ev qertaf pir in : (-a, -avêj, -ak, -al, -ar, -asa, -awer, -bar, -bêj, -bir, -bîn, -dar, -e, -ek, -ele, -ezar, -êr, -firoş, -geh, -gir, -hez, -ik, -istan,-î, -în, -kar, -ker, -kêş, -kuj, -mend, -mêj, -nak, -ok, -oke, -ole, -olek, -onek, -oyî, -rêj, -tir, -tirîn, -van, -wer, -xenêk, -xwaz) :**

**Paşgir : -î**

★ **Bi rayeka lêkeran ên dema borî ve raweya çebiwar pêk tînin û ew, wek rengdêran jî bi kar tên :**

**Lêker : çûn**

**erênî : çû + (y)î } çûyî**
**Karkarê çûyî, neziviriya ser karê xwe.**

**neyînî : ne + çû + (y)î } neçûyî**
**Yê neçûyî, karê wî jî rakiribû ser xwe.**

**Lêker : hatin**

**erênî : hat + î } hatî**
**Mirovê hatî, dest bi firotina zebeşan kir.**

**neyînî : ne + hat + î } nehatî**
**Yê nehatî, ji bo karekî çûbû dereke dûr.**

★ **Hin rengdêrên pêk tên, mensûbiyetê jî şanî dikin :**

**bajar : bajar + î } bajarî**
**Keça bajarî li gundê me nema.**

**av : av + î } avî**
**Marê avî xuşiya, çû, kete coyê.**

**★ Bi rayekên lêkeran ên dema niha û bêjeyên din ve : Ji wan : (-avêj, -bêj, -bir, -bîn, -firoş, -gir, -kêş, -kuj, -mêj, -rêj, -xwaz) :**

**avêtin : avêj**
**ber + avêj : beravêj**

**gotin : bêj**
**gele + bêj : gelebêj**

**birîn : bir**
**êş + bir : êşbir**

**dîtin : bîn**
**kûr + bîn : kûrbîn**

**firotin : firoş**
**xwe + firoş : xwefiroş**

**girtin : gir**
**alî + gir : alîgir**

**kêşandin : kêş**
**cefa + kêş : cefakêş**

**kuştin : kuj**
**mêr + kuj : mêrkuj**

**mêtin : mêj**
**şîr + mêj : şîrmêj**

**rêtin : rêj**
**xwîn + rêj : xwînrêş**

**xwastin : xwaz**
**dil + xwaz : dilxwaz**

**★ Ji yên ku navdêran rengdêran çêdikin : (-ak, -ane, -asa, -awer, -e, -ek, -ser, -ele, -er, -çole, -hez, -în, -nak, -nas, -ok, -ole, -olek, -oleke, -onek, -oyî, -parêz, -perwer, -perest, -van, -wer, -yar, -zar) :**

**ron + ak : ronak**
**agir + nak : agirnak**
**şer + oyî : şeroyî**

**mirov + ane : mirovane**

**bîr + awer : bîrawer**
**hiş + yar : hişyar**

**dêw + asa : dêwasa**

**ser + eke : sereke**
**çeng + ele : çengele**
**xapîn + er : xapîner**

**reş + çole : reşçole**
**zîv + în : zîvîn**

**xatir + nas : xatirnas**

**dil + o + van : dilovan**

**şerm + ok : şermok**
**şermend + e : şermende**
**şerm + e + zar : şermezar**

**vir + ek : virek**
**zirt + ole : zirtole**
**zirt + olek : zirtolek**
**şil + oke : şiloke**
**zirt + onek : zirtonek**

**zarok + hez : zarokhez**
**welat + parêz : welatparêz**
**gel + perwer : gelperwer**
**gel + perest : gelperest**

★ **Ji yên ku him navdêran, him jî rengdêran çêdikin : (-dar, -gîn, -kar, -ker) :**

**av + dar : avdar**
**xem + gîn : xemgîn**

**şerm + e + kar : şermekar**
**vir + ker : virker**

★ **Ji yên ku ji rayeka lêkeran, navdêr û rengdêran, rengdêran çêdikin :**
**(-a, -ar, -e, -bar) :**

**zanîn : zan**
**zan + a : zana**

**xwarin : xwar**
**xwar + e : xware**

**firîn : fir**
**fir + ar : firar**
**xew + ar : xewar**

**xwendin : xwend**
**xwend + e : xwende**

**xwarin : xwar**
**xwar + bar : xwarbar**

★ **Yên ku bi payeyên berztirînê, ji rengdêran rengdêran çêdikin :**
**(-tir, -tirîn) :**

**sivik + tir : siviktir**
**navsal + tirîn : navsaltirîn**

**Mînak 152 : Ji navgirên ku rengdêran çêdikin : (-bi-, -lê-, -li-) :**

**berbihev, nebinavkirî, dorlêgirtî, devliken**

**Ew dibêjin ku ciwanê dorlêgirtî xwe rizgar kiriye.**

**Mînak 153 : Ji rengdêrên kompleks : Ev rengdêr nexwerû ne, him hevedudanî û him pêkhatî dibin :**

**bejnlihev, bidardekirî, çavdiberde, hişnelihev, jibîrkirî, serjêkirî**

**Mînak 154 : Bi navbendên ku rengdêran çêdikin : (-a-, e, -o-) :**

**rengareng, girepeya, şermezar yekeyek, dilovan**

**Biçûkkirina rengdêran :**

**Ev bi alîkariya paşgirên biçûkker pêk tên : Ecibandin, jêhezkirin û delalokiyê nîşan didin.**

**Mînak 155 : Paşgirên biçûkker : (-ik, -o, -ok ) :**

**sorik, şemo, xwaro, şermok, xwarok**

**★ Bi paşgirên banglêkirinê :**

**Mînak 156 : Paşgirên banglêkirinê : -o, -ê; -(i)no**

**Yekjimar :**

**nêr : -o**
**sorik → Soriko!**

**mê : -ê**
**sorik → Sorikê!**

**Pirjimar, nêr û mê : -(i)no**

**sorik → Sorikno!**
**sorik → Sorikno!**

**★ Bi ducarkirina peyvan : Bi ducarkirna hin bêjeyan jî rengdêr pêk tên, lê ev rêbaz ne karîger e :**

**hûr hûr : nanê hûr hûr**

**Diya Nalînê, nanê hûr hûr dabû ber zarokan.**
**Diya Nalînê, nanê hûrehûr dabû ber zarokan.**

**vîç vîç : çûka vîç vîç**

**Çûka vîç vîç, di hêlînê xwe de bêdeng mabû.**
**Çûka vîçevîç, di hêlîna xwe de bêdeng mabû.**
**Çûka vîçvîçî, di hêlîna xwe de bêdeng mabû.**

**Di rengdêran de dijwatedarî :**
**Ji aliyê wateyê ve di rengdêran de peyvên dijwate gelek in :**

**reş↔ spî, mezin↔ biçûk, dirêj↔ kurt, jîr↔ tiral, qelew↔ lawaz, ciwan↔ kal, stûr↔ zirav, erênî↔ neyînî, jêr↔ jor, pir↔ hindik, qert↔ teze, sert↔ nerm, hatî↔ nehatî, birçî↔ têr, bêkar↔ zewicî**

**Mînak 157 : Çend bikaranîn :**

**Porê Gulçînê reş e, yê pîrika wê spî ye.**
**Tiliyên min dirêj in, lê yên te kurt in.**
**Divê zikê têr, bi halê yê birçî bizane.**

**Jimar : 5**

**Mijar : Raweya fermanî**

**Nasîn : Peyvên ku karan, rewşan, bûyînan an jî qewimînan bi çalakiyan tînin ziman re *lêker* tê gotin.**

**Mînak 158 : Ev peyv lêker in :**
anîn, bûn, çûn, çêkirin, dan, dîtin, girtin, hatin, hebûn, hîn bûn, hîştin, ketin, kirin, kirîn, nivîsîn, şûştin, vexwarin, xwandin.

**Nasîn : Çalakiyên raweyê li gorî hin rêbazên rêzimanî bi fermanî çêdibin. Hevokên raweya fermanî bi giştî bi baneşanê diqedin.**

**Erêniya raweya fermaniyê :**

**a. Qertafa fermaniyê ya erêniyê( bi-) :**
**Di kêşanan de pêşgir û navgir dibin û di hin lêkeran de jî tevde dikevin.**

**b. Paşgirên(qertafên) kesandinê(-e, -in) :**
**Di kêşana hin lêkeran de her tim wek xwe namînin. Heke rayeka lêkerê ya raweya fermanî bi dengdarekê bi dawî bibe, di bikaranîna qertafên kesandinê de hin guherîn tên holê.**

**c. Paşgira kesandinê ya ji bo yekjimariyê : (-e)**
**ç. Paşgira kesandinê ya ji bo pirjimariyê : (-in)**

***Hemû qertafên raweya fermanî bi lêkeran ve tên nivîsandin.***

**• Di raweya fermanî ya erêniyê de :**

**★ Bi giştî, lêker li gorî vê formê (bi.....e) û (bi.....in) tên kişandin.**

**Mînak 159 : Kirin**
**kirin** ➝ **(bi** + **k** + **e)** ➝ **Bike** } yekjimar
**kirin** ➝ **(bi** + **k** + **in)** ➝**Bikin** } pirjimar
**-k-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**kirin**, rader : **kirin**, rayek : **kir-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 160 : Kirîn**
**kirîn** ➝ **(bi** + **kir** + **e)** ➝ **Bikire** } yekjimar
**kirîn** ➝ **(bi** + **kir** + **in)** ➝ **Bikirin** } pirjimar
**-kir-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**kirîn**, rader : **kirîn**, rayek : **kirî-**, paşgira raderîn : **-n**

**Mînak 161 : Ketin/keftin**
**ketin** → (**bi** + **kev** + **e**) → **Bikeve** } yekjimar
**ketin** → (**bi** + **kev** + **in**) → **Bikevin** } pirjimar
**-kev-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**ketin**, rader : **ketin**, rayek : **dît-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 162 : Dotin**
**dotin** → (**bi** + **doş** + **e**) → **Bidoşe** } yekjimar
**dotin** → (**bi** + **doş** + **in**) → **Bidoşin** } pirjimar
**-doş-**} reyeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**dotin**, rader : **dotin**, rayek : **dot-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 163 : Gotin**
**gotin** → (**bi** + **bêj** + **e**) → **Bibêje** } yekjimar
**gotin** → (**bi** + **bêj** + **in**) → **Bibêjin** } pirjimar
**-bêj-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**gotin**, rader : **gotin**, rayek : **got-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 164 : Kuştin**
**kuştin** → (**bi** + **kuj** + **e**) → **Bikuje** } yekjimar
**kuştin** → (**bi** + **kuj** + **in**) → **Bikujin** } pirjimar
**-kuj-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha, [ **ş** → **j** ]

**Lêker :**
**kuştin**, rader : **kuştin**, rayek : **kuşt-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 165 : Lîstin**
**lîstin** → (**bi** + **lîz** + **e**) → **Bilîze** } yekjimar
**lîstin** → (**bi** + **lîz** + **in**) → **Bilîzin** } pirjimar
**-lîz-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha, [ **s** → **z** ]

**Lêker :**
**lîstin**, rader : **lîstin**, rayek : **lîst-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 166 : Dîtin**
**dîtin** ➝ (**bi** + **bîn** + **e**) ➝ **Bibîne** } yekjimar
**dîtin** ➝ (**bi** + **bîn** + **in**) ➝ **Bibînin** } pirjimar
**-bîn-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**dîtin**, rader : **dîtin**, rayek : **dît-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 167 : Bûn/bûyîn**
**bûn** ➝ **(bi** + **b** + **e)** ➝ **Bibe** } yekjimar
**bûn** ➝ (**bi** + **b** + **in)** ➝ **Bibin** } pirjimar
-**b**-} rayeka rewaya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**bûn**, rader : **bûn**, rayek : **bû-**, paşgira raderîn : **-n**

**Mînak 168 : Dan/dayîn**
**dan** ➝ (**bi** + **d** + **e**) ➝ **Bide** } yekjimar
**dan** ➝ (**bi** + **d** + **in)** ➝ **Bidin** } pirjimar
**-d-**} rayeka rewaya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**dan**, rader : **dan**, rayek : **da-**, paşgira raderîn : **-n**

**★ Hinek lêker li gorî vê formê [ bi.....e(ê, î, o, û) ] û [bi.....n(in) ] tên kişandin. Ji ber ku rayekên wan ên raweya fermanî, bi van tîpan (-ê, -î, -o, -û) bi dawî dibin.**

**Mînak 169 : Zan/zayîn**
**zan** ➝ (**bi** + **zê** + **e**) ➝ **Bizê** } yekjimar
**zan** ➝ (**bi** + **zê** + **in**) ➝ **Bizên** } pirjimar
**-zê-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**zan**, rader : **zan**, rayek : **za-**, paşgira raderîn : **-n**

**Mînak 170 : Jîn/jiyan**
**jîn** ➝ **(bi** + **jî** + **e)** ➝ **Bijî** } yekjimar
**jîn** ➝ **(bi** + **jî** + **in)** ➝ **Bijîn** } pirjimar
**-jî-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**jîn**, rader : **jîn**, rayek : **jî-**, paşgira raderîn : **-n**

**Lêker :**
**jiyan**, rader : **jiyan**, rayek : **jiya-**, paşgira raderîn : **-n**

**Nîşe : Jîn/jiyan**
**Di raweya fermanî û ya dema niha de her du lêker wek hev tên kişandin.**

**Mînak 171 : Sûtin**
**sûtin** ➝ **(bi** + **sû** + **e)** ➝ **Bisû** } yekjimar
**sûtin** ➝ (**bi** + **sû** + **in**) ➝ **Bisûn** } pirjimar
**-sû-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**sûtin**, rader : **sûtin**, rayek : **sût-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 172 : Hatin/werîn**
**hatin** ➝ (**bi** + **hê** + **e**) ➝ **Bê** } yekjimar
**hatin** ➝ (**bi** + **hê** + **in**) ➝ **Bên** } pirjimar
**-hê-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha, **-hê-**} **-h-**} dikeve

**Lêker :**
**hatin**, rader : **hatin**, rayek : **hat-**, paşgira raderîn : **-in**

★ **Hin lêker qertafa (bi-)'yê nagirin :**

**Mînak 173 : Werîn/hatin**
**werîn** ➝ (bi + **wer** + **e**) ➝ **Were** } yekjimar
**werin** ➝ (bi + **wer** + **in**) ➝ **Werin** } pirjimar
**wer-**} rayeka raweya fermanî, lê ji bo raweya dema niha bi kar nayê

**Lêker :**
**werîn**, rader : **werîn**, rayek : **werî-**, paşgira raderîn : **-n**

**Nîşe :**
**Werîn : Di gelek rawayan de bi kar nayê.**

**Mînak 174 : Vexwarin**
**vexwarin** ➝ (**ve** + bi + **xw** + **e**) ➝ **Vexwe** } yekjimar
**vexwarin** ➝ (**ve** + bi + **xw** + **in**) ➝ **Vexwin** } pirjimar
**vexw-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**vexwarin**, rader : **vexwarin**, rayek : **vexwar-**, paşgira raderîn : **-in**

★ **Eger lêker bi tîpeke dengdêr dest pê bike, di hin lêkeran de ew tîp**

**bi qertafa (bi-)'yê ve tên ser hev û (-i-) dikeve yan jî wekî xwe dimîne :**

**Mînak 175 : Ajotin**
**ajotin** ➝ **(bi + ajo + e)** ➝ **Bajo(biajo)** } yekjimar
**ajotin** ➝ **(bi + ajo + in)** ➝ **Bajo(biajon)** } pirjimar
**-ajo-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**ajotin**, rader : **ajotin**, rayek : **ajot-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 176 : Avêtin/avêjtin**
**avêtin** ➝ (bi + **avê** + e) ➝ **Bavê(biavê)** } yekjimar
**avêtin** ➝ (bi + **avê** + **in)** ➝ **Bavên(biavên)** } pirjimar
**-avê-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker**
**avêtin**, rader : **avêtin**, rayek : **avêt-**, paşgira raderîn : **-in**

**Nîşe : Avêjtin : Ev dirûv ê kevn e, li şûna wê, avêtin karîger e.**

**Mînak 177 : Axaftin**
**axaftin** ➝ **(bi** + **axêv + e)** ➝ **Baxêve(biaxêve)** } yekjimar
**axaftin** ➝ **(bi** + **axêv + in)** ➝ **Baxêvin(biaxêvin)** } pirjimar
**-axêv-**} rayeka aweya fermanî û ya dem niha, [ **f** → **v** ]

**Lêker :**
**axaftin**, rader : **axaftin**, rayek : **axaft-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 178 : Anîn**
**anîn** ➝ **(bi** + **hîn** + **e)** ➝ **Bîne** } yekjimar
**anîn** ➝ **(bi** + **hîn** + **in)** ➝ **Bînin** } pirjimar
**-hîn-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha, **-hîn-**} **-h-**} dikeve

**Lêker :**
**anîn**, rader : **anîn**, rayek : **anî-**, paşgira raderîn : **-n**

**Nîşe : Di hin devokan de tên dîtin :**
**Weyne** ➝ **Bîne** } yekjimar
**Weynin** ➝ **Bînin** } pirjimar

**Mînak 179 : Êşîn**
**êşîn** ➝ **( bi** + **êş** + **e)** ➝ **Biêşe** } yekjimar
**êşîn** ➝ **(bi + êş + in)** ➝ **Biêşin** } pirjimar
**-êş-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :** **êşîn**, rader : **êşîn**, rayek : **êşî-**, paşgira raderîn : **-n**

**Mînak 180 : Avjenî kirin**
**avjenî kirin** ➝ (**avjenî** + **bi** + **k** + **e**) ➝ **Avjenî bike** } yekjimar
**avjenî kirin** ➝ (**avjenî** + **bi** + **k** + **in**) ➝ **Avjenî bikin** } pirjimar
**avjenîk-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**avjenî kirin**, rader : **avjenî kirin**, rayek : **avjenî kir-**, paşgira raderîn : **-in**

**Nîşe : Di zimanê gelêrî de tên dîtin :**
**Avjenî ke** ➝ **Avjenî bike** } yekjimar
**Avjenî kin** ➝ **Avjenî bikin** } pirjimar

## Neyîniya raweya fermaniyê :

**Qertafa neyînî ya fermaniyê ( me-) ye. Li şûna qertafa erêniyê ya raweya fermanî ( bi-)'yê bi kar tê û di kêşana her lêkerê de cih digire. Di hin kêşana lêkeran de mîna bikaranîna (bi-)'yê û navgir jî dibe.**

**Qertafên fermaniyê yekjimar û pirjimar ên kesandinê (-e, -in), çawa ku di awayê erênî ya fermaniyê de bi kar tên, di ya neyîniyê de jî wisa bi erk in.**

**Hin zimanzane û nivîskar, qertafa neyîniyê ya (ne-)'yê jî di aweyê fermaniyê de wekî qertafa (me-)'yê didin xebitandin û gelek jî karîger e.**

**Mînak 181 : Kirin**
**kirin** ➝ (**me** + **k** + **e**) ➝ **Meke** } yekjimar
**kirin** ➝ (**me** + **k** + **in**) ➝ **Mekin** } pirjimar

**Nîşe : Ji bo bikaranîna qertafa (ne-)'yê :**
**kirin** ➝ (**ne** + **k** + **e**) ➝ **Neke** } yekjimar
**kirin** ➝ (**ne** + **k** + **in**) ➝ **Nekin** } pirjimar

**Mînak 182 : Kirîn**
**kirîn** ➝ (**me** + **kir** + **e**) ➝ **Mekire** } yekjimar
**kirîn** ➝ (**me** + **kir** + **in**) ➝ **Mekirin** } pirjimar

**Mînak 183 : Ajotin**
**ajotin** ➝ (**me** + **ajo** + **e**) ➝ **Majo**(**meajo**) } yekjimar
**ajotin** ➝ (**me** + **ajo** + **in**) ➝ **Majo**(**meajon**) } pirjimar

**Mînak 184 : Birin**

**birin** → (**me** + **b** + **e**) → **Mebe** } yekjimar
**birin** → (**me** + **b** + **in**) → **Mebin** } pirjimar
**-b-**} rayeka rewaya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**birin**, rader : **birin**, rayek : **bir-**, paşgira raderîn : **-n**

**Mînak 185 : Bûn/bûyîn**
**bûn** → (**me** + **b** + **e**) → **Mebe** } yekjimar
**bûn** → (**me** + **b** + **in**) → **Mebin** } pirjimar
**-b-**} rayeka rewaya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**bûn**, rader : **bûn**, rayek : **bû-**, paşgira raderîn : **-n**

**Mînak 186/1 : Çûn(çûyîn)/herin**
**çûn** → (**me** + **ç** + **e**) → **Meçe** } yekjimar
**çûn** → (**me** + **ç** + **in**) → **Meçin** } pirjimar,

**Mînak 186/2 : Herin/çûn(çûyîn)**
**herin** → (**me** + **her** + **e**) → **M**ere } yekjimar
**herin** → (**me** + **her** + **in**) → **M**ere } pirjimar

**Nîşe : Herin :**
**Ev dirûv di gelek raweyan de bi kar nayê û li şûna wê, lêkera çûn'ê dikeve karîgeriyê.**

**Mînak 187 : Hildan**
**hildan** → (**hil** + **me** + **d** + **e**) → **Hilmede** } yekjimar
**hildan** → (**hil** + **me** + **d** + **in**) → **Hilmedin** } pirjimar
**hild-**} rayeka rewaya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**hildan**, rader : **hildan**, rayek : **hilda-**, paşgira raderîn : **-n**

**Mînak 188 : Nivîsîn**
**nivîsîn** → (**me** + **nivîs** + **e**) → **Menivîse** } yekjimar
**nivîsîn** → (**me** + **nivîs** + **in**) → **Menivîse**} pirjimar
**-nivîs-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**nivîsin**, rader : **nivîsin**, rayek : **nivîs-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 189 : Nivîsandin**

**nivîsandin** → (**me** + **nivîsîn** + **e**) → **Menivîsîne** } yekjimar
**nivîsandin** → (**me** + **nivîsîn** + **in**) → **Menivîsîne** } pirjimar
**-nivîsîn-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**nivîsandin**, rader : **nivîsandin**, rayek : **nivîsand-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 190 : Anîn**
**anîn** → (**me** + **hîn** + **e**) → **Mîne** } yekjimar
**anîn** → (**me** + **hîn** + **in**) → **Mînin** } pirjimar

**Nîşe : Di zimanê gelêrî de tên dîtin :**
**Meyne** → **Mîne** } yekjimar
**Meynin** → **Mînin** } pirjimar

**Mînak 191 : Xwendin(xwandin)**
**xwendin** → (**me** + **xwîn** + **e**) → **Mexwîne** } yekjimar
**xwendin** → (**me** + **xwîn** + **in**) → **Mexwînin** } pirjimar
**-xwîn-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**xwendin**, rader : **xwendin**, rayek : **xwend-**, paşgira raderîn : **-in**
**Lêker :**
**xwandin**, rader : **xwandin**, rayek : **xwand-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 192 : Vexwarin**
**vexwarin** → (**ve** + **me** + **xw** + **e**) → **Vemexwe** } yekjimar
**vexwarin** → (**ve** + **me** + **xw** + **in**) → **Vemexwin** } pirjimar
**vexw-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**vexwarin**, rader : **vexwarin**, rayek : **vexwar-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 193 : Xwastin(xwestin)**
**xwastin** → (**me** + **xwaz** + **e**) → **Mexwaze** } yekjimar
**xwestin** → (**me** + **xwez** + **in**) → **Mexwezin** } pirjimar
**-xwez-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha, [ **s** → **z** ]

**Lêker :**
**xwastin**, rader : **xwastin**, rayek : **xwast-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 194 : Xistin**
**xistin** → (**me** + **x** + **e**) → **Mexe** } yekjimar
**xistin** → (**me** + **x** + **in**) → **Mexin** } pirjimar

**-x-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**xistin**, rader : **xistin**, rayek : **xist-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 195 : Gerîn**
**gerîn** → (**me** + **ger** + **e**) → **Megere** } yekjimar
**gerîn** → (**me** + **ger** + **in**) → **Megerin** } pirjimar
**-ger-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**gerîn**, rader : **gerîn**, rayek : **gerî-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 196 : Girtin**
**girtin** → (**me** + **gir** + **e**) → **Megire** } yekjimar
**girtin** → (**me** + **gir** + **in**) → **Megirin** } pirjimar
**-gir-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**girtin**, rader : **girtin**, rayek : **girt-**, paşgira raderîn : **-in**

**Mînak 197 : Kelîn**
**kelîn** → (**me** + **kel** + **e**) → **Mekele** } yekjimar
**kelîn** → (**me** + **kel** + **in**) → **Mekelin** } pirjimar
**-kel-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Mînak 198 : Kelandin**
**kelandin** → (**me** + **kelîn** + **e**) → **Mekelîne** } yekjimar
**kelandin** → (**me** + **kelîn** + **in**) → **Mekelînin** } pirjimar
**-kelîn-**} rayeka raweya fermanî û ya dema niha

**Lêker :**
**kelandin,** rader : **kelandin,** rayek : **keland-,** paşgira raderîn : **-in**

**Jimar : 6**

**Mijar : Dema niha**

**Nasîn :**
**Çalakiyê dest pê kiriye, kar û xebatên ku dibin, didomin. Çalakiyên ku di demeke wiha de pêk tên re *dema niha* tê gotin.**

Ev hevok li gorî dema niha pêk hatine :
**Ez diçim û têm, gula xwe nabînim.**
**Ew diçe û tê, bêyî dildarê xwe dimîne.**

- **Çêkirina raweyê**

**a. Rayeka raweyê : Rayeka lêkerê ya dema niha tê dîtin.**

**b. Qertafa(pêşgir) dema niha(di-) :**
**Ev qertaf tê ber rayeka dema niha, lê di hin lêkerên nexwerû de wek navgirekê bi kar tê û di hinan de jî tevde dikeve.**

**c. Qertafên(paşgirên) kesandinê :**

**Yekjimar : (-im, -(y)î, -e)**
**Pirjimar : (-in, -in, -in)**

**Ev tên dawiya rayeka dema niha. Di hin lêkeran de yên ku rayekên wan ên dema niha bi dengdêrekê diqedin û bi vê sedemê ye ku hin guherînên biçûk di qertafên kesandinê de tên holê û hinek jî têkde dikevin.**

**ç. Ji bo awayê neyîniyê :**
**Bi qertafa neyîniyê ya (na-)'yê pêk tê. Ev qertaf cihê qertafa erêniyê(di-) ya dema niha digire û di hemû kêşana lêkeran de cihê xwe diparêze. Qertafa (na-) di çend kêşana lêkeran de bi dirûvê (ni-)'yê bi kar tê.**

**Di kêşana lêkeran de negerguhêzî û gerguhêzî :**

**Di kêşanê de lêker, bi hebûn û nebûna bireserê li du beşên bingehîn tên komkirin :**
**Lêkerên negerguhêz(têneper)**
**Lêkerên gerguhêz(têper)**

**Bo destnîşankirina lêkerên negerguhêz û yên gerguhêz rêbazek :**

**Negerguhêzî û gerguhêzî bi pirsên (çi, kî, kê) jî tên bidestxistin. Ger pirsa ku li pêveberê dibe, bêbersiv li ser kirdeyê bimîne, ew lêker negerguhêz e. Lê bersiv ji wê cuda be, ew lêker gerguhêz e.**
**Bi kurtasî lêkerên negerguhêz bireserê nagirin, lê yên gerguhêz digirin.**

**Lêkerên negerguhêz :**
**Ev di kêşanê de bireserê nagirin û li gorî kirdeyên xwerû tên kişandin. Dema kirde kar û barên xwe pêk tînin, çalakiyên wan xwe diavêjin ser tiştekî yan jî kesekî/ê.**

**Mînak 199 : Lêker : Çûn**
(**çû** + **n**), **çû-**} rayeka raderê, **-n** } paşgira raderîn
**çûn** } **ç-**} rayeka dema niha

**Ez diçim ber deriyê dibistanê.**
**- Tu diçî çi?**
**- Tu diçî kî?**
**- Tu diçî kê?**

**Ev pirs mîna yên jorîn bi sê awayan jî bê pirskirin, pirs, bêbersiv li ser kirdeyê(ez) dimîne. Bi vê sedemê ye ku lêkera "çûn"ê negerguhêz e.**

**Lêkerên gerguhêz :**
**Di kêşana lêkerên gerguhêz de bireser hene. Di dema niha, ya bê û raweya fermanî de li gorî kirdeyê; di demên borî û hin raweyên çîroki de li gorî bireserê tên kêşandin. Dema kirde kar û barên xwe pêk tînin, çalakiyên wan xwe diavêjin ser tiştekî yan jî kesekî/ê.**

**Mînak 200 : Lêker : Xwarin**
(**xwar** + i**n**), **xwar-**} rayeka raderê, -i**n** } paşgira raderîn
**xwarin** } **xw-**} rayeka dema niha

**Ez sêvekê dixwim.**
**- Tu çi dixwî?**
**- Ez sevekê dixwim.**

**Di hevoka jorîn de sêv bireser e. Ji ber ku çalakiya kirdeyê(ez) li ser sevekê pêk tê. Ango lêkera "xwarin"ê gerguhêz e.**

**Mînak 201: Lêker : Dîtin**
(**dît** + i**n**), **dît-**} rayeka raderê
**dîtin** } **bîn-**} rayeka dema niha

**Em keçekê dibînin.**
**- Hûn kê dibînin?**

**- Em keçekê dibînin.**

**Keç bireser e, çalakiya kirdeyê(em) li ser keçekê pêk tê. Ango lêkera "dîtin"ê gerguhêz e.**

**• Dema niha û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 202** : **Revîn**
(**revîn** + **n**), **revî-**} rayeka raderê
**revîn** } **-rev-**} rayeka dema niha

**Awayê erênî :**
**Ez direvim/Tu direvî/Ew direve**
**Em direvin/Hûn direvin/Ew direvin**

**Awayê neyînî :**
**Ez narevim/Tu narevî/Ew nareve**
**Em narevin/Hûn narevin/Ew narevin**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 203 : Parastin**
(**parast** + **in**), **parast-**} rayeka raderê
**parastin** } **parêz-** } rayeka dema niha

**Awayê erênî :**
**Ez diparêzim/Tu diparêzî/Ew diparêze**
**Em diparêzin/Hûn diparêzin/Ew diparêzin**

**Awayên neyînî :**
**Ez naparêzim/Tu naparêzî/Ew naparêze**
**Em naparêzin/Hûn naparêzin/Ew naparêzin**

**• Dema niha û hin kêşanên taybet :**

**★ Ji lêkerên ku di awayê neyîniyê de qertafa (ni-)'yê digirin :**

**Mînak 204 : Zanîn** lêkereke gerguhêz e.
(**zanî** + **n**), **zanî-**} rayeka raderê
**zanîn** } **zan-**} rayeka dema niha

**Awayê erênî :**

**Em dizanin/Hûn dizanin/Ew dizanin**
**Ez dizanim/Tu dizanî/Ew dizane**

**Awayê neyînî :**
**Ez nizanim/Tu nizanî/Ew nizane**
**Em nizanin/Hûn nizanin/Ew nizanin**

**Nîşe :**
**Lêker : "karîn" û "kanîn" jî li gorî vê formê tên kêşandin.**

★ **Di kêşana hin lêker û qertafan(pêşgir û paşgiran) de hin guherînên girîng tên holê :**

**Mînak 205/1 : Bi forma nûjen : Lêker : Hatin**
(**hat** + **in**), **hat-**} rayeka raderê
**hatin** } **hê-**} rayeka dema niha

**Awayê erênî :**
**Ez têm/Tu têyî/Ew tê**
**Em tên/Hûn tên/Ew tên**

**Awayên neyînî :**
**Ez nayêm/Tu nayî/Ew nayê**
**Em nayên/Hûn nayên/Ew nayên**

**Mînak 205/2 : Bi forma kevn : Lêker : Hatin**
(**hat** + **in**), **hat-**} rayeka raderê
**hatin** } **hê-**} rayeka dema niha

**Awayê erênî :**
**Ez dihêm/Tu dihêyî/Ew dihê**
**Em dihên/Hûn dihên/Ew dihên**

**Awayên neyînî :**
**Ez nahêm/Tu nahêyî/Ew nahê**
**Em nahên/Hûn nahên/Ew nahên**

**Mînak 206/1 : Bi forma nûjen : Lêker : Anîn/hanîn**
(**anî** + **n**), **anî-**} rayeka raderê
**anîn** } **hîn-**} rayeka dema niha

**Awayê erênî :**
**Ez tînim/Tu tînî/Ew tîne**
**Em tînin/Hûn tînin/Ew tînin**

**Awayê neyînî :**
**Ez nayînim/Tu nayînî/Ew nayîne**
**Em nayînin/Hûn nayînin/Ew nayînin**

**Mînak 206/2 : Bi forma kevn : Lêker : Hanîn/anîn**
(**hanî** + **n**), **hanî-**} rayeka raderê
**hanîn** } **han-**} rayeka dema niha

**Awayê erênî :**
**Ez dihanim/Tu dihanî/Ew dihane**
**Em dihanin/Hûn dihanin/Ew dihanin**

**Awayê neyînî :**
**Ez nahanim/Tu nahanî/Ew nahane**
**Em nahanin/Hûn nahanin/Ew nahanin**

★ **Di kêşana lêkerên hevedudanî yan pêkhatî de qertafa erêniyê(di-) û ya neyîniyê(na-) wek navgirekê bi kar tên :**

**Mînak 207 : Vexwendin**
(**vexwend** + **in**), **vexwend-**} rayeka raderê
**vexwendin** } **ve** + **xwîn-**} rayeka dema niha

**Awayê erênî :**
**Ez vedixwînim/Tu vedixwînî/Ew vedixwîne**
**Em vedixwînin/Hûn vedixwînin/Ew vedixwînin**

**Awayên neyînî :**
**Ez venaxwînim/Tu venaxwînî/Ew venaxwîne**
**Em venaxwînin/Hûn venaxwînin/Ew venaxwînin**

- **Bikaranîna dema niha**

**Mînak 208/1 :Di wateya demeke bê ya nêzik de :**
**A niha ez radibim, têm cem te.**

**Mînak 208/2 : Di wateya demeke tê de :**
**Tu dibînî ku ez dixebitim.**

**Mînak 208/3 : Di wateya demeke fireh de :**
**Her ku baran dibare, ew jin jî pê re digîre.**

**Mînak 208/4 : Li hin deveran di wateya demeke domdar de :**
**Ez her sal li wî bajarî dixebitime.**

**Jimar : 7**

**Mijar : Dema boriya têdeyî**

**Nasîn :**
**Çalakî qediyaye, mirov rewşa wê dizane, bi çavên xwe dîtiye yan jî jiyaye. Çalakiyên ku wisa pêk tên, yên *dema boriya têdeyî* ne.**

Ev hevok li gorî dema boriya têdeyî pêk hatine :
**Dîlan rabû ser piyan û ket, ber xwe da, ji nû ve rabû.**
**Wê pênûsek ji berika xwe derxist û da min.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Rayeka raweyê :**
**Eger paşgira raderîn ji lêkerê bê avêtin, parçeyê ku dimîne, rayeka dema borî ye û ew bo raweya dema boriya têdeyî jî rayek tê hilbijartin.**

**b. Paşgirên kesandinê :**

**Bo lêkerên negerguhêz :**

**Yekjimar : (-im, -î, -)**
**Pirjimar : (-in, -in, -in)**

**Ev paşgir tên dawiya rayeka raweyê. Di hin lêkeran de yên ku rayekên wan ên dema borî bi dengdêrekê diqedin, hin guherîn di paşgirên wan ên kesandinê de têne holê û hinek jî pêkde dikevin.**

**Bo lêkerên gerguhêz : Ev li gorî bireserê û mêjera wê tên kişandin.**

**c. Awayê neyîniyê :**
**Qertafa neyîniyê ya (ne-) tê ber rayeka lêkerê. Pêşgir û navgir, di hemû kêşana lêkeran de cihên xwe diparêze.**

**Hinek nivîskar di kêşana çend lêkeran(karîn/kanîn, zanîn) de li şûna qertafa neyîniyê ya(ne-)'yê, ya (ni-)'yê jî bi erk dikin.**

**• Dema boriya têdeyî û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 209** : **Çûn**
(**çû** + **n**), **çû-**} rayeka raderê ji bo raweya dema boriya têdeyî jî rayek e.

**-n** } paşgira raderîn

**Awayê erênî :**
**Ez çûm/Tu çûyî/Ew çû**
**Em çûn/Hûn çûn/Ew çûn**

**Awayê neyînî :**
**Ez neçûm/Tu neçûyî/Ew neçû**
**Em neçûn/Hûn neçûn/Ew neçûn**

**Mînak 210** : **Kuxîn**
(**kuxî** +**n**), **kuxî-**} rayeka raderê û ya dema boriya têdeyî,
**-n** } paşgira raderîn

**Awayê erênî :**
**Ez kuxîm/Tu kuxî/Ew kuxî**
**Em kuxîn/Hûn kuxîn/Ew kuxîn**

**Awayê neyînî :**
**Ez nekuxîm/Tu nekuxî/Ew nekuxî**
**Em nekuxîn/Hûn nekuxîn/Ew nekuxîn**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 211** : **Dîtin**
(**dît** + **in**), **dît-**} rayeka raderê û ya dema boriya têdeyî,
-**in** } paşgira raderîn

**Awayê erênî :**
**Min dît/Te dît/Wî(wê) dît**
**Me dît/We dît/Wan dît**

**Awayê neyînî :**
**Min nedît/Te nedît/Wî(wê) nedît**
**Me nedît/We nedît/Wan nedît**

★ **Ji lêkerên gerguhêz, li vir bireser cînavkên kesane yên xwerû ne : Lêker li gorî cînavkên ku di erkên bireserî de tên kêşandin. Wek tê zanîn, ev awayê kêşanê bi *forma ergatîviyê* tê nasandin.**

**Mînak 212 : Di forma ergatîviyê de :**
**Lêker : Dîtin**
(**dît** + **in**), **dît-**} rayeka dema boriya têdeyî, -**in** } paşgira raderîn

✔ **Bireser : ez**

**Awayê erênî :**
**Te ez dîtim/Wî(wê) ez dîtim**
**We ez dîtim/Wan ez dîtim**

**Awayê neyînî :**
**Te ez nedîtim/Wî(wê) ez nedîtim**
**We ez nedîtim/Wan ez nedîtim**

✔ **Bireser : tu**

**Awayê erênî :**
**Min tu dîtî/Wî(wê) tu dîtî**
**Me tu dîtî/Wan tu dîtî**

**Awayê neyînî :**
**Min tu nedîtî/Wî(wê) tu nedîtî**
**Me tu nedîtî/Wan tu nedîtî**

✔ **Bireser : ew**

**Awayê erênî :**
**Min ew dît/Te ew dît/Wî(wê) ew dît**
**Me ew dît/Wan ew dît**

**Awayê neyînî :**
**Min ew nedît/Te ew nedît/Wî(wê) ew nedît**
**Me ew nedît/Wan ew nedît**

✔ **Bireser : em**

**Awayê erênî :**
**Te em dîtin/Wî(wê) em dîtin**
**We em dîtin/Wan em dîtin**

**Awayê neyînî**
**Te em nedîtin/Wî(wê) em nedîtin**
**We em nedîtin/Wan em nedîtin**

✔ **Bireser : hûn**

**Awayê erênî :**

**Min hûn dîtin/Wî(wê) hûn dîtin**
**Me hûn dîtin/Wan hûn dîtin**

**Awayê neyînî :**
**Min hûn nedîtin/Wî(wê) hûn nedîtin**
**Me hûn nedîtin/Wan hûn nedîtin**

★ **Ji lêkerên hevedudanî û gerguhêz :**

**Mînak 213 : Xwe pê xistin**
**(xwe + pê + xist + in)**, **xwe + pê**} ev pêşgirên raderê ne.
**xwe pê xist-**} rayeka dema boriya têdeyî, **-in**} paşgira raderîn

**Awayê erênî :**
**Min xwe pê xist/Te xwe pê xist/Wî(wê) xwe pê xist**
**Me xwe pê xist/We xwe pê xist/Wan xwe pê xist**

**Awayê neyînî :**
**Min xwe pê nexist/Te xwe pê nexist/Wî(wê) xwe pê nexist**
**Me xwe pê nexist/We xwe pê nexist/Wan xwe pê nexist**

**Jimar : 8**

**Mijar : Çîrokiya dema boriya têdeyî**

**Nasîn :**
**Ev li ser bingeha dema boriya têdeyî, lê ji aliyê rawe û demê ve ji wê cudatir û di demeke bihurî de çalakiyên ku bi raweyeke hevedudanî û bi awayê çîrokî tîne ziman.**

Ev hevok li gorî çîrokiya dema boriya têdeyî pêk hatine :
**Xezala te şandî, çi gotibû ku ez bi lez vegeriyabûm.**
**Belê, ez dîsa hatibûm, li ber deriyê we rawestibûm.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Rayeka raweyê :**

**Bo rayeka bingehîn : Rayeka lêkerê ya raweya dema boriya têdeyî, ji bo çîrokiya dema boriya têdeyî jî karîger e. Eger ew rayek bi dengdarekê dawî bibe, (-i-)'yê digire û piştî vê tîpê jî rayeka lêkera alîkar tê.**

**Bo rayeka alîkar : Rayeka dema borî ya lêkera bûn'ê ye : (-bû-)**

**b. Paşgirên kesandinê :**

**Bo lêkerên negerguhêz :**

**Yekjimar : (-im, -(y)î, -)**
**Pirjimar : (-in, -in, -in)**

**Bo lêkerên gerguhêz : Ev li gorî bireserê û mêjera wê tên kişandin.**

**c. Awayê neyîniyê :**
**Qertafa neyîniyê ya (ne-) tê ber rayeka lêkerê ya bingehîn. Pêşgir û navgir di hemû kêşana lêkeran de cihên xwe digire.**

***Hemû rayek û qertaf(paşgir, pêşgir, navgir) bi hev ve tên nivîsandin.***

**• Çîrokiya dema boriya têdeyî û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**
**Hevrûkirin, bo dema boriya têdeyî û çîrokiya dema boriya têdeyî :**

**Mînak 214 : Lêkera bingehîn : Ketin**

(**ket** + **in**), **ket-**} rayeka raderê ji bo her du raweyan jî rayek e.
**-in** } paşgira raderîn

**Lêkera alîkar : Bûn**
(**bû** + **n**), **bû-**} rayeka raderê ji bo raweya çîrokiya dema boriya têdeyî alîkar e. **-n** } paşgira raderîn

**a. Dema boriya têdeyî**

**Awayê erênî :**
**Ez ketim/Tu ketî/Ew ket**
**Em ketin/Hûn ketin/Ew ketin**

**Awayê neyînî :**
**Ez neketim/Tu neketî/Ew neket**
**Em neketin/Hûn neketin/Ew neketin**

**b. Çîrokiya dema boriya têdeyî**

**Awayê erênî :**
**Ez ketibûm/Tu ketibûyî/Ew ketibû**
**Em ketibûn/Hûn ketibûn/Ew ketibûn**

**Awayê neyînî :**
**Ez neketibûm/Tu neketibûyî/Ew neketibû**
**Em neketibûn/Hûn neketibûn/Ew neketibûn**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**
**Hevrûkirin, bo dema boriya têdeyî û çîrokiya dema boriya têdeyî :**

Mînak 215 : **Lêkera bingehîn : Ristin**
(**rist** + **in**), **rist-**} rayeka raderê ji bo her du raweyan jî rayek e.
**-in** } paşgira raderîn

**Lêkera alîkar : Bûn**
(**bû** + **n**), **bû-**} rayeka raderê ji bo raweya çîrokiya dema boriya têdeyî alîkar e. **-n** } paşgira raderîn, bireser yekjimar e.

**a. Dema boriya têdeyî**

**Awayê erênî :**
**Min rist/Te rist/Wî(wê) rist**
**Me rist/We rist/Wan rist**

**Awayê neyînî :**
**Min nerist/Te nerist/Wî(wê) nerist**
**Me nerist/We nerist/Wan nerist**

**b. Çîrokiya dema boriya têdeyî**

**Awayê erênî :**
**Min ristibû/Te ristibû/Wî(wê) ristibû**
**Me ristibû/We ristibû/Wan ristibû**

**Awayê neyînî :**
**Min neristibû/Te neristibû/Wî(wê) neristibû**
**Me neristibû/We neristibû/Wan neristibû**

★ **Ji lêkerên gerguhêz kêşanek :**
**Hevrûkirin, bo dema boriya têdeyî û çîrokiya dema boriya têdeyî.**
**Di kêşana jêrîn de bireser yekjimar û pirjimar in :**

Mînak 216 : **Lêkera bingehîn : Vekirin**
(**ve** + **kir** + **in**), **vekir-**} rayeka raderê ji bo her du raweyan jî rayek e.
**-in** } paşgira raderîn

**Lêkera alîkar : Bûn**
(**bû** + **n**), **bû-**} rayeka raderê ji bo raweya çîrokiya dema boriya têdeyî alîkar e. **-n** } paşgira raderîn

**a. Dema boriya têdeyî**

**Awayê erênî :**
**Min deriyek vekir/Te du derî vekirin/**
**Wî(wê) deriyê sor vekir**

**Me derînin vekirin/We deriyek vekir/**
**Wan çar derî vekirin**

**Awayê neyînî :**
**Min deriyek venekir/Te du derî venekirin/**
**Wî(wê) deriyê sor venekir**

**Me derînin venekirin/We deriyek venekir/**
**Wan çar derî venekirin**

**b. Çîrokiya dema boriya têdeyî**

**Awayê erênî :**
**Min deriyek vekiribû/Te du derî vekiribûn/**
**Wî(wê) deriyê sor vekiribû**

**Me derînin vekiribûn/We deriyek vekiribû/**
**Wan çar derî vekiribûn**

**Awayê neyînî :**
**Min deriyek venekiribû/Te du derî venekiribûn/**
**Wî(wê) deriyê sor venekiribû**

**Me derînin venekiribûn/We deriyek venekiribû/**
**Wan çar derî venekiribûn**

**Jimar : 9**

**Mijar : Dema boriya dûdar**

**Nasîn :**
**Çalakî di demeke nediyar a borî de diqewime. Pêkhatina wan tên zanîn û bandora wan li ser dema ku mirov tê de ye.**

Ev hevok li gorî dema boriya dûdar pêk hatine :
**Dîlanê ji wî re çi gotiye ku ew li me xeyîdiye.**
**Wê rojê nehatiye û peyameke nivîskî şandiye.**

- **Çêkirina raweyê**

**a. Rayeka raweyê :**
**Eger paşgira raderîn ji lêkerê bê avêtin, parçeyê ku dimîne, rayeka dema borî ye û ew ji bo raweya dema boriya dûdar jî rayek e.**

**b. Qertafa raweyê (-e) : Ev li piştî paşgirên kesandinê cih digire.**

**Bo lêkerên negerguhêz :**

**Yekjimar : (-ime, -iye, -iye)**
**Pirjimar : (-ine, -ine, -ine)**

**Ev paşgir tên dawiya rayeka raweyê. Di hin lêkeran de yên rayekên wan ên ku dema boriya dûdar bi dengdêrekê diqedin, hin guherîn di paşgirên kesandinê de têne holê û hin tîpên wan jî dikevin.**

**Bo lêkerên gerguhêz : Ev li gorî bireserê tên kişandin.**

**Bireser yekjimar e : (-iye, -iye, -iye)**
**Bireser pirjimar e : (-ine, -ine, -ine)**

**c. Awayê neyîniyê :**
**Qertafa neyîniyê ya (ne-) tê ber rayeka lêkerê. Pêşgir yan navgir di hemû kêşana lêkeran de cihên xwe digire.**

***Rayek û qertaf(paşgir, pêşgir, navgir) bi hev ve tên nivîsandin.***

- **Dema boriya dûdar û kêşana lêkeran**

♦ **Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 217** : **Ketin**
(**ket** + **in**), **ket-**} rayeka dema boriya dûdar, **-in** } paşgira raderîn

**Awayê erênî :**
**Ez ketime/Tu ketiye/Ew ketiye**
**Em ketine/Hûn ketine/Ew ketine**

**Awayê neyînî :**
**Ez neketime/Tu neketiye/Ew neketiye**
**Em neketine/Hûn neketine/Ew neketine**

★ **Ji lêkerên negerguhêz : Ji yên ku raderên wan bi paşgira (-an)'ê diqedin :**

**Mînak 218 : Meşiyan**
(**meşiya** + **n**), **meşiya-**} rayeka dema boriya dûdar, **-n**} paşgira raderîn

**Awayê erênî :**
**Ez meşiyame/Tu meşiyaye/Ew meşiyaye**
**Em meşiyane/Hûn meşiyane/Ew meşiyane**

**Awayê neyînî :**
**Ez nemeşiyame/Tu nemeşiyaye/Ew nemeşiyaye**
**Em nemeşiyane/Hûn nemeşiyane/Ew nemeşiyane**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**
**Bireser : Tiştê tê dirûn yekjimar e.**

**Mînak 219 : Dirûn**
(**dirû** + **n**), **dirû-**} rayeka dema boriya dûdar, **-n** } paşgira raderîn

**Awayê erênî :**
**Min dirûye/Te dirûye/Wî(wê) dirûye**
**Me dirûye/We dirûye/Wan dirûye**

**Awayê neyînî :**
**Min nedirûye/Te nedirûye/Wî(wê) nedirûye**
**Me nedirûye/We nedirûye/Wan nedirûye**

**Jimar : 10**

**Mijar : Çîrokiya dema boriya dûdar**

**Nasîn :**
**Ev demeke hevedudanî ye û li ser bingeha dema boriya dûdar pêk tê. Çalakiyên wê ne diyar in. Mirov wan dibihîze yan jî bêhay karekî dike û piştî demeke borî, bi awayekî jibîrkirî tîne ziman.**

Ev hevok li gorî çîrokiya dema boriya dûdar in :
**Dîlanê ji wî re nameyeke xweşik nivîsandibûye.**
**Lê ew bi dest wê neketibûye, hatibûye çirandin.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Rayeka raweyê :**

**Rayeka bingehîn :**
**Rayeka lêkerê ya dema boriya dûdar ji bo çîrokiya dema boriya dûdar jî bi kar tê. Eger ew rayek bi dengdarekê dawî bibe, (-i-)'yê digire û piştî vê tîpê jî rayeka lêkera alîkar tê.**

**Rayeka alîkar : Rayeka lêkera "bûn"ê ya dema borî ye.**

**b. Qertafa raweyê(-e)  : Ev li piştî paşgirên kesandinê cih digire.**

**c. Paşgirên(**yên kesandinê û ya raweyê) **raweyê :**
**Ev paşgir tên dawiya rayeka hevedudanî ya raweyê :**

**Yekjimar : (-me, -ye, -ye)**
**Pirjimar : (-ne, -ne, -ne)**

**ç. Bo kêşanê : Lêkerên negerguhêz li gorî kirdeyê û yên gerguhêz li gorî bireserê tên kêşandin.**

**d. Awayê neyîniyê :**
**Qertafa neyîniyê ya (ne-) : Pêşgir û navgir di hemû kêşana lêkeran de cihên xwe digire.**

***Hemû rayek û qertaf(paşgir, pêşgir, navgir) bi hev ve tên nivîsandin.***

**• Çîrokiya dema boriya dûdar û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 220 : Lêkera bingehîn : Çûn**
**(çû + n)**, **çû-**} rayeka çîrokiya dema boriya dûdar, **-n** } paşgira raderîn

**Lêkera alîkar : Bûn**
**(bû + n), bû-**} rayeka alîkar, **-n** } paşgira raderîn

**Awayê erênî :**
**Ez çûbûme/Tu çûbûye/Ew çûbûye**
**Em çûbûne/Hûn çûbûne/Ew çûbûne**

**Awayê neyînî :**
**Ez neçûbûme/Tu neçûbûye/Ew neçûbûye**
**Em neçûbûne/Hûn neçûbûne/Ew neçûbûne**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 221** : **Lêkera bingehîn : Ristin**
(**rist** + **in**), **rist-**} rayeka çîrokiya dema boriya dûdar, **-in** } paşgira raderîn

**Lêkera alîkar : Bûn**
**(bû + n), bû-**} rayeka alîkar, **-in** } paşgira raderîn

**Awayê erenî :**
**Min ristibûye/Te ristibûye/Wî(wê) ristibûye**
**Me ristibûne/We ristibûne/Wan ristibûne**

**Awayê neyînî :**
**Min neristibûye/Te neristibûye/Wî(wê) neristibûye**
**Me neristibûne/We neristibûne/Wan neristibûne**

**Jimar : 11**

**Mijar : Dema boriya berdest**

**Nasîn :**
**Çalakî di demeke bihurî de bi awayekî berdewam pêk tê. Ji dema boriya berdest re çîroka dema niha jî tê gotin.**

Ev hevok li gorî dema boriya berdest pêk hatine :
**Gava ku ew dihat, ez ji darê de dadiketim.**
**Wî ji min re digot ku tu li wir radiketî.**

- **Çêkirina raweyê**

**a. Rayeka raweyê : Rayeka lêkerê ya dema borî ji bo wê jî karîger e.**

**b. Qertafa raweyê (di-) : Di hemû lêkaran de pêşgir an navgir cih digire û eger bi serê xwe be, erêniya raweya pêk tîne.**

**c. Kêşana lêkerê :**

**Bo lêkerên negerguhêz :**
**Paşgirên kesandinê tên dawiya rayeka lêkerê ya dema borî. Eger rayêka lêkerê ya dema borî bi dengdêrekê biqede, di kêşanan de hin guherîn di paşgirên kesandinê de tên holê.**

**Yekjimar : (-im, -î, -)**
**Pirjimar : (-in, -in, -in)**

**Bo lêkerên gerguhêz : Li gorî bireserê û mêjara wê tên kêşandin.**

**ç. Awayê neyîniyê : Qertafa neyîniyê(ne-) tê ber qertafa awayê erêniyê (di-) û qertafên kesandinê wekî berê di cihên xwe de dimînin.**

***Di hemû kêşanan de rayek û qertaf(pêşgir, navgir, paşgir) bi hev ve tên nivîsandin.***

- **Dema boriya berdest û kêşana lêkeran**

♦ **Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 222 : Ketin**
(**ket** + **in**), **ket-**} rayeka dema boriya berdest, **-in**} paşgira raderîn

**Awayê erênî :**
**Ez diketim/Tu diketî/Ew diket**
**Em diketin/Hûn diketin/Ew diketin**

**Awayê neyînî :**
**Ez nediketim/Tu nediketî/Ew nediket**
**Em nediketin/Hûn nediketin/Ew nediketin**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 223** : **Ristin**
(**rist** + **in**), **rist-**} rayeka dema boriya berdest, **-in**} paşgira raderîn

**Awayê erênî :**
**Min dirist/Te dirist/Wî(wê) dirist**
**Me dirist/We dirist/Wan dirist**

**Awayê neyînî :**
**Min nedirist/Te nedirist/Wî(wê) nedirist**
**Me nedirist/We nedirist/Wan nedirist**

★ **Ji lêkerên gerguhêz :**
**Kirde cînavkên tewandî ne û bireser cînavkên xwerû ne :**

**Mînak 224 : Kişandin**
(**kişand** + **in**), **kişand-**} rayeka dema boriya berdest, **-in**} paşgira raderîn

**Awayê erênî :**
**Min tu dikişandî/Te ez dikişandim/**
**Wî(wê) hûn dikişandin**

**Me ew dikişandin/We ez dikişandim/**
**Wan em dikişandin**

**Awayê neyînî :**
**Min tu nedikişandî/Te ez nedikişandim/**
**Wî(wê) hûn nedikişandin**

**Me ew nedikişandin/We ez nedikişandim/**
**Wan em nedikişandin**

**Jimar : 12**

**Mijar : Dema bê**

**Nasîn :**
**Çalakiyê dest pê nekiriye, lê di demeke ne dûr an jî pêşerojê de dê biqewime. Ji aliyê dem û raweyê ve çalakiyên ku wisa tên holê yên *dema bê* ne.**

Ev hevok li gorî raweya dema bê pêk hatine :
**Ez ê biçim parka mezin.**
**Du kes jî bo karekî dê li kargehê bimînin.**
**Em ê sibehê biçin seyranê, lê ew ê bo karekî girîng li kargehê bixebite.**

- **Çêkirina raweyê**

**a. Qertafên dema bê(ê, dê) :**
**Ev qertaf cuda tên nivîsandin, bi piranî ji kirdeyê şûn de cih digirin.**

**Heke kirde bi dengdêrekê dawî bibe, tîpa kelijandinê (y) tê pêşiyê (ê)'yê û ev her du tîp bi hev ve tên nivîsandin.**

**Hin zimanzane di hevokên ku bi kirdeyên cînavkên kesane de, (ê)'yê mîna pêşgirekê bi cînavkên kirdeyî ve dinivîsînin.**

**Hin zimanzane qertafa (wê)'yê jî dixin nav ên dema bê(ê, dê, wê) û ew jî weke qertafa dema bê ya (dê)'yê, her tim cuda tê nivîsandin. Qertafa (wê) wekî yên din ne karîger e û wekî wan cih nagire.**

**b. Pêşgira dema bê(bi-) :**
**Di cihê pêşgira dema niha (di-) de bi kar tê. Pêşgira dema bê jî mîna qertafa fermaniyê di hin lêkeran(hevedudanî/pêkhatî) de bi kar nayê.**

**c. Rayeka dema bê : Rayeka dema niha ji bo dema bê jî rayek e.**

**ç. Paşgirên kesandinê tên dawiya lêkerê û bi hev ve tên nivîsandin :**

**Yekjimar : (-im, -(y)î, -e)**
**Pirjimar : (-in, -in, -in)**

**d. Awayê neyîniyê :**
**Bo dema bê qertafa neyîniyê (ne) cihê qertafa awayê erênî (bi-)'yê digire, di hin kêşana lêkerên hevedudanî/pêkhatî de weke navgirekê jî bi kar tê.**

**Mînak 225/1 : Bo destpêka mijarê :**

**Lêker : Çûn ➝ ç-**} ev ji bo sê raweyan jî rayek e :
**ç-**} ya raweya fermanî ➝ **Biçe!**
**ç-**} ya raweya dema niha ➝ **Ez diçim.**
**ç-**} ya **dema bê** ➝ **Ez ê biçim.**

**Mînak 225/2** : **Bo destpêka mijarê :**

**Lêker : Kirîn ➝ kir-**} ev ji bo sê raweyan jî rayek e :
**kir-**} ya raweya fermanî ➝ **Bikire!**
**kir-**} ya dema dema niha ➝ **Ez dikirim.**
**kir-**} ya **dema bê** ➝ **Ez ê bikirim(ez dê bikirim).**

**kir-**} ya **dema bê** ➝ **Ew, hûn û em wê hemû sêvan bikirin.**

**• Dema bê û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 226 : Bezîn ➝ bez-**} rayeka dema bê

**Awayê erênî :**
**Ez ê bibezim/Tu yê bibezî/Ew ê bibeze**
**Em ê bibezin/Hûn ê bibezin/Ew ê bibezin**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê nebezim/Tu yê nebezî/Ew ê nebeze**
**Em ê nebezin/Hûn ê nebezin/Ew ê nebezin**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 227 : Kirin ➝ k-**} rayeka dema bê

**Awayê erênî :**
**Ez ê bikim/Tu yê bikî/Ew ê bike**
**Em ê bikin/Hûn ê bikin/Ew ê bikin**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê nekim/Tu yê nekî/Ew ê neke**
**Em ê nekin/Hûn ê nekin/Ew ê nekin**

**★ Ji lêkerên gerguhêz û pêkhatî :**

**Mînak 228 : Vexwarin**
**(vexwar + in), vexwar-**} rayeka dema borî
**vexwarin → vexw-**} rayeka dema bê

**Awayê erênî :**
**Ez ê vexwim/Tu yê vexwî/Ew ê vexwe**
**Em ê vexwin/Hûn ê vexwin/Ew ê vexwin**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê venexwim/Tu yê venexwî/Ew ê venexwe**
**Em ê venexwin/Hûn ê venexwin/Ew ê venexwin**

**Nîşe : Lêker : Vexwarin**
**Di erêniya dema bê de qertafa kêşanê (bi-) nayê bikaranîn.**

**Nîşe : Di zimanê gelêrî de tên dîtin :**
**Mînak :**
**Tê venexwî →Tê**(**Tu** + (y)**ê**), **-u** } dikeve
**Ew ê venexwe → Wê venexwe → Wê(Ew + ê), E-**} dikeve

★ **Ji lêkerên gerguhêz û hevedudanî :**

**Mînak 229 : Çêkirin**
**çêkirin(çê + kir + in), çêkir-}** rayeka dema borî
**çêkirin → çêk**(**çê** + **k-**), **çêk-**} rayeka dema bê

**Awayê erênî :**
**Ez ê çêkim/Tu yê çêkî/Ew ê çêke**
**Em ê çêkin/Hûn ê çêkin/Ew ê çêkin**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê çênekim/Tu yê çênekî/Ew ê çêneke**
**Em ê çênekin/Hûn ê çênekin/Ew ê çênekin**

**Nîşe :**
**Di erêniya dema bê ya lêkera çêkirin'ê de qertafa (bi-)'yê, bi kar nayê.**
**Mînak :**
**Ez ê dersa xwe çêkim(çêbikim).**

**Jimar : 13**

**Mijar : Çîrokiya dema bê**

**Nasîn :**
**Çalakiyên çîrokiyên dema bê, di demên borî de bi awayên ji hevdu cuda bi dema bê ve têne girêdan.**

**Çîrokiyên dema bê, em dikarin bi sê raweyan beş bikin. Ji ber ku bi navê "çîrokiya dema bê" sê raweyên ji hevdu cuda hene :**

**Çîrokiya dema bê**
**Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema borî**
**Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema boriya dûr**

**I. Çîrokiya dema bê :**
**Di raweyê wê de çalakiyên ku bên pêkanîn sereke xuya dikin.**

**Ev hevok li gorî çîrokiya dema bê'yê pêk hatine :**
**Hûn ê di meha borî de biçûna bajêr.**
**We yê cil û berg jî bikirana.**

- **Çêkirina raweyê**

**a. Rayeka raweyê :**
**Rayeka lêkerê ya dema borî ji bo vê raweyê jî rayek e.**

**b. Qertafên çîrokiya dema bê(ê, dê) :**
**Di *raweya dema bê* de çawa tên bikaranîn, di vê raweyê de jî wisan in. Hin zimanzane, qertafa (wê)'yê jî dixin nava yên dema bê(ê, dê, wê)'yê.**

**c. Pêşgira raweyê(bi-) :**
**Bi gelemperî ev pêşgir tê ber rayeka raweyê, di hin lêkerên hevedudanî yan pêkhatî de weke navgirekê cih digire. Lê di hin lêkeran de hîç nayê bikaranîn.**

**ç. Li gorî kesan paşgirên raweyê :**

**Bo lêkerên negerguhêz : (-ama, -ayî, -ya ; -ana, -ana, -ana)**

**Bo lêkerên gerguhêz :**
**Bo yekjimariya bireserê : (-a, -a, -a ; -a, -a, -a)**
**Bo pirjimariya bireserê : (-ana, -ana, -ana ; -ana, -ana, -ana)**

**d. Awayê neyîniyê : Qertafa neyîniyê(ne-), wekî ya di *dema bê* de bi kar tê.**

**• Çîrokiya dema bê û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 230 : Ketin**
**(ket + in), ket-**} bo raweyê rayek e. **-in** } paşgira raderîn

**Awayê erênî :**
**Ez ê biketama/Tu yê biketayî/Ew ê biketa**
**Em ê biketana/Hûn ê biketana/Ew ê biketana**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê neketama/Tu yê neketayî/Ew ê neketa**
**Em ê neketana/Hûn ê neketana/Ew ê neketana**

**Nîşe : Ji bo qertafa dema bê ya (wê)'yê :**
**Mînak :**
**Awayê erenî : Mem, Alan û Rojînê wê biketana.**
**Awayê neyînî : Mem, Alan û Rojînê wê neketana.**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 231 : Bireser yekjimar e.**
**Xwandin(xwand + in), xwand-**} bo raweyê rayek e.

**Awayê erênî :**
**Min ê bixwanda/Te yê bixwanda/Wî(wê) yê bixwanda**
**Me yê bixwanda/We yê bixwanda/Wan ê bixwanda**

**Awayê neyînî :**
**Min ê nexwanda/Te yê nexwanda/Wî(wê) yê nexwanda**
**Me yê nexwanda/We yê nexwanda/Wan ê nexwanda**

**Nîşe : Ji bo qertafa dema bê ya (wê)'yê :**
**Mînak :**
**Awayê erênî : Mem, Alan û Rojînê wê bixwanda.**
**Awayê neyînî : Mem, Alan û Rojînê wê nexwanda.**

**Mînak 232 : Bireser pirjimar e : sê pirtûk in.**
**xwandin(xwand + in), xwand-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Min ê ew bixwandana/Te yê ew bixwandana**

**Wî(wê) yê ew bixwandana**

**Me yê ew bixwandana/We yê ew bixwandana**
**Wan ê ew bixwandana**

**Awayê neyînî :**
**Min ê ew nexwandana/Te yê ew nexwandana**
**Wî(wê) yê ew nexwandana**

**Me yê ew nexwandana/We yê ew nexwandana**
**Wan ê ew nexwandana**

## II. Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema borî

**Ev rawe hevedudanî ye û çîrokiya dema bê ya ku li daxwaza dema borî ye. Di vê raweyê de çalakî yan jî sêwirandin ji aliyê kirdeyê ve bi awayên guman têne ziman.**

Ev hevok li gorî çîrokiya dema bê ya daxwaza dema borî pêk hatine :
**Ew ê ji wir jî çûbe maleke din.**
**Gelo wî yê ew dîtibe?**

- **Çêkirina raweyê**

**a. Rayeka raweyê :**

**Ya lêkera bingehîn :**
**Rayeka lêkerê ya dema borî ji bo raweya çîrokiya dema bê jî bi kar tê.**
**Eger rayeka lêkera bingehîn bi dengdarekê dawî bibe, tîpa (-i-)yê digire.**

**Ya lêkera alîkar : Rayeka dema niha ya lêkera bûn'ê ye : (-b-)**

**b. Qertafên dema bê(ê, dê) :**
**Çawa di dema bê de tê bikaranîn wisa jî di vê raweyê de bi kar tên.**
**Hin zimanzane qertafa (wê)'yê jî dixin nav ên dema bê(ê, dê, wê).**

**c. Kêşana lêkeran :**

**Ji bo lêkerên negerguhêz :**
**Paşgirên kesandinê di raweya hevedudanî de tên dawiya rayeka lêkera alîkar û bi hev ve tên nivîsandin.**

**Yekjimar : (-bim, -bî, -be)**
**Pirjimar : (-bin, -bin, -bin)**

**Ji bo lêkerên gerguhêz, paşgirên kesandinê :**
**Paşgirên kesandinê(-e, -in), tên dawiya lêkera raweyê ya alîkar û bi hev ve tên nivîsandin.**

**Yekjimar : (-be, -be, -be)**
**Pirjimar : (-bin, -bin, -bin)**

**ç. Awayê neyîniyê : Qertafa neyîniyê(ne-), mîna ya di dema bê de tê karandin.**

**• Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema borî û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 233 : Çûn**
(**çû** + **n**), **çû-**} rayeka raweyê, **-n** } paşgira raderîn
**bûn } b-**} rayeka dema niha alîkar e. **-n** } paşgira raderîn

**Paşgirên kesandinê :**
**yekjimar : (-im, -î, -e)**
**pirjimar : (-in, -in, -in)**

**Awayê erênî :**
**Ez ê çûbim/Tu yê çûbî/Ew ê çûbe**
**Em ê çûbin/Hûn ê çûbin/Ew ê çûbin**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê neçûbim/Tu yê neçûbî/Ew ê neçûbe**
**Em ê neçûbin/Hûn ê neçûbin/Ew ê neçûbin**

**Mînak 234 : Ketin**
(**ket** + **in**), **ket-**} rayeka raweyê, ev rayek (**-i-**)'yê digire.
**bûn** } **b-**} rayeka dema niha alîkar e.

**Awayê erênî :**
**Ez ê ketibim/Tu yê ketibî/Ew ê ketibe**
**Em ê ketibin/Hûn ê ketibin/Ew ê ketibin**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê neketibim/Tu yê neketibî/Ew ê neketibe**
**Em ê neketibin/Hûn ê neketibin/Ew ê neketibin**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 235 : Kirin**
(**kir** + **in**), **kir-**} rayeka raweyê
**bûn** } **b-**} rayeka dema niha alîkar e.

**Awayê erênî :**
**Min ê kiribe/Te yê kiribe/Wî(wê) ye kiribe**
**Me yê kiribe/We yê kiribe/Wan ê kiribe**

**Awayê neyînî :**
**Min ê nekiribe/Te yê nekiribe/Wî(wê) yê nekiribe**
**Me yê nekiribe/We yê nekiribe/Wan ê nekiribe**

**Mînak 236 : Bireser : du sêv in.**
**Lêker : Anîn**
(**anî** + **n**), **anî-**} rayeka raweyê
**bûn** } **b-**} rayeka dema niha alîkar e.

**Awayê erênî :**
**Min ê sêv anîbin/Te yê sêv anîbin/**
**Wî(wê) ye sêv anîbin**

**Me yê sêv anîbin/We yê sêv anîbin/**
**Wan ê sêv anîbin**

**Awayê neyînî :**
**Min ê sêv neanîbin/Te yê sêv neanîbin/**
**Wî(wê) yê sêv neanîbin**

**Me yê sêv neanîbin/We yê sêv neanîbin/**
**Wan ê sêv neanîbin**

## III. Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema boriya dûr

**Ev raweke hevedudanî ye û çîrokiya dema bê ya ku li daxwaza dema boriya dûr e. Di vê raweyê de pêkanîn û pêkneanîn an jî sêwirandina çalakiyê sereke ne.**

Ev hevok li gorî çîrokiya dema bê ya daxwaza dema boriya dûr pêk hatine :
**Ew ê ji wir jî hatibûya ser pira mezin.**
**Gelo wî yê ji wê re gotibûya?**

- **Çêkirina raweyê**

**a. Rayeka raweyê :**

**Ya lêkera bingehîn :**
**Rayeka lêkerê ya dema borî, ji bo raweya çîrokiya dema bê ya daxwaza dema boriya dûr jî bi kar tê. Eger rayeka lêkerê bi dengdarekê dawî bibe, tîpa (-i-)yê digire.**

**Ya lêkera alîkar : Rayeka dema borî ya lêkera bûn'ê ye : (bû-)**

**b. Qertafên dema bê(ê, dê) :**
**Çawa di dema bê de tê bikaranîn wisa jî di vê raweyê de karîger in. Hin zimanzane qertafa (wê)'yê jî dixin nav ên dema bê(ê, dê, wê).**

**c. Paşgira raweyê : (-a)**

**ç. Li gorî kesan paşgirên kesandinê û ya raweyê :**

**Bo lêkerên negerguhêz : (-ma, -yayî, -ya ; -na, -na, -na)**
**Bo lêkerên gerguhêz :**
**Bireser yekjimar e : (-ya, -ya, -ya ; -ya, -ya, -ya)**
**Bireser pirjimar e : (-na, -na, -na ; -na, -na, -na)**

**d. Awayê neyîniyê : Qertafa neyîniyê (ne-), wekî ya di dema bê de bi kar tê.**

**• Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema boriya dûr û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 237 : Hatin**
**(hat + in), hat-}** rayeka raweyê

**Lêkera alîkar : Bûn**
**(bû + n), bû-}** rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Ez ê hatibûma/Tu yê hatibûyayî/Ew ê hatibûya**
**Em ê hatibûna/Hûn ê hatibûna/Ew ê hatibûna**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê hatibûma/Tu yê hatibûyayî/Ew ê hatibûya**
**Em ê hatibûna/Hûn ê hatibûna/Ew ê hatibûna**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 238 : Çandin**
**(çand + in)**, **çand-}** rayeka raweyê
**Lêkera alîkar : Bûn**
**(bû + n), bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Min ê çandibûya/Te yê çandibûya/**
**Wî(wê) yê çandibûya**

**Me yê çandibûya/We yê çandibûya/**
**Wan ê çandibûya**

**Awayê neyînî :**
**Min ê neçandibûya/Te yê neçandibûya/**
**Wî(wê) yê neçandibûya**

**Me yê neçandibûya/We yê neçandibûya/**
**Wan ê neçandibûya**

**Mînak 239 : Bireser pirjimar e : gul in.**
**Firotin(firot + in)**, **firot-**} rayeka raweyê
**Lêkera alîkar : Bûn**
**(bû + n), bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Min ê gul firotibûna/Tê yê gul firotibûna/**
**Wî(wê) yê gul firotibûna**

**Me yê gul firotibûna/We yê gul firotibûna/**
**Wan ê gul firotibûna**

**Awayê neyînî :**
**Min ê gul nefirotibûna/Tê yê gul nefirotibûna/**
**Wî(wê) yê gul nefirotibûna**

**Me yê gul nefirotibûna/We yê gul nefirotibûna/**
**Wan ê gul nefirotibûna**

**Jimar : 14**

**Mijar : Dema bê ya nêzîk**

**Nasîn : Ev dem û hemû raweyên wê bi alîkariya lêkera "kirin"ê pêk tên. Ev lêker him tê kişandin, him jî wateya "*dema bê*"yê dide raweyên xwe. Bêyî lêkera "kirin"ê, lêkereke duyemîn cih digire û ew jî dikeve kêşanê.**

**Bêyî lêkera "kirin"ê, dema bê ya nêzîk û tu raweyên wê pêk nayên. Di vê dema bê û raweyên wê yên din de qertafa dema bê bi kar nayê.**

**Ev hevok li gorî raweya dema bê ya nêzîk pêk hatine :**
**Ez dikim biçim pirtûkaxaneya kevn.**
**Du kes dikin ji bo wê xebatê bimînin.**

**Birkirina raweyên dema bê ya nêzîk :**
**Dema bê ya nêzîk**
**Çîrokiya dema bê ya nêzîk**

## I. Dema bê ya nêzîk

**• Çêkirina raweyê**

**a. Lêkera "kirin"ê : Ji bo çêkirina raweyê alîkar e. Kêşana wê mîna ya dema niha ye.**

**b. Lêkera duyemîn : Wekî ya di *dema bê* de tê kişandin û lêkerên din jî wekî ya duyemîn bi kar tên.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa (ne-)'yê û bi lêkera duyêmîn çêdibe.**

**• Dema bê ya nêzîk û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 240 :**
**Lêkera yekemîn û alîkar : Kirin → k-**} rayeka raweyê ya alîkar
**Lêkera duyemîn : Bezîn → bez-**} rayeka aweyê ya bingehîn

**Awayê erênî :**
**Ez dikim bibezim/Tu dikî bibezî/Ew dike bibeze**
**Em dikin bibezin/Hûn dikin bibezin/Ew dikin bibezin**

**Awayê neyînî :**

**Ez dikim nebezim/Tu dikî nebezî/Ew dike nebeze**
**Em dikin nebezin/Hûn dikin nebezin/Ew dikin nebezin**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 241 :**
**Lêkera yekemîn û alîkar : Kirin** ➝ **k-**} rayeka raweyê ya alîkar
**Lêkera duyemîn : birîn** ➝ **bir-**} rayeka raweyê ya bingehîn

**Awayê erênî :**
**Ez dikim bibirim/Tu dikî bibirî/Ew dike bibire**
**Em dikin bibirin/Hûn dikin bibirin/Ew dikin bibirin**

**Awayê neyînî :**
**Ez dikim nebirim/Tu dikî nebirî/Ew dike nebire**
**Em dikin nebirin/Hûn dikin nebirin/Ew dikin nebirin**

• **Bikaranîna dema bê ya nêzîk**

**Mînak : 242/1 : Di hevokê de dema bê ya nêzîk :**

**Dîlan dike biçe zanîngehê.**
**Ez dikim niha biçim û li bajêr bigerim.**
**Hûn dikin ji malê re gelek tişt nekirin.**

**Mînak : 242/2 : Bireser : ferheng in.**
**Di kêşana lêkeran de tu cudatî pêk nayên :**

**Ez dikim ferhengekê bibim.**
**Ew dike du ferhengan bibe.**
**Hûn dikin sê ferhengan bibin.**

## II. Çîrokiya dema bê ya nêzîk

• **Çêkirina raweyê**

**a. Lêkera "kirin"ê : Ev lêker weke ya di dema boriya berdest de dikeve kêşanê û paşgira (-a)'yê digire.**

**b. Lêkera duyemîn : Ev lêker wekî ya çîrokiya dema bê, tê kişandin.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa (ne-)'yê bi lêkera duyêmîn çêdibe.**

• **Çîrokiya bê ya nêzîk û kêşana lêkeran**

♦ **Ji lêkerên negerguhêz : Hatin**
**Kirde cînavkên kesane yên xwerû ne.**

**Mînak 243 :**
**Lêkera yekemîn û alîkar : Kirin → kir-**} rayeka raweyê ya alîkar
**Lêkera duyemîn : Hatin → hat-**} rayeka raweyê ya bingehîn

**Awayê erênî :**
**Ez dikira bihatama/Tu dikira bihatayî/Ew dikira bihata**
**Em dikira bihatana/Hûn dikira bihatana/Ew dikira bihatana**

**Awayê neyînî :**
**Ez dikira nehatama/Tu dikira nehatayî/Ew dikira nehata**
**Em dikira nehatana/Hûn dikira nehatana/Ew dikira nehatana**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz : Vexwarin**
**Kirde cînavkên kesane yên tewandî ne.**

**Mînak 244 :**
**Lêkera yekemîn û alîkar : Kirin → kir-**} rayeka raweyê ya alîkar
**Lêkera duyemîn : Vexwarin → vexwar-**} rayeka raweyê ya bingehîn

**Awayê erênî :**
**Min dikira vexwara/Te dikira vexwara/**
**Wî(wê) dikira vexwara**

**Me dikira vexwara/We dikira vexwara/**
**Wan dikira vexwara**

**Awayê neyînî :**
**Min dikira venexwara/Te dikira venexwara/**
**Wî(wê) dikira venexwara**

**Me dikira venexwara/We dikira venexwara/**
**Wan dikira venexwara**

• **Bikaranîna çîrokiya dema bê ya nêzîk**

**Mînak : 245/1 : Di hevokê de çîrokiya dema bê ya nêzîk :**

**Dîlanê dikira biçûya zanîngehê.**
**Min dikira ji vir biçûma û li bajêr bigeriyama.**

**We dikira ji malê re gelek tişt nebira.**

**Mînak 245/2 : Bireser : ferheng in.**
**Lêkera duyemîn li gorî mêjera bireserê dikeve kêşana :**

**Min dikira ferhengekê bikira.**
**Wî dikira du ferheng bikirana.**
**Wan dikira sê ferheng nekirana.**

**Mînak 245/3 : Bireser : ferheng in.**
**Di zimanê gelêrî de lêkera duyemîn di dema bê ya nêzîk de ye :**

**Min dikira ferhengekê bikirim.**
**Wî dikira du ferhengan bikire.**
**Wan dikira sê ferhengan nekirin.**

**Jimar : 15**

**Mijar : Raweya daxwazî**

**Nasîn : Raweyên daxwazî; daxwazan, hêvîkirin, pêşniyaz, destûrdayîn, gazîkirin û tikakirinan vedibêjin.**

**Raweyên daxwazî li çar beşan dabeş dibe :**
**Daxwaziya dema niha**
**Daxwaziya dema borî ya pêkhatî**
**Daxwaziya dema borî ya pêknehatî**
**Daxwaziya dema boriya dûr**

## I. Daxwaziya dema niha

**Ji bo çalakiyê daxwaz û pêşniyaz sereke ne. Kar û barên ku pêk bên li ber bûyînê ne, yan jî pêkanîna wan bi derfet in.**

- **Çêkirina raweyê**

**a. Rayeka raweyê :**
**Rayeka lêkerê ya dema niha ji bo daxwaziya dema niha jî bi kar tê.**

**b. Pêşgirên raweyê :**

**Ya erêniyê(bi-) : Pêşgir an navgir cih digire, di hin kêşana lêkeran (hevedudanî, pêkhatî) de bi kar nayê.**

**Ya neyîniyê(ne-) : Pêşgir an navgir cih digire, di hemû kêşana lêkeran (hevedudanî, pêkhatî) de bi kar tê.**

**Di zimanê gelêrî de li şûna pêşgira neyîniyê(ne-), pêşgira neyînîyê ya dema niha(na-) jî tê bikaranîn.**

**c. Paşgirên kesandinê : Ev paşgir tên dawiya rayeka lêkerê :**

**Yekjimar : (-im, -(y)î, -e)**
**Pirjimar : (-in, -in, -in)**

***Di hemû kêşanan de rayek û qertaf(pêşgir, navgir, paşgir) bi hev ve tên nivîsandin.***

- **Daxwaziya dema niha û kêşana lêkeran**

♦ **Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 246 : Ketin**
**(ket + in)**, **ket-**} rayeka raderê
**ketin } kev-**} rayeka daxwaziya dema niha

**Awayê erênî :**
**Ez bikevim/Tu bikevî/Ew bikeve**
**Em bikevin/Hûn bikevin/Ew bikevin**

**Awayê neyînî :**
**Ez nekevim/Tu nekevî/Ew nekeve**
**Em nekevin/Hûn nekevin/Ew nekevin**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 247 : Kirîn**
**(kirî + n)**, **kirî-**} rayeka raderê
**kirîn } kir-**} rayeka daxwaziya dema niha

**Awayê erênî :**
**Ez bikirim/Tu bikirî/Ew bikire**
**Em bikirin/Hûn bikirin/Ew bikirin**

**Awayê neyînî :**
**Ez nekirim/Tu nekirî/Ew nekire**
**Em nekirin/Hûn nekirin/Ew nekirin**

★ **Ji lêkerên gerguhêz û nexwerû(pêkhatî) :**

**Mînak 248 : Vexwarin**
**(vexwar + in)**, **vexwar-**} rayeka raderê
**vexwarin → vexw-**} rayeka daxwaziya dema niha

**Awayê erênî :**
**Ez vexwim/Tu vexwî/Ew vexwe**
**Em vexwin/Hûn vexwin/Ew vexwin**

**Awayê neyînî :**
**Ez venexwim/Tu venexwî/Ew venexwe**
**Em venexwin/Hûn venexwin/Ew venexwin**

## II. Daxwaziya dema borî ya pêkhatî

**Ev rawe hevedudanî ye. Çalakiyên pêk tên, ji aliyê kiryarên xwe ve bi guman in. Di vegotinan de daxwaz û dibetiyên ku ne misegor hene.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Rayekên raweyê :**

**Ya lêkera bingehîn : Rayeka lêkerê ya dema borî bi kar tê. Eger ev rayek bi dengdarekê dawî bibe, tîpa (-i-)'yê digire.**

**Ya lêkera alîkar : Rayeka dema niha ya lêkera bûn'ê ye : (b-)**

**b. Kêşana lêkerê :**

**Bo lêkerên negerguhêz : Paşgirên kesandinê tên dawiya rayeka lêkera alîkar :**

**Yekjimar : (-bim, -bî, -be)**
**Pirjimar : (-bin, -bin, -bin)**

**Bo lêkerên gerguhêz : Paşgirên kesandinê(-e, -in), tên dawiya lêkera raweyê ya alîkar.**

**Yekjimar : (-be, -be, -be)**
**Pirjimar : (-bin, -bin, -bin)**

**c. Awayê neyînî :**
**Qertafa neyîniyê(ne-) : Pêşgir û navgir di hemû kêşanan de cih digirin.**

***Di hemû kêşanan de rayek û qertaf(pêşgir, navgir, paşgir) bi hev ve tên nivîsandin.***

**• Daxwaziya dema borî ya pêkhatî û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 249 : Ketin**
(**ket** + **in**), **ket-**} rayeka daxwaziya dema borî ya pêkhatî
**Lêkera alîkar : Bûn** } **b-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Ez ketibim/Tu ketibî/Ew ketibe**
**Em ketibin/Hûn ketibin/Ew ketibin**

**Awayê neyînî :**
**Ez neketibim/Tu neketibî/Ew neketibe**
**Em neketibin/Hûn neketibin/Ew neketibin**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 250/1 : Kirîn**
**(kirî + n), kirî-**} rayeka daxwaziya dema borî ya pêkhatî
**Lêkera alîkar : Bûn } b-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Min kirîbe/Te kirîbe/Wî(wê) kirîbe**
**Me kirîbe/We kirîbe/Wan kirîbe**

**Awayê neyînî :**
**Min nekirîbe/Te nekirîbe/Wî(wê) nekirîbe**
**Me nekirîbe/We nekirîbe/Wan nekirîbe**

**Mînak 250/2 : Birser pirjimar e : du gul**

**Lêker : Kirîn** } **(kirî + n), kirî-**} rayeka raweyê
**Lêkera alîkar : Bûn } b-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Min du gul kirîbin/Te du gul kirîbin/**
**Wî(wê) du gul kirîbin**

**Me du gul kirîbin/We du gul kirîbin/**
**Wan du gul kirîbin**

**Awayê neyînî :**
**Min du gul nekirîbin/Te du gul nekirîbin/**
**Wî(wê) du gul nekirîbin**

**Me du gul nekirîbin/We du gul nekirîbin/**
**Wan du gul nekirîbin**

## III. Daxwaziya dema borî ya pêknehatî

**Çalakî pêk nehatine, ji bo pêkhatina wan daxwaz tên vegotin.**

- **Çêkirina raweyê**

**a. Rayeka raweyê : Rayeka lêkerê ya dema borî bi kar tê.**

**b. Pêşgirên raweyê :**

**Ya erêniyê(bi-) : Pêşgir an navgir cih digire, di hin kêşana lêkeran (hevedudanî, pêkhatî) de bi kar nayê.**

**Ya neyîniyê(ne-) : Pêşgir an navgir cih digire, di hemû kêşana lêkeran (hevedudanî, pêkhatî) de bi kar tê.**

**c. Li gorî kesan paşgirên raweyê :**

**Bo lêkerên negerguhêz : (-ama, -ayî, -ya ; -ana, -ana, -ana)**

**Bo lêkerên gerguhêz :**
**Bireser yekjimar e : (-a, -a, -a ; -a, -a, -a)**
**Bireser pirjimar e : (-ana, -ana, -ana ; -ana, -ana, -ana)**

***Di hemû kêşanan de rayek û qertaf(pêşgir, navgir, paşgir) bi hev ve tên nivîsandin.***

**• Daxwaziya dema borî ya pêknehatî û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 251 : Ketin**
**(ket + in), ket-**} rayeka daxwaziya dema borî ya pêknehatî

**Awayê erênî :**
**Ez biketama/Tu biketayî/Ew biketa**
**Em biketana/Hûn biketana/Ew biketana**

**Awayê neyînî :**
**Ez neketama/Tu neketayî/Ew neketa**
**Em neketana/Hûn neketana/Ew neketana**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 252/1 : Kirîn**
**(kirî + n), kirî-**} rayeka daxwaziya dema borî ya pêknehatî

**Awayê erênî :**
**Min bikiriya/Te bikiriya/Wî(wê) bikiriya**
**Me bikiriya/We bikiriya/Wan bikiriya**

**Awayê neyînî :**
**Min nekiriya/Te nekiriya/Wî(wê) nekiriya**
**Me nekiriya/We nekiriya/Wan nekiriya**

**Mînak 252/2 : Bireser pirjimar e : du gul**
**Lêker : Kirin } (kirî + n), kirî-}** rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Min du gul bikiriyana/Te du gul bikiriyana/**
**Wî(wê) du gul bikiriyana**

**Me du gul bikiriyana/We du gul bikiriyana/**
**Wan du gul bikiriyana**

**Awayê neyînî :**
**Min du gul nekiriyana/Te du gul nekiriyana/**
**Wî(wê) du gul nekiriyana**

**Me du gul nekiriyana/We du gul nekiriyana/**
**Wan du gul nekiriyana**

## IV. Daxwaziya dema boriya dûr

**Ev rawe hevedudanî ye. Çalakî pêk nehatine, lê di demeke gelek borî de ji bo pêkhatina wan daxwaz tên vegotin.**

- **Çêkirina raweyê**

**a. Rayeka raweyê :**

**Ya lêkera bingehîn : Rayeka lêkerê ya dema borî bi kar tê. Eger ev rayek bi dengdarekê dawî bibe, tîpa (-i-)'yê digire.**

**Ya lêkera alîkar : Rayeka dema borî ya lêkera bûn'ê ye : (bû-)**

**b. Paşgira raweyê : (-a)**

**c. Li gorî kesan paşgirên kesandinê û ya raweyê :**

**Bo lêkerên negerguhêz : (-ma, -yayî, -ya ; -na, -na, -na)**

**Bo lêkerên gerguhêz :**
**Bireser yekjimar e : (-ya, -ya, -ya ; -ya, -ya, -ya)**
**Bireser pirjimar e : (-na, -na, -na ; -na, -na, -na)**

**ç. Awayê neyîniyê :**
**Qertafa neyîniyê ya (ne-), tê ber rayeka lêkerê ya bingehîn. Pêşgir û navgir di hemû kêşana lêkeran de cihên xwe digire.**

***Hemû rayek û qertaf(paşgir, pêşgir, navgir) bi hev ve tên nivîsandin.***

**• Daxwaziya dema boriya dûr û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 253 : Hatin**
**(hat + in)**, **hat-**} rayeka daxwaziya dema borî ya dûr
**Lêkera alîkar : Bûn } (bû + n), bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Ez hatibûma/Tu hatibûyayî/Ew hatibûya**
**Em hatibûna/Hûn hatibûna/Ew hatibûna**

**Awayê neyînî :**
**Ez nehatibûma/Tu nehatibûyayî/Ew nehatibûya**
**Em nehatibûna/Hûn nehatibûna/Ew nehatibûna**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 254 : Çandin**
**(çand + in)**, **çand-**} rayeka daxwaziya dema borî ya dûr
**Lêkera alîkar : Bûn } bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Min çandibûya/Te çandibûya/Wî(wê) çandibûya**
**Me çandibûya/We çandibûya/Wan çandibûya**

**Awayê neyînî :**
**Min neçandibûya/Te neçandibûya/Wî(wê) neçandibûya**
**Me neçandibûya/We neçandibûya/Wan neçandibûya**

**Jimar : 16**

**Mijar : Raweya xwestekî**

**Nasîn :**
**Raweyên xwestekî li ser bingeha raweya daxwazî û beşên wê, bi alîkariya bêjeyên rawesaz ên raweya xwestekî (xwezî, xwezilka/ xweziya) pêk tên.**
**Raweyên xwestekî, peywir û wateyên daxwazî û mercî di xwe de dihewînin; birên raweyên daxwazî bi xwezîkirinê watedar dikin.**
**Di gel vê ew bi serê xwe, ne raweya daxwazî û ne jî ya mercî didin navandin.**
**Ev rawe û beşên wê ji aliyê rêzimanê ve bo hemû kesan karîger in.**

**Raweyên xwestekî li çar beşan dabeş dibin :**
**Xwestekî ya daxwaziya dema niha**
**Xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêkhatî**
**Xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêknehatî**
**Xwestekî ya daxwaziya dema boriya dûr**

## I. Xwestekî ya daxwaziya dema niha

**Ev rawe bi bêjeya rawesaz(**amraz**) a (xwezî)'yê, li ser bingeha daxwaziya dema niha çêdibe.**

• **Çêkirina raweyê**

**Bêjeya alîkar a rawesaz (xwezî) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema niha ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe û mîna ya daxwaziya dema niha ye.**

**Xwestekî ya daxwaziya dema niha û kêşana lêkeran**

♦ **Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 255 : Ketin**
**ketin } kev-**} rayeka xwestekî ya daxwaziya dema niha

**Awayê erênî :**
**Xwezî ez bikevim/Xwezî tu bikevî/Xwezî ew bikeve**

**Xwezî em bikevin/Xwezî hûn bikevin/Xwezî ew bikevin**

**Awayê neyînî :**
**Xwezî ez nekevim/Xwezî tu nekevî/Xwezî ew nekeve**
**Xwezî em nekevin/Xwezî hûn nekevin/Xwezî ew nekevin**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 256 : Kirîn**
**kirîn } kir-**} rayeka xwestekî ya daxwaziya dema niha

**Awayê erênî :**
**Xwezî ez bikirim/Xwezî tu bikirî/Xwezî ew bikire**
**Xwezî em bikirin/Xwezî hûn bikirin/Xwezî ew bikirin**

**Awayê neyînî :**
**Xwezî ez nekirim/Xwezî tu nekirî/Xwezî ew nekire**
**Xwezî em nekirin/Xwezî hûn nekirin/Xwezî ew nekirin**

• **Bikaranîna xwestekî ya daxwaziya dema niha**

**Mînak : 257 : Di hevokê de xwestekî ya daxwaziya dema niha :**

**Xwezî ez biçim ba hevalên xwe yên dûr.**
**Xwezî Rojhat zû bê, Narê bibe û bigerîne.**
**Xwezî hûn ji wan re tiştên nebaş nebêjin!**

## II. Xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêkhatî

**Ev rawe bi bêjeya rawesaz a (xwezî)'yê, li ser bingeha daxwaziya dema borî ya pêkhatî çêdibe. Ew rawe kêmtirîn bi kar tê.**

• **Çêkirina raweyê**

**a. Bêjeya alîkar a rawesaz (xwezî) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema borî ya pêkhatî ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe, mîna ya daxwaziya dema borî ya pêkhatî ye.**

**Xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêkhatî û kêşana lêkeran**

♦ **Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 258 : Ketin**
**ketin } ket-**} rayeka xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêkhatî
**Lêkera alîkar : Bûn } b-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Xwezî ez ketibim/Xwezî tu ketibî/Xwezî ew ketibe**
**Xwezî em ketibin/Xwezî hûn ketibin/Xwezî ew ketibin**

**Awayê neyînî :**
**Xwezî ez neketibim/Xwezî tu neketibî/Xwezî ew neketibe**
**Xwezî em neketibin/Xwezî hûn neketibin/Xwezî ew neketibin**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 259 : Kirîn**
**kirîn } kirî-**} rayeka xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêkhatî
**Lêkera alîkar : Bûn } b-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Xwezî min kirîbe/Xwezî te kirîbe/Xwezî wî(wê) kirîbe**
**Xwezî me kirîbe/Xwezî we kirîbe/Xwezî wan kirîbe**

**Awayê neyînî :**
**Xwezî min nekirîbe/Xwezî te nekirîbe/Xwezî wî(wê) nekirîbe**
**Xwezî me nekirîbe/Xwezî we nekirîbe/Xwezî wan nekirîbe**

• **Bikaranîna xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêkhatî**

**Mînak : 260 : Di hevokê de xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêkhatî :**

**Xwezî ew jî çûbe pêşangeha wenêgeran.**
**Xwezî Memê ji Nazê re ew kulîlk şandibin.**
**Xwezî wan nexweşiya wî ji Alên re negotibe.**

## III. Xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêknehatî

**Ev rawe bi bêjeya rawesaz a (xweziya)'yê, li ser bingeha daxwaziya dema borî ya pêknehatî çêdibe.**

• **Çêkirina raweyê**

**a. Bêjeya alîkar a rawesaz (xweziya) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema borî ya pêknehatî ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe, mîna ya daxwaziya dema borî ya pêknehatî ye.**

**Xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêknehatî û kêşana lêkeran**

♦ **Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 261 : Ketin**
**ketin } ket-** } rayeka xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêknehatî

**Awayê erênî :**
**Xweziya ez biketama/Xweziya tu biketayî/**
**Xweziya ew biketa**

**Xweziya em biketana/Xweziya hûn biketana/**
**Xweziya ew biketana**

**Awayê neyînî :**
**Xweziya ez neketama/Xweziya tu neketayî/**
**Xweziya ew neketa**

**Xweziya em neketana/Xweziya hûn neketana/**
**Xweziya ew neketana**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 262 : Kirîn**
**kirîn } kirî-**} rayeka xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêknehatî

**Awayê erênî :**
**Xweziya min bikiriya/Xweziya te bikiriya/**
**Xweziya wî(wê) bikiriya**

**Xweziya me bikiriya/Xweziya we bikiriya/**
**Xweziya wan bikiriya**

**Awayê neyînî :**

**Xweziya min nekiriya/Xweziya te nekiriya/**
**Xweziya wî(wê) nekiriya**

**Xweziya me nekiriya/Xweziya we nekiriya/**
**Xweziya wan nekiriya**

- **Bikaranîna xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêknehatî**

**Mînak : 263 :**
**Di hevokê de xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêknehatî :**

**Xweziya em biçûna semînera zimanzanan.**
**Xweziya wan ji me re gelek pirtûk bişandana.**
**Xweziya Şîlanê ev name ji min re nenivîsanda.**

**IV. Xwestekî ya daxwaziya dema boriya dûr**

**Ev rawe bi bêjeya rawesaz a (xweziya)'yê, li ser bingeha daxwaziya dema boriya dûr çêdibe.**

- **Çêkirina raweyê**

**Bêjeya alîkar a rawesaz (xweziya) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û weke hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema boriya dûr e.**

**Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe û mîna ya daxwaziya dema boriya dûr e.**

- **Xwestekî ya daxwaziya dema boriya dûr û kêşana lêkeran**

♦ **Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 264 : Hatin**
**Hatin } hat-**} rayeka xwestekî ya daxwaziya dema boriya dûr
**Lêkera alîkar : Bûn } bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Xweziya ez hatibûma/Xweziya tu hatibûyayî/**
**Xweziya ew hatibûya**

**Xweziya em hatibûna/Xweziya hûn hatibûna/**

**Xweziyaew hatibûna**

**Awayê neyînî :**
**Xweziya ez nehatibûma/Xweziya tu nehatibûyayî/**
**Xweziya ew nehatibûya**

**Xweziya em nehatibûna/Xweziya hûn nehatibûna/**
**Xweziyaew nehatibûna**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 265 : Çandin**
**çandin } çand-**} rayeka xwestekî ya daxwaziya dema boriya dûr
**Lêkera alîkar : Bûn } bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Xweziya min çandibûya/Xweziya te çandibûya/**
**Xweziya wî(wê) çandibûya**

**Xweziya me çandibûya/Xweziya we çandibûya/**
**Xweziya wan çandibûya**

**Awayê neyînî :**
**Xweziya min neçandibûya/Xweziya te neçandibûya/**
**Xweziya wî(wê) neçandibûya**

**Xweziya me neçandibûya/Xweziya we neçandibûya/**
**Xweziya wan neçandibûya**

**• Bikaranîna xwestekî ya daxwaziya dema boriya dûr**

**Mînak : 266 : Di hevokê de xwestekî ya daxwaziya dema boriya dûr :**

**Xweziya Berîvanê ji wan re mizgînek anîbûya.**
**Xweziya zarokên we ji erebeyê derketibûna.**
**Xweziya Ferho bi davikê du çûk negirtibûna.**

**Jimar : 17**

**Mijar : Raweya bilanî**

**Nasîn :**
**Raweyên bilanî jî wekî yên xwestekî, li ser bingeha raweya daxwazî û beşên wê bi alîkariya bêjeya rawesaz a (bila)'yê pêk tên.**
**Raweyên bilanî erk û wateyên daxwazî û fermanî di xwe de dihewînin û birên raweyên daxwazî bi bilanîkirinê watedar dikin.**
**Di gel vê ew bi serê xwe, ne raweya daxwazî û ne jî ya fermanî didin navandin.**
**Ev rawe û beşên wê yekjimar û pirjimar bo kesên sêyemîn karîger in.**

**Raweya bilanî li çar beşan dabeş dibe :**
**Bilaniya dema niha**
**Bilaniya dema borî ya pêkhatî**
**Bilaniya dema borî ya pêknehatî**
**Bilaniya dema boriya dûr**

## I. Bilaniya dema niha

**Li gorî raweya xwestekî ya daxwaziya dema niha; li şûna bêjeya rawesaz a (xwezî)'yê, ya (bila) bi kar tê û bilaniya dema niha pêk tê.**

**• Çêkirina raweyê**

**Bêjeya alîkar a rawesaz(bila) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema niha ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe û bikaranîna wê mîna ya xwestekî ya daxwaziya dema niha ye.**

**• Bilaniya dema niha û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 267 : Mirin**
**mirin } mir-}** rayeka bilaniya dema niha

**Awayê erênî :**
**Bila ez bimirim/Bila tu bimirî/Bila ew bimire**
**Bila em bimirin/Bila hûn bimirin/Bila ew bimirin**

**Awayê neyînî :**
**Bila ez nemirim/Bila tu nemirî/Bila ew nemire**
**Bila em nemirin/Bila hûn nemirin/Bila ew nemirin**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 268 : Rijandin**
**rijandin } rijîn-}** rayeka bilaniya dema niha

**Awayê erênî :**
**Bila ez birijînim/Bila tu birijînî/Bila ew birijîne**
**Bila em birijînin/Bila hûn birijînin/Bila ew birijînin**

**Awayê neyînî :**
**Bila ez nerijînim/Bila tu nerijînî/Bila ew nerijîne**
**Bila em nerijînin/Bila hûn nerijînin/Bila ew nerijînin**

**• Bikaranîna bilaniya dema niha**

**Mînak 269/1 : Di hevokê de bilaniya dema niha :**

**Bila ew bimire li şûna te, gelo ne wisan e?**
**Ji Berîvanê re bibêje, bila wî şîrî nerijîne.**
**Bila hûn tevde bên, bila çi dibe ma bibe!**

**Mînak 269/2 : Di zimanê gelêrî de li şûna "bila"yê, "ma" jî bi kar tê :**

**Ma ew bimire li şûna te, gelo ne wisan e?**
**Ji Berîvanê re bibêje, ma wî şîrî nerijîne.**
**Ma hûn tevde bên, bila çi dibe ma bibe!**

## II. Bilaniya dema borî ya pêkhatî

**Li gorî raweya xwestekî ya daxwaziya dema borî ya pêkhatî; li şûna bêjeya rawesaz a (xweziya)'yê, ya (bila) bi kar tê û bilaniya dema borî ya pêkhatî pêk tê.**

**• Çêkirina raweyê**

**Bêjeya alîkar a rawesaz(bila) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema borî ya pêkhatî ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe, bikaranîna wê mîna ya xwestekî ya daxwaziya dema borî ya pêkhatî ye.**

**• Bilaniya dema borî ya pêkhatî û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 270 : Mirin**
**ketin } mir-**} rayeka bilaniya dema borî ya pêkhatî
**Lêkera alîkar : Bûn } b-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Bila ez miribim/Bila tu miribî/Bila ew miribe**
**Bila em miribin/Bila hûn miribin/Bila ew miribin**

**Awayê neyînî :**
**Bila ez nemiribim/Bila tu nemiribî/Bila ew nemiribe**
**Bila em nemiribin/Bila hûn nemiribin/Bila ew nemiribin**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 271 : Rijandin**
**rijandin } rijand-**} rayeka bilaniya dema borî ya pêkhatî
**Lêkera alîkar : Bûn } b-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Bila min rijandibe/Bila te rijandibe/**
**Bila wî(wê) rijandibe**

**Bila me rijandibe/Bila we rijandibe/**
**Bila wan rijandibe**

**Awayê neyînî :**
**Bila min nerijandibe/Bila te nerijandibe/**
**Bila wî(wê) nerijandibe**

**Bila me nerijandibe/Bila we nerijandibe/**
**Bila wan nerijandibe**

**• Bikaranîna bilaniya dema borî ya pêkhatî**

**Mînak 272 : Di hevokê de bilaniya dema borî ya pêkhatî :**

**Bila ew nehatibe li şûna te, ka hatiye fehmkirin?**
**Ji Rewşenê re bibêje, bila goştê karê nekelandibe.**
**Divê ji Narê re gotibe, bila ciwan pêkde hatibin.**

## III. Bilaniya dema borî ya pêknehatî

**Li gorî raweya xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêknehatî;**
**li şûna bêjeya rawesaz a (xweziya)'yê, ya (bila) bi kar tê û bilaniya dema borî ya pêknehatî pêk tê.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Bêjeya alîkar a rawesaz (bila) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema borî ya pêknehatî ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe, bikaranîna wê mîna ya daxwaziya dema borî ya pêknehatî ye.**

**• Bilaniya dema borî ya pêknehatî û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 273 : Mirin**
**mirin } mir-**} rayeka bilaniya dema borî ya pêknehatî

**Awayê erênî :**
**Bila ez bimirama/Bila tu bimirayî/Bila ew bimira**
**Bila em bimirana/Bila hûn bimirana/Bila ew bimirana**

**Awayê neyînî :**
**Bila ez nemirama/Bila tu nemirayî/Bila ew nemira**
**Bila em nemirana/Bila hûn nemirana/Bila ew nemirana**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 274 : Rijandin**
**rijandin } rijand-**} rayeka bilaniya dema borî ya pêknehatî

**Awayê erênî :**
**Bila min birijanda/Bila te birijanda/Bila wî(wê) birijanda**
**Bila me birijanda/Bila we birijanda/Bila wan birijanda**

**Awayê neyînî :**
**Bila min nerijanda/Bila te nerijanda/Bila wî(wê) nerijanda**
**Bila me nerijanda/Bila we nerijanda/Bila wan nerijanda**

**• Bikaranîna bilaniya dema borî ya pêknehatî**

**Mînak : 275 : Di hevokê de bilaniya dema borî ya pêknehatî :**

**Bila Rewşenê cilên wan zarokan bişûştana.**
**Bila Memê jî ji Dîlanê re xelatek hilbijarta.**
**Bila Nûrcanê roj û şev bi tenê nemeşiyaya.**

## IV. Bilaniya dema boriya dûr

**Li gorî raweya xwestekî ya daxwaziya dema boriya dûr; li şûna bêjeya rawesaz a (xweziya)'yê, ya (bila) bi kar tê û bilaniya dema boriya dûr pêk tê.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Bêjeya alîkar a rawesaz (bila) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema boriya dûr e.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe, bikaranîna wê mîna ya daxwaziya dema boriya dûr e.**

**• Bilaniya dema boriya dûr û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 276 : Mirin**
**mirin } mir-**} rayeka bilaniya dema borî ya dûr
**Lêkera alîkar : Bûn } bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Bila ez miribûma/Bila tu miribûyayî/**
**Bila ew miribûya**

**Bila em miribûna/Bila hûn miribûna/**
**Bilaew miribûna**

**Awayê neyînî :**
**Bila ez nemiribûma/Bila tu nemiribûyayî/**
**Bila ew nemiribûya**

**Bila em nemiribûna/Bila hûn nemiribûna/**
**Bilaew nemiribûna**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 277 : Rijandin**
**rijandin } rijand-**} rayeka bilaniya dema borî ya dûr
**Lêkera alîkar : Bûn } bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Bila min rijandibûya/Bila te rijandibûya/**
**Bila wî(wê) rijandibûya**

**Bila me rijandibûya/Bila we rijandibûya/**
**Bila wan rijandibûya**

**Awayê neyînî :**
**Bila min nerijandibûya/Bila te nerijandibûya/**
**Bila wî(wê) nerijandibûya**

**Bila me nerijandibûya/Bila we nerijandibûya/**
**Bila wan nerijandibûya**

• **Bikaranîna bilaniya dema boriya dûr**

**Mînak : 278 : Di hevokê de bilaniya dema boriya dûr :**

**Bila Mem û Alan jî di dersê de serketibûna.**
**Bila Ferho jî hatibûya û beşdarî me bûbûya.**
**Bila filan û bêvan kes derman nexwaribûna!**

**Jimar : 18**

**Mijar : Raweya hekanî**

**Nasîn : Raweyên hekanî(mercî), bi şertan tên holê û bi giştî di hevokên hevedudanî de bi kar tên. Bêjeya rawesaz a raweyê, (heke) ye û ev bêje; wateya egeriyê, peywira raweyî û ya gihanekî di xwe de dihewîne.**

**Raweyên hekanî li ser du beşên raweyên bingehîn pêk tên.**

**Hekaniyên ku li ser bingeha raweyên pêşkerî pêk tên pênc in :**
**Ya dema niha**
**Ya dema bê**
**Ya dema boriya têdeyî**
**Ya dema boriya dûdar**
**Ya dema boriya berdest**

**Hekaniyên ku li ser bingeha raweyên daxwazî pêk tên çar in :**
**Ya daxwaziya dema niha**
**Ya daxwaziya dema borî ya pêkhatî**
**Ya daxwaziya dema borî ya pêknehatî**
**Ya daxwaziya dema boriya dûr**

**Hekaniyên ku li ser bingeha raweyên pêşkerî pêk tên :**

## I. Hekaniya dema niha

**Ev rawe bi bêjeya rawesaz(heke), li ser bingeha raweya dema niha çêdibe.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Bêjeya alîkar a rawesaz(heke) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya dema niha ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê ya (ne-)'yê çêdibe, bikaranîna wê wekî qertafa neyîniya dema niha(na-) ye.**

**• Hekaniya dema niha û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 279 : Ketin**
**ketin } kev-**} rayeka hekaniya dema niha

**Awayê erênî :**
**Heke ez dikevim/Heke tu dikevî/Heke ew dikeve**

**Heke em dikevin/Heke hûn bikevin/Heke ew dikevin**

**Awayê neyînî :**
**Heke ez nekevim/Heke tu nekevî/Heke ew nekeve**
**Heke em nekevin/Heke hûn nekevin/Heke ew nekevin**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 280 : Girtin**
**girtin } gir-**} rayeka hekaniya dema niha

**Awayê erênî :**
**Heke ez digirim/Heke tu digirî/Heke ew digire**
**Heke em digirin/Heke hûn digirin/Heke ew digirin**

**Awayê neyînî :**
**Heke ez negirim/Heke tu negirî/Heke ew negire**
**Heke em negirin/Heke hûn negirin/Heke ew negirin**

**• Bikaranîna hekaniya dema niha**

**Mînak : 281/1 : Di hevokê de hekaniya dema niha :**

**Heke ew alîkariya te dike, tu jî ji wê re bikî.**
**Heke Rojhat diçe, jê re bibêje ku Alan jî çû.**
**Heke hûn neçin, hevalên din jî nikarin biçin.**

**Mînak : 281/2 : Peyvên ku wekî (heke)'yê bi kar tên, hene û ev hemwate ne : Heger/eger/ger, ku :**

**Heger ew alîkariya te dike, tu jî ji wê re bikî.**
**Eger Rojhat diçe, jê re bibêje ku Alan jî çû.**
**Ku hûn neçin, hevalên din jî nikarin biçin.**

**II. Hekaniya dema bê**

**Ev rawe bi bêjeya rawesaz(heke), li ser bingeha dema bê çêdibe.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Bêjeya alîkar a rawesaz(heke) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya dema bê ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe, bikaranîna wê wekî ya dema bê ye.**

**• Hekaniya dema bê û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 282 : Ketin**
**ketin } kev-**} rayeka hekaniya dema bê

**Awayê erênî :**
**Heke ez ê bikevim/Heke tu yê bikevî/Heke ew ê bikeve**
**Heke em ê bikevin/Heke hûn ê bikevin/Heke ew ê bikevin**

**Awayê neyînî :**
**Heke ez ê nekevim/Heke tu yê nekevî/Heke ew ê nekeve**
**Heke em ê nekevin/Heke hûn ê nekevin/Heke ew ê nekevin**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 283 : Girtin**
**girtin } gir-**} rayeka hekaniya dema bê

**Awayê erênî :**
**Heke ez ê bigirim/Heke tu yê bigirî/Heke ew ê bigire**
**Heke em ê bigirin/Heke hûn ê bigirin/Heke ew ê bigirin**

**Awayê neyînî :**
**Heke ez ê negirim/Heke tu yê negirî/Heke ew ê negire**
**Heke em ê negirin/Heke hûn ê negirin/Heke ew ê negirin**

**• Bikaranîna hekaniya dema bê**

**Mînak : 284 : Di hevokê de hekaniya dema bê :**

**Heke tu yê bixebitî, ez ê li karekî din bigerim.**
**Heke Zîlan ê bibînî, ew dikare te bibe wê derê.**
**Heke hûn ê li wir nemînin, bila Rizgar bimîne.**

**III. Hekaniya dema boriya têdeyî**

**Ev rawe bi bêjeya rawesaz(heke), li ser bingeha dema boriya têdeyî**

**çêdibe.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Bêjeya alîkar a rawesaz (heke) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya dema boriya têdeyî ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe, bikaranîna wê wekî ya dema boriya têdeyî ye.**

**• Hekaniya dema boriya têdeyî û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 285 : Ketin**
**ketin } ket-**} rayeka hekaniya dema boriya têdeyî

**Awayê erênî :**
**Heke ez ketim/Heke tu ketî/Heke ew ket**
**Heke em ketin/Heke hûn ketin/Heke ew ketin**

**Awayê neyînî :**
**Heke ez neketim/Heke tu neketî/Heke ew neket**
**Heke em neketin/Heke hûn neketin/Heke ew neketin**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 286 : Girtin**
**girtin } girt-**} rayeka hekaniya dema boriya têdeyî

**Awayê erênî :**
**Heke min girt/Heke te girt/Heke wî(wê) girt**
**Heke me girt/Heke we girt/Heke wan girt**

**Awayê neyînî :**
**Heke min negirt/Heke te negirt/Heke wî(wê) negirt**
**Heke me negirt/Heke we negirt/Heke wan negirt**

**• Bikaranîna hekaniya dema boriya têdeyî**

**Mînak : 287 : Di hevokê de hekaniya dema boriya têdeyî :**

**Heke min diyarî girt, ez ê ji wan re bişînim.**
**Heke me erebe kirî, em careke din nefiroşin.**
**Heke wan nan nexwar, mesrefê te zêde nabê.**

## IV. Hekaniya dema boriya dûdar

**Ev rawe bi bêjeya rawesaz(heke), li ser bingeha dema boriya têdeyî çêdibe.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Bêjeya alîkar a rawesaz(heke) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya dema boriya dûdar e.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe, bikaranîna wê wekî ya dema boriya dûdar e.**

**• Hekaniya dema boriya dûdar û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 288 : Ketin**
**ketin } ket-**} rayeka hekaniya dema boriya dûdar

**Awayê erênî :**
**Heke ez ketime/Heke tu ketiye/Heke ew ketiye**
**Heke em ketine/Heke hûn ketine/Heke ew ketine**

**Awayê neyînî :**
**Heke ez neketime/Heke tu neketiye/Heke ew neketiye**
**Heke em neketine/Heke hûn neketine/Heke ew neketine**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 289 : Girtin**
**girtin } girt-**} rayeka hekaniya dema boriya dûdar

**Awayê erênî :**
**Heke min girtiye/Heke te girtiye/Heke wî(wê) girtiye**
**Heke me girtiye/Heke we girtiye/Heke wan girtiye**

**Awayê neyînî :**

**Heke min negirtiye/Heke te negirtiye/Heke wî(wê) negirtiye**
**Heke me negirtiye/Heke we negirtiye/Heke wan negirtiye**

• **Bikaranîna hekaniya dema boriya dûdar**

**Mînak : 290 : Di hevokê de hekaniya dema boriya dûdar :**

**Heke ew hatiye ditîn, tu yê bi teksiya xwe bibî.**
**Heke wan kevok firandine, em ê çawa bigirin?**
**Heke berxê şîr nemîtiye, ev nikare avê jî vexwe.**

## V. Hekaniya dema boriya berdest

**Ev rawe bi bêjeya rawesaz(heke), li ser bingeha dema boriya berdest çêdibe.**

• **Çêkirina raweyê**

**a. Bêjeya alîkar a rawesaz(heke) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya dema boriya berdest e.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe, bikaranîna wê wekî ya dema boriya berdest e.**

• **Hekaniya dema boriya berdest û kêşana lêkeran**

♦ **Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 291 : Ketin**
**ketin } ket-}** rayeka hekaniya dema boriya berdest

**Awayê erênî :**
**Heke ez diketim/Heke tu diketî/Heke ew diket**
**Heke em diketin/Heke hûn diketin/Heke ew diketin**

**Awayê neyînî :**
**Heke ez nediketim/Heke tu nediketî/Heke ew nediket**
**Heke em nediketin/Heke hûn nediketin/Heke ew nediketin**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 292 : Girtin**

**girtin } girt-**} rayeka hekaniya dema boriya berdest

**Awayê erênî :**
**Heke min digirt/Heke te digirt/Heke wî(wê) digirt**
**Heke me digirt/Heke we digirt/Heke wan digirt**

**Awayê neyînî :**
**Heke min nedigirt/Heke te nedigirt/Heke wî(wê) nedigirt**
**Heke me nedigirt/Heke we nedigirt/Heke wan nedigirt**

**• Bikaranîna hekaniya dema boriya berdest**

**Mînak : 293 : Di hevokê de hekanî ya dema boriya berdest :**

**Heke hûn li wir rûdiniştin, wî yê ji min re bigota.**
**Heke pirtûk dihatin belavkirin, we jî bixwastana.**
**Heke ew li te nedigeriya, çima ji kalê pirs kiriye?**

**Hekaniyên ku li ser bingeha raweyên daxwazî pêk tên :**

**I. Hekaniya daxwaziya dema niha**

**Ev rawe bi bêjeya rawesaz(heke), li ser bingeha daxwaziya dema niha çêdibe.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Bêjeya alîkar a rawesaz(heke) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema niha ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe, bikaranîna wê wekî ya neyîniya daxwazî ya dema niha ye.**

**• Hekaniya daxwaziya dema niha û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 294 : Çûn**
**(çû + n)**, **çû-**} rayeka raderê
**çûn } ç-**} rayeka hekaniya daxwaziya dema niha

**Awayê erênî :**

**Heke ez biçim/Heke tu biçî/Heke ew biçe**
**Heke em biçin/Heke hûn biçin/Heke ew biçin**

**Awayê neyînî :**
**Heke ez neçim/Heke tu neçî/Heke ew neçe**
**Heke em neçin/Heke hûn neçin/Heke ew neçin**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 295 : Gotin**
**(gotin + in), got-**} rayeka raderê
**gotin } bêj-**} rayeka hekaniya daxwaziya dema niha

**Awayê erênî :**
**Heke ez bibêjim/Heke tu bibêjî/Heke ew bibêje**
**Heke em bibêjin/Heke hûn bibêjin/Heke ew bibêjin**

**Awayê neyînî :**
**Heke ez nebêjim/Heke tu nebêjî/Heke ew nebêje**
**Heke em nebêjin/Heke hûn nebêjin/Heke ew nebêjin**

**• Bikaranîna hekaniya daxwaziya dema niha**

**Mînak : 296 : Di hevokê de hekaniya daxwaziya dema niha :**

**Heke Mem bixwîne û Rewşen jî binivîsîne.**
**Heke Dîlan bixwîne, ew ê lê guhdarî bikin.**
**Eger hûn bên, ez ê karê xwe bidomînim.**
**Ku hûn ranebin, em danekevin qata jêrîn.**

## II. Hekaniya daxwaziya dema borî ya pêkhatî

**Ev rawe bi bêjeya rawesaz(heke), li ser bingeha daxwaziya dema boriya pêkhatî çêdibe.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Bêjeya alîkar a rawesaz(heke) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema boriya pêkhatî ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe, bikaranîna wê wekî ya neyîniya daxwazî ya dema boriya pêkhatî ye.**

**• Hekaniya daxwaziya dema borî ya pêkhatî û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 297 : Çûn**
**çûn } çû-**} rayeka hekaniya daxwaziya dema borî ya pêkhatî
**Lêkera alîkar : Bûn } b-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Heke ez çûbim/Heke tu çûbî/Heke ew çûbe**
**Heke em çûbin/Heke hûn çûbin/Heke ew çûbin**

**Awayê neyînî :**
**Heke ez neçûbim/Heke tu neçûbî/Heke ew neçûbe**
**Heke em neçûbin/Heke hûn neçûbin/Heke ew neçûbin**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 298 : Gotin**
**gotin } got-**} rayeka hekaniya daxwaziya dema borî ya pêkhatî
**Lêkera alîkar : Bûn } b-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Heke min gotibe/Heke te gotibe/Heke wî(wê) gotibe**
**Heke me gotibe/Heke we gotibe/Heke wan gotibe**

**Awayê neyînî :**
**Heke min negotibe/Heke te negotibe/Heke wî(wê) negotibe**
**Heke me negotibe/Heke we negotibe/Heke wan negotibe**

**• Bikaranîna hekaniya daxwaziya dema borî ya pêkhatî**

**Mînak : 299 : Di hevokê de hekaniya daxwaziya dema borî ya pêkhatî :**

**Heke tu nehatibî civînê, çima agahdarî nedane?**
**Heke mamoste xwastibe, wan ê alîkarî bikira.**
**Heke wî çî gotibe, ji te re çi ye, li karê xwe binêre!**

## III. Hekaniya daxwaziya dema borî ya pêknehatî

**Ev rawe bi bêjeya rawesaz(heke), li ser bingeha daxwaziya dema borî ya pêknehatî çêdibe.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Bêjeya alîkar a rawesaz(heke) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema borî ya pêknehatî ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe, bikaranîna wê wekî ya neyîniya daxwaziya dema borî ya pêknehatî ye.**

**• Hekaniya daxwazî ya dema boriya pêknehatî û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 300 : Çûn**
**çûn } çû-**} rayeka hekaniya daxwaziya dema borî ya pêknehatî

**Awayê erênî :**
**Heke ez biçûma/Heke tu biçûyayî/Heke ew biçûya**
**Heke em biçûna/Heke hûn biçûna/Heke ew biçûna**

**Awayê neyînî :**
**Heke ez neçûma/Heke tu neçûyayî/Heke ew neçûya**
**Heke em neçûna/Heke hûn neçûna/Heke ew neçûna**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 301 : Gotin**
**gotin } got-**} rayeka hekaniya daxwaziya dema borî ya pêknehatî

**Awayê erênî :**
**Heke min bigota/Heke te bigota/Heke wî(wê) bigota**
**Heke me bigota/Heke we bigota/Heke wan bigota**

**Awayê neyînî :**
**Heke min negota/Heke te negota/Heke wî(wê) negota**
**Heke me negota/Heke we negota/Heke wan negota**

**• Bikaranîna hekaniya daxwaziya dema borî ya pêknehatî**

**Mînak : 302 :**
**Di hevokê de hekaniya daxwaziya dema borî ya pêknehatî :**

**Heke ciwan bihatana festivalê, wî yê bigota.**
**Heke te ji min re negota, min jî nedizaniya.**
**Heke Nûrcan biçûya û bi çavên xwe bidîta.**

## IV. Hekaniya daxwaziya dema boriya dûr

**Ev rawe bi bêjeya rawesaz(heke), li ser bingeha daxwaziya dema borî ya dûr çêdibe.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Bêjeya alîkar a rawesaz(heke) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema boriya dûr e.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa neyîniyê(ne-) çêdibe, bikaranîna wê wekî ya neyîniya daxwaziya dema boriya dûr e.**

**• Hekaniya daxwaziya dema boriya dûr û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 303 : Çûn**
**çûn } çû-**} rayeka hekaniya daxwaziya dema boriya dûr
**Lêkera alîkar : Bûn } bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Heke ez çûbûma/Heke tu çûbûyayî/**
**Heke ew çûbûya**

**Heke em çûbûna/Heke hûn çûbûna/**
**Heke ew çûbûna**

**Awayê neyînî :**
**Heke ez neçûbûma/Heke tu neçûbûyayî/**
**Heke ew neçûbûya**

**Heke em neçûbûna/Heke hûn neçûbûna/**
**Heke ew neçûbûna**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 304 : Gotin**

gotin } got-} rayeka hekaniya daxwaziya dema boriya dûr
**Lêkera alîkar : Bûn } bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Heke min gotibûya/Heke te gotibûyayî/**
**Heke wî(wê) gotibûya**

**Heke me gotibûya/Heke we gotibûya/**
**Heke wan gotibûya**

**Awayê neyînî :**
**Heke min negotibûya/Heke te negotibûya/**

**Heke wî(wê) negotibûya**
**Heke me negotibûya/Heke we negotibûya/**
**Heke wan negotibûya**

- **Bikaranîna hekaniya daxwaziya dema boriya dûr**

**Mînak : 305 : Di hevokê de hekaniya daxwaziya dema boriya dûr**

**Heke Narê şerbet anibûya, wan ê vexwara.**
**Heke Mîro jî li wir bûbûya, ew ê bikeniyana.**
**Ku kar û mar nebûbûna, wî yê çawa bikira?**

**Jimar : 19**

**Mijar : Raweya divêtî**

**Nasîn :**
**Raweyên divêtî bi çalakiyên xwe; pêdivî, pêwîstbûn û daxwazan vedibêjin. Ew bi lêkera alîkar a "viyan"ê, li ser bingeha raweyên**

**daxwazî pêk tên.**

**Ev lêker bi çar dirûvan tê dîtin : Vîn/viyan/vêtin/vên**

**Di çêkirina raweyê de lêkera "viyan"ê bi du forman bi kar tê :**
**Ji kêşana wê ya dema niha : Divê**
**Ji kêşana wê ya dema boriya berdest : Diviya**

**Her çiqas bikaranîna formên din jî bên dîtin, ew ne karîger in.**
**Bi giştî ev bêje(divê/diviya) tên ber hevokên raweyên divêtiyê.**

**Raweya divêtî li çar beşan dabeş dibe :**
**Ya daxwaziya dema niha**
**Ya daxwaziya dema boriya pêkhatî**
**Ya daxwaziya dema boriya pêknehatî**
**Ya daxwaziya dema boriya dûr**

## I. Divêtiya daxwazî ya dema niha

**Ev rawe bi kêşana dema niha ya lêkera (viyan/vên)'ê, li ser bingeha daxwaziya dema niha çêdibe.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Ji kêşana lêkera alîkar a rawesaz(divê) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema niha ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa (ne-)'yê û bi lêkera duyêmîn çêdibe.**

**★ Destpêk**

**Mînak 306/1 : Bo navê raweyê : Vêtin**
**vêtin(vêt + in) } vêt-}** rayeka raderîn

**✔ Ji kêşana dema boriya berdest : Divêt(di + vêt)**
**Ev form qertafa bêjesaz a (-î )'yê digire : Divêtî**

**Mînak 306/2 : Bo rawesaziyê : Vên**
**vên(vê + n), vê-}** rayeka dema niha

**✔ Ji forma raweya dema niha :**

**Ji bo pêkhatina raweyên divêtî, ya daxwaziya dema niha û ya daxwaziya dema boriya pêkhatî : Divê(di + vê)**

**Mînak 306/3 : Bo daxwazîya dema boriya dûr : Viyan**
**(viya + n), viya-**} rayeka dema borî

✔ **Ji forma raweya dema boriya berdest : Ji bo pêkhatina divêtî yên daxwaziya dema borî, ya pêkhatî û ya dûr : Diviya(di + viya)**

**Mînak 307 : Ev dirûv jî tê bikaranîn : Vîn**
**vîn(vî + n), vî-**} rayeka dema niha

✔ **Bo forma dema niha û ya boriya pêkhatî : Pêdivî(pê + di + vî)**
✔ **Bo forma dema boriya dûr : Pêdiviya(pê + di + viya)**

• **Divetiya daxwazî ya dema niha û kêşana lêkeran**

♦ **Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 308 : Lîstin**
**(lîst + in), lîst-**} rayeka raderê
**lîstin } lîz-**} rayeka divêtiya daxwazî ya dema niha

**Awayê erênî :**
**Divê ez bilîzim/Divê tu bilîzî/Divê ew bilîze**
**Divê em bilîzin/Divê hûn bilîzin/Divê ew bilîzin**

**Awayê neyînî :**
**Divê ez nelîzim/Divê tu nelîzî/Divê ew nelîze**
**Divê em nelîzin/Divê hûn nelîzin/Divê ew nelîzin**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 309 : Xwarin**
**(xwarin + in), xwar-**} rayeka raderê
**xwarin } xw-**} rayeka divêtiya daxwazî ya dema niha

**Awayê erênî :**
**Divê ez bixwim/Divê tu bixwî/Divê ew bixwe**
**Divê em bixwin/Divê hûn bixwin/Divê ew bixwin**

**Awayê neyînî :**
**Divê ez nexwim/Divê tu nexwî/Divê ew nexwe**

**Divê em nexwin/Divê hûn nexwin/Divê ew nexwin**

- **Bikaranîna divêtiya daxwazî ya dema niha**

**Mînak : 310/1 : Di hevokê de divêtiya daxwazî ya dema niha :**

**Divê Berîvan bigere, bibîne û Rewşenê bîne.**
**Divê tu û ew biçin, kovarên wêjeyî bikirin.**
**Hûn jî bên, divê em dakevin bazara masiyan.**
**Divê em ji bo mêvanan xwarinê amade bikin.**

**Mînak : 310/2 : Hin bêje di raweya divêtiyê de bi erka (divê/diviya)'yê bi kar tên : Pêdivî, pêwîst, hewce/gerek :**

**Pêdivî bavê te biçe, ji we re erebeyeke nû hilbijêre.**
**Pêwîst e, ez te bi hespa xwe bibim heta ser kaniyê.**
**Hewce nîn e ku hûn ji wir de bibezin heta rezan.**
**Ne pêwîst e ku ew her roj bê salonê û wan bibe.**

## II. Divêtiya daxwazî ya dema boriya pêkhatî

**Ev rawe bi kêşana dema niha ya lêkera alîkar a (viyan/vên)'ê, li ser bingeha daxwaziya dema borî ya pêkhatî çêdibe.**

- **Çêkirina raweyê**

**a. Ji kêşana lêkera alîkar a rawesaz(divê) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema boriya pêkhatî ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa (ne-)'yê û bi lêkera duyêmîn çêdibe.**

- **Divetiya daxwazî ya dema boriya pêkhatî û kêşana lêkeran**

♦ **Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 311 : Lîstin**
**lîstin } lîst-**} rayeka divêtiya daxwazî ya dema boriya pêkhatî
**Lêkera alîkar : Bûn } b-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Divê ez lîstibim/Divê tu lîstibî/Divê ew lîstibe**
**Divê em lîstibin/Divê hûn lîstibin/Divê ew lîstibin**

**Awayê neyînî :**
**Divê ez nelîstibim/Divê tu nelîstibî/Divê ew nelîstibe**
**Divê em nelîstibin/Divê hûn nelîstibin/Divê ew nelîstibin**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 312 : Xwarin**
**xwarin } xwar-**} rayeka divêtiya daxwazî ya dema boriya pêkhatî
**Lêkera alîkar : Bûn } b-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Divê min xwaribe/Divê te xwaribe/**
**Divê wî(wê) xwaribe**

**Divê me xwaribe/Divê we xwaribe/**
**Divê wan xwaribe**

**Awayê neyînî :**
**Divê min nexwaribe/Divê te nexwaribe/**
**Divê wî(wê) nexwaribe**

**Divê me nexwaribe/Divê we nexwaribe/**
**Divê wan nexwaribe**

• **Bikaranîna divêtiya daxwazî ya dema boriya pêkhatî**

**Mînak : 313 : Di hevokê de divêtiya daxwazî ya dema boriya pêkhatî :**

**Divê Dîlanê nivîsarên Zîlanê xwandibin.**
**Divê Nazê ew şîrmij li piştê xwe girê dabe.**
**Divê Narê ji bo wî soleke folklorîk kirîbe.**
**Divê hûn nehatibin, lê ew ên ha kî bûbin?**

## III. Divêtiya daxwazî ya dema boriya pêknehatî

**Ev rawe bi kêşana dema niha ya lêkera (viyan)'ê, li ser bingeha daxwaziya dema borî ya pêknehatî çêdibe.**

• **Çêkirina raweyê**

**a. Ji kêşana lêkera alîkar a rawesaz(diviya) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema boriya pêknehatî ye.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa (ne-)’yê û bi lêkera duyêmîn çêdibe.**

**• Divêtiya daxwazî ya dema boriya pêknehatî û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 314 : Lîstin**
**lîstin } lîst-}** rayeka divêtiya daxwazî ya dema boriya pêknehatî

**Awayê erênî :**
**Diviya ez bilîstama/Diviya tu bilîstayî/**
**Diviya ew bilîsta**

**Diviya em bilîstana/Diviya hûn bilîstana/**
**Diviya ew bilîstana**

**Awayê neyînî :**
**Diviya ez nelîstama/Diviya tu nelîstayî/**
**Diviya ew nelîsta**

**Diviya em nelîstana/Diviya hûn nelîstana/**
**Diviya ew nelîstana**

**♦ Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 315 : Xwarin**
**xwarin } xwar-}** rayeka divêtiya daxwazî ya dema boriya pêknehatî

**Awayê erênî :**
**Diviya min bixwara/Diviya te bixwara/**
**Diviya wî(wê) bixwara**

**Diviya me bixwara/Diviya we bixwara/**
**Diviya wan bixwara**

**Awayê neyînî :**
**Diviya min nexwara/Diviya te nexwara/**
**Diviya wî(wê) nexwara**

**Diviya me nexwara/Diviya we nexwara/**
**Diviya wan nexwara**

**• Bikaranîna divêtiya daxwazî ya dema boriya pêknehatî**

**Mînak : 316 : Di hevokê de divêtiya daxwazî ya dema boriya pêknehatî :**

**Diviya kirîger bi xwe bihata û li sêvan binêriya.**
**Diviya firoşger zû biçûna û bigihîştana bazarê.**
**Diviya di wê demê de danûstan zehf gêş nebûya.**
**Diviya der barê wir de nûçeyek bihata pêşkêşkirin.**

## IV. Divêtiya daxwazî ya dema boriya dûr

**Ev rawe bi kêşana dema boriya berdest a lêkera (viyan)'ê, li ser bingeha daxwaziya dema boriya dûr çêdibe.**

**• Çêkirina raweyê**

**a. Ji kêşana lêkera alîkar a rawesaz(diviya) : Ev bêje tê ber hevokên raweyê û wek hêmaneke serbixwe cuda tê nivîsandin.**

**b. Bingeha raweyê : Ya daxwaziya dema boriya dûr e.**

**c. Awayê neyîniyê : Bi qertafa (ne-)'yê û bi lêkera duyêmîn çêdibe.**

**• Divetiya daxwazî ya dema boriya dûr û kêşana lêkeran**

**♦ Ji lêkerên negerguhêz :**

**Mînak 317 : Lîstin**
**lîstin } lîst-**} rayeka divêtiya daxwazî ya dema boriya dûr
**Lêkera alîkar : Bûn } bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Diviya ez lîstibûma/Diviya tu lîstibûyayî/**
**Diviya ew lîstibûya**

**Diviya em lîstibûna/Diviya hûn lîstibûna/**
**Diviya ew lîstibûna**

**Awayê neyînî :**
**Diviya ez nelîstibûma/Diviya tu nelîstibûyayî/**
**Diviya ew nelîstibûya**

**Diviya em nelîstibûna/Diviya hûn nelîstibûna/**

**Diviya ew nelîstibûna**

♦ **Ji lêkerên gerguhêz :**

**Mînak 318 : Xwarin**
**xwarin } xwar-**} rayeka divêtiya daxwazî ya dema boriya dûr
**Lêkera alîkar : Bûn } bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Diviya min xwaribûya/Diviya te xwaribûya/**
**Diviya wî(wê) xwaribûya**

**Diviya me xwaribûya/Diviya we xwaribûya/**
**Diviya wan xwaribûya**

**Awayê neyînî :**
**Diviya min nexwaribûya/Diviya te nexwaribûya/**
**Diviya wî(wê) nexwaribûya**

**Diviya me nexwaribûya/Diviya we nexwaribûya/**
**Diviya wan nexwaribûya**

• **Bikaranîna divêtiya daxwazî ya dema boriya dûr**

**Mînak : 319 : Di hevokê de divêtiya daxwazî ya dema boriya dûr :**

**Diviya baxçevan du ştil dabûna wî ji bo te.**
**Diviya bilûrvan ji we re kilam jî gotibûna.**
**Diviya ew mirov seydvanê kewan nebûbûya.**
**Diviya ez jî bi sebrekê ketibûma şopa wan.**

**Jimar : 20**

**Mijar : Lêkerên alîkar**

**Nasîn : Lêkerên alîkar him bi erkên bingehîn, him jî bi yên alîkar bi kar tên û ev lêker du cure ne.**

**Lêkerên alîkar ên ku di pêkhatina raweyan de erkên girîng radikin :**
**Bûn(bûyîn)**
**Hatin/werîn**
**Dan(dayîn)**
**Kirin**
**Viyan(vên/vêtin/vîn)**

**Lêkerên alîkar ên ku bi erkên xwe yên bingehîn jî di hevokên hevedudanî de wek lêkereke alîkar bi kar tên :**
**Xwastin(xwestin)**
**Karîn/kanîn(şiyan)**
**Zanîn**
**Wêrîn**

***Ji lêkerên jorîn (bûn, hatin, wêrîn) negerguhêz, lê yên din gerguhêz in.***

**Lêkerên alîkar ên ku pêkhatina raweyan de erkên girîng radikin :**

**• Bûn :**
**Ez dixwazim berfirehî li ser kêşana vê lêkerê rawestim. Ji ber ku di kêşana wê de hin tevliheviyên rêzimanî derdikevin pêşberî mirov.**
**Ev lêker ji aliyê kêşana lêkerîn ve jî, jêderka qertafên kesandinê ye.**

**♦ Kêşana lêkerê û di raweyan de cih û erkên wê**

**Mînak 320 : Kêşana lêkerê :**

**★ Raweya fermanî**
**bûn(bû + n)**, **bû-**} rayeka raderê, **-n** } paşgira raderîn
**bûn }** **b-**} rayeka raweya fermanî

**Awayê erênî :**
Yekjimar : **Bibe!**
Pirjimar : **Bibin!**

**Awayê neyînî :**
Yekjimar : **Mebe!**
Pirjimar : **Mebin!**

**★ Dema niha**
**bûn**} **b-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**

**Ez dibim/Tu dibî/Ew dibe**
**Em dibin/Hûn dibin/Ew dibin**

**Awayê neyînî :**
**Ez nabim/Tu nabî/Ew nabe**
**Em nabin/Hûn nabin/Ew nabin**

★ **Dema boriya têdeyî**
**bûn(bû + n), bû-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Ez bûm/Tu bûyî/Ew bû**
**Em bûn/Hûn bûn/Ew bûn**

**Awayê neyînî :**
**Ez nebûm/Tu nebûyî/Ew nebû**
**Em nebûn/Hûn nebûn/Ew nebûn**

★ **Çîrokiya dema boriya têdeyî**

**Lêker ji aliyê rayekê ve bingehîn û alîkar e :**
**bûn(bû + n), bû-**} rayeka bingehîn
**bûn(bû + n), bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Ez bûbûm/Tu bûbûyî/Ew bûbû**
**Em bûbûn/Hûn bûbûn/Ew bûbûn**

**Awayê neyînî :**
**Ez nebûbûm/Tu nebûbûyî/Ew nebûbû**
**Em nebûbûn/Hûn nebûbûn/Ew nebûbûn**

★ **Dema boriya dûdar**
**bûn(bû + n), bû-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Ez bûme/Tu bûye/Ew bûye**
**Em bûne/Hûn bûne/Ew bûne**

**Awayê neyînî :**
**Ez nebûme/Tu nebûye/Ew nebûye**
**Em nebûne/Hûn nebûne/Ew nebûne**

★ **Çîrokiya dema boriya dûdar**

**Lêker ji aliyê rayekê ve bingehîn û alîkar e :**
**bûn**(**bû** + **n**), **bû-**} rayeka bingehîn
**bûn**(**bû** + **n**), **bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Ez bûbûme/Tu bûbûye/Ew bûbûye**
**Em bûbûne/Hûn bûbûne/Ew bûbûne**

**Awayê neyînî :**
**Ez nebûbûme/Tu nebûbûye/Ew nebûbûye**
**Em nebûbûne/Hûn nebûbûne/Ew nebûbûne**

★ **Dema boriya berdest**
**bûn**(**bû** + **n**), **bû-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Ez dibûm/Tu dibûyî/Ew dibû**
**Em dibûn/Hûn dibûn/Ew dibûn**

**Awayê neyînî :**
**Ez nedibûm/Tu nedibûyî/Ew nedibû**
**Em nedibûn/Hûn nedibûn/Ew nedibûn**

★ **Dema bê**
**bûn**} **b-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Ez ê bibim/Tu yê bibî/Ew ê bibe**
**Em ê bibin/Hûn ê bibin/Ew ê bibin**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê nebim/Tu yê nebî/Ew ê nebe**
**Em ê nebin/Hûn ê nebin/Ew ê nebin**

★ **Çîrokiya dema bê**
**bûn**(**bû** + **n**), **bû-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Ez ê bibûma/Tu yê bibûyayî/Ew ê bibûya**
**Em ê bibûna/Hûn ê bibûna/Ew ê bibûna**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê nebûma/Tu yê nebûyayî/Ew ê nebûya**
**Em ê nebûna/Hûn ê nebûna/Ew ê nebûna**

★ **Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema borî : Lêkera bûn'ê di vê raweyê de kêm bi kar tê.**

**Lêker ji aliyê rayekê ve bingehîn û alîkar e :**
**bûn**(**bû** + **n**), **bû-**} rayeka bingehîn
**bûn** } **b-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Ez ê bûbim/Tu yê bûbî/Ew ê bûbe**
**Em ê bûbin/Hûn ê bûbin/Ew ê bûbin**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê nebûbim/Tu yê nebûbî/Ew ê nebûbe**
**Em ê nebûbin/Hûn ê nebûbin/Ew ê nebûbin**

★ **Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema boriya dûr**

**Lêker ji aliyê rayekê ve bingehîn û alîkar e :**
**bûn**(**bû** + **n**), **bû-**} rayeka bingehîn
**bûn**(**bû** + **n**), **bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Ez ê bûbûma/Tu yê bûbûya/Ew ê bûbûya**
**Em ê bûbûna/Hûn ê bûbûna/Ew ê bûbûna**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê nebûbûma/Tu yê nebûbûya/Ew ê nebûbûya**
**Em ê nebûbûna/Hûn ê nebûbûna/Ew ê nebûbûna**

★ **Dema bê ya nêzîk**
**kirin** } **k-**} rayeka alîkar a raweyê
**bûn** } **b-**} rayeka bingehîn a raweyê

**Awayê erênî :**
**Ez dikim bibim/Tu dikî bibî/Ew dike bibe**
**Em dikin bibin/Hûn dikin bibin/Ew dikin bibin**

**Awayê neyînî :**
**Ez dikim nebim/Tu dikî nebî/Ew dike nebe**
**Em dikin nebin/Hûn dikin nebin/Ew dikin nebin**

★ **Çîrokiya dema bê ya nêzîk**
**kirin } kir-**} rayeka alîkar a raweyê
**bûn } bû-**} rayeka bingehîn a raweyê

**Awayê erênî :**
**Ez dikira bibûma/Tu dikira bibûyayî/Ew dikira bibûya**
**Em dikira bibûna/Hûn dikira bibûna/Ew dikira bibûna**

**Awayê neyînî :**
**Ez dikira nebûma/Tu dikira nebûyayî/Ew dikira nebûya**
**Em dikira nebûna/Hûn dikira nebûna/Ew dikira nebûna**

**Nîşe :**
**Ev kêşan bi cînavkên tewandî û yên şanîdanê(ev, ew; van, wan) jî pêk tên.**

★ **Daxwaziya dema niha**
**bûn**} **b-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Ez bibim/Tu bibî/Ew bibe**
**Em bibin/Hûn bibin/Ew bibin**

**Awayê neyînî :**
**Ez nebim/Tu nebî/Ew nebe**
**Em nebin/Hûn nebin/Ew nebin**

★ **Daxwaziya dema borî ya pêkhatî**

**Lêker ji aliyê rayekê ve bingehîn û alîkar e :**
**bûn**(**bû + n**), **bû-**} rayeka bingehîn
**bûn** } **b-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Ez bûbim/Tu bûbî/Ew bûbe**
**Em bûbin/Hûn bûbin/Ew bûbin**

**Awayê neyînî :**
**Ez nebûbim/Tu nebûbî/Ew nebûbe**
**Em nebûbin/Hûn nebûbin/Ew nebûbin**

★ **Daxwaziya dema borî ya pêknehatî**
**bûn**(**bû + n**), **bû-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Ez bibûma/Tu bibûyayî/Ew bibûya**
**Em bibûna/Hûn bibûna/Ew bibûna**

**Awayê neyînî :**
**Ez nebûma/Tu nebûyayî/Ew nebûya**
**Em nebûna/Hûn nebûna/Ew nebûna**

★ **Daxwaziya dema boriya dûr**

**Lêker ji aliyê rayekê ve bingehîn û alîkar e :**
**bûn**(**bû** + **n**), **bû-**} rayeka bingehîn
**bûn**(**bû** + **n**), **bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Ez bûbûma/Tu bûbûya/Ew bûbûya**
**Em bûbûna/Hûn bûbûna/Ew bûbûna**

**Awayê neyînî :**
**Ez nebûbûma/Tu nebûbûya/Ew nebûbûya**
**Em nebûbûna/Hûn nebûbûna/Ew nebûbûna**

★ **Raweya xwestekî li ser bingeha daxwaziyê pêk tê û ji aliyê kêşana lêkera bûn'ê ve jî tu cudatî nîn e. Em ê bi yek hevokên nimûnedar mijarê derbas bikin.**

**Xwestekî ya daxwaziya dema niha :**
**Xwezî ew bibe nivîskarekî navder.**

**Xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêkhatî :**
**Xwezî tu kes ji aliyê mejiyê ve nebûbe belengaz.**

**Xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêknehatî :**
**Xweziya hûn mamosteyên zanîngehê bibûna.**

**Xwestekî ya daxwaziya dema boriya dûr :**
**Xweziya tu xebatkarê wê kargehê nebûbûya.**

★ **Raweya bilanî mîna ya xwestekî li ser bingeha daxwaziyê pêk tê û ji aliyê kêşana lêkera bûn'ê ve jî ti cudatî nîn e.**

**Bilaniya dema niha :**
**Bila ew bibe çayger ku hûn çaya baş vexwin.**

**Bilaniya dema borî ya pêkhatî :**
**Dîlanê xeber şandiye ku bila jê re xem nebûbe.**

**Bilaniya dema borî ya pêknehatî :**
**Bila amrazên ragihandinê nûjen bibûna.**

**Bilaniya dema borî ya dûr :**
**Bila Zîlan di folklorê de serwer bûbûya.**

**★ Raweya hekanî û beşên wê, li ser raweyên pêşkêrî yên bingehîn û li ser ên daxwaziyê yên bingehîn pêk tên. Ji aliyê kêşana lêkera bûn'ê ve tu cudatî nayên holê.**

**♦ Di hekaniyên ku li ser bingeha raweyên pêşkerî pêk tên de :**

**Hekaniya dema niha :**
**Heke Berîvan nebe, Rewşen nikare bixebite.**

**Hekaniya dema bê :**
**Heke hûn ê beşdar nebin, dê çawa alîkar bibin?**

**Hekaniya dema boriya têdeyî :**
**Heke ew dêndar bû, diviya dest bi xebatê bikira.**

**Hekaniya dema boriya dûdar :**
**Heke zarok mezin bûya û li ser piyan bûbûya.**

**Hekaniya dema boriya berdest :**
**Heke Pîro parsok dibû, te yê ji wan re negota.**

**♦ Di hekaniyên ku li ser bingeha raweyên daxwazî pêk tên de :**

**Hekaniya daxwaziya dema niha :**
**Heke ew şanoger bibin û hûn jî lê temaşe bikin.**

**Hekaniya daxwaziya dema borî ya pêkhatî :**
**Heke projeyek bûbe, ew ê hatibûya ser maseyê.**

**Hekaniya daxwaziya dema borî ya pêknehatî :**
**Heke ew nexweş nebûya û di taziyê de hebûya.**

**Hekaniya daxwaziya dema boriya dûr :**
**Heke ava me sar bûbûya û we jî vexwaribûya.**

★ **Raweya divêtî û beşên wê li ser raweya daxwazî yên bingehîn pêk tên û ji aliyê kêşana lêkera bûn'ê ve cudatî nayên dîtin.**

**Divêtiya daxwazî ya dema niha :**
**Divê tu xebathez bibî ku di pêşbaziyê de bi ser bikevî.**

**Divêtiya daxwazî ya dema boriya pêkhatî :**
**Divê ew zane bûbe û malbat jî pê serbilind bûbe.**

**Divêtiya daxwazî ya dema boriya pêknehatî :**
**Diviya roj germ bibûya, lê ew jî pê sergêj nebûya.**

**Divêtiya daxwazî ya dema boriya dûr :**
**Diviya yara wî li wir bûbûya û bi serê xwe bûbûna.**

**Mînak 321 : Eger raderek di hevokê de wek navdêrekê bi kar bê û qertafeke kesandinê jî, ji wê raderê şûn de bê, wê demê ew qertaf cuda tê nivîsandin.**

Çi avakirin û **wêrankirin in**, çi binketin û **serketin in!**
(Tavên Stêrîn, A. Karabax)

♦ **Lêkera bûn'ê û qertafên kesandinê**

**Mînak 322 : Lêkera bûn'ê û qertafên kesandinê :**

★ **Ev lêker jêderka qertafên kesandinê ye :**

✔ **Bêje bi dengdarekê dawî dibe : Bêyî bikaranîna bi kêşana lêkeran, ew qertaf cuda tên nivîsandin :**

**Yekjimar : (-im, -(y)î, -e)**
**Pirjimar : (-in, -in, -in)**

**Ez xwendekar im û ew jî xwendevan in.**
**Ez diçim dibistanê, lê ew diçin pirtûkxaneyê.**

✔ **Bêje bi dengderekê dawî dibe : Ew qertaf cuda tên nivîsandin :**

**Yekjimar : (-me, -yî, -ye)**
**Pirjimar : (-ne, -ne, -ne)**

**Tu xwende yî, lê yên ha nexwende ne.**
**Ez hoste me, xebatkarên me jêhatî ne.**

♦ **Lêkera bûn'ê, hebûn, tune bûn, nîn**

**Mînak 323 : Lêkera (bûn)'ê û (hebûn û tune bûn, nîn) :**

★ **Ji aliyê peyvsaziyê ve lêkera bûn'ê, di hebûn û tune bûn'ê de cih digire. Kêşana wan dirûvên darîştî bo her dem û raweyê ne karîger in.**

**Hebûn erêniyê, tune bûn neyîniyê şanî didin. Bêjeya nîn'ê jî wekî tune bûn'ê, neyîniyê radigihîne.**

**Em ê vê xalê bi hin kêşan û hevokên nimûnedar derbas bikin.**

**Raweya fermanî :**
**hebûn } heb-**} rayeka raweyê
**tune bin } tune b-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
Yekjimar : **Hebe!**
Pirjimar : **Hebin!**

**Awayê neyînî 1 :**
Yekjimar : **Mebe!**
Pirjimar : **Mebin!**

**Awayê neyînî 2 :**
Yekjimar : **Tune be!**
Pirjimar : **Tune bin!**

**Dema niha :**
**Hebûn :**
**Ez heme/Tu heyî/Ew heye**
**Em hene/Hûn hene/Ew hene**

**Tune bûn :**
**Ez tune me/Tu tune yî/Ew tune ye**
**Em tune ne/Hûn tune ne/Ew tune ne**

★ **Di hevokê de : (hebûn, tune bûn, nîn bûn) :**

**Dema niha :**
**Berîvan li dibistanê ye, lê Rojda nîn e.**
**Em li mal in, lê ew li vir nîn in.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Dema ku ew hat, Mem li wir hebû.**
**Dema ku Alan diçû, Mem ne li wir bû.**
**Dema ku Alan diçû, Mem li wir tune bû.**

**Daxwaziya dema niha :**
**Ew hebe ku hûn bi hev re bimeşin.**
**Ew nebe, hûn nikarin ji vir derkevin.**

♦ **Lêkera bûn'ê û forma dibetî**

**Mînak 324 : Forma dibetî :**
**Ev ne rawe ye, lê formek e. Bingeh û navandina wê ji lêkera bûn'ê tê.**

★ **Pêkhatina navê formê :**

**Dema niha :**
**bûn } b-**} rayeka dema niha
Yekjimar, ji bo kesê sêyemîn : **Ew dibe**

**Ji qertafên bêjesaz, paşgir : -tî**
**Navê formê : Dibe + tî } Dibetî**

**Di formê de dirûvê ku tê bikaranîn : Dibe :**
**Ev dirûv bi (ku)'yê ve cih digire û li şûna (dibe)'yê, (belkî, mimkun) jî tê xebitandin.**

★ **Forma dibetî, bi kêşana lêkerê ya daxwaziya dema niha û ya daxwaziya dema boriya pêkhatî ve çêdibe. Ev form ji bo her du raweyên daxwaziyê jî gelek karîger e.**

**Bi daxwaziya dema niha :**

**Dibe ku ew wê nameyê bixwîne.**
**Dibe ku hûn bi lez ji wir neçin.**

**Belkî ew sibehê zû bên û me bibin.**
**Mimkun e ku ew nîvro biçe danûstanê.**
**Bi derfet e ku ew te bi balafirê jî bişîne.**

**Bi daxwaziya dema borî ya pêkhatî :**

**Dibe ku Memê ji Dîlanê pere girtibin.**
**Dibe ku Ferho evîndarê Rojdayê nebûbe.**

**Heye ku ew xwendekar nehatibin festivalê.**
**Belkî Alan bi Cano re çûbe bajarekî din.**
**Ne mimkun e ku hûn bêbêndan meşiyabin.**

**• Hatin :**
**Avaniya tebatî bi vê lêkerê pêk tê, lêkerên lebatî jî bi alîkariya wê dikevin rewşa tebatiyê.**

**Lêkera hatin'ê bi werîn'ê ve hemwate ne, lê lêkera werîn'ê mîna wê ne karîger e, di her raweyê de jî nayê bikaranîn û cihê xwe dide lêkera hatin'ê.**

**Em ê bi giranî li ser *avaniya tebatî* rawestin, ji ber ku ji aliyê erka bingehîn ve lêkera hatin'ê di gelek raweyan de hatibû kêşandin.**

**♦ Hatin û werîn**

**Mînak 325 : Lêker : Hatûn û werîn**

**★ Raweya fermanî :**
**hatin(hat + in)**, **hat-**} rayeka raderê, **-in** } paşgira raderîn
**hatin** } **hê-**} rayeka raweya fermanî

**Bikaranîna nûjen :**

**Awayê erênî :**
Yekjimar : (**bi** + **hê** + **e**) → **Bê**!
Pirjimar : (**bi** + **hê** + **in**) → **Bên**!

**Awayê neyînî :**
Yekjimar : **Mê(meyê)!**
Pirjimar : **Mên(meyin)!**

**Bikaranîna dirûvê kevn :**

**Awayê erênî :**
Yekjimar : (**bi** + **hê** + **e**) → **Bihê**!
Pirjimar : (**bi** + **hê** + **in**) →**Bihên**!

**Awayê neyînî :**
Yekjimar : **Mehê!**
Pirjimar : **Mehên!**

**★ Raweya fermanî :**

**Werîn(wer + in), wer-**} rayeka raderê, **-in** } paşgira raderîn
**wer-**} rayeka raweya fermanî
Pêşgira raweya fermanî ya erêniyê bi kar nayê : (**bi-**)

**Awayê erênî :**
Yekjimar : (**wer + e**) → **Were**!
Pirjimar : (**wer** + **in**) → **Werin**!

**Awayê neyînî, ji lêkera (hatin)'ê :**
Yekjimar : **Mê**(**meyê**)!
Pirjimar : **Mên**(**meyin**)!

**Awayê neyînî(di zimanê gelêrî de tê dîtin) :**
Yekjimar : **Mere/nere!**
Pirjimar : **Merin/nerin!**

★ **Di dema niha de lêkera werîn'ê bi kar nayê û li şûna wê ya hatin'ê karîger e.**

✔ **hatin** } **hê-**} rayeka fermaniyê, **h-**} ev di bikaranîna nûjen de dikeve.

✔ **-ê-} Ev ji bo raweyên jêrîn jî rayek e :**
dema niha
dema bê ya nêzîk
dema bê
daxwaziya dema niha
xwestekî ya daxwaziya dema niha
bilaniya dema niha
hekaniya dema niha
dîvêtiya dema niha
forma dibetî ya dema niha

★ **Dema bê : Lêker : Hatin**

**Pêşgira raweyê : bi-**
**Ji bo avaniya dema bê : (bi + hê-) → bê**

**Dirûvê nûjen :**

**Awayê erênî :**
**Ez ê bêm/Tu yê bêyî/ Ew ê bê**
**Em ê bên/Hûn ê bên/Ew ê bên**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê neyêm/Tu yê n(e)êyî/ Ew ê neyê**
**Em ê neyên/Hûn ê neyên/Ew ê neyên**

**Dirûvê kevn :**

**Awayê erênî :**
**Ez ê bihêm/Tu yê bihêyî/ Ew ê bihê**
**Em ê bihên/Hûn ê bihên/Ew ê bihên**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê nehêm/Tu yê nehêyî/ Ew ê nehê**
**Em ê nehên/Hûn ê nehên/Ew ê nehên**

★ **Lêkera werîn'ê di raweyên jêrîn de bi kar tê û di awayê neyîniyê de cihê xwe dide neyîniya lêkera hatin'ê :**

**Dema bê ya nêzîk :**
**Ez dikim werim, te bibim kursê.**
**Ez dikim neyêm û te nebim kursê.**

**Dema bê :**
**Ew ê were, hûn ê jê re pêşniyaz bikin.**
**Ew ê neyê û hûn jî jê re pêşniyaz nakin.**

**Daxwaziya dema niha :**
**Em guh bidin wî mirovî, ka çi dibêje?**

**Xwestekiya dema niha :**
**Xwezî ew were, ji min re vê mijarê vebêje.**

**Bilaniya dema niha :**
**Bila Dîlan were, porê Rewşenê bişo.**

**Hekaniya dema niha :**
**Heke ew were şahiyê, tu jî pê re werî.**

**Hekaniya dema bê :**
**Heke hûn ê werin cejnê, qîzan jî bînin.**

**Hekaniya daxwazî ya dema niha :**
**Heke tu werî, wê dîsa ji bîr meke.**

**Divêtiya daxwazî ya dema niha :**

**Divê em werin û careke din jî neyên.**

**Di forma dibetiyê de lêkera werîn'ê :**
**Dibe ku ew were û li şûna min jî tu biçî.**

**Lêkera werîn'ê li hin deveran bi dirûvê warin'ê bi cih bûye :**
**Ez ê warim ku te bibim ba koma piyanojen.**

**♦ Avaniya lebatî û ya tebatî**

**Mînak 326 : Lebatî û tebatî :**

**★ Avaniya lebatî :**
**Di vê avaniyê de kirde çalakiyan pêk tînin û ev kirde berbiçav in, nerguhêz û gerguhêz hemû lêker bi kar tên.**

**Ji lêkerên negerguhêz : rabûn, lîstin, mirin :**
**Ciwan radibûn û dilîstin.**
**Di bahoza par de gelek sewal mirin.**

**Ji lêkerên gerguhêz : Anîn, dan, birîn :**
**Min çar heste anîn û dan wî.**
**Darbir darek nebiriye.**

**★ Avaniya tebatî :**
**Di vê avaniyê de kirde ne kiryar e. Yan nayê xuyakirin yan jî bi awayeke veşarî di bandora çalakiyê de dimîne.**

**Avaniya tebatî bi alîkariya lêkera hatin'ê pêk tê û lêkera bingehîn jî di dawiya hevokê de bi dirûvê raderîn cih digire.**
**Di hevokê de lêkerên bingehîn çendek jî dibin.**

**Avaniya tebatî bi lêkerên negerguhêz pêk nayê. Lê li ser bingeha hin lêkerên negerguhêz, dirûvên gerguhêz tên dariştin ku ew jî dibin lêkerên tebatî.**

**Avaniya tebatî, bêyî raweya fermanî di hemû raweyan de bi kar tê.**
**Lêkera werîn'ê jî di hin dem û raweyan de tê xebitandin.**

**♦ Bikaranîna avaniya tebatî :**

**Mînak 327 : Bikaranîna avaniya tebatî :**

**Dema niha :**

**Lêkera alîkar : hatin**
**Lêkera bingehîn : kirîn**

**Yekjimar, bireser pirtûkek e.**
**Pirtûk tê kirîn.**

**Pirjimar, bireser pirtûk gelek in.**
**Pirtûk tên kirîn.**

**Di hevokê de :**
**Hin mirov tên hevandin û hinek jî tên birêkirin.**
**Em pirs dikin, lê xaniyekî nebiha nayê dîtin.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Romaneke şahkar hat nivîsandin.**
**Lê berhemeke şanoyî nehat afirandin.**

**Çîrokiya dema boriya têdeyî :**
**Bedenek li nêzî keleyê hatibû lêkirin.**
**Xanên dîrokî ji nû ve nehatibûn avakirin.**

**Dema boriya dûdar :**
**Li ser wî çemî pirek hatiye çêkirin.**
**Koçber di ser wê re nehatine derbaskirin.**

**Dema boriya berdest :**
**Xaliyên biha jî dihatin standin.**
**Ewqas kulav hebûn, yek nedihat kirîn.**

**Dema bê ya nêzîk :**
**Ew dike ku pirtûka wê bê weşandin.**

**Dema bê :**
**Ew dizane ku peyam dê ji kê re neyên şandin.**
**Ji wan kesan hinek dê werin xebitandin.**

**Çîrokiya dema bê :**
**Ew ê ji bo axaftinê bihata hilbijartin.**
**Hûn ê bo semînerê nehatana nasandin.**

**Daxwaziya dema niha :**
**Nivîsarên te ji aliyê wî ve bên sererastkirin.**
**Wêneyê wî bi destê wêneger were kişandin.**

**Xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêkhatî :**
**Xwezî her afetzade hatibe bi war û mal kirin.**

**Bilaniya dema boriya dûr :**
**Bila ew qesr û konax nehatibûna hilweşandin.**

**Hekaniya daxwaziya dema borî ya pêknehatî :**
**Heke navê te bihata xwandin, tu yê biçûya.**

**Divêtiya daxwazî ya dema boriya dûr :**
**Diviya hin berhem hatibûna berhevkirin.**

★ **Di forma dibetiyê de :**

**Bi daxwaziya dema borî ya pêkhatî ve :**
**Dibe ku hemû zevî hatibin demankirin.**

• **Dan :**
**Alîkariya vê lêkerê di avaniya dançêker de derdikeve pêşberî mirov. Ev avanî jî bi lêkerên gerguhêz tê holê.**

♦ **Pêkhatina avaniya dançêker**

**Dema ku karek bi destî hinan bê kirin, ji aliyê rêzimanî ve ew kar li gorî vê avaniyê pêk tên.**

**Di avaniya dançêker de lêkera alîkar (dan), li gorî mêjera bireserê dikeve kêşanê û lêkera bingehîn jî bi dirûvê raderê di dawiya hevokê de cih digire. Di hevokê de lêkerên bingehîn çendek jî dibin.**

**Di vê avaniyê de kirde ji yekê pirtir in û di kar û barê çalakiyê de hevpar in, lê di vê hevpariyê de rolên wan ne wek hev in. Yek dide çêkirin û yek pêk tîne. Yan hin didin çêkirin û hin jî pêk tînin.**

**Ne pêwîst e ku kêşana lêkera dan'ê bê ducarkirin. Em ê li gorî raweyan, avaniya dançêker bi hevokên nimûnedar bidin kolandin. Ev avanî di hemû dem û raweyan de karîger e.**

**Mînak 328 : Ji bo destpêkê :**

✔ **Heger mirov karekî bi xwe bike, wisa tê gotin :**

**Ez peykerekî çêdikim.**
**Wî du şelûl nefirandin.**

**Heger mirov karekî bi hinan bide kirin, wisa tê gotin ku ew li gorî avaniya dançêker e :**

**Ez peykerekî didim çêkirin.**
**Wî du şelûl nedan firandin.**

**Di avaniya dançêker de bikaranîna daçeka (bi)'yê :**
**Ew danasîna kursê, bi wî jî dide meşandin.**
**Hûn afîşên xwe bi destê kê didin çapkirin?**

**♦ Bikaranîna avaniya dançêker**

**Mînak 329 : Bikaranîna avaniya dançêker :**

**Raweya fermanî :**
**Bide bezandin!**
**Mede bezandin!**

**Dema niha :**
**Kevir û dar dan berhevkirin.**
**Edîtor lêkolîna te neda weşandin.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Dîlanê ferhenga kurdî da bergkirin.**

**Çîrokiya dema boriya têdeyî :**
**Wê kompîtura xwe nedabû veherandin.**

**Dema boriya dûdar :**
**Nanpêj makîneya hevîr daye şûştin.**

**Çîrokiya dema boriya dûdar :**
**Hevîrker gogên hevîr nedabûne razandin.**

**Dema boriya berdest :**
**Zêrkerên wê kolanê zêr didan razandin.**

**Dema bê ya nêzîk :**
**Ez dikim berçavka xwe bidim nûyandin.**

**Çîrokiya dema bê ya nêzîk :**
**Narê dikira salnameyê bida çirandin.**

**Dema bê :**
**Ew ê wê berhemê nede dikirandin.**

**Çîrokiya dema bê :**
**Wî yê dikan tevde bidana kirêkirin.**

**Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema borî :**
**Berîvanê dê kulîlkên çilmisî dabin çinandin.**

**Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema boriya dûr :**
**Wî yê ji bo wan tu tişt nedabûya ragihandin.**

**Daxwaziya dema niha :**
**Em dîkekî ser jêkin û bidin qewirandin.**

**Daxwaziya dema borî ya pêkhatî :**
**Wî kavirên wan nedabin qusandin.**

**Daxwaziya dema borî ya pêknehatî :**
**Gundiyan daristan bidaya birandin.**

**Daxwaziya dema boriya dûr :**
**Darbiran dar nedabûna nijandin.**

**Xwestekî ya daxwaziya dema niha :**
**Xwezî hûn porên zarokan bidin tiraşkirin.**

**Xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêkhatî :**
**Xwezî nasnameyên wan nedabin mêrandin.**

**Xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêknehatî :**
**Xweziya wan ji we re zargotin bidana vegoitin.**

**Xwestekî ya daxwaziya dema boriya dûr :**
**Xweziya Nalînê ew nedabûya vexwendin.**

**Bilaniya dema niha :**
**Ji Narê re bibêje, bila wî mastî bide firotin.**

**Bilaniya dema borî ya pêkhatî :**
**Jê re bibêje, bila nexweş nedabe gerandin.**

**Bilaniya dema borî ya pêknehatî :**
**Bila te gûzên wan bidana jimartin.**

**Bilaniya dema boriya dûr :**
**Bila cîranan genim dabûna hêrandin.**

**Hekaniya dema niha :**
**Heke tu diranan didî çêkirin, bila ew jî bên.**

**Hekaniya dema bê :**
**Heke ew ê bide xapandin, em ê çawa bizanin?**

**Hekaniya dema boriya têdeyî :**
**Heke wan hesp dan bezandin, me nebihîstiye.**

**Hekaniya dema boriya dûdar :**
**Heke mal dane parkirin, kesek pê nehisiyaye.**

**Hekaniya dema boriya berdest :**
**Heke ew didan rûniştandin, dê jê re bigotana.**

**Hekaniya daxwaziya dema niha :**
**Heke tu wî barî nedî rakirin, ez ji wan re nabim.**

**Hekaniya daxwaziya dema borî ya pêkhatî :**
**Heke wî dabe niyazkirin, wan ê piştgirî bikira.**

**Hekaniya daxwaziya dema borî ya pêknehatî :**
**Heke ew bidana darizandin, diya me nedigiriya.**

**Hekaniya daxwaziya dema boriya dûr :**
**Heke zêr dabûna wezinandin, min ê bidîta.**

**Divêtiya daxwazî ya dema niha :**
**Wê jî got, divê tu derguşê bidî hejandin.**

**Divêtiya daxwazî ya dema boriya pêkhatî :**
**Divê wan bi hêza wî mal dabin raguhastin.**

**Divêtiya daxwazî ya dema boriya pêknehatî :**
**Diviya wî demjimêr bidaya raguherandin.**

**Divêtiya daxwazî ya dema boriya dûr :**
**Diviya te çavên lîstivanan nedana girêdan.**

★ **Di forma dibetiyê de :**

**Bi daxwaziya dema niha ve :**
**Dibe ku dîroknas xirbeyê bide kolandin.**

**Bi daxwaziya dema borî ya pêkhatî ve :**
**Dibe ku rêk û mêk jî dabin vekirin.**

**• Kirin :**
**Bi alîkariya lêkera kirin'ê *raweyên dema bê ya nêzîk* pêk tên. Di gelek raweyan de ev lêker hatibû kêşandin, ne hewce ye ku em li vir jî wan ducar bikin. Em ê bi hêsanî li ser hin taybetiyên vê lêkerê yên din rawestin.**

**♦ Forma erênî-neyînî :**
**Ev form hema bi hemû lêkeran çêdibe. Lêker bi kêşana erenî û neyînî cih digire. Ev bikaranîn; pêkolî, bergerî û lavayan tînîn ziman. Li gorî lêkerên xwe bi wateyên din jî bar dibin.**

**Di dema niha de :**
**Ez dikim nakim, zarok naçe dibistanê.**

**Di dema boriya têdeyî de :**
**Wê kir nekir, wî destên xwe neşûştin.**

**Di dema boriya berdest de :**
**Narê dikir nedikir, wê çavên xwe venedikir.**

**Bi avaniya tebatî ve :**
**Wî dikir nedikir, derî nedihat vekirin.**

**Bi avaniya dançêker ve :**
**Me dikir nedikir, wî erd neda ajotin.**

**Bi lêkerên din ve forma erênî-neyîniyê :**
**Ez xwe dizanim nizanim ew mirov wiha ye.**
**Wî dixwand nedixwand û tê nedigihîşt.**

**• Viyan : xwastin/xwestin, vên/vêtin/vîn :**
**Ev lêker û dirûvên wê, ji aliyê wateya ferhengî ve hemwate tên diyarkirin. Lê di bikaranînên xwe de wate û erkên cuda digirin. Ev dirûv him bi erkên bingehîn û him bi yên alîkar bi kar tên.**

**Lêkera xwastin'ê wek lêkereke alîkar bi erk e, lê bi vê dirûvê ji bo raweya divêtiyê ne karîger e.**

**Dirûvên vên, vêtin, vîn'ê, wek viyan'ê pêdivî û pêwîstiyê tînin ziman û wek wê jî, bi giranî bi van wateyan tên xebitandin ku di raweya divêtiyê de jî bi erk in.**

**Di raweya divêtiyê de em li ser erka alîkar a viyan'ê rawestibûn. Em ê li vir jî erka wê ya bingehîn vekolînin. Lê ew bi vê erkê kêm tê karandin.**

**Kêşana lêkerê û dirûvên wê : Viyan(vên, vîn, vêtin)**

**Mînak 330 : Ev lêker bi wateya xwe ya ferhengî gerguhêz e, digel vê bikaranînên negerguhêz jî tên dîtin.**

★ **Bo kêşana lêkerê û dirûvên wê :**

**Lêker : Viyan**
(**viya** + **n**), **viya-**} rayeka raderê, **-n** } paşgira raderîn

**Dirûvê lêkerê : Vên**
(**vê** + **n**), **vê-**} rayeka raderê, **-n** } paşgira raderîn

**Dirûvê lêkerê : Vîn**
(**vî** + **n**), **vî-**} rayeka raderê, **-n** } paşgira raderîn

**Dirûvê lêkerê : Vêtin**
(**vêt** +**in**), **vêt-**} rayeka raderê, **-in** } paşgira raderîn

★ **Raweya fermanî :**

**Ev di raweya fermanî de bo dirûvê viyan'ê jî bi kar tên :**

**Awayê erênî :**

Yekjimar : **Bivê!**
(**bi** + **vî** + **e**), **-î** + **e** } **-ê** } dibe, yan jî (**-vê**)'yê ji (**vên**)'ê digire.

Pirjimar : **Bivên!**
(**bi** + **vî** + **en**), **-î** + **e** } **-ê** } dibe, yan jî (**-vê**)'yê ji (**vên**)'ê digire.

**Awayê neyînî :**
Yekjimar : **Mevê!**
Pirjimar : **Mevên!**

**Dirûvê lêkerê : vêtin**

**Awayê erênî :**
Yekjimar : **Bivête!**
Pirjimar : **Bivêtin!**

**Awayê neyînî :**
Yekjimar : **Mevête!**
Pirjimar : **Mevêtin!**

★ **Dema niha :**

**Bikaranîna negerguhêz :**

**Awayê erênî :**
**Ez divêm/Tu divêyî/Ew/divê**
**Em divên/Hûn divên/Ew divên**

**Awayê neyînî :**
**Ez navêm/Tu navêyî/Ew navê**
**Em navên/Hûn navên/Ew navên**

**Bikaranîna gerguhêz :**

**Awayê erênî :**
**Min divê/Te divê/Wî(wê) divê**
**Me divê/We divê/Wan divê**

**Awayê neyînî :**
**Min navê/Te navê/Wî(wê) navê**
**Me navê/We navê/Wan navê**

**Di hevokê de :**

**Min lepikek divê, lê te du sol divên.**
**Lepikek min divê, lê du sol te divên.**

**Me hevalek divê û bo we jî sisê divên.**
**Hevalek me divê û sisê jî bo we divên.**

**Ez te divê û tu min divê ku wisa tê evîn.**
**Em we divên û hûn me divên, wisa tê jîn.**

**Dirûvê lêkerê : vêtin**

**Bikaranîna negerguhêz :**

**Awayê erênî :**
**Ez divêtim/Tu divêtî/Ew/divête**
**Em divêtin/Hûn divêtin/Ew divêtin**

**Awayê neyînî :**
**Ez navêtim/Tu navêtî/Ew navête**
**Em navêtin/Hûn navêtin/Ew navêtin**

**Bikaranîna gerguhêz :**

**Awayê erênî :**
**Min divêt/Te divêt/Wê(wê) divêt**
**Me divêt/We divêt/Wan divêt**

**Awayê neyînî :**
**Min navêt/Te navêt/Wî(wê) navêt**
**Me navêt/We navêt/Wan navêt**

**Di hevokê de :**
**Wî pênûs navêt, lê defter divêtin.**
**Wê pirtûk divêtin, lê jêbir navêt.**

★ **Dema boriya berdest :**
**Wan erebeyek diviya ku pê biçûna.**
**Min hêzek diviya ku lez bimeşiyama.**

**Lêkerên alîkar ên ku bi erkên xwe yên bingehîn jî wek lêkereke alîkar bi kar tên :**

• **Xwastin :**
**Ev lêker jî xwediyê erkên bingehîn û alîkar e. Lê ew erk ji yên viyan'ê û dirûvên wê yên din gelek cudatir in. Wateya pêdivî û pêwîstiyê di xwe de nehewîne. Weke lêkereke serbixwe ye û bi xwestin'ê ve hemwate ne.**

**Em ê li vir li ser erkên wê rawestin. Ev lêker di hemû dem û raweyan de karîger e.**

**Mînak 331 : Xwastin(xwestin) :**
**(xwast + in), xwast-**} rayeka raderê û ya dema borî
**(xwest + in), xwest-**} rayeka raderê û ya dema borî

♦ **Bo erka lêkerê ya bingehîn**

**Mînak 332/1 : Bo erka lêkerê ya bingehîn :**

**Raweya fermanî :**
**xwastin } xwaz-**} rayeka raweyê
**xwestin } xwez-**} rayeka raweyê

**Yekjimar :**

**Awayê erênî :**
**Bixwaze!/Bixweze!**

**Awayê neyînî :**
**Mexwaze!/Mexweze!**

**Pirjimar :**

**Awayê erênî :**
**Bixwazin!/Bixwezin!**

**Awayê neyînî :**
**Mexwazin!/Mexwezin!**

**Dema niha :**
**Ez ji te alîkariyê dixwazim.**
**Ew ji wan piştgiriyê naxwaze.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Diya wî jê re şarek xwast.**
**Wê pel û post nexwastin.**

**Dema boriya dûdar :**
**Alan û Nazê ji wî pereyên xwe xwastine.**
**Lê Memê yên xwe nexwastine.**

**Dema boriya berdest :**
**Wan ji wî gundî qîzek dixwast.**
**Mal û mexel nedixwastin, zêr dixwastin.**

**Dema bê :**
**Em ê ji wan hevalbendiyê bixwazin.**
**Hûn ê jê belge û melgeyan nexwazin.**

♦ **Bo erka lêkerê ya alîkar :**

**Mînak 332/2 : Bo erka lêkerê ya alîkar :**

**Di vê bikaranînê de lêkera xwastin'ê alîkar e. Lê ya bingehîn lêkereke din e. Di hevokê de lêkerên bingehîn çendek jî dibin.**

**Dema niha :**
**Ez dixwazim biçim û wî bînim cem xwe.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Wî xwast ku bi Nazê re bipeyive.**

**Çîrokiya dema boriya têdeyî :**
**Min nexwastibû ku ew pêre biçûya.**

**Dema boriya dûdar :**
**Cano xwastiye ku şîv ewqas sar nebûya.**

**Çîrokiya dema boriya dûdar :**
**Wî nexwastibûye ku ew bûbûya dozger.**

**Dema boriya berdest :**
**Wê dixwast ku ew ê nebe bermalî.**

**Dema bê :**
**Ew ê bixwaze ku tu zanyar bibî.**

**Çîrokiya dema bê :**
**Wan ê bixwastana ku, dê li cih nehiştana.**

**Daxwaziya dema niha :**
**Gava ku tu çekê bixwazî, ew bi xwe dide.**

**Xwestekiya dema niha :**
**Xwezî tu bixwazî û ez gulan biçirpînim.**

**Bilaniya dema niha :**
**Bila ew bixwaze ku hûn biçin rûyên hev.**

**Hekaniya dema niha :**
**Heke ew bixwaze, tu yê çêlekê bidoşî.**

**Divêtiya dema niha :**
**Divê tu bixwazî û ew jî wî karî pêk bînê.**

**Di forma dibetiyê de :**

**Bi daxwaziya dema niha ve :**
**Dibe ku ew bixwaze û dev jê berde.**

**Di forma erênî-neyîniyê de :**

**Dema niha :**
**Ew dixwaze naxwaze, ma ji te re derd e?**

**• Karîn/kanîn :**
**Ev lêker hemwate ne. Pêkanîna karekî yan jî bûyînekê, ji aliyê hêz û şeyê ve diyar dikin. Li gorî lêkera karîn'ê şiyan kêm bi kar tê. Lêkera kanîn'ê di hin devokan de karîger e.**

**Lêkera şe kirin'ê, bi wan lêkerên jorîn ve hemwate ne. Digel vê di bikaranîna şe kirin'ê de bo karekî jêhatin û huner sereke ne.**

**Mînak 333 : Karîn/kanîn :**
**Ev lêker bi erka bingehîn û ya alîkar di hemû dem û raweyan de karîger in. Ji aliyê kêşanê ve jî wekî hev tên kêşandin.**
**Di neyîniya dema niha de li şûna qertafa (na-), ya (ni-)'yê digirin.**

**(karî + n)**, **karî-**} rayeka raderê û ya dema borî
**(kanî + n)**, **kanî-**} rayeka raderê û ya dema borî

**Mînak 334/1 : Di hin raweyan de kêşana lêkerê :**

**Raweya fermanî :**
**karîn**} **kar-**} rayeka raweyê
**kanîn**} **kan-**} rayeka raweyê

**Yekjimar :**

**Awayê erênî :**
**Bikare!/Bikane!**

**Awayê neyînî :**
**Mekare!/Mekane!**

**Pirjimar :**

**Awayê erênî :**
**Bikarin!/Bikanin!**

**Awayê neyînî :**
**Mekarin!/Mekanin!**

**Dema niha :**
**karîn**} **kar-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Ez dikarim/Tu dikarî/Ew dikare**
**Em dikarin(Hûn dikarin/Ew dikarin**

**Awayê neyînî :**
**Ez nikarim/Tu nikarî/Ew nikare**
**Em nikarin/Hûn nikarin/Ew nikarin**

**Dema boriya têdeyî :**
**karîn** } **karî-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Min karî/Tê karî/Wî(wê) karî**
**Me karî/We karî/Wan karî**

**Awayê neyînî :**
**Min nekarî/Tê nekarî/Wî(wê) nekarî**
**Me nekarî/We nekarî/Wan nekarî**

**Çîrokiya dema boriya têdeyî :**
**karîn**} **karî-**} rayeka raweyê
**bûn**} **bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Min karîbû/Tê karîbû/Wî(wê) karîbû**
**Me karîbû/We karîbû/Wan karîbû**

**Awayê neyînî :**
**Min nekarîbû/Tê nekarîbû/Wî(wê) nekarîbû**
**Me nekarîbû/We nekarîbû/Wan nekarîbû**

**Di zimanê gelêrî de li şûna (-î-)'yê, (-i-) :**
**Wan karibû, lê wî nekaribû.**

**Dema boriya dûdar :**
**karîn**} **karî-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Min kariye/Tê kariye/Wî(wê) kariye**
**Me kariye/We kariye/Wan kariye**

**Awayê neyînî :**
**Min nekariye/Tê nekariye/Wî(wê) nekariye**
**Me nekariye/We nekariye/Wan nekariye**

**Çîrokiya dema boriya dûdar :**
**karîn**} **kar-**} rayeka raweyê
**bûn**} **bû-**} rayeka alîkar

**Awayê erênî :**
**Min karîbûye/Tê karîbûye/Wî(wê) karîbûye**
**Me karîbûye/We karîbûye/Wan karîbûye**

**Awayê neyînî :**
**Min nekarîbûye/Tê nekarîbûye/Wî(wê) nekarîbûye**
**Me nekarîbûye/We nekarîbûye/Wan nekarîbûye**

**Di zimanê gelêrî de li şûna (-î-)'yê, (-i-) :**
**Min karibûye, lê te nekaribûye.**

**Dema boriya berdest :**
**karîn**} **kar-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Min dikarî/Tê dikarî/Wî(wê) dikarî**
**Me dikarî/We dikarî/Wan dikarî**

**Awayê neyînî :**
**Min nedikarî/Tê nedikarî/Wî(wê) nedikarî**
**Me nedikarî/We nedikarî/Wan nedikarî**

**Dema boriya berdest : Karîn/kanîn :**
**Ev lêker bi dirûvê jêrîn jî tên kêşandin :**

**Awayê erênî :**
**Min dikariya/Tê dikariya/Wî(wê) dikariya**
**Me dikaniya/We dikaniya/Wan dikaniya**

**Awayê neyînî :**
**Min nedikariya/Tê nedikariya/Wî(wê) nedikariya**

**Me nedikaniya/We nedikaniya/Wan nedikaniya**

**Dema bê :**
**karîn**} **kar-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Ez ê bikarim/Tu yê bikarî/Ew ê bikare**
**Em ê bikarin/Hûn ê bikarin/Ew ê bikarin**

**Awayê neyînî :**
**Ez ê nekarim/Tu yê nekarî/Ew ê nekare**
**Em ê nekarin/Hûn ê nekarin/Ew ê nekarin**

**Çîrokiya dema bê :**
**karîn**} **karî-**} rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Min ê bikariya/Te yê bikariya/Wî(wê) yê bikariya**
**Me yê bikariya/We yê bikariya/Wan ê bikariya**

**Awayê neyînî :**
**Min ê nekariya/Te yê nekariya/Wî(wê) yê nekariya**
**Me yê nekariya/We yê nekariya/Wan ê nekariya**

**Mînak 334/2 : Di hin raweyan de bikaranîna lêkerê ya alîkar :**

**Dema niha :**
**Dîlan dikare ku bibe civaknas.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Min nekarî sêvê spî bikim.**

**Dema boriya dûdar :**
**Wî kariye hemû kesan bihewîne.**

**Dema boriya berdest :**
**Berîvanê dikarî ku bêje ew pêre neçin.**

**Dema bê :**
**Tu yê bikarî hevalan bibînî.**

**Dema bê ya nêzîk :**
**Ez dikim bikarim bimeşim.**

**Daxwaziya dema borî ya pêkhatî :**
**Narê karibe erebeyek bikiriya.**

**Hekaniya dema niha :**
**Heke ew bikare, em ê biryarê xwe bidin.**

**Divêtiya dema niha :**
**Divê Zîlan bikare û ew jî pêk bîne.**

**Di avaniya lebatiyê de :**

**Bi dema niha :**
**Hûn dikarin alîkar bin, salon jî tê xemilandin.**

**Di avaniya dançêker de :**

**Bi dema niha :**
**Ew nikare ku pê malê bide şêlkirin.**

**Di forma dibetiyê de :**

**Bi daxwaziya dema niha ve :**
**Dibe ku ew bikare birêse.**

**Di forma erênî-neyîniyê de :**

**Bi daxwaziya dema niha :**
**Tu bikarî nekarî, ew ê te bide xebitandin.**

• **Şiyan : Ev ne lêkereke tekûz û karîger e. Digel vê di hin raweyan de karîgeriya wê bala mirov dikişîne. Em ê bi kurtasî li ser rawestin.**

**Mînak 335/1 : Bo kêşana lêkerê :**
**(şiya + n), şiya-**} rayeka raderê û ya dema borî

**Raweya fermanî :**
**şiyan } şê-**} rayeka raweyê

**Yekjimar :**

**Awayê erênî : (bi + şê + e) : Bişê!**
**Awayê neyînî : (me + şê + e) : Meşê!**

**Pirjimar :**

**Awayê erênî : (bi + şê + in) : Bişên!**
**Awayê neyînî : (me + şê + in) : Meşên!**

**Dema niha :**
**şiyan } şê-}** rayeka raweyê

**Awayê erênî :**
**Ez dişêm/Tu dişêyî/Ew dişê**
**Em dişên(Hûn dişên/Ew dişên**

**Awayê neyînî :**
**Ez naşêm/Tu naşêyî/Ew naşê**
**Em naşên/Hûn naşên/Ew naşên**

**Mînak 335/2 : Bo bikaranînê lêkerê :**

**Dema niha :**
**Ez dişêm ku fîlmê wî rexne bikim.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Wî projeya xwe şiya û me jî pejirand.**

**Çîrokiya dema boriya têdeyî :**
**Wî neşiyabû ku ji wan re rûpoşan jî bistîne.**

**Dema boriya dûdar :**
**Wê şiyaye ku bi wan re saleke din bixebitiya.**

**Dema bê :**
**Hûn ê bişên ku em encameke erênî bigirin.**

**• Şe kirin : Ev lêker hevedudanî û gerguhêz e. Dibe ku ji rayeka şiyan'ê ya dema niha hatibe darişţin û (şê), vediguhere (şe)'yê. Ev lêker ji aliyê kêşanê ve mîna lêkera kirin'ê tê kişandin.**

**Ev her du lêker hevreng in, lê wate û erkên wan cuda ne :**
**Şe kirin : şiyan, karîn, kanîn.**
**Şe kirin : por, rî, kevir an tiştekî din şe kirin.**

**Mînak 336/1 : Bo kêşana lêkerê : şe kirin(şiyan, karîn, kanîn) :**
**(şe + kir + in), şekir-}** rayeka raderê û ya dema borî

**Raweya fermanî :**
**şe kirin} şek-}** rayeka raweyê

**Yekjimar :**

**Awayê erênî : (şe + bi + k + e) : Şeke!**
**Awayê neyînî : (şe + me + k + e) : Şemeke!**

**Pirjimar :**

**Awayê erênî : (şe + bi + k + in) : Şekin!**
**Awayê neyînî : (şe + me + k + in) : Şemekin!**

**Mînak 336/2 : Bo bikaranînê lêkerê :**

**Dema niha :**
**Nalîn şe dike ku bi serê xwe li bajêr bigere.**
**Cano şe nake ku ew bi tenê li wir bije.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Wan şe kir, dê avahiya şaredariyê pêk bihata.**
**Wî şe nekir ku ew ê zane û şixulhez bibe.**

**Mînak 336/3 : Şe kirin :**
**Li hin deveran bi wateya bawerî kirin, bawerî pê anîn'ê jî bi kar tê :**

**Di hevokê de :**
**Ew şe nake ku tu him bixebitî û him jî bixwînî.**
**Min şe dikir ku ew ê bikare kamyonê biajo.**

**• Zanîn :**
**Ev lêker di wateya xwe ya ferhengî de "fêmkirin, hînbûn, nasîn û pêkanîn"ê vedihewîne.**
**Ji aliyê kêşanê ve mîna lêkera karîn'ê tê kêşandin û di neyîniya dema niha de jî wekî wê li şûna qertafa (na-), ya (ni-)'yê digire.**

**Mînak 337/1 : Zanîn**
**(zanî + n), zanî-}** rayeka raderê û ya dema borî

**★ Raweya fermanî :**
**zanîn} zan-}** rayeka raweyê

**Yekjimar :**

**Awayê erênî : Bizane!**
**Awayê neyînî : Mezane!**

**Pirjimar :**
**Awayê erênî : Bizanin!**
**Awayê neyînî : Mezanin!**

**Mînak 337/2 : Bo bikaranîna lêkerê :**

**Dema niha :**
**Ez dizanim ku helbest çawa tên xwandin.**
**Ew nizane bi zimanê Çînî agahdariyê bide.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Wî zanî ku bi rûniştinê kar nameşin.**

**Dema boriya dûdar :**
**Wan nezaniye ku ew ê bi mal û malbat bibe.**

**Dema bê :**
**Ew ê bizane xwarinê, lê nizane ku çêke.**

**• Wêrîn :**
**Ev bi wateya xwe ya ferhengî, ji bo pêkanîna karekî wêrîtiyê nîşan dide. Lêkera gerguhêz a wêrandin'ê ji wê hatiye dariştin. Lêkera wêrîn'ê bi erka xwe ya alîkar hîntir karîger e.**

**Mînak 338/1 : Wêrîn**
**(wêrî + n)**, **wêrî-**} rayeka raderê û ya dema borî

**Raweya fermanî :**
**wêrîn } wêr-**} rayeka raweyê

**Yekjimar :**

**Awayê erênî : Biwêre!**
**Awayê neyînî : Mewêre!**

**Pirjimar :**

**Awayê erênî : Biwêrin!**
**Awayê neyînî : Mewêrin!**

**Mînak 338/2 : Bo bikaranînê lêkerê :**

**Raweya fermanî :**
**Biwêre biçe û wî marî bigire.**

**Dema niha :**
**Mem diwêre bi şev jî derkeve rêwîtiyê.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Wî newêriya ku bi parşûtê dakeve jêr.**

**Dema bê :**
**Ew ê newêre, ji pireyê de xwe berde avê?**

**Daxwaziya niha :**
**Em biwêrin, em ê hêzên xwe xurttir bikin.**

**Daxwaziya dema boriya dûr :**
**Wan wêrîbûya, dê bi dest xwe bixistana.**

**Hekaniya dema niha :**
**Heke ew biwêre, dê bibe qeşmerê şanoyî.**

**Jimar : 21**

**Mijar : Rawe û avanî**

**Rawe :**
**Rawe ji aliyê rawesaziyê ve li ser çar hêmanên bingehîn pêk tên :**

**Dem, kes, mêjer û kêşana lêkerê. Li gorî raweyên xwe di pêkhatina wan de hin bêjeyên alîkar(*xwezî, bila, heke, divê*) jî xwediyê erkan in.**

**Ji aliyê senifandinê ve rawe li ser du beşên sereke tên komkirin : Yên pêşkerî û yên daxwazî.**

**A. Raweyên pêşkerî :**
**Ji aliyê navandinê ve ev rawe bi navên demên xwe tên ragihandin :**

**I. Dema niha**

**II. Demên borî :**

**a. Dema boriya têdeyî**
- **Çîrokiya dema boriya têdeyî**

**b. Dema boriya dûdar**
- **Çîrokiya dema boriya dûdar**

**c. Dema boriya berdest**

**III. Dema bê**
- **Çîrokiya dema bê**
- **Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema borî**
- **Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema boriya dûr**

**IV. Dema bê ya nêzîk**
- **Çîrokiya dema bê ya nêzîk**

**B. Raweyên daxwazî :**
**Ji aliyê navandinê ve ev rawe bi navên raweyên xwe tên diyarkirin :**

**I. Raweya daxwazî :**
- **Daxwaziya dema niha**
- **Daxwaziya dema borî ya pêkhatî**
- **Daxwaziya dema borî ya pêknehatî**
- **Daxwaziya dema boriya dûr**

**II. Raweya fermanî**

**III. Raweya xwestekî :**
- **Xwestekî ya daxwaziya dema niha**
- **Xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêkhatî**
- **Xwestekî ya daxwaziya dema boriya pêknehatî**

**• Xwestekî ya daxwaziya dema boriya dûr**

**IV. Raweya bilanî :**
**• Bilaniya dema niha**
**• Bilaniya dema borî ya pêkhatî**
**• Bilaniya dema borî ya pêknehatî**
**• Bilaniya dema boriya dûr**

**V. Raweya hekanî :**
**Raweyên hekanî li ser du beşên raweyên bingehîn pêk tên.**

**Hekaniyên ku li ser bingeha raweyên pêşkerî pêk tên, pênc in :**
**• Ya dema niha**
**• Ya dema bê**
**• Ya dema boriya têdeyî**
**• Ya dema boriya dûdar**
**• Ya dema boriya berdest**

**Hekaniyên ku li ser bingeha raweyên daxwazî pêk tên, çar in :**
**• Ya daxwaziya dema niha**
**• Ya daxwaziya dema borî ya pêkhatî**
**• Ya daxwaziya dema borî ya pêknehatî**
**• Ya daxwaziya dema boriya dûr**

**VI. Raweya divêtî :**
**• Ya daxwaziya dema niha**
**• Ya daxwaziya dema boriya pêkhatî**
**• Ya daxwaziya dema boriya pêknehatî**
**• Ya daxwaziya dema boriya dûr**

**Piştî wan rêzandinên jorîn em ê (çêbiwar û pareng)'ê jî bi kurtasî bidin dahûrandin.**

**Çêbiwar :**
**Wek tê zanîn jê re *raweya çêbiwar* jî tê gotin. Lê ev navlêkirin ne di cih de ye. Ji ber ku bêyî rayeka lêkerê ya dema borî, tu daneyên din ên ku raweyî di xwe de nehewîne.**

**Dirûvê çêbiwar bi rayeka dema borî pêk tê û formeke parengî ye.**

**Di forma neyîniyê de qertafa (ne-)'yê di çêbiwariyê de pêşgir an navgir cih digirin û her du jî bi rayeka çêbiwar ve tên nivîsandin.**

**Bêjeyên çêbiwar pêkhatî ne û mîna rengdêrên çawaniyê bi kar tên.**

**Mînak 339 : Pêkhatina dirûvê çêbiwar :**

★ **Rayeka lêkerê ya dema borî eger bi tîpeke dengdar dawî bibe, paşgira çêbiwar (-î ) lê tê zêdekirin :**

**Lêker : Ketin(ket + in)**

**(ket + î ), ketî** } ji bo dirûvê yê **erêniya çêbiwar** a lêkerê
**neketî** } ji bo dirûvê yê **neyîniya çêbiwar** a lêkerê

**Di hevokê de :**
**Mirovê ketî, rabû ser xwe û li asoyên rengîn nêriya.**
**Mirovê neketî, dibeziya ku di pêşbaziyê de bibe yê yekemîn.**

★ **Rayeka lêkerê ya dema borî eger bi tîpa (-î-)'yê dawî bibe, ev tîp li şûna paşgira çêbiwar digire :**

**Lêker : Anîn(anî + n)**

**anî } çêbiwar**
**neanî } neyîniya çêbiwar**

**Di hevokê de :**
**Ava ku anî hendik bû, bi wan nekir.**

★ **Rayeka lêkerê ya dema borî eger bi tîpa (û)'yê dawî bibe, berî paşgira çêbiwar, tîpa kelijandinê (y)'ê cih digire :**

**Lêker : Çûn(çû + n)**

**çûyî } çêbiwar**
**neçûyî } neyîniya çêbiwar**

**Di hevokê de :**
**Şivanê çûyî careke din venegeriyabû.**

★ **Ji bo hin lêkerên hemwate û dirûvên cuda :**

**Lêker : Revîn(revî + n)**

**revî } çêbiwar**
**nerevî } neyîniya çêbiwar**

**Lêker : Reviyan(reviya + n)**

**reviyayî } çêbiwar**
**nereviyayî } neyîniya çêbiwar**

**Di hevokê de :**
**Hespa nereviyayî dihat nalkirin.**

**★ Bo lêkerên pêkhatî :**

**Lêker : Vexwarin(vexwar + in)**

**vexwarî } çêbiwar**
**venexwarî } neyîniya çêbiwar**

**Di zimanê gelêrî de dirûvê neyînî :**
**nevexwarî } neyîniya çêbiwar**

**Di hevokê de :**
**Rêwiyê ku av venexwarî nan jî nexwar.**

**★ Bo lêkerên hevedudanî :**

**Lêker : Çêkirin(çêkir + in)**

**çêkirî } çêbiwar**
**çênekirî } neyîniya çêbiwar**

**Di zimanê gelêrî de dirûvê neyînî:**
**neçêkirî } neyîniya çêbiwar**

**Di hevokê de :**
**Kevirên çêkirî baş dihatin lêkirin.**

**Pareng :**
**Ev ji aliyê wesfandinê ve bi rengdêrê, ji aliyê kêşanê ve jî bi lêkerê ve peywendîdar in.**

**Mînak 340/1 : Çend mînak ji bo parengê :**

**Dema niha :**

**Lêker : Ketin**

**kev** } rayeka raweyê

Yekjimar :
**Dîlanê *gula dikeve,* girt û dirêjî Alên kir.**

Pirjimar :
**Dîlanê gulên *dikevin,* girtin û dirêjî Alên kirin.**

**Daxwaziya dema niha :**

**Lêker : Birîn**
**bir** } rayeka raweyê

Yekjimar :
***Dara ku bibire,* ne mezin bû û min birî.**

Pirjimar :
***Darên ku bibirin,* ne mezin bûn û min birîn.**

**Dema boriya têdeyî :**

**Lêker : Çêkirin**
**çêkir** } rayeka raweyê

Yekjimar :
***Dîmenê çêkirî,* wî kiriye û te jî ji min re aniye.**

Pirjimar :
***Dîmenên çêkirî,* wî kirîne û te jî ji min re anîne.**

**Mînak 340/2 : Bo parengê çend mînakên din, ji yên cuda :**

**Dema niha :**

**Keça ku *di xewê de digîre :***
**Keça ku *di xewê de digîre,* evîndar bûye.**

**Dema boriya têdeyî :**

**Ciwanê ku *di xewê de negirî(negiriya)* :**
**Ciwanê ku *di xewê de negiriya,* ne evîndar bû.**

**Çîrokiya dema boriya têdeyî :**

**Keça ku *di xewê de giriyabû* :**
**Keça ku *di xewê de giriyabû,* helbestvan bûye.**

**Dema boriya berdest :**

**Jina ku *di xewê de digiriya* :**
**Jina ku *di xewê de digiriya,* bêkes û bêmal bû.**

**Dema bê :**

**Bûka ku wê *di xewê de bigîre* :**
**Bûka ku wê *di xewê de bigîre,* bê xew mabû.**

**Çîrokiya dema bê :**

**Pîra ku wê *di xewê de negiriya* :**
**Pîra ku wê *di xewê de negiriya,* mixabin bi roj digiriya.**

**Daxwaziya dema niha :**

**Kalê ku *di xewê de bigîre* :**
**Kalê ku *di xewê de bigîre,* li ber êgir rûdinişt.**

**Ahenga dem û raweyan :**
**Di bikaranîna dem û raweyan de aheng hene. Her dem û rawe bi hev re bi kar nayên. Bo hin dem û raweyên ku bi hev re bikar tên, em dê hevokên nimûnedar bidin.**

**Mînak 341 : Dema niha bi raweyên din ve :**

**★ Li jêr di hevokên hevedudanî de yên bingehîn ên dema niha ne û ew yên reşkirî ne :**

**✔ Dema niha**

**Dema niha :**
**Ez dibînim ku ew li çi dinêre.**

**Dema bê :**
**Ez dizanim ku ew ê ji wir biçe.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Ez dizanim ku wî çi anî.**

**Dema boriya dûdar :**
**Ez dizanim ku wê çi aniye.**

**Daxwaziya dema niha :**
**Ez têm ku te bibînim.**

**Daxwaziya dema niha :**
**Ez bi şik im ku ew neçe ba wî.**

**Mînak 342 : Dema boriya têdeyî bi raweyên din ve :**

★ **Li jêr di hevokên hevedudanî de yên bingehîn ên dema boriya têdeyî ne û ew yên reşkirî ne :**

✔ **Dema boriya têdeyî**

**Dema boriya têdeyî :**
**Ew kesê ku we dît, mamosteyê me bû.**

**Çîrokiya dema boriya têdeyî :**
**Roja ku ew çûn, ez ziviriyabûm.**

**Dema boriya dûdar :**
**Wî ji min re got ku ew mirov hatiye dîtin.**

**Dema boriya berdest :**
**Dema ku ew bi rê ket, tu jî dihatî.**

**Dema bê :**
**Min zanî ku ew ê biçe cem wan.**

**Çîrokiya dema bê :**
**Narê ji Nazê re got : "Min ê çay çêkira."**

**Daxwaziya dema niha :**
**Ew bawer dike ku ez wî bibînim.**

**Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema boriya pêknehatî :**
**Min ji te re got ku wî ew vexwara, ew ê sergêj bûbûya.**

**Mînak 343 : Çîrokiya dema boriya têdeyî bi raweyên din ve :**

★ **Li jêr di hevokên hevedudanî de yên bingehîn ên çîrokiya dema boriya têdeyî ne û ew yên reşkirî ne :**

✔ **Çîrokiya dema boriya têdeyî**

**Çîrokiya dema boriya têdeyî :**
**Wî civanî kevirek dabû ser milê xwe û anîbû ber malê.**

**Çîrokiya dema bê :**
**Wan jê re nivîsand ku wî yê tu bişandaya xebatê.**

**Daxwaziya dema niha :**
**Ew hatibû ku min bibe zanîngehê.**

**Mînak 344 : Dema boriya dûdar bi raweyên din ve :**

★ **Li jêr, di hevokên hevedudanî de yên bingehîn ên dema boriya dûdar in û ew yên reşkirî ne :**

✔ **Dema boriya dûdar**

**Dema boriya dûdar :**
**Ew wê salê, bi roj xebitîne û bi şev jî çûne kursa muzîkê.**

**Çîrokiya dema boriya dûdar :**
**Narê ji Nazê re gotiye ku wan li wir kilamek gotibûye.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Narê ji Nazê re gotiye ku wan li wir kilamek got.**

**Çîrokiya dema boriya têdeyî :**
**Narê ji Nazê re gotiye ku wan li wir kilamek gotibû.**

**Dema bê :**
**Narê ji Nazê re gotiye ku ew ê li wir kilamekê bibêjin.**

**Daxwaziya dema niha :**
**Narê ji Nazê re gotiye ku ew li wir  kilamekê bibêjin.**

**Daxwaziya dema borî ya pêknehatî :**
**Memê ji Zînê re gotiye ku wan li wir kilamek bigota.**

**Daxwaziya dema boriya dûr :**
**Memê ji Zînê re gotiye ku wan li wir kilamek gotibûya.**

**Mînak 345 : Çîrokiya dema boriya dûdar bi raweyên din ve :**

**★ Li jêr di hevokên hevedudanî de yên bingehîn ên çîrokiya dema boriya dûdar in û ew yên reşkirî ne :**

**✔ Çîrokiya dema boriya dûdar**

**Çîrokiya dema boriya dûdar :**
**We salê berfek daketibûye ku piştî wê gelek dar hişk bûbûne.**

**Mînak 346 : Dema boriya berdest bi raweyên din ve :**

**★ Li jêr di hevokên hevedudanî de yên bingehîn ên dema boriya berdest in û ew yên reşkirî ne :**

**✔ Dema boriya berdest**

**Dema boriya berdest :**
**Em di meha gulanê de diçûn zozanê û hol ava dikirin.**

**Dema bê :**
**Min hêvî dikir ku ew ê min bi tenê nehêlî.**

**Çîrokiya dema bê :**
**Li şûna ku we savar dixwar, we yê goşt bixwara.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Dema ku ez derbas dibûn, ew ji dîwêr de ket.**

**Dema boriya dûdar :**
**Dema ku hûn dihatin, ew ji mizgeftê derketiye.**

**Çîrokiya dema boriya têdeyî :**
**Min dizanî ku wî di civînê de çi pêşniyaz kiribû.**

**Mînak 347 : Dema bê bi raweyên din ve :**

**★ Li jêr di hevokên hevedudanî de yên bingehîn ên dema bê ne û ew yên reşkirî ne :**

**✔ Dema bê**

**Dema bê :**

**Pereyên ku dê bên berhevkirin, ew ê têxin bankayê.**

**Dema niha :**
**Dîlan û Berîvan dê ji vir biçin û îro jî Alan diçe.**

**Daxwaziya dema niha :**
**Ew ê biçe dibistanê ku mamoste bibe ba bapîra xwe.**

**Mînak 348 : Çîrokiya dema bê bi raweyên din ve :**

★ **Li jêr di hevokên hevedudanî de yên bingehîn ên çîrokiya dema bê ne û ew yên reşkirî ne :**

✔ **Çîrokiya dema bê**

**Çîrokiya dema bê :**
**Wî yê têr bixwara ku heta êvarê dê birçî nebûya.**

**Dema boriya berdest :**
**We yê balon bidana ku ew çawa pê kêfxweş dibûn.**

**Daxwaziya dema niha :**
**We yê balafirok bikirana ku zarok pê şa bibin.**

**Mînak 349 : Daxwaziya dema niha bi raweyên din ve :**

★ **Li jêr di hevokên hevedudanî de yên bingehîn ên daxwaziya dema niha ne û ew yên reşkirî ne :**

✔ **Daxwaziya dema niha**

**Daxwaziya dema niha :**
**Heta ku baran nesekine, em neçin.**

**Dema bê :**
**Çawa ku baran bisekine, em ê bibezin.**

**Dema boriya têdeyî :**
**Dema ku ew hevdu bibînin, ez ji wir çûm.**

**Dema boriya dûdar :**
**Gava ku ew bên, hûn ji otelê derketine.**

**Çîrokiya dema boriya têdeyî :**

**Ji bo ku pûroyan bifiroşe, li otogarê mabû.**

**Mînak 350 : Daxwaziya dema borî ya pêknehatî bi raweyên din ve :**

**★ Li jêr di hevokên hevedudanî de yên bingehîn ên daxwaziya dema boriya pêknehatî ne û ew yên reşkirî ne :**

**✔ Daxwaziya dema borî ya pêknehatî**

**Çîrokiya dema boriya têdeyî :**
**Ji bo ku Memê bixwanda, wan koçî bajêr kiribû.**

**Dema boriya berdest :**
**Ji bo ku wî baş bixwanda, ew bêpere nedihiştin.**

**Çîrokiya dema bê :**
**Heta ku wan ez nedîtama, dê li wir bimana.**

**Mînak 351 :**
**Hekaniya daxwaziya dema borî ya pêkhatî bi raweyên din ve :**

**★ Li jêr di hevokên hevedudanî de yên bingehîn ên hekaniya daxwaziya dema borî ya pêkhatî ne û ew yên reşkirî ne :**

**✔ Hekaniya daxwaziya dema borî ya pêkhatî**

**Dema bê :**
**Heke wan ji wî re gotibe, ew ê ji min re bibêje.**

**Divêtiya daxwazî ya dema boriya pêkhatî :**
**Heke ew hatibe, divê baytar jî bi xwe re anîbe.**

**Mînak 352 :**
**Hekaniya daxwaziya dema borî ya pêknehatî bi raweyên din ve :**

**★ Li jêr di hevokên hevedudanî de yên bingehîn ên hekaniya daxwaziya dema borî ya pêknehatî ne û ew yên reşkirî ne :**

**✔ Hekaniya daxwaziya dema borî ya pêknehatî**

**Çîrokiya dema bê :**
**Ku hûn biçûna pêşangehê, we yê pirtûk bikirana.**

**Dema boriya berdest :**

**Eger em bigihiştana balafirê, em diçûn Hewlêrê.**

**Mînak 353 : Hekaniya daxwaziya dema borî ya dûr bi raweyên din ve :**

**★ Li jêr di hevokên hevedudanî de yên bingehîn ên hekaniya daxwaziya dema borî ya dûr in û ew yên reşkirî ne :**

**✓ Hekaniya daxwaziya dema borî ya pêknehatî**

**Çîrokiya dema bê ya daxwaza dema boriya dûr :**
**Ku ew li otelê rûniştibûya, dê nivîskarê navder dîtibûya.**

**Çîrokiya dema bê :**
**Eger te ew nebiribûya malê, dê li wir şeveder bimaya.**

**Domdariya deman :**
**Ev bikaranîn ji bo hin deman karîger e ku wateyeke domdar dide demên xwe. Di kêşanê de avaniya lêkerê ya demê, qertafa (di-) û paşgira (-e)'yê digire, di neyîniyê de jî qertafa (ne-) lê tê zêdekirin.**

**• Domdariya dema niha : Paşgira domdariyê(-e), tê dawiya kêşana lêkerê ya dema niha :**

**Ez her roj di ber wî dîwarî re derbas dibime.**
**Ez her roj di ber wî dîwarî re derbas nedibime.**

**• Domdariya dema borî ya têdeyî : Li ser kêşanê lêkerê ya dema boriya têdeyî, bi her du qertafên domdariyê pêk tê :**

**Wî gelek pirtûkên dîrokî dixwandine.**
**Wî gelek pirtûkên dîrokî nedixwandine.**

**• Domdariya dema borî ya dûdar : Qertafa domdariyê (di-), tê ber kêşana lêkerê ya dema boriya dûdar û paşgira dema boriya dûdar cihê xwe diparêze :**

**Wan li zanîngehê dersên zimanê Kurdî didane.**
**Wan li zanîngehê dersên zimanê Kurdî nedidane.**

**• Domdariya dema borî ya berdest : Paşgira domdariyê(-e), tê dawiya kêşana lêkerê ya dema boriya berdest :**

**Ew her havîn diçûne ber gola Wanê.**
**Ew her havîn nediçûne ber gola Wanê.**

**Avanî :**
**Ji aliyê kêşanê ve têkildariya lêkerê ya ku bi dem, kes û mêjerê re tê holê, vedibêje. Rawe bê avaniyan lêkeran pêk nayên, avaniya hinan serbixwe û ya hinan jî hevpar in.**

**Mînak 354 : Çend mînak ji bo avaniya lêkerê ya deman :**

★ **Dema niha :**

**Lêker : Çûn**

**Ew diçe.**

✔ **diçe** } Avaniya lêkerê ya dema niha û lebat e. Kirde kesê duyemîn, nêr û mê, yekjimar e.

**Em diçin.**

✔ **diçin** } Avaniya lêkerê ya dema niha û lebat e. Kirde kesê yekemîn, nêr û mê, pirjimar e.

**Em naçin.**

✔ **naçin** } Avaniya lêkerê ya neyîniya dema niha û lebat e. Kirde kesê yekemîn, nêr û mê, pirjimar e.

★ **Dema boriya têdeyî :**

**Lêker : Xwarin**

**Wî xwar.**

✔ **xwar** } Avaniya lêkerê ya dema boriya têdeyî û lebat e. Kirde kesê sêyemîn, nêr û yekjimar e.

**Me xwar.**

✔ **xwar** } Avaniya lêkerê ya dema boriya têdeyî û lebat e. Kirde kesê yekemîn, nêr û mê, pirjimar in.

**Me nexwar.**

✔ **xwar** } Avaniya lêkerê ya neyîniya dema boriya têdeyî û lebat e. Kirde kesê yekemîn, nêr û mê, pirjimar in.

**Lêker : Dîtin**

**Wan ez dîtim.**

✔ **dîtim** } Avaniya lêkerê ya dema boriya têdeyî û lebat e. Ji aliyê bireser û cînavkê ve jî ergatîvî ye. Kêşana lêkerê li gor bireserê(**ez**) ye. Kirde kesê sêyemîn, nêr û mê, pirjimar in.

**Lêker : Hev maç kirin**

**Berîvan û Berfînê hev maç kirin.**

**hev maç kirin** } Avaniya lêkerê ya dema boriya têdeyî û lebat e. Ji aliyê bireser û cînavkê ve jî berbihevîn e. Kirde kesê sêyemîn, mê û pirjimar e.

★ **Dema boriya berdest :**

**Lêker : Xwe şûştin**

**Te xwe şûşt.**

✔ **xwe şûşt** } Avaniya lêkerê ya dema boriya berdest û lebat e. Ji aliyê bireser û cînavkê ve jî vegerok e. Kirde kesê duyemîn, nêr û mê, yekjimar e.

**We xwe şûştin.**

✔ **xwe şûştin** } Avaniya lêkerê ya dema boriya berdest û lebat e. Ji aliyê bireser û cînavkê ve jî vegerok e. Kirde kesê duyemîn, nêr û mê, pirjimar in.

• **Ji aliyê lebatî û tebatiyê ve avanî :**
**Ev di beşên xwe de hatibûn dahûrandin. Ji aliyê lebatî û tebatiyê ve lêker li ser du beşên bingehîn kom dibin : Ya lebatî û ya tebatî.**

**Em ê li vir ji bo her beşekê yek mînakan bidin û derbas bibin.**

♦ **Avaniya lebatî :**
**Di vê avaniyê de kirde çalakiyê pêk tîne û ev kirde berbiçav e.**

**Nalîn li ber eynikê rawestî û pore xwe şe kir.**

♦ **Avaniya tebatî :**

**Ev avanî bi alîkariya lêkera hatin'ê pêk te. Kirde di bandora çalakiyê de xuya dike yan jî di hevokê de veşarî dimîne.**

**Formayên werzîşkaran hatin dirûtin.**

★ **Bêyî alîkariya lêkera hatin'ê jî bikaranînên tebatî tên dîtin.**

✔ **Di binyata hin lêkeran de tebatîtî hene : Hejîn, rijîn, şikestin :**

**Darên baxçeyên wan dihejiyan.**
**Dema ku em hatibûn, av rijiyabû.**
**Nifte ya deriyê malê şikestibû.**

• **Ji aliyê dançêkeriyê ve avanî :**
**Ji aliyê dançêkeriyê ve avanî li ser du beşên sereke kom dibin :**
**Ya dançêker û yên nedançêker.**

**Avaniya dançêker di beşa xwe de hatibû vegotin. Bi dîtineke giştî, em dikarin bibêjin ku hemû avaniyên din, ne dançêker in û ew jî di gelek mijaran de hatibûn vekolandin.**

**Jimar : 22**

**Mijar : Lêker**

**Nasîn :** **Peyvên ku karekî, rewşekê, bûyînekê yan jî çalakiyan vedibêjîn lêker in. Ew kar, kirin û bûyîn; di demekê de ji aliyê kesekî/ê, tiştekî ve pêk tên an jî kiryar bi xwe dibin mijara çalakiyên xwe.**

**Kêşana lêkerê li gorî kirdê, bireser, dem, rawe, avanî û rewşê tên holê. Em ê di vê mijara lêkeran de bi giranî, ji aliyê peyvsaziyê ve li ser wan rawestin.**

**Mînak 355 : Ev lêker in :**
**Anîn, bûn, jiyandin, malastin, nêrîn, pan, rêzandin, vegotin, zanîn**

## Rader

**Ji lêkerên ku nehatine kêşandin re *rader* tê gotin. Ev dirûv bi serê xwe wek navdêran bi kar tên û di vê bikaranînê de navdêr dibin. Ji aliyê zayendê ve hemû lêkerên navderîn mê ne.**

**Radereke xwerû ji du hêmanên bingehîn pêk te : Rayek û qertaf.**
**Rayek bingeha raderê ye. Qertaf jî paşgir û pêşgirên lêkersaz in. Ev her du hêman bi hev re dirûvê raderê dirêsin.**

**Ji rayekê re *rayeka raderê, rayeka lêkerê* û ji qertafa raderê re *paşgira raderê, qertafa raderîn, paşgira raderîn* jî tên gotin.**

**Em ê li vir *rayeka raderê* û *paşgira raderîn* bi kar bînin. Ji ber ku ev têgîn, ji aliyê rêzimanê ve hîn bêhtir nûjen û karîger in.**

**Mînak 356 : Di raderê de rayek û qertaf :**

★ **Bo lêkerên ku bi (-in)'ê diqedin :**

**Lêker : Kirin(kir + in) :**
**kir-**} rayeka raderê, **-in** } paşgira raderîn

★ **Bo lêkerên ku bi (-în)'ê diqedin :**

**Lêker : Anîn(anî + n) :**
**anî-**} rayeka raderê, **-n** } paşgira raderîn

★ **Bo lêkerên ku bi (-an)'ê diqedin :**

**Lêker : Kutan(kuta + n) :**
**kuta-**} rayeka raderê, **-n** } paşgira raderîn

★ **Bo lêkerên ku bi (-ûn)’ê diqedin :**

**Lêker : Bûn(bû + n) :**
**bû-**} rayeka raderê, **-n** } paşgira raderîn

★ **Bo lêkerên ku bi (-and + in)’ê diqedin :**
**Ceribandin, hêrandin, karandin, mêzandin, senifandin, weşandin**

**Lêker : Ceribandin(ceriband + in) :**
**ceriband-**} rayeka raderê, **-in** } paşgira raderîn

**Mînak 357/1 : Di raderên nexwerû de rayek û qertaf :**

♦ **Ji bo raderên nexwerû(**pêkhatî/hevedudanî**) :**

★ **Pêşgirên lêkersaz ên wan raderên pêkhatî û hevedudanî, bi serê xwe ne xwediyê wateyên girîng in. Ev pêşgir cuda nayên nivîsandin.**

**Mînak 357/2 : Daketin, hildan, rakirin, vekirin, vexwarin, wergirtin**

**Lêker : daketin(da + ket + in) :**

**da-**} pêşgira lêkersaz
**ket-**} hêmana watedar û bingeha raderê

**daket-**} rayeka raderê, **-in** } paşgira raderîn

★ **Pêşgirên lêkersaz ên van raderên hevedudanî ku ew bi serê xwe jî watedar in û piraniya wan cuda tên nivîsandin.**

**Mînak 357/3 : Ava kirin, xwe kuştin, çêkirin, jê kirin, lê dan, pê xistin**

**Lêker : Ava kirin(ava + kir + in) :**

**ava**} hêmana serbixwe û alîkar a raderê ya dirûvê hevedudanî
**kir-**} hêmana bingehîn a raderê

**ava kir-**} rayeka raderê, **-in** } paşgira raderîn

★ **Ji raderên ku çend pêşgirên lêkersaz digirin û piraniya wan pêşgiran cuda tên nivîsandin. Bi gelemperî ev rader biwêjî ne.**

**Mînak 357/4 : Bi hev xistin, serê hev xwarin, ji hev kirin, li hev anîn**

**Lêker : Bi hev xistin(bi + hev + xist + in) :**

**bi-**} hêmana lêkersaz a yekemîn û alîkar a raderê ya dirûvê hevedudanî
**hev-**} hêmana lêkersaz a duyemîn û alîkar a raderê ya dirûvê hevedudanî
**xist-**} hêmana bingehîn a raderê

**bi hev xist-**} rayeka raderê, **-in** } paşgira raderîn

**Cureyên lêkeran**

**Ji aliyê peyvsaziyê ve lêker li du beşên bingehîn kom dibin :**
**Yên xwerû û yên nexwerû.**

**• Lêkerên xwerû :**
**Ev lêker ji yek peyvan pêk tên. Taybetiyên wan ên herî girîng rayekên xwerû û paşgirên raderîn in. Rayekên wan bi gelemperî hêmanên(morfem) lêkerîn in.**

**Mînak 359 : Anîn, birin, çûn, dan, hatin, ketin, kirin, man, xistin**

**• Lêkerên nexwerû :**
**Ev li du beşên sereke parve dibin : Yên pêkhatî û yên hevedudanî.**

**♦ Lêkerên pêkhatî :**
**Rayêkên wan; hêmanên navdêrîn, rengdêrîn û lêkerîn in ku ew morfem rayekên lêkeran ên dema niha jî şanî didin. Ji aliyê dirûvê ve ji wan lêkeran gelek dişibin lêkerên xwerû.**

**Mînak 360/1 : Barîn, êşîn, firîn, gerîn, jimartin, kelîn, mijîn, şewitîn**

**Mînak 360/2 : Êşandin, firandin, gerandin, kelandin, mijandin**

**♦ Lêkerên hevedudanî : Ev li sê beşên sereke parve dibin :**

**★ Ji yên ku herî kêm bi du hêmanên serbixwe û watedar pêk tên.**

**Mînak 361 : Bar kirin, dirêj kirin, siwar bûn, sererast kirin, tûj kirin**

**★ Ji yên ku bi du hêmanan pêk tên, her hêmanên wan ne serbixwe û watedar dibin.**

**Mînak 362 : Hildan, rakirin, vexwendin, çêkirin, jê kirin, lê kirin**

★ **Ji yên ku bi çend hêmanan pêk tên, ji wan hin hêman serbixwe û watedar in, hinek jî ne serbixwe û watedar in. Ev lêker kompleks in û piraniya wan biwêjî ne.**

**Mînak 363 : Bi dar ve kirin, bi ser de girtin, çav lê sor bûn, pê ve anîn**

**Di pêkhatina lêkeran de :**
**Bêjeyên lêkeran bi hin morfem û qertafên lêkersaz pêk tên.**

• **Hêmanên bingehîn :**
**Di bêjeya lêkerê de hêmana bingehîn morfem e ku ev bingeha rayeka raderê jî destnîşan dike.**

**Mînak 364/1 : Di lêkeran de bo hêmanên bingehîn :**

**Lêker : Revîn(rev + în), rev-**} hêmana bingehîn
**Lêker : Revandin(rev + and + in), rev-**} hêmana bingehîn
**Lêker : Wergirt(wer + girt + in), girt-**} hêmana bingehîn

**Mînak 364/2 : Bo piraniya lêkerên pêkhatî**

**Piraniya lêkerên pêkhatî yên ku bi paşgira (-în)'ê diqedin û raderên wan, bingeha lêkerên gerguhêz ên ku bi paşgira (-andin)'ê dawî dibin re dibin morfem. Di vê pêkhatina lêkerîn de (-î-)'ya (-în)'ê, cihê xwe dide (-a-)'ya (-andin)'ê :**

**Lêker : Kenîn ➝ kenandin**
**Lêker : Kirpîn ➝ kirpandin**
**Lêker : Kolîn ➝ kolandin**
**Lêker : Tirsîn ➝ tirsandin**

♦ **Lêkerên awerte hene : Jîn ➝ jiyandin**

• **Qertafên lêkersaz :**
**Di lêkeran de hêmanên bingehîn(morfem), bi alîkariya paşgir, navgir û pêşgirên lêkersaz dirûv û wateyan digirin.**

♦ **Paşgir : Paşgirên lêkersaz tên dawiyên rayekên raderan.**

**Mînak 365/1 : Paşgirên lêkersaz ên sereke : -in, în, -n, an :**

**Lêker : Girtin(girt + in)**
**Lêker : Nasîn(nas + în)**
**Lêker : Çûn(çû + n)**

**Lêker : Pêçan(pêç + an)**

**Mînak 365/2 : Di hin dirûvên darîştî de tîpên kelijandinê : (y, w)**

**Di hin dirûvên lêkeran ên darîştî de berî paşgirên lêkersaz, tîpeke kelijandinê (y, w) cih digire. Ew dirûvên darîştî di hevokan de bi piranî bi awayên raderîn karîger in :**

**Lêker : Bûn ➝ bûyîn, bûwîn**
**Lêker : Dan ➝ dayîn**
**Lêker : Jîn ➝ jiyîn**
**Lêker : Man ➝ mayîn**

**Mînak 365/3 : Di hin dirûvên darîştî de tîpa kelijandinê : (y)**

**Di hin dirûvên lêkeran ên darîştî de berî paşgirên lêkersaz, tîpa kelijandinê ya (y)'ê digirin ku ew dirûvên darîştî jî di hin kêşanên raweyên borî de bi kar tên :**

**Lêker : Bezîn ➝ beziya(n)**
**Lêker : Gerîn ➝ geriya(n)**
**Lêker : Meşîn ➝ meşiya(n)**
**Lêker : Teqîn ➝ teqiya(n)**

**♦ Navgir :**
**Ev di lêkerên ku bi (-andin)'ê diqedin de cih digire û navgireke lêkersaz û hevedudanî ye.**

**Mînak 366 : Bo navgira lêkersaz : (-and-) :**

**Lêker : Hûrandin(hûr + and + in)**
**Lêker : Kêşandin(kêş + and + in)**
**Lêker : Nivîsandin(nivîs + and + in)**
**Lêker : Qelişandin(qeliş + and + in)**

**♦ Pêşgir :**
**Wek paşgiran, pêşgirên lêkersaz jî di pêkhatin û darîştina lêkeran de cihên girîng digirin. Ev gelek in û her yek, wateyên nû didin lêkerên xwe. Piraniya wan tên ber rayeka raderê, bi hev ve tên nivîsandin û hinek jî cuda.**

**★ Ji yên ku bi rayekê ve tên nivîsandin û ji wan bêyî (ro-)'yê, yên din gelek karîger in : (da-, hil-, ra-, ro-, ve-, wer-)**

**(da-) :**
**Lêker : Dabeşîn(da + beşîn)**
**Lêker : Dabitîn(da + bitîn)**
**Lêker : Dadan(da + dan)**
**Lêker : Daketin(da + ketin)**

**(hil-) :**
**Lêker : Hilavêtin(hil + avêtin)**
**Lêker : Hilberadin(hil + berandin)**
**Lêker : Hilbûn(hil + bûn)**
**Lêker : Hildan(hil + dan)**

**(ra-) :**
**Lêker : Rabezîn(ra + bezîn)**
**Lêker : Radan(ra + dan)**
**Lêker : Raborîn(ra + borîn)**
**Lêker : Rakirin(ra + kirin)**

**(ro-) :**
**Lêker : Rokirin(ro + kirin)**

**(ve-) :**
**Lêker : Vebirîn(ve + birîn)**
**Lêker : Vebûn(ve + bûn)**
**Lêker : Veçirandin(ve + çirandin)**
**Lêker : Vexwarin(ve + vexwarin)**

**(wer-) :**
**Lêker : Werbûn(wer + bûn)**
**Lêker : Werdan(wer + dan)**
**Lêker : Werkutandin(wer + kutandin)**
**Lêker : Werpêçîn(wer + pêçîn)**

**★ Ji yên ku li gorî wateyên lêkerên xwe, him bi rayekan ve û him jî cuda tên nivîsandin. Ku bi raderîn bi kar bên, ew bi hev ve tên nivîsandin :**
**(ba-, çê-, der-, rû-)**

**(ba-) :**
**Lêker : Badan(ba + dan)**
**Lêker : Ba dan(ba + dan)**

**(çê-) : Her ku diçe bi rayekê ve nivîsandina wê bi ser dikeve :**
**Lêker : Çêbûn(çê + bûn)**
**Lêker : Çêkirin(çê + kirin)**

**(der-) :**
**Lêker : Deranîn(der + anîn)**
**Lêker : Derbûn(der + bûn)**
**Lêker : Derketin(der + ketin)**
**Lêker : Der kirin(der + kirin)**

**(rî-) :**
**Lêker : Rîxandin(rî + xandin)**
**Lêker : Rî berdan(rî + berdan)**

**(rû-) :**
**Lêker : Rûnişin(rû + niştin)**
**Lêker : Rûçikandin(rû + çikandin)**
**Lêker : Rûdan(rû + dan)**
**Lêker : Rû dan(rû + dan)**

**• Hêmanên alîkar ên serbixwe û hevedudanî :**
**Hin hêmanên serbixwe bi raderan ve formên hevedudanî pêk tînin û di kêşanê de piraniya wan hêmanan cuda tên nivîsandin. Eger raderîn bi kar bên, hemû hêman bi hev ve tên nivîsandin.**

**★ Ji bo hêmanên navdêrîn : (bar, deng, fêr) :**
**Lêker : Bar kirin**
**Lêker : Deng dan**
**Lêker : Fêr bûn**

**★ Ji bo hêmanên rengdêrîn : (kûr, sar, xweş) :**
**Lêker : Kûr kolan**
**Lêker : Sar bûn**
**Lêker : Xweş dîtin**

**★ Ji bo hêmanên cînavkî :**

**Bi cînavka vegerok ve : (xwe) :**
**Lêker : Xwe kuştin**
**Lêker : Xwe parastin**
**Lêker : Xwe şidandin**

**Bi cînavka berbihevîn a (hev)'ê ve :**
**Lêker : Hev berdan**
**Lêker : Hev birîn**
**Lêker : Hev girtin**

**Bi cînavkên lihevxitî ve :**
**(jev, lev, pev, tev, jêk, lêk, pêk, têk, jê, lê, pê, tê) :**

**Lêker : Jev ketin**
**Lêker : Lev anîn**
**Lêker : Pev çûn**
**Lêker : Tev dan**

**Lêker : Jêk ve bûn**
**Lêker : Lêk hatin**
**Lêker : Pêk guhartin**
**Lêker : Têk şikestin**

**Lêker : Jê axaftin**
**Lêker : Lê dan**
**Lêker : Pê selmandin**
**Lêker : Tê hêwirîn**

**★ Ji lêkerên hevedudanî yên komleks :**
**Ev bi çend hêmanên alîkar ên serbixwe yan jî hevedudanî, bi raderan ve cih digirin. Ji yên ku alîkar, hinek cuda û hinek jî bi hev ve tên nivîsandin.**

**Di pêkhatina wan de daçek rolên girîng radikin ser xwe û piraniya wan lêkeran biwêjî ne :**

**Lêker : Bi bal de çûn**
**Lêker : Bi hev de revîn**
**Lêker : Bi hêstên xwe tev gerîn**
**Lêker : Berbiçav bûn**

## Di lêkeran de negerguhêzî û gerguhêzî

**Em li ser vê behsê rawestiyabûn û di herikîna hin mijaran de jî vegotînên nimûnedar hatibûn dayîn. Bo bibîrxistinê, em ê li vir bi kurtekirineke nazarî jê behs bikin.**

**Kurmancî zaravayeke nîvergatîvî ye. Ji vê taybetiya zaravayê tê ku lêkerên negerguhêz û yên gerguhêz cuda tên kêşandin. Bi gotineke giştî, lêkerên gerguhêz di demên bê û niha de li gorî kirde ye, lê di demên borî de li gorî bireserê dikevin kêşanê.**

**Di kêşana lêkerên gerguhêz ên demên bê û niha de, kirde xwerû û bireser tewandî ne, lê di demên borî de kirde tewandî û bireser xwerû ne.**

**Ji bo bidestxistina gerguhêzî û negerguhêziya lêkeran : Di hevokê de ji pêveberê, bo tiştan pirsên bi (çi)'yê û bo kesan jî pirsên bi (kî/kê)'yê tên pirsîn. Eger bersiv ji kirde cudatir be, ew lêker gerguhêz e. Ema bersiv, bêbersiv li ser kirdeyê bimîne, ew lêker negerguhêz e.**

**Ji aliyê bireserê ve lêker li du beşan kom dibin :**
**Yên negerguhêz û yên gerguhêz.**

**• Lêkerên negerguhêz : Ev lêker bireserê nagirin.**

**Ji lêkerên negerguhêz : Bûn, bezîn, çûn, firîn, hatin, meşîn**

**• Lêkerên gerguhêz : Ev lêker bireserê digirin.**

**Ji lêkerên gerguhêz : Bihîstin, cûtin, danîn, meşandin, stran**

## Di kêşanê de rayekên lêkeran

**Wekî ku di mijarên xwe de jî hatibûn vekolandin, rayekên lêkeran di hin dem û raweyan de hevpar û di hinan de jî cuda bi kar tên.**
**Di kurdî de du rayekên bingehîn hene, ya dema niha û ya borî. hemû rawe li ser wan û li gorî raweyên xwe tên ristandin û curandin.**

**Mînak 367 : Di kêşanê de rayekên lêkeran bi gelemperî li du beşên sereke kom dibin :**

**★ Di raweyên jêrîn de rayêkên hemû lêkeran hevpar bi kar tên :**

**Dema niha, dema bê, dema bê ya nêzîk, daxwaziya dema niha û ya dema bê, raweya fermanî, xwestekî ya daxwaziya dema niha, bilaniya dema niha, hekaniya dema niha û ya dema bê, hekaniya daxwaziya dema niha, divêtiya daxwazî ya dema niha.**

**Mînak 368 :**
**Ji lêkerên negerguhêz : Çûn → (-ç-)**
**Ji lêkerên gerguhêz : Kirin → (-k-)**

**★ Ji aliyê rayeka bingehîn ve di raweyên din de rayeka dema borî ya hemû lêkeran hevpar bi kar tê.**

**Mînak 369 :**
**Ji lêkerên negerguhêz : Çûn → (çû-)**
**Ji lêkerên gerguhêz : Kirin → (kir-)**

★ **Di rayeka hin lêkeran ên dema borî de paşgira (-iya)'ê :**

**Di rayeka hin lêkeran ên dema borî de digel rayekên bingehîn hin dirûven cuda jî bi kar tên ku ji aliyê rayeka raderê ve ew kêşan nerêzikî ne :**

✔ **Eger dirûveke kevnare ya lêkerê hebe û ew bi paşgira (-iyan)'ê biqede, tê vê wateyê ku ew kêşan li gorî rayeka wê ya dema borî pêk hatiye.**

✔ **Ew guhartin bi piranî di lêkerên negerguhêz de tên holê. Dibe ku di dema borî de taybetiyeke kêşana lêkerê ya ku raderên wan bi (-în)'ê diqedin e.**

**Mînak 370 : Lêker : Teqîn**

**Rayeka dema borî : (teqî-) :**
Yekjimar : **Balonek teqî.**
Pirjimar : **Ji deh balonan şeş teqîn.**

**Rayek dema borî ya paşgira (-iya) digire : (teqî/iya) → (teqiya) :**
Yekjimar : **Balonek teqiya.**
Pirjimar : **Ji deh balonan şeş teqiyan.**

● **Di pêkhatina bêjeyên din de rayekên karîger :**
**Rayekên hin lêkeran ên dema niha wek morfemên bêjesaz di pêkhatina bêjeyan de bi kar tên.**

**Mînak 371 : Wek pêşgir û paşgiran bikaranîna morfemên bêjesaz :**

★ **Bo morfemên bêjesaz ên ku wek hêmanên bingehîn cih digirin :**

**Lêker : Gotin**

**Bêjeya pêkhatî : Bêjer**
**bêj-**} rayeka dema niha û hêmana bingehîn, **-er** } paşgira bêjesaz

**Lêker : Firotin**

**Bêjeya pêkhatî : Firoşgeh**
**firoş-**} rayeka dema niha û hêmana bingehîn, **-geh** } paşgira bêjesaz

**Lêker : Pêçîn**

**Bêjeya pêkhatî : Pêçang**

**pêç-**} rayeka dema niha û hêmana bingehîn, **-ang** } paşgira bêjesaz

★ **Bo morfemên bêjesaz ên ku wek paşgirên bêjesaz cih digirin :**

**Lêker : Gerîn ➞ bêjeya pêkhatî : Rojger**
**roj-}** hêmana bingehîn a bêjesaz, **ger-**} rayeka dema niha ya lêkerê

**Lêker : Girtin ➞ bêjeya pêkhatî : Rêgir**
**rê-}** hêmana bingehîn a bêjesaz, **gir-**} rayeka dema niha ya lêkerê

**Lêker : Firîn ➞ bêjeya pêkhatî : Balafir**
**bala-**} hêmana bingehîn a bêjesaz, **fir-**} rayeka dema niha ya lêkerê

★ **Carinan rayekên hin lêkeran ên dema niha mîna pêşgir û paşgirên bêjesaz, bêjeyên nû pêk tînin :**

**Lêker : Êşîn ➞** rayeka dema niha : **êş-**
**Lêker : Birîn ➞** rayeka dema niha : **bir-**
**Bêjeya ku pêkhatî : Êşbir**

★ **Carinan jî rayekan hin lêkeran pêşgir û paşgir bi kar tên û hin bêjeyên nû tên holê :**

**Lêker : Firîn ➞** rayeka dema niha : **fir-**
**Bêjeya ku pêkhatî : Firfir**

• **Di kêşanê de rêzikî û nerêzikiya lêkeran :**
**Di kêşanê de rayekên hin lêkeran ên dema niha û yên dema borî ji hev ne dûr in, ev lêker ên rêzikî ne. Lê yên hinekan ji hevdu gelek dûr in. Ev lêker jî yên nerêzikî ne.**

**Mînak 372/1 : Bo lêkerên rêzikî :**

**Lêker : Cûtin**
Rayeka dema niha : **cû**
Rayeka dema borî : **cût**

**Lêker : Firandin**
Rayeka dema niha : **firîn**
Rayeka dema borî : **firand**

**Lêker : Hêrîn**
Rayeka dema niha : **hêr**

Rayeka dema borî : **hêrî**

**Lêker : Kirin**
Rayeka dema niha : **k**
Rayeka dema borî : **kir**

**Lêker : Revîn**
Rayeka dema niha : **rev**
Rayeka dema borî : **revî/reviya**

**Mînak 372/2 : Bo lêkerên nerêzikî :**

**Lêker : Dîtin**
Rayeka dema niha : **bîn**
Rayeka dema borî : **dît**

**Lêker : Gotin**
Rayeka dema niha : **bêj**
Rayeka dema borî : **got**

**Lêker : Hiştin**
Rayeka dema niha : **hêl**
Rayeka dema borî : **hişt**

**Mînak 372/3 : Di kêşana hin lêkeran de him dirûvên nûjen û him ên kevn tên dîtin. Piraniya yên nûjen rêzikî û yên kevnare nerêzikî ne.**

**Lêker : Anîn/hanîn**

**Dirûvê nûjen : Anîn**
Rayeka dema niha : **în**
Rayeka dema borî : **anî**

**Dirûvê kevn : Hanîn**
Rayeka dema niha : **hîn**
Rayeka dema borî : **hanî**

**Lêker : Ketin/keftin**
Rayeka dema niha : **kev**
Rayeka dema borî : **ket**

• **Di rayekên hin lêkeran ên dema niha de hin guhartina dengan :**
**Di rayekên hin lêkeran ên dema niha de hin guhartina tîpan tên holê ku,**

ew bi gelemperî li gorî hin rêbazan pêk tên.

**Mînak 373/1 : Lêkerên ku bi (-aftin, -artin, -astin, -aştin, -axtin)'ê diqedin, tîpa (-a-)'yê, xwe li ya (-ê-)'yê dadigere.**

★ **Di wan lêkeran de rayekên dema niha :**

**Aşkaftin → aşkêv**
**Bijartin → bijêr**
**Alastin → alês**
**Biraştin → birêj**
**Axaftin → axêv**

**Mînak 373/2 : Di hin lêkeran de hin dengdaran nefîzekî, xwe li yên fîzekî dadigerin.**

**Nefîzekî : Fîzekî :**
**Tîpa (-f-) → li ya (-v-)'ê**
**Tîpa (-p-) → li ya (-b-)'ê**
**Tîpa (-s-) → li ya (-z-)'ê**
**Tîpa (-ş-) → li ya (-j-)'ê**

★ **Ji wan lêkeran ên ku di van dengên wan de guhartin pêk tên :**

**Pişkaftin → pişkêv**
**Qulaptin → qulêb**
**Xwastin → xwaz**
**Gihaştin → gihêj**

★ **Ji wan lêkeran ên ku di van dengên wan de guhartin pêk nayên :**

**Qurifîn → qurif**
**Xapîn → xap**
**Nivîstin → nivîs**
**Guvaştin → guvêş**

**Mînak 373/3 : Lêkerên ku bi (-andin)'ê diqedin, tîpa vê paşgirê ya (-a-)'yê, xwe li ya (-î-)'yê dadigere :**

**Çirandin → çirîn**
**Honandin → honîn**
**Mijandin → mijîn**
**Rijandin → rijîn**

**Agahdarî :**
**Veser a Rêzimana Kurdî ya Kurmancî -bi hîndarî-**
A. Karabax

**Jimar : 23**

**Mijar : Hoker**

**Nasîn :**

**Ew peyvên ku di hevokê de wateya lêker, rengdêr û hêmanên ku wekî yên xwe temam dikin re *hoker*(*hevalkar*) tê gotin.**

**Hoker ji bo lêker, rengdêr û peyvên wekî yên xwe; ji aliyê çawanî, dem, cih, bergeh, rêje, mêjer, sedem, şanîdan, guman û misogerî, pirs, erênî û neyîniyê ve alîkar in.**

**Hêmanên navdêrîn, rengdêrîn, lêkerî û daçekî bi serê xwe yan komikî wek hokeran bikar tên, bi van erkên xwe dibin hoker. Lê her hoker; ne navdêr, rengdêr, lêker û daçek in.**

**Bi gelemperî peyvên ku di binyatên xwe de hoker in, ew neguherbar in.**

***Pirs : Di teksta jêrîn de beyî yên hatine reşkirin, hoker hene?***

Siltanên fîlan **bi canfedayî** bixebitin, **bixebitin** û **dîsa** bixebitin û ji bo Fîlistanê, canê xwe fedayî birayên xwe yên gêrîk bikin. Wan, ji tiştên ku gêrîkan ji bo fîlan û Siltên dikirin, **bê rawestan** her nimûne didan. **Belê**, gêrîk dê bûbûna fîl jî, ji xwe ew fîlên lanetlêhatî bûn. Her gêrîk ji **berê** de fîlek bû, lê lanet li wan hatiye û **wiha** wek gêrîkan hatine piçûkkirin. Her gêrîk **bi xebatê** û bi destûra Siltên dikare bibe fîlek. **Belê**, bi destûra Siltên... Siltan dikare fîlîtiyê bide her gêrîkê jêhatî. Gêrîk dikarin bi destûra Siltên bibin fîl. Lê ew dikarin **bi tenê**, bi qasî gêrîkan bibin fîl. (Siltanê Fîlan, Y. Kemal)

**Peyvên ku reşkirî, bikaranînên xwe hoker in : bi canfedayî, dîsa, bê, belê, berê, wiha, bi xebatê, bi tenê**

## Li gorî erkên xwe cureyên hokeran

**Hoker li gorî erkên xwe li şeş beşên sereke kom dibin :**
**Yên çawaniyê**
**Yên demê**
**Yên cih û bergehê**
**Yên şanîdanê**
**Yên çendaniyê**
**Yên pirsyariyê**

- **Hokerên çawaniyê :**

**Piraniya peyvên hokerên çawaniyê yên rengdêrên çawaniyê ne. Ji aliyê peyvsaziyê ve bi giştî ew bêguhartin bikar tên û çawaniya çalakiyê diyar dikin.**
**Bo bidestxistina peyvên wan, pirsên bi (çawa/çawan, çilo/çiton) li lêkerên pêveberî tên kirin.**

**Mînak 374 : Hokerên çawaniyê û bikaranîn :**

★ Ji yên xwerû : biçûk, bilind, dereng, tenê, lez, mezin, tavil, xweşik, zû

Di gengeşiyê de mirovê ku bilind difiriya, biçûk ketibû.
Koma cîwana zû hatin festîvalê, lê dereng çûn.
Darên tûyê zû mezin dibin.

★ Ji yên nexwerû(pêkhatî/hevedudanî) : bi lez, bi tenê, bi misogerî, bêguman, bêşik, çarmêrkî, edîbane, hêdîka, kêmtir, rasterast

Rojda û Nalîn bi lez diçûn û dihatin.
Niha ev keç bi tenê dixebite.
Di şevbihêrkê de her kes çarmêrkî rûniştibû.

• Hokerên demê :
Ev hoker ji aliyê demê ve bo çalakiyê karîger in. Ji bo bidestxistina wan, pirsên ku bi (kengî, çi demê, çi wext) li lêkerên pêveberî tên kirin.

Dem li sê beşên sereke dabeş dibin : Dema niha, dema borî û dema bê.
Peyvên demîn bi wan beşan ve têkildar in.

Mînak 375 : Hokerên demê û bikaranîn :

★ Hokerên demê, ji yên xwerû : îro, duh, pêr, sibehê, roj, rojekê, nîvro, gav, wext, saet, meh, îsal, par, biharê, havînê, payîzê, zivistanê

Ew duh ji wir derketin û îro li ber golê bi cih dibin.
Baran par kêm barîbû, lê îsal şilayî bê hemd e.
Dibistanên me havînê tên girtin û payîzê vedibin.

★ Ji hokerên demê, ji yên nexwerû : berê êvarê, berî bîskekê, bi saetan, êvarkî, piştî nîvro, roj bi roj, sibeh û êvar, sibehê zû

Delal her roj êvarê dixebite, bi roj jî diçe kursa Dimilkî.
Nalîn berî bîskekê li vir bû.
Rojhat, wê havînê li ba nasekî malbata wan maye.

• Hokerên cih û bergehê :
Ev hoker ji aliyê cih û bergehê ve çalakiyê didin nasîn. Bo bidestxistina wan, pirsên ku bi (li ku, li ku derê, ji ku, ji ku derê, di ku de, bi ku ve, ji ku ve) li lêkerên pêveberî tên kirin.

Mînak 376 : Hokerên cih û bergehê, bikaranîn :

★ **Ji hokerên cihê : derdor, dereke din, dûr, jêr, jor, paş, pêş, li paş, li pêş, nêz, her derê, li çepê, li her derê, li rastê, li vir, li wir, vir, wir**

**Du çiyager bûn, ji hevalên xwe dûr ketibûn.**
**Wan xwe avêtin ber zinarekî, nan li wir xwarin.**
**Dakatina berfê bi hêz dibû, li her derê dibariya.**

★ **Ji hokerên bergehê : ber bi, ber ve, ber bi ve, ber bi jêr ve, ber bi jor ve, bi vir de, bi wir de, ji vê hêlê ve, ji wê hêlê de, ji vê alî ve, ji vî alî ve, ji wê alî ve, ji wî alî ve, serejêr, serejor**

**Xamika xezal a navterhîn serejêr direwiya.**
**Nêçîrvan ji kemînê derket û ji wî alî ve beziya.**
**Piştî demekê xezal bûn sisê, ber bi jor ve çûn.**

• **Hokerên şanîdanê :**
**Ev hoker ji aliyê şanîdanê ve pêkhatina çalakiyan şanî didin. Ji bo bidestxistina peyvên wan, pirsên ku bo hokêrên çawaniyê tên kirin (çawa/çawan, çilo/çiton) bi kar tên. Digel vê yekê bersivên wan, ne hokerên çawaniyê ne. Hokerên şanîdanê di nav hev de hemwate û nêzwate ne, şibandin û nediyariyê jî di xwe de dihewînin.**

**Mînak 377 : Hokerên şanîdanê û bikaranîn :**

★ **Ji hokerên şanîdanê : wiha, wilo, wisa/wisan, wanî, hanî, halo**

**Kalê çîrokbêj wiha got û min jî wanî nivîsand.**
**Min çiqas jê re got, ew dîsa wilo dike.**
**Ew li wî dinêre û hanî radibe û rûdine.**

• **Hokerên çendaniyê :**
**Ev hoker ji aliyê mêjer, rêje û radeyê ve çalakiyê didin nasîn. Ji bo bidestxistina peyvên wan, pirsên ku bi (çiqas, qasî çi, wekî çi) li lêkerên pêveberî tên kirin.**

**Mînak 378 : Hokerên çendaniyê û bikaranîn :**

★ **Ji hokerên çendaniyê : bêhtir/bêtir, bi qasî, bi çendî, çar bi çar, ewqas, gelek, herî, hin, hinek, keliyekê, kêm, kêmtir, kêm û zêde, pir, yek bi yek, zehf, zêde, zêdetir**

**Xebatkarên me ne tiral in, nexasim bêhtir dixebitin.**
**Li wir ez jî kêm û zêde dixebitim.**
**Firoşger, sêv du bi du jimartin û dan hemûyan.**

• **Hokerên pirsyariyê :**
**Ev hoker ji aliyê pirsiyariyê ve ji bo çalakiyê tên xebitandin. Ev hêman ji peyvên pirsînê yên ku bi erkên hokerî bikar tên, pêk tên.**

**Mînak 379 : Hokerên pirsyariyê û bikaranîn :**

★ **Ji hokerên pirsyariyê : çawa, çend, çilo, çiqas, çi demê, çi wext, kengî, li ku, li ku derê, ji ku, ji ku derê, di ku de, bi ku ve, ji ku ve, qasî çi, wekî çi**

**Xamika xezal çawa bû?**
**Nêçîrvan bi ku ve beziya?**
**Xezal çend bûn?**

**Di hin bikaranînên taybet de hoker**

**Mînak 380 : Ji bo wan bikaranînan mînakên hilbijartî :**

★ **Bo rewş û çawaniyê :**
**Ew ji dil de dikeliya û bi dengekî nermikî dirêsiya.**

★ **Bo şibandin, çawanî û şanîdanê :**
**Çawa bikim, Gul jî wisa dixwîne!**

★ **Bo payedariyê :**
**Em ji we pirtir raziyan û ew jî ji me pirtirîn raziyane.**

★ **Bo daxwaziyê :**
**Bila hûn ê ji me re bişînin.**

★ **Bo gumaniyê :**
**Belkî îro Berîvan nikare bê perwerdehiya pîşeyî.**

★ **Bo misogeriyê :**
**Helbet ew nikare bê, ji ber ku nexweş e.**

★ **Bo nediyariyê :**
**Şevek ji şevan bû, leşker li pey hev dimeşiyan.**

★ **Bo sedemê :**
**Ew çima dixebitî, ji ber ku karê wî xebat bû, ne encam bû.**

★ **Bo erêniyê :**
**Belê, min dîtina we pejirand.**

★ Bo neyîniyê :
Ew bajar ne nêzîk e, te ew hîç nedîtiye.

★ Hoker wateya rengdêrekê temam dike :
Ev gul û kulîlk gelek xweşik in.

★ Hoker peyveke weke ya xwe dişidîne :
Şekir xelas bûye, Dîlanê pir hindik aniye.

## Ji aliyê peyvsaziyê ve hoker

Piraniya hêmanên hokerîn bi binyadî navdêr, rengdêr, daçek in.
Ji aliyê peyvsaziyê ve hoker du beşên sereke ne : Xwerû û nexwerû.

• Hokerên xwerû : Ev ji yek bêjeyan pêk tên.

### Mînak 381 : Ji hokerên xwerû :

Ji nav û navdêran : îro, duh, îşev, lez, nîvro, par, pêr, sibeh, zane
Ji nav û rengdêran : baş, bilind, kesk, mezin, rind, sax, xweş, zer
Ji peyvên hokeran : bê, bêyî, bilî, hêdî, na, ne, par, pêr, zû

• Hokerên nexwerû :
Ev hokerên pêkhatî û yên hevedudanî ne. Hokerên nexwerû herî kêm, bi du hêmanan pêk tên.

### Mînak 382 : Pêkhatina hokerên nexwerû :

★ Ji yên ku bi ducarkirina bêjeyekê çêdibin û bi hev ve tên nivîsandin :
hûrhûr, saxsax, xirxir, xîzxîz, xulxul, zûzû

★ Ji yên ku bi ducarkirina bêjeyekê çêdibin û cuda tên nivîsandin :
cot cot, deh deh, giran giran, hêdî hêdî, sar sar, teze teze

★ Ji yên ku bi awayên tewandinê pêk tên :
piştî nîvro, berê êvarê, sibehê zû, berî sê mehan

★ Ji yên ku bi bêjeyên dijwate û bi alîkariya gihaneka (û)'yê ve :
biçûk û mezin, jor û jêr, kêm û zêde, sar û germ, şev û roj

★ Ji yên ku bi alîkariya qertafa neyînî ya (bê)'yê :
bê pênûs, bê pirtûk, bê pere, bê hêvî, bê gotin, bê xebat, bê destûr
bêpênûs, bêpirtûk, bêpere, bêhêvî, bêgotin, bêxebat, bêdestûr

★ Ji yên ku bi alîkariya daçeka (bi), peyv û paşgira (î)'yê ve :

**bi heybet, bi lez, bi dilxweşî, bi çavreşî, bi çavsorî, bi destgiranî**

★ **Ji yên ku bi alikariya daçekên (bi, di, li, ji, de, re, ve)'yan ve :**
**bi vir ve, bi wir de, li ku, ji ber ku, ji ku, di ku re, ber bi, ber bi ve**

★ **Ji yên ku bi awayê komika bêjeyî bi kar tên :**
**çawa hatin wisa çûn, hatin nehatin, gotin negotin**

★ **Ji yên ku bi awayê biwêjî bi kar tên : ava yekî serberjor çûn**

★ **Bi navbend, pêşgir û paşgiran pêkhatina hokerên nexwerû :**

**Navbend : (-e-) : çeperast, keskeşîn, rasterast, xurexur**

**Pêşgir : ( î-) : îşev, îro, îsal, îcar**

**Paşgir : (-ane) :**

**edîbane(edîb + ane) → Mem edîbane dipeyive.**
**torane(tor + ane) → Birayê wî torane digeriya.**

**Paşgir : (-anî) :**

**wekanî(wek + anî) → Diya Rewşenê hirî wekanî radixist.**
**zûkanî(zûka + anî) → Dema ku ew dihat, zûkanî dimeşiya.**

**Paşgir : (-ka) :**

**hêdîka(hêdî + ka) → Destê xwe hêdîka bilind kir.**
**zûka(zû + ka) → Dema ku ew dihat, zûka dimeşiya.**

**Paşgir : (-kî) :**

**êvarkî(êvar + kî) → Azad êvarkî hat cem wan.**
**mêvankî(mêvan + kî) → Ew li cem wan mêvankî rûnişt.**

**Paşgir : (-tir, -tirîn) :**

**pirtir(pir + tir) → Îşev ciwan pirtir hatin şanogehê.**
**zûtirîn(zû + tirîn) → Hûn ê sibehê zûtirîn biçin bajêr.**

★ **Bi paşgira tewangê : (-ê) :**

**biharê(bihar + ê) → Em biharê diçin zozanê.**
**rojekê(rojek + ê) → Ew ê rojekê bê mala we.**

## Ji aliyê hevoksaziyê ve hoker

**Ev peyv di hevokê de ji bo hêmanên bingehîn alîkar in. Ev alîkarî ji bo lêker, rengdêr û peyvên ku wekî yên xwe ne.**

### Mînak 383 : Di hevokê de hoker :

★ **Di hevokê de dibin têrker :**

**Em danê êvarê diçin dîlanê.**
**Masî teze teze hatin biraştin.**

★ **Di hevokê de bi lêkerê ve dikevin awayê pêveberiyê :**

**Azad ji Memê leztir e.**
**Wan qîzan şîr bi germî venexwarin.**

**Jimar : 24**

**Mijar : Daçek**

**Nasîn :**

**Ev hêmanên bêjeyî ne ku bi serê xwe wekî bêjeyên bingehîn ne xwediyê wateyên girîng in. Digel vê di hevokan de bi cihgirtinên xwe, di navbera hêmanên bingehîn û alîkar de pêwendiyan pêk tînin.**

**Daçek bi peyvên din an jî bi hêmanên xwe ve di hin bikaranînan de dibin hoker, gihanek jî.**

**Ev hêman cuda tên nivîsandin. Daçek û komedaçek peyvan ditewînin, tewang li ser peyvên guherbar pêk tên. Di hevokê de paşdaçek pêşdaçekan temam dikin.**

**Di rêza hêmanên bêjeyî yên hevokê de karên daçekan ên ku herî balkêş, di pêkhatina têrkeran de alîkarbûn in û têkiliyên wan ên herî sereke bi navdêr, cînavk û bi hêmanên wekî yên xwe re ne.**

**Ji aliyê peyvsaziyê ve daçek di çêkirina peyv û biwêjan de cih digirin.**

***Pirs : Di teksta jêrîn de bêyî yên hatine reşkirin, daçek hene?***

Rê pir hene û rêwî jî gelek in. Çi dema rêwiyek **bi** riyeke nenas **ve** diçe û **li** dûriyaneke yan **li** sêriyaneke rast tê, **ji** xwe **re** şaş dimîne ka dê **bi** kîjan riyê **ve** here. Ha wisa ew rêwî dudil dibe û **ji** rêwîtiya xwe disilike. Lê pirê caran kîjan riya ku pir zêde hatiye şixulandin, **ji** mirov **re** bê teşqele tê xuyakirin û hêsantir dixuyê. (Siyabend û Xecê, Zeynelabidîn Zinar)

**Ev peyv daçek in : bi, ve, li, ji, re**

## Bi tevayî daçek

**Em ê daçekan ji aliyê peyvsazî, wate û erkên wan ve di zik hev de vekolin. Ji aliyê peyvsaziyê ve daçek li du beşên bingehîn dabeş dibin : Yên xwerû û yên nexwerû.**

**• Daçekên xwerû :**
**Ev daçek ji yek hêmanan pêk tên. Pêşdaçek û paşdaçekên bingehîn di vê beşê de cih digirin.**

### Mînak 384 : Daçekên xwerû û bikaranîn :

**★ Pêşdaçekên bingehîn : bi, di, ji, li**

**Gulçîn bi trênê çû bajêr.**
**Gulê sola xwe di mirîşkê werkir.**
**Gulçînê, helbest ji deftera Cano kopya kir.**
**Cano li Amedê diçe zanîngehê.**

★ Paşdaçekên bingehîn : de, re, ve

Di gurçikên Dîlanê de kevir hebûne.
Rizgar di parkê re çûye sûkê.
Singê tûjik di erdê ve hêsantir çûbû.

✔ Di hin nivîsaran de tên dîtin ku paşdaçekên bingehîn bi awayekî awerte, ango bi serê xwe jî tên karandin :

Gurçikên wê de kevir hebûne.
Rizgar parkê re çûye.
Singê ne tûjik erdê ve baş neçû.

Mînak 385 : Pêşdaçekên bêjeyî û nebingehîn :

★ Ji pêşdaçekên bêjeyî û nebingehîn : bo/bona, gor/gorî, heta/heya, wek/weke/wekî, mîna/fena, nola/nolî

Ev bêjeyên li jor di binyatên xwe de daçek in. Piraniya wan bi serê xwe bi kar tên û ev ji pêşdaçekên nebingehîn ên ku herî nêzî yên xwerû ne.

Rojhat bo xwendinê hat.
Gorî Memê ew bi bezê ketiye.
Dîlan heta dibistanê bi tenê çûye.

Wî wekî te bi hevalan ve şano negerandiye.
Gulçîn mîna Rojhêt naxwîne.
Ew nolî Dîlanê dixwîne.

★ Ji pêşdaçekên bêjeyî û nebingehîn : ba, bê, bêyî, ber, bilî, bin, cem, dor, gel, jêr, jor, nav, nik/rex, paş, pêş, qasî, ser

Piraniya bêjeyên li jor bi binyadî ne daçek in. Lê di hin erkên xwe de mîna daçekan bi kar tên. Eger ew di wan erkan de bi serê xwe bên bikaranîn, dibin pêşdaçekên nebingehîn ên ku nêzî daçekên xwerû.

Ew bê pere neçû.
Ev bêyî min hatiye.

Wî bilî Rewşenê tu kes nedîtiye.
Ew turîst gel Memê çûye mizgeftê.

Ba min mêvanek heye.
Tu kes ber derî nîn e.

**Gulçîn hat bin dara mezin.**
**Ew nikare bê cem min.**
**Dor min agir bû.**

**Em hemî daketin jêr.**
**Hûn jî derketin jor.**
**Ev ketin nav avê.**

**Gulê xwe da nik me.**
**Rewşen çû paş dibistanê.**
**Wî xwe da pêş xwendekaran.**
**Wê ferheng danî ser maseyê.**

**Qasî wan Nalînê jî pirtûk kirîne.**

- **Daçekên nexwerû : Ev herî kêm bi du hêmanan pêk tên.**

**Mînak 386 : Daçekên hevedudanî û bikaranîn :**

★ **Ev ji pêşdaçek û paşdaçekên bingehîn pêk tên :**

**Bi ... de → Şîr bi çiçikan de hatibû.**
**Bi ... re → Gulçîn bi Gulê re dilîst.**
**Bi ... ve → Rewşen bi hevalên xwe ve digeriyan.**

**Di ... de → Di wê gulistanê de kaniyek hebû.**
**Di ... re → Mem, di taxa nû re çûye navenda bajêr.**
**Di ... ve → Nalînê, pêşgîr bi deriyê serşokê ve kir.**

**Ji ... de → Zarokekî wan ji darê de ketiye.**
**Ji ... re → Memê ew pirtûk ji Gulçînê re biriye.**
**Ji ... ve → Rewşa wî ji aliyê me ve hîn zelal nebûye.**

★ **Ji yên bi pêşdaçek û yek peyvan pêk tên :**

**Ji ba → Rizgar ji ba kalikê xwe çûbû.**
**Ji ber → Wî ji ber min ansîklopedî kişand ber xwe.**
**Ji bin → Ew ji bin darê rabû ser piyan.**
**Ji bo → Hûn ji bo kê van dersan amade dikine?**
**Ji cem → Ew ciwan ji cem me rabû, çû cem hevalên xwe.**
**Ji nav → Zilamê me ji nav xwendekaran çûye ba wan.**
**Ji ser → Du kevok ji ser wî zinarî firiyane.**

**Li ba → Mamoste li ba bavê te çay vedixwar.**

**Li ber → Rojda li ber baranê şil bûbû.**
**Li bin → Çend xebatkar li bin holê raziyan.**
**Li cem → Rewşenê li cem kê ev kilam gotiye?**
**Li hember → Dibistana navîn li hember mala me ye.**
**Li jêr → Li jêr dibistana me parka zarokan çêdibe.**
**Li jor → Li jor dibistana me pirtûkxaneya taxê heye.**
**Li nav → Rojhat, wê rojê li nav zarokên taxa jêr bû.**
**Li paş → Wê xezalê, îcar jî nêçîrvan gelek li paş xwe hiştibû.**
**Li pêş → Azad li ser rêkê, li pêş texsiyê rawestiya.**
**Li nik/rex → Di vî gundî de xanî li rex hev hatine avakirin.**
**Li ser → Vê sibehê bilbil li ser zinarekî, li gorî dilê min dixwend.**

**★ Ji yên bi pêşdaçek, peyv û paşdaçekan ve pêk tên :**

**Bi ser de → Di wî karî de sê rojên te, bi ser ên me de hatine.**
**Bi hev re → Zarokên me, li mal bi hev re xwarinê dixwin.**
**Bi bin ve → Rewşenê, kêra bi benik bi bin holê ve kiribû.**
**Bi hev ve → Memê, dar dane ser hev û bi hev ve girê dan.**
**Bi ser ve → Bi ser rezê wan ve keriyek pez hatibû.**

**Di bin de → Baran barî, zeviyên me di bin avê de man.**
**Di ber de → Di ber dîwarekî hewşê de çar darên xoxê hebûn.**
**Di nav de → Nalîn, di nav xwendekarên taxa jor de rûniştibû.**
**Di serî de → Rê, di serî de li col û cobalên wan hatibû girtin.**

**Di bin re → Di bin du çiyayan re hûn bi trênê bihurîn.**
**Di ber re → Di ber çiyayên bilind re em bi trênê bihurîn.**
**Di nav re → Trêna me, li deştekê di nav rezan re bihurî.**
**Di ser re → Tê gotin ku baz di ser deştan re bêxem difirin.**

**Ji ber ve → Gulçîn, ji ber birayê xwe ve çû berxan bîne.**
**Ji bin ve → Wî, ji bin ve gef û gur li kê xwendine?**
**Ji ser ve → Kula pişta wî ji ser ve hate dermankirin.**
**Ji jêr ve → Wê kir nekir, ji jêr ve tu kesî guhdarî lê nekir.**
**Ji jor ve → Ew li ser pireyê bû, ji jor ve li avê dinêriya.**
**Ji der ve → Apê Nalînê, ji der ve erebeyek anîbû navçeyê.**

**★ Ji yên daçekên hevedudanî yan komedaçekên din :**

**Ber bi → Diya Gulê ji avê dihat, Gul ber bi wê beziya.**
**Ber bi... ve → Komek turîst ber bi jor ve dimeşiyan.**

**Digel... ve → Gul û Gulçîn, digel Dîlanê ve çûn şanogehê.**
**Ligel... ve → Nalîn û Rewşen, ligel Memê ve çûn ber golê.**

**Digel hev → Xwendekaran digel hev li piyesê temaşe kirin.**
**Ligel hev → Nalîn, Rewşen û Mem ligel hev çûn ber golê.**
**Li ber hev → Xwendekar di cih de li ber hev rûniştin.**
**Li hember hev → Mêvanên me li hember hev rûniştibûn.**
**Li pê/pey hev → Xwendekarên taxa me li pey hev hatin.**
**Li dû hev → Çar zarok li dû hev ketin hundirê malê.**
**Li paş hev → Ew li paş hev çûn ber deriyê nexweşxaneyê.**
**Li pêş hev → Xwendekarên me li pêş hev rawestibûn.**
**Li pişt hev → Gul û Gulçîn li pişt hev hatin ber maseyê.**
**Li nik hev → Li nik hev sê kesan li binê bîrê dinêriyan.**

## Di pêkhatina peyv, komepeyv û raweyan de daçek

**Mînak 387/1 : Di pêkhatina peyv û komepeyvan de hêmanên daçekî cih digirin, ji wan çendek :**

**Di navdêrê de : bi + aqiltî → biaqiltî**
**Di rengdêrê de : ji + bergirî → jibergirî**

**Di lêkera biwêjî de : bi ser de hatin → bi + ser + de + hatin**
**Bi radera navdêrîn de : biserdehatin**

**Bi cînavka tewandî ve : bi + wî/wê → pê**

**Di hokerê de : ji berê de → ji berê de**
**Daçek bi daçekê ve : ji bo → ji bo**
**Bi gihanekan ve : ji ber ku → ji ber ku**

**Mînak 387/2 : Di raweyên lêkerê de qertafên daçekî : bi-, di-**

**Qertafa kêşanê : bi-**

**Raweya fermanî : Bixwîne!**
**Dema bê : Ez ê bixwînim.**

**Qertafa kêşanê : di-**

**Dema niha : Ez dixwînim.**
**Dema boriya berdest : Min nedixwand.**

## Di hin bikaranînên kompleks de daçek

**Mînak 388 : Di hevokê de bikaranîn :**

**Bi terkêrê ve :**
**Gulçînê ji du xwendekaran re pênûs kirîn.**

**Bi pêveberê ve :**
**Xalîvan xaliyê salonê ji nû ve bir.**

**Bo cihekî :**
**Gul bi Gulçînê ve di eywanê de rûniştine.**

**Bo berekê :**
**Hêzên leşkerî ber bi başûrê ve bihurîn.**

**Bo demekê :**
**Em duh, ber bi êvarê ji pirtûkxaneyê hatin.**

**Bo rewşekê :**
**Memê bi zarokan ve şerbet vexwarin.**

**Bo sedemekê :**
**Birayê Memê ji ber derdê dilê xwe heliyabû.**

**Bo mabestekê :**
**Nalînê, ji bo Gulê xwarin nebiribû seyrangehê.**

**Bo bisînorkirinekê :**
**Turîst heta kemera dîrokî ya avê çûn.**

**Bo şibandinekê :**
**Bejna Nalînê bi qasî ya Şîlanê ne zirav e.**

**Di komepeyva biwêjî de :**
**Evîndar bû, ew di agirê xwe de dişewitiya.**

**Jimar : 25**

**Mijar : Gihanek**

**Nasîn :**

**Ev peyvên ku bêje, komek, hevokên sereke û yên pêreyî bi hev ve girê didin re *gihanek* tê gotin.**

**Hêmanên gihanekî neguherbar in, bi serê xwe ne xwediyê wateyên girîng in. Lê di hevokê de rolên alîkar ên girîng dilîzin.**

**Hin daçek, hoker, lêker, cînavk, rengdêr û navdêr bi erkên gihanekî bi kar tên; di yên xwerû û nexwerû de cih digirin û bi vî awayî dibin gihanek.**

***Pirs : Di teksta jêrîn de beyî yên hatine reşkirin, gihanek hene?***

Pîvok **û** Zexmo man li serê meydanê, firîna firnikê hespên wan diçûn asîmanê. Ji heyecan **û** heylanê temaşevanan bêhna xwe nedida **û** nedistend, serekê heyeta hemberiyê li tûtikê da. Bi wî dengê tûtikê re, mij **û** moran derket ser meydanê. Pîvokê, bi zanabûn firsenda pêşî da kurmam, **lê** kemenda Zexmo vala çû.
Bihurîn **û** par re zivirîn, li nivê meydanê, cara diduyan Pîvokê mecal da Zexmo. **Fena ku** Pîvok tinazên xwe pê bike, dîsa kemenda Zexmo tewş çû **û** damara nava eniya wî çilmisî. Libaketina sisiyan Zexmo nedît, tenê dît **ku** li nivê meydanê girêdayî ye.
(Ristemê Zal, Xurşîd Mîrzengî)

**Ev peyv gihanek in : û, lê, fena ku, ku.**

## Bi tevayî gihanek

**Em ê gihanekan ji aliyê peyvsazî, wate û erkên wan ve di nav hev de bidin dahûrandin.**
**Ji aliyê peyvsaziyê ve gihanek du beş in : Yên xwerû û yên nexwerû.**

**• Gihanekên xwerû : Gihanekên xwerû ji yek hêmanan pêk tên.**

**Mînak 389 : Ji gihanekên xwerû : an/yan, ano/ango/yanî, bes, ca, de, gel, heger/eger, hek/heke, heta/heya, jî, ka, ku, lema/loma, lew/lewre, lê, ema/ lakîn, ma, ne, û**

**★ Bikaranîna gihanekên xwerû :**

**an/yan**
**Pênûsa sor an a zer bide min!**
**Pelê çirî yan ê neçirî, ev tevde yên we ne.**

**ango/yanî**
**Ew bi arsimê ketiye ango zehf serma xwariye.**
**Ew bi arsimeke giran ketiye, yanî hîn nexweş e.**

**bes**
**Bes bimeşin, hûn ê piştî nîvro bigihêjin wî gundî.**

Hûn ê ber bi nîvro li ser kaniyê bin, bes bimeşin.

**ca**
Ca ew mirov bê ku hûn ê çawa jê re nebêjin!
Ca sibehê bibe, ez ê biçim serlêdana wê pîrê.

**de**
De çi dibe dibe, em ê nameyekê jê re binivîsin.
De kê gotiye gotiye, hûn ê ji xwe re nekin xem.

**gel**
Gul û Gulçîn, ew gel Memê hatine salonê.
Ez û tu, em gel turîstan çûn şaredariyê.

**heger/eger, hek/heke**
Heger ew îro bên, em ê ji vir biçin.
Hek ne wisa be, ew ê çawa bike?
Heke wisa be, ez ê wî bişînim ba te.

**heta/heya**
Heta ku ez bêm, kalê derman xwaribû.
Heya mirinê ew ê ji wan re bixebite.

**jî**
Min ji wê re lênûskek anî, lê te jî jê re aniyê.
Wan jî du pênûs dabûn wê.

**ka**
Bila hoste were, ka em pê re çi peymanê çêdikin?
Ma ew rojekê neçe karê xwe, ka em jê re çi dibêjin!

**ku**
Ku erebeya wî hebûye, hûn ê bibirana bendava mezin.
Em diçin sînemayê ku li filmeke belgewarî temaşe bikin.

**lema/loma, lew/lewre**
Hûn nehatine alîkariya wê, lema ew ji we xeyîdiye.
Wî ji Gulê re negotiye, lew vê neçûye sînemayê.
Em ji wir derketin, lewre wî axaftina xwe biriye.

**lê, ema/lakîn**
Gulê çay çêkiribû, lê wan venexwar.
Hûn hatin ema ew bi we re nehatibû.

**Ew dixebitîn, lakîn bê pere bûn.**

**ma**
**Ma wî alîkarî nexwest ku em jî bidin.**
**Ma min çi got ku tu hema dibêjî : “Na!”**

**û**
**Gul û Gulçîn çûn bajêr.**
**Wan bilêt kirîn û berê xwe dan lûnaparkê.**

**• Gihanekên nexwerû : Gihanekên nexwerû gelek in. Ew herî kêm bi du hêmanan pêk tên.**

**Mînak 390 : Gihanekên nexwerû(pêkhatî, hevedudanî) :**

**★ Ji yên nexwerû :**

**an ... an...**
**Ew nehat an li ba Azêd an li ba Memê ma.**

**an na/heke na...**
**Ev zilam, birayê te an na, hevalê te ye?**

**an ... an jî...**
**An Memê Alan an jî Ristemê Zal dê bê pêşkêşkirin.**

**ca ka**
**Ca ka wî bide min!**

**çawa ku**
**Çawa ku tu bêyî, em ê dest bi kişikê bikin.**

**çer ku**
**Çer ku îşev bigihêjim otelê, ez ê razêm.**

**çi ... çi...**
**Çi ji aliyê dê û çi ji aliyê bavê ve hebû, li wan parî kirin.**

**çima ku**
**Rojhat xwe tawanbar dike, çima ku nekariye ezmûnê bide.**

**da ku**
**Ez ê jê re helbestan bişînim, da ku bide televîzyonê.**

**dibe ku**
**Min pirtûkê Gulê da Gulçînê, dibe ku îro here mala wan.**

**geh ... geh...**
**Hûn geh diçûn geh dihatin, lê em tim li wir bûn.**

**ger**
**Ger ew xwarinê nexin, îro ez wan bernadim.**

**ger .... ger ...**
**Ger bi destê wê, ger bi yê wî be, tu xelat ji we re nayên.**

**heta ku**
**Heta ku ez sax bim, ez ê li te binêrim.**

**ha ... ha...**
**Ha tu têyî ha ew, em ê li mala me dersan çêkin.**

**heye ku**
**Rizgar nehatibû, heye ku riya xwe guherandibû.**

**him ... him...**
**Wan him rez dibirîn him bar dikirin.**

**him ... him jî...**
**Ew vegotin him bo te him jî bo wî ye.**

**ji ber ku**
**Me karê xwe qedand, ji ber ku em şev û roj xebitîn.**

**lêbelê**
**Ez ê herim, lêbelê nikarim heya êvarê bimînim.**

**ka bila**
**Ka bila Rojda bê, çi kiriye nekiriye, hûn ê bibînin.**

**ne ... ne**
**Ne ez dibêjim ne tu, kî yê bibêje, ka em di çi rewşê de ne!**

**wekî ku**
**Min dît ku ew bêhiş radiket, wekî ku bi rojan bêxewmayî.**

**Ji aliyê wate û erkên xwe ve di hevokê de gihanek :**

**Mînak 391 : Di hevokên hevedudanî de gihanek bi rolên alîkar ên girîng radibin :**

★ **Di navbera du hêmanên hevokî de cih digire :**
**Gulçînê dît ku min ew negirt û nebir ber deriyê.**

★ **Sedemê nîşan dike :**
**Ji ber ku pênûs ne baş bû, wî nikarî xweşik binivîse.**

★ **Demê diyar dike :**
**Çawa ku ez bi şev dixwînim, hûn jî dikarin bixwînin.**

★ **Encamê şanî dide :**
**Li gorî ku wî digot, Cano xwastiye ku xwe biavêje ava mezin.**

★ **Rûberîkirin û wekheviyê watedar dimîne :**
**Ha danê sibehê, ha danê êvarê dibe, ew jî bên qursa Soranî.**

★ **Merc û bisînorkirinê destnîşan dike :**
**Heta ku hînî vî zimanî nebin, hûn ê çawa ezmûnê bidin?**

★ **Di navbera hêmanên hevokê de dijberiyê bi dest dixin :**
**Dikir ku bi balafir biçe, lakîn bilêt gelekî biha bûn.**

★ **Di komepeyvên biwêjî de :**
**Evîndar bûye, agir wisa pê ketiye ku tu çare nedîtine.**

★ **Di verastkirina hevokên hevedudanî de :**
**Ew xwe tawanbar dike, çima ku nekare bisîkletê biajo.**

★ **Di ahenga hevokên hevedudanî de :**
**Li yekşemê, yan hûn an jî em ê li qada futbolê bin.**

**Jimar : 26**

**Mijar : Baneşan**

**Nasîn :**

**Peyv û dengên ku hêstan bi kovan, nayîrîn, tirs, şayîş, şaşwazî, eciban, hejmetkarî, şahî, dilxweşî, şiyarkirin, ferman, gazîkirin, mixab, nifir û nazaketan şanî dikin re *baneşan* tê gotin.**

**Hêmanên ku bi binyadî baneşan in ew neguherbar in. Gelek peyvên din jî bi erkên baneşanî bi kar tên û di formên hevedudanî de cih digirin.**

**Di her hevokên baneşanî de peyv an deng ne baneşan in. Ji ber ku hin hevok bêyî hêmanên baneşanî jî bi awayên baneşanî radibin.**

**Mînak 392 : Destpêk : Bo bikaranîna nîşandeka baneşanê( ! ) :**

**Nîşandeka baneşanê tê dawiyê hevoka baneşanî :**

**Ax serê min diêşe!**

**Nîşandeka baneşanê li ber hêmana baneşanê û li dawiya hevoka sereke ye :**

**Ax! Serê min çawa diêşe!**

**Peyv an peyvên baneşanî bi bêhnokê tên veqatandin, nîşandeka baneşanê diçe dawiya hevokê :**

**Ax, êşa serê min her şev giran dibe!**

**Bi tevayî baneşan**

**Gelek baneşan hene, ew bi wate û erkên xwe cuda cuda karîger in. Mirov dikare wan bi awayekî beşkirî wiha vekolîne :**

**Mînak 393/1 : Bo kovan û nayîrînan :**

**⋆ Ji yên peyv û dengên baneşanî : Ax! Ay! Hey lê/lo! Of! Oy! Wî! Wex/Wax! Wey/Way! Wey lê/lo!**

**Ax kurê min nexweş bûye!**
**Ay! Êşa serê min rabû!**

**Hey lê, dîsa dilê min ketiye kela havînê!**
**Hey lo, were ber deriyê dilê min!**

**Of ev çi êş e!**
**Oy derdê bê derman!**

**Dengbêj li her dawiya bendê digot : “Wî! Wî! Wî!..”**

**Wex! Agir bi mala min ketiye!**

**Wey zarokek di avê de fetisiye!**
**Zarokek di avê de fetisiye, wey!**

**Wey lê, ev çi kul e ku kes pê nizane!**
**Ev çi kul e ku kes pê nizane, wey lê!**

**Wey lo, hişkesaliyê gundê me wêran kiriye!**
**Hişkesaliyê gundê me wêran kiriye, wey lo!**

**★ Ji yên peyvên navdêrîn : Hawar! Lorî!**

**Hawar Xwedêyo, vê nexweşiyê zarok nehîştin!**
**Min xwedî kir, xaka reş bir... lorî berxê min lorî!**

**★ Ji yên biwêjî : De lorî! Ax li min ezê/ezo! Wey li minê/mino!**

**Diya te mir, de lorî qîza min lorî!..**

**Ez ê çawa bikim vê şîrmijê, ax li min ezo!**

**Wey li minê! Ji kê re hatiyê danîn kirasê bêkesiyê!**

**Mînak 393/2 : Bo tirs û şayîşan :**

**★ Ji yên peyv û dengên baneşanî : Him! Pix! Wex! Wey! Wiş!**

**Him... te ew ji min re negotibû!**

**Pix! Kurino, sinetker têye!**

**Wex ji warê wan re, tu malbat nemane!**

**Wey pergala me qediyaye!**

**Wiş zarokino! Baş guhdarî bikin, a niha şano dest pê dike!**

**★ Ji yên peyv û dengên baneşanî, bo şibandina ajalan : Hoşt!**

**Hoşt kûçikê şîrheram! Hoşt be, ha!**

**★ Ji yên peyvên navdêrîn : Hawar!**

**Hawar! Şerê birekujiyê dest pê kiriye!**

★ **Ji yên biwêjî : Hawar li min/me!**

**Mar ketine warên me, hawar li me!**
**De bêje, hawar li min!**

**Hawar li me! Kulîlkên dar û berên me şewitîne!**
**Lehiyê ez bêmal kirim, hawar li min!**

**Mînak 393/3 : Bo şaşwaziyan :**

★ **Ji yên peyv û dengên baneşanî : A! Aha! Erik/Herik! He!Tew! Wiş! Wî!**

**A! Ew qîz çi xweşik dilîze!**

**Aha! Havalê Nalînê jî lîstikvan bûye!**

**Erik, hemû ciwanên wê taxê lîstikvan bûne!**

**Wêneyên dîwarên şaredariyê, we çêkiribûn, he?!**

**Tew! Stranbêjê me jî dibêje : "Ez îşev nikarim bistrêm!"**

**Wiş, qîza wan reviye ha!**

**Wî! Di gundekî de tu kesî nan nedaye parsekê!**
**Wî, min navê te ji bîr kiriye!**

★ **Ji yên peyvên navdêrîn : Hawar!**

**Hawar, zilamên we, navê welatî xwe nizanine!**

**Mînak 393/4 : Bo eciban û hejmetkariyan :**

★ **Ji yên peyv û dengên baneşanî : Bijî/Bijîn! Çi! Eh! Ha ho! O! Peh/Pehe!**

**Gulê got : " Dayê, min xelata yekemîn girt!"**
**Dayê : "Bijî qiza min!"**

**Memê got : "Bavo, pola me di basketbolê de bi ser ket!"**
**Bavê : " Bijîn!"**

**Memê : "Bavo, di koma basketbolê de ez jî hebûm!"**
**Bavê : "Her bijî, lawê min!"**

**Çi bajarekî dîrokî ye!**

**Eh baş e, we ji zarokan re şekir aniye!**

**Ha ho hevalno bibezin, ev çi masî ne!**

**O! Tu mezin bûyî, emrê te dirêj be!**

**Peh! Ew çi aveke xweşik bûye!**

**⋆ Ji yên biwêjî : Çi zehmet e! Çi zehmet in! Serkeftin!**

**Mêvan : "Çemekî har e, pireya wî sê caran hatiye çêkirin!"**
**Kalo : "Çi zehmet e lo!"**

**Lîstikvan derdiketin qada futbolê.**
**Temaşevan diqîriyan : "Serkeftin! Serkeftin!.."**

**Mînak 393/5 : Bo şahî û dilxweşiyan :**

**⋆ Ji yên peyv û dengên baneşanî : Aferîn! Ay! Gidî! Hah! Hey gidî! Ox!**

**Gulçînê got : "Dayê, ez ê xwendina xwe bidomînim."**
**Dayikê : "Aferîn delala min!"**

**Evîndar dibêje : "Min îro yara xwe dîtiye, ay dilê min!"**
**Nalîn lê vedigere û dibêje : "Gidî, wiha mebêje!"**

**Hah, ew jî bi hatina we gelekî serbilind bûye!**
**Hey gidî dilo, bi baranê ve bi ser kê de dibarî..!**
**Ox! Ev çi dîlan e, ha bireqisin keçino!**

**⋆ Ji yên peyvên navdêrîn : Tilîlî!**

**Govend şên dibû û tilîlî dikişandin : "Tilîlîlîlîîî!.."**

**Mînak 393/6 : Bo îkaz û şiyarkirinan :**

**⋆ Ji yên peyv û dengên baneşanî : Biv! Çûçê! Viş/Vişt! De! Dê! Cece!**

**Gelî! Hey!**

**Şîrmijekî destê xwe dirêjî êgir kir.**
**Xwişkê got : "Biv! Çeçê te bişewite!"**

**Zarokek ji cihê xwe rabû.**
**Dayikê got : "Çûçê, kurê bavê xwe!"**

**Zarok digiriya, dayê :**
**- Wiş, got, kurê min megirî!**

**De, ev xebat wisa tê meşandin!**
**Dê bixebitin, em vî karî biqedînin!**

**Pêlevan destê xwe li singê xwe xist û pê re :**
**- Ceceeee, got!**

**Gelî hevalan, em sibehê jî li ber kaniyê dixebitin!**

**Hey qîzikê, divê ku tu biçî mala wan!**

★ **Ji yên peyv û dengên baneşanî, bo şibandina ajalan : Ço! Çûş! Hoşt!**

✔ **Ço! Çûş!**

**Bo ajalan(**ew kerek e**) :**
**Apê Dildar li kera xwe siwar bû û got : "Ço!"**
**Apê Dildar, kera xwe li ber deriyê hewşê rawestand û got : "Çûş!"**

**Bo mirovan(**argo**) :**
**Apê Dildar :**
**- Kuro, heta ku ez ji te re nabêjim ço, tu nameşî!**

**Serdar dibişirî û Apê Dildar bi ser de çû :**
**- Tu rawestinê jî nizanî, da ku ez nabêjim çûş!**

✔ **Hoşt!**

**Bo ajalan(**ew kûçikek e**) :**
**Kûçikê malê diewitiya. Xalê Nezan got : "Hoşt! Hoşt!"**

**Bo mirovan(**argo**) :**
**Gundî civiyabûn. Xortekî tasek av ji mezinekî dixwast.**
**Mirovek qarî û got : "Hoşt! De rabe ji vir..."**

★ **Ji yên peyvên navdêrîn : Tilîlî!**

**Qîrewîrek rabû, deh kes hatibûn binçavkirin.**
**Lê jinan dewam dikir : “Tilîlîlîîî..!”**

**Mînak 393/7 : Bo fermanan : Ev bi lêkeran pêk tên :**

★ **Ji yên erêniyê :**
**Bike/Bikin! Bîne/Bînin! Vexe/Vexin!**

★ **Ji yên neyîniyê :**
**Meke/Mekin! Meyne/Meynin! Vemexe/Vemexin!**

**Mînak 393/8 : Bo gazîkirinan(banglêkirin) :**

★ **Ji yên peyv û dengên baneşanî : Ey! Hê/Ho! Hey! Hey gidî! Hey lê/Hey lo! Lê/Lo!**

**Ey zilam(i)no, bibezin!**
**Hê Gulê, binêre, Dilşad tê!**
**Ho Dilşado, raweste, ez têm!**

**Hey porzerê, te mala min xera kir!**
**Hey gidî çavreşê, ez li benda kê me!**
**Hey lê dilnarînê, bê cem yarê xwe!**
**Hey lo lawo, ez bang dikim, tu çima deng nakî!**

**Lê devbikenê, hêdî hêdî bibêje!**
**Lo, de bilezîne, em dereng man!**

★ **Ev baneşan pirjimar bi kar tê : Gelî!**

**Gelî mirovan, hûn bi xêr hatin!**
**Gelî mirovino, hûn bi xêr hatin!**

★ **Ji yên peyvên navdêrîn, yekjimar, nêr(-o), mê(-ê) :**
**Cano/Canê! Kuro/Keçê! Bavo/Dayê! Havalo/Hevalê!**

★ **Ji yên baneşan û bi navdêran ve, yekjimar, nêr(-o), mê(-ê) :**
**Hey cano/Hey canê! Lo hevalo/Lê hevalê! Ey bavo/Ey dayê!**

★ **Ji yên baneşan û bi navdêran ve, pirjimar, nêr/mê(-(i)no) :**
**Hey canino! Lo hevalino/Lê hevalino! Ey bavino/Ey dayikino!**

★ **Ji yên peyvên navdêrîn ên nenas, pirjimar, nêr/mê(-(i)no) :**
**Kurino/Keçino! Mêrikino/Jinikino! Zavan(i)no/Bûkino!**

★ **Ji baneşanên ku bi dirêjxwendina tîpên peyvan bi kar tên :**
**Baran → Baraaan! Zîn → Zînêêêê! Çiya → Çiyayoooo..!**

**Mînak 393/9 : Bo mixaban û nifiran :**

★ **Ji yên peyvên baneşanî : Ê! Heyf!**

**Ê bes e lê, te em ji guhan de kirin!**
**Heyf ji we re! We nikariye bi ser kevin!**

★ **Ji yên biwêjî : Nelet lê bê/bên! Bi derdê giran biketê/biketo! Heyf e! Çi heyf! Heyfa te/we! Malxerabê(o)! Malik wêranê/wêrano!**

**Mînak 393/10 : Baneşanên nazaketan(silavî, xweşbêşî, xweşmerî) :**

★ **Ji yên silavdayînan û ev peyv bi binyadî ne baneşan in :**
**Beyanî baş! Rojbaş! Roja te/we xweş! Êverbaş! Şevbaş!**

★ **Ji yên xweşbêşiyê û ev peyv bi biyadî ne baneşan in :**
**Tu bi xêr hatî/Hûn bi xêr hatin! Ser çavan! Bimîne xweşiyê de! Bimînin xweşiyê de! Oxir be! Mala te/we ava be!**

★ **Ji yên nazaketan ên din û ev peyv bi binyadî ne baneşan in :**

**Bibore/Biborin! Bibexşîne/Bibexşînin! Derbasî be! Serê we sax be! Ez benî! Lebê! Norş û can be! Malava! Xwedê ji te/we razî be! Emrê te/we dirêj be! Cejna te/we pîroz be! Sersala te/we pîroz be!**

★ **Ji bo mezinan nazaket, ku ev peyv bi binyadî ne baneşan in :**
Bi giştî beyî yên rewşên malbatî û yên cancigerî; kesê(**a**) duyemîn ên pirjimar, li şûna kesê(**a**) duyemîn **ê**/**a** yekjimar tên bikaranîn :

**Biborin! Bibexşînin! Derbasî be! Serê we sax be! Ez benî! Lebê! Norş û can be! Mala we ava be! Xwedê ji we razî be! Emrê we dirêj be! Cejna we pîroz be! Sersala we pîroz be!**

## Ji aliyê peyvsaziyê ve baneşan

**Ji aliyê peysaziyê ve baneşan li du beşên sereke parve dibin :**

**• Yên xwerû : Piraniya wan di binyatên xwe de baneşan in û bi yek hêmanan pêk tên.**

**• Yên nexwerû : Mirov dikare wan wisa jêrebeş bike û bihûrîne :**
**Yên bi du hêmanan**
**Yên dubare**
**Yên komebaneşanî**
**Yên biwêjî**

**Mînak 394 : Baneşanên xwerû :**

**★ Ji peyv û dengên banêşanî : A! Ax! Ay! Biv! Eh! Ê! Gelî! Gidî! Ey! Hey! Heyf! Hoşt! Lê! Lo! Of! Oy! Pix! Tew! Wax! Way! Wey! Wiş! Wî!**

**Mînak 395 : Baneşanên nexwerû(pêkhatî, hevedudanî) :**

**★ Ji yên bi du hêmanan : Ax lê! Ey lê! Ey lo! Hey gidî! Hey lê! Hey lo! Lebê! Lêlê! Lolo! Wey lê! Wey lo!**

**Mê : lê + lê → lêlê :**
**Rewşanê li qîzê gazî kir :**
**- Lêlê, tu çi bûyî dîna çolan!"**

**Nêr : lo + lo → lolo :**
**Dîno rabû ser xwe û ji lawê xwe re got :**
**- Lolo, tu çi dibezî wekî hespên beriyan!**

**★ Ji yên bo ajalan an ji yên argo : Çûş lo! Çûş lê! Hoşt lo!**

**★ Ji yên bi peyvên baneşanî û yên din ve : De lorî! De hawar! De biçe/biçin! Ax yadê/yabo! Lê vexwe/vexwin! Lo vexwe/vexwin!**

**★ Ji yên dubare : Ay! Ay! Ey! Ey! Hey! Hey! Lê! Lê! Lo! Lo!**

**★ Ji yên bo ajalan an ji yên argo : Ço! Ço! Hoşt! Hoşt!**

**★ Ji yên komebaneşanî : De wî! wî! Hey gidî lêlê! Wey lolo!**

**★ Ji yên biwêjî : Ax li min ezê! Ax li min ezo! Hawar li me!**

**Jimar : 27**

**Mijar : Hevoksazî**

**Hevoksazî pêkhatina hevokan, di wan de rêzbûna hêmanên bêjeyî û têkildariyên wan ên hevokî vedikole. Ev vekolîn, li gorî rê û rêzikên rêzimanî çêdibin.**
**Hevok û cureyên wê û hevok û hêmanên wê bingeha hevoksaziyê ne.**

**Hevok**

**Li gorî rêgezên rêzimanî û têkildariya wate û peywirên hêmanên xwe hevok; raman, hest, daxwaz, dîtin, hikm û rûdanan tînin ziman.**
**Bi gotineke gelemperî hevok bi tîpeke girdek dest pê dike, bi xal an pirsnîşan an bangnîşan an jî bi sêxalê dawî dibe. Ew nayê vê wateyê ku hemû hevok bes bi wan xalbendiyan diqedin.**

**Di kurmanciyê de ji bo pêkhatina hevokeke hêsan pêwîst e ku lêkerek bê kêşandin. Wek tê zanîn ew kêşan li gorî dem, kes û mêjerê dibin.**

**Mînak 396 : Lêker : Çûn**
**Biçe!**
**Diçe.**
**Çû.**

**Hêmanên hevokê :**

**Di hevokê de çar hêmanên girîng hene. Ji wan ên bingehîn kirde û pêveber, yên alîkar jî bireser û têrker in.**

**• Kirde :**

**Di hevokê de çalakî ji aliyê kirdeyê ve pêk tên ku ew kirde, yekjimar û pirjimar kes an jî tiştek e. Di kurmanciyê de kirde bi piranî di destpêka hevokê de cih digire. Ji kirdeyê re *kiryar* jî tê gotin.**
**Bo bidestxistina kirdeyan; ji bo *mirovan* pirsên bi ( *kî/kê* ) û ji bo *tiştan* jî pirsên ku bi ( *çi* )'yê, ji lêkerên pêveber têne kirin.**

**Mînak 397/1 : Di hevokê de kirde û bikaranîn :**

**★ Kirde yekjimar e :**

**Bo mirovan : Kirde  mirovek e yan jî jinek e :** Zelal
**Zelalê av vexwar.**

**Bo tişt û heyberên din : Kirde tiştek e yan jî ajalek e :** berx
**Berxê av vexwar.**

**★ Kirde pirjimar e :**

**Bo mirovan : Kirde jin û mêr, du kes in :** Mem, Zelal
**Mem û Zelalê av vexwarin.**

**Bo tişt û heyberên din : Kirde tişt in an jî ajal in :** berxan
**Berxan av vexwarin.**

**Mînak 397/2 : Di hevokê de hêmanên kirdeyî gelek in :**

★ **Bo cînavkên kesane : Kirde ew û ez, du kes in :** ew, ez
**Ew hat û ez jî çûm.**

★ **Bo cînavkên şanîdane :**

**Kirde pirjimar e û tişt an ajal in, cihên wan nêzîk in :** van
**Van ava ku bi derman venexwarin.**

**Kirde pirjimar e û mirov in, cihên wan dûr in :** wan
**Wan ji me re hirmî kirîn.**

★ **Bo hêmanên ravekî :**

**Bo raveka navderîn : Kirde :** çavên Zelalê
**Çavên Zelalê zer in.**

**Bo raveka rengderîn : Kirde :** zilamê evîndar
**Zilamê evîndar dimeşiya.**

**Bo raveka cînavkî : Kirde :** seriyê min
**Seriyê min diêşiya.**

**Bo raveka zincîrîn : Kirde :** şanogerên şaredariya bajarê mezin
**Şanogerên şaredariya bajarê mezin li ber deriyê şanogehê ne.**

★ **Hêmanên kirdeyî yên ku hîn kompleks jî hene :**
**Yê ku li gundê me çar salan mamostetî kiribû, ketibû pêşbaziyê.**

**Mînak 397/3 : Di hevokê de kirde bi awayê veşarî jî dibin :**

★ **Ew bi alîkariya wateya hevokê û paşgirên kesandinê şanî dibin :**

**Ji lêkerên negerguhêz : Hatin**

**Ji kêşana lêkerê diyar dibe ku kirde yekjimar û mirovek e :** ew
**Li her çarşemê dihat.**

**Ji lêkerên gerguhêz : Xwandin, nivîsandin**

**Ji kêşana her du lêkeran jî diyar dibe ku kirde mirov in, yekjimar an jî pirjimar in :** te, wî/wê, we wan; vî/wê, van/wan

**Her roj dixwand û dinivîsand.**

**Mînak 397/4 : Bûyerên pêk tên an kes û tiştên ku dibin mijarên bûyeran, carinan ew bixwe jî dibin kirde :**

**Kirde :** baran
**Sê roj û sê şev in ku baran dibare.**

**Kirde :** hemû mal
**Hemû mal di bin avê de mabûn.**

**Kirde :** du darên kevnare yên tûyên
**Du darên kevnare yên tûyên şikeştibûn.**

**• Pêveber :**
**Ev hêman pêkhatina kar, bûyer û rewşan radigihînin. Ji bo karîgeriya pêveberê pêwîst e ku herî kêm lêkerek bê kêşandin. Di kurmanciyê de pêveber bi piranî di dawiya hevokê de cih digire.**

**Hemû lêker bi erkên pêveberî tên karandin. Ligel vê di hin bikaranînên lêkeran û bi piranî hin yên alîkar de hin taybetî hene ku pêveberiya wan bi hin hêmanên din ve dikevin hevpariyê.**

**Mînak 398/1 : Di hevokê de pêveber :**

**⋆ Ji lêkerên xwerû : Çûn**

**Serdar çû.**
pêveber : **çû**

**⋆ Ji lêkerên pêkhatî : Rabûn**

**Zîlan rabû.**
pêveber : **rabû**

**⋆ Ji lêkerên hevedudanî : Pêk anîn**

**Dîlanê karê xwe pêk aniyê.**

pêveber : **pêk aniye**

**Mînak 398/2 : Li gorî lêkeran pêveber :**

★ **Ji yên ku bûyer an kirinan diyar dikin : Kirin**

**Hûn dikin.**
pêveber : **dikin**

★ **Ji yên ku rewş an taybetiyan raber dikin : Bûn**

**Serdar zilam e.**
pêveber : **zilam e**

**Serdar jêhatî ye.**
pêveber : **jêhatî ye**

Li jor, kêşana lêkera (**bûn**)'ê ya dema niha û kesê sêyemîn (**e**/**ye**), bi peyvên (**zilam** û **jêhatî**)'yê ve dibin pêveber ku ne kêşanbariya lêkerê, ne jî ew peyv bi serê xwe tenê nikarin erka pêveberiyê pêk bînin.

✓ **Ji yên ku rewş an taybetiyan raber dikin : Bûn**

**Serdar ciwan bû.**
pêveber : **bû/ciwan bû**

Li jor, kêşan lêkera (**bûn**)'ê ya dema boriya têdeyî û kesê sêyemîn (**bû**), bêyî peyva (**ciwan**)'ê jî dikare bibe pêveber, lê ji aliyê wateyê ve ew hevok temam nabe.

✓ **Ji yên ku rewş an taybetiyan raber dikin, neyînî : Bûn**

**Serdar ne mezin bû.**
pêveber : **ne mezin bû**

**Mînak 398/3 : Lêkerên pêveber bi gelek hêmanan ve hevpar dibin ku ji aliyê sazbûna hevokê ve piraniya wan hêmanan têrker in û ji aliyê bêjesaziyê ve jî navdêr, rengdêr, cînavk, hoker, daçek û gihanek in :**

**Ew jin mamoste, nivîskar û peykervan bû.**
**Bejna wê piçek, zirav û dirêj dihat xuya kirin.**

• **Bireser :**
**Kirde çalakiyên xwe yekser li ser kes û tiştan pêk tînin, yan jî ew kes û**

**tişt yekser di bin bandora çalakiyan de dimînin ku ev kes û tişt, ji aliyê hevoksaziyê ve hêmanên *bireser* in. Bi navlêkirineke din, di hevokê de bireser *têrkerên rasterast* in.**

**Wekî ku di hin behsên têkildar de hatibûn karandin, di kêşana lêkerên gerguhêz de bireser bi erkên girîng radibin.**

**Bo bidestxistina *bireserê*(*têrkera rasterast*), bo kesan pirsên bi ( *kî/kê* ) û bo tiştan jî yên bi *( çi* )'yê; ew pirs bi kirdeyê ve ji lêkerên pêveber tên kirin.**

**Mînak 399/1 : Di hevokê de bireser :**

★ **Bireser kes(**mirov**) in :**

✔ **Bo bidestxistina bireserê, pirsên bi ( kî )'yê û bi kirdeyê ve ji lêkerên pêveber tên kirin.**

**Diya Dîlanê zarok mêjand.**

Pirs : **Diya Dîlanê kî mêjand?**
Bersiv : **Diya Dîlanê zarok mêjand.**
**Bireser :** zarok

**Diya Şîlanê jî zarokin mêjandine.**

Pirs : **Diya Şîlanê kî mêjandine?**
Bersiv : **Diya Şîlanê zarokin mêjandine.**
**Bireser :** zarokin

✔ **Bo bidestxistina bireserê, pirsên bi ( kê )'yê û bi kirdeyê ve ji lêkerên pêveber tên kirin.**

**Diya Berîvanê qîzê dimêjîne.**

Pirs : **Diya Berîvanê kê dimêjîne?**
Bersiv : **Diya Berîvanê qîzê dimêjîne.**
**Bireser :** qîzê

**Diya Rewşenê jî du qîzan dimêjîne.**

Pirs : **Diya Rewşenê kê dimêjîne?**
Bersiv : **Diya Rewşenê du qîzan dimêjîne.**
**Bireser :** du qîzan

★ **Bireser tişt in : Bo bidestxistina bireserê, pirsên bi ( çi )'yê û bi kirdeyê ve ji lêkerên pêveber tên kirin.**

**Bavê Dîlanê berçavik kirî.**

Pirs : **Bavê Dîlanê çi kirî?**
Bersiv : **Bavê Dîlanê berçavik kirî.**
**Bireser :** berçavik

**Bavê Şîlanê jî du berçavik kirîne.**

Pirs : **Bavê Şîlanê çi kirîne?**
Bersiv : **Bavê Şîlanê du berçavik kirîne.**
**Bireser :** du berçavik

**Mînak 399/2 : Di hevokê de bireser ji çend hêmanan jî pêk tên :**

★ **Ji hêmanên serbixwe :**

**Zîlanê** *Mem û Berfîn* **di salonê de dîtine.**
**Jina şanoger,** *ew, tu û ez***, em vexwendin ber sehneyê.**

★ **Ji hêmanên ravekê :**

**Wî ajogerî** *xwendekarên wê zanîngehê* **ranekirine.**
**Nazê,** *pênûsa sor a dirêj* **daye hevalekî min.**

● **Têrker :**
**Ji aliyê sazbûna hevokê ve hêmanên ku pêveberan temam an jî xurt dikin, *têrker* in. Bi giştî ew temamkirin û xurtkirin ji aliyê dem, cih û rewşê ve ne.**

**Têrker li du beşên sereke kom dibin : Yên rasterast û yên nerasterast. Wekî ku li jor hatibû vegotin; têrkerên rasterast, bireser in û ne pêwîst e ku dîsa bên ducarkirin.**

**Di pêkhatina têrkeran de gelek bêje û bêjeyên alîkar, karîger in ku em ê li vir, bi giranî li ser bikaranîna têrkerên nerasterast rawestin.**

**Mînak 400 : Di hevokê de têrkerên nerasterast :**

**Ji bo bidestxistina têrkerên nerasterast, pirsên ku bi hokerên pirsyariyê û kirdeyê ve ji lêkerên pêveber tên kirin.**

♦ **Li gorî dem, cih, rewş û şibandinê têrker :**

★ **Ji yên ku bo demê bi kar tên :**

**Sê firoşger** *piştî nîvro* **ketin taxê.**
**Komek firoşger jî** *duh, berê êvarê* **hatin.**

★ **Ji yên ku bo cih û berekê bi erk dibin :**

**Hemû ciwan pêkte** *li parkê* **rûniştibûn.**
**Ew** *ji qesrê* **derketin û** *ber bi jêr ve* **çûn.**

★ **Ji yên ku bo rewşê karîger in :**

**Ew bi hev re** *hêdî* **û** *xweşik* **direqisiyan.**
**Dema ku sazbend sekinîn, ew qîz** *dilsar* **bûn.**

★ **Ji yên bo şibandinê, ew jî rewşekê radigihînin :**

**Rêber, agahdarî** *wiha* **daye biyaniyan.**
**Min jê re gotibû; hey lo, tu çima** *wilo* **dibêjî!**

**Mînak 401/1 : Di hevokan de cihên hêmanan tên guhertin :**

★ **Kirde + bireser + pêveber :**
Kevokvan kevokê digire.

★ **Kirde + bireser + pêveber + têrker :**
Kevokvan kevokê dixe rikeyê.

★ **Kirde + têrker + bireser + pêveber :**
Kevokvan ji rikê kevok derxist.

★ **Bireser + têrker + têrker + pêveber :**
Kevok ji rikê hate firandin(**kirde veşarî ye**).

★ **Têrker + têrker + bireser + pêveber :**
Di rikê de kevok dida avdan(**kirde veşarî ye**).

★ **Kirde + têrker + pêveber :**
Wî ji rikê berda(**bireser veşarî ye).**

**Mînak 401/2 : Di diyalogan de hin hêman an jî hemû dikevin :**

**Ev hevok gotineke gelêrî ye :**

Li ser dara hirmiyê sih û sê kilamên hirçê hene.

Mem :
- Sih û sê kilamên hirçê hene.
Dîlan :
- Li ser dara hirmiyê.
Berîvan :
- Sih û sê kilamên hirçê.
Şîlan :
- ?

**Di diyalogên jorîn de ev hêman ketine :**

Diyalog 1 : **Têrker :** li ser dara hirmiyê
Diyalog 2 : **Kirde, pêveber** ***:*** sih û sê kilamên hirçê, hene
Diyalog 3 : **Têrker, pêveber :** li ser dara hirmiyê, hene
Diyalog 4 : **Hemû :** Li ser dara hirmiyê sih û sê kilamên hirçê hene.

**Cureyên hevokan :**
**Wekî ku hin beşên rêzimana kurmanciyê der barê cureyên hevokan de jî, ji aliyê têgînnasî û senifandinê ve di çavkaniyên nivîskî de tevlihevî tên dîtin ku gelek zimanzana wan cuda bi nav dikin û dinirxînin.**

**Em ê li ser bingeheke hevpar û bi sentezeke rêbazî, cureyên hevokan bidin navandin û dahûrandin : Bi gelemperî cureyên hevokê, li gorî rewşa pêveberê hevok, ji aliyê avasaziyê ve hevok.**

**• Bi gelemperî cureyên hevokê :**
**Ji aliyê navandinê ve; wate, rawe û formên wan sereke tên raberkirin. Mirov dikare wan cureyan ji aliyê ragihandinî, erênî, neyînî, fermanî, daxwazî, bilanî, xwestekî, hekanî, divêtî, pirsyarî û baneşaniyê ve bide birkirin. Em ê wan, li jêr di birên wan de bi yek hevokan şanî bikin.**

**♦ Hevokên ragihandinê : Ev hevok bi alîkariya raweyên pêşkerî tên sazkirin. Rewş, rûdan, agahî û ramanan bi ragihandinê diyar dikin.**

**Mînak 402 :**
**Şerko Bêkes helbestvanekî berhemdêr e.**

**♦ Hevokên erêniyê : Ev hemû hevokên erêniyê dixe nava xwe.**

**Mînak 403 :**
**Ew li mêvanxaneya şaredariyê radiziya.**

♦ **Hevokên neyînê : Ev hemû hevokên neyîniyê dixe nava xwe.**

**Mînak 404 :**
**Wan ew ranekirin nexweşxaneya nûjen.**
**Rewşa wî ne min jê re got, ne jî kesekî din.**

♦ **Hevokên fermaniyê : Ev bi awayê fermanî saz dibin.**

**Mînak 405 :**
**Rabe ser xwe!**

♦ **Hevokên daxwaziyê : Ev bi awayê daxwazî çêdibin.**

**Mînak 406 :**
**Hûn jî li depreşê binivîsînin.**

♦ **Hevokên xwestekiyê : Ev bi awayên xwestekî pêk tên.**

**Mînak 407 :**
**Xweziya ew li cem wan bibûya.**

♦ **Hevokên bilaniyê : Ev bi awayên bilanî tên holê.**

**Mînak 408 :**
**Bila hûn bimeşin bi wan re.**

♦ **Hevokên hekanîyê : Ev hevok ên awayên mercî ne û bi giranî di yên hevedudanî de bi kar tên.**

**Mînak 409 :**
*Heke hûn nexebitin*, **nikarin pêş bikevin.**
*Ku hûn guhdarî bikin,* **dê baş bê fehmkirin.**

♦ **Hevokên divêtiyê : Ev bi awayên divêtî çêdibin û him bi serê xwe, him jî di hevokên hevedudanî de tên karandin.**

**Mînak 410 :**
**Divê tu vê mijarê ji bo min baş vebêjî.**

♦ **Hevokên pirsyariyê : Ev bi awayên pirsyarî pêk tên.**

**Mînak 411/1 : Hêmanên pirsyarî kirpandinê digirin :**

*Kî* **endezyar e?**

**Endezyar *kî* ye?**

**Ew *li ku derê* mabû?**

**Mînak 411/2 : Pêveber kirpandinê radikin ser xwe.**
**Mamoste jî *pejirandiye*?**

**♦ Hevokên baneşaniyê : Ev bi awayên baneşanî çêdibin.**

**Mînak 412 :**
**Ew çi xwendekarekî zîrek e!**
**Xwendin û nivîsandina wî bê hempa ye!**

**● Li gorî rewşa pêveberê hevok :**
**Li gorî rewşa pêveberê hevok du bir in : Yên navdêrî û yên lêkerî.**

**♦ Hevokên navdêrî :**
**Pêveberên wan bi navdêran ve dikevin hevpariyê ku ew pêveber bi kêşana lêkera "bûn"ê, ango bi paşgirên kesandinê tên holê. Di kêşana lêkera "bûn"ê de ya awayê rewşê sereke ye.**

**Bi nirxandineke berfireh em dikarin wiha bêjin: Hevokên ku pêveberên wan bi kêşan lêkera "bûn"ê ya awayê rewşê pêk tên û pêveberiya wan bi navdêr, rengdêr, cînavk, hoker, daçek, gihanek û baneşanan ve hevpar dibin; ew hevok ên navdêrî ne.**

**Mînak 413 :**
**Navê vê qîzê Berfîn e.**
**Navê wî zilamî jî Alan e.**

**Alan û Berfîn ciwan in.**
**Alan û Berfîn evîndarên hev in.**

**♦ Hevokên lêkêrî :**
**Yên ku bêyî awayê rewşê ya kêşana lêkera "bûn"ê û bi hemû lêkerên din çêdibin, hevokên lêkerî ne. Hevokên ku bi keşana lêkera "bûn"ê yên ku çalakiyan diyar dikin jî di vê birê de cih digirin.**

**Bi ramaneke berfireh, hevokên ku bêyî yên bi *kêşanên lêkera* "bûn"ê *yên rewşîn* pêk tên, ew hemû hevok ji aliyê pêveberê ve yên lêkerî ne.**

**Mînak 414 :**
**Alên ji Berfînê re gelek name dişandin.**
**Di wan salan de ew li wir bûne.**

• **Ji aliyê avasaziyê ve hevok :**
**Hevok ji aliyê avasaziyê ve li du birên bingehîn tên komkirin : Xwerû û hevedudanî. Beyî hevokên xwerû û yên hevedudanî, em ê di vê beşê de li ser hevokên serbixwe û yên navberî jî rawestin.**

♦ **Hevokên xwerû(sade) : Ev li gorî kirdeyên xwe bi kêşana lêkerekê; hest, daxwaz, bûyar an jî ramanekê radigihînin.**

**Mînak 415 :**
**Rewşen bajarî ye.**
**Wê xwendina xwe bi dawî kiriye.**

♦ **Hevokên serbixwe :**
**Ev ji aliyê sazbûnê ve wekî yên xwerû, hêsan pêk tên. Bi serê xwe dikarin hest, rûdan û ramanan diyar bikin. Di hevokeke dirêj de li pey hev tên, bi bêhnok, xalecot û sêxalan ji hev cuda dibin. Bi kirdeyên hevpar û bi çend pêveberan jî saz dibin ku pêveberên wan bi gihaneka "û"yê ji hev tên cudakirin.**

**Mînak 416 :**
**Dîlanê şîv anî, da ber zarokan.**
**Berîvanê jî hirmî anîn û dan wan.**

♦ **Hevokên navberî :**
**Di nava hevokekê de, hevokeke din di navbera du bedikan de yan jî bê bendik tên ristin ku ew hevok *ên navberî* ne. Eger ji hevokên ku têde cih digirin, ew bên derxistin, di wê hevokê de tu kemasî nayê holê.**

**Mînak 417 :**
**Sala ku dest bi xwendinê kiribû -*dibistan nû ava bûbû*- ew heft salî bû.**
***Xwedê biparêze*, ew ciwanekî zor xweşmêr e.**

♦ **Hevokên hevedudanî :**
**Ev bi çend hevokên xwerû yan jî yên serbixwe, bi hevokên bingehîn(sereke) û yên alîkar(pêreyî), bi alîkariya gihanekan û bi hin nîşandekên xalbendiyê tên sazkirin.**
**Di hevokeke kompleks de, dibe ku ji wan çend hêman jî bên karandin.**

**Piştî vê ravekirinê, em ê hevokên hevedudanî wiha bidin vekolandin :**

★ **Di hevokên hevedudanî de hevokên rêzkirî :**
**Ev hevok ji çend hevokên serbixwe û bi alîkariya gihaneka "û"yê, yan jî**

**bi alîkariya hin nîşandekên xalbendiyê(bêhnok, xalebêhnok, sêxal) tên afirandin.**

**Di pêkhatina hevokeke wisa de çend hevokên serbixwe tên rêzkirin ku ji aliyê şêwe yan wateyê yan jî her duyan ve sergihayiyeke pevgirêdayî ya hevokeke hevedudanî derdikeve holê. Di wan hevokên hevedudanî de yên rêzkirî; bi bêhnok, xalebêhnok an jî bi sêxalan ji hev tên cudakirin.**

**Mînak 418 :**
**Mem di cihan de bû; Dîlan kete hundir, haya wî jê nebû.**
**Demjimêrê lê da, Mem şiyar bû... rabû û çû serşokê.**

**★ Di hevokên hevedudanî de yên pevgirêdayî :**
**Ev hevokên hevedudanî, herî kêm bi hevokeke bingehîn û yeke alîkar pêk tên. Ev her du hêman, him ji aliyê wateyê ve û him jî ji aliyê peywirê ve hevokên hevedudanî sergihayî dikin.**

**Di pêkhatina wan de gihanek an komikên gihanekî, hoker an komikên hokerî û cînavka girêkî, "ku" jî bi erkên alîkar cihên xwe digirin û hin nîşandekên xalbediyê jî tên xebitandin.**

**Di hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî de, ji hevokên bingehîn re *şahkomek* û hevokên alîkar re *komek* jî tên gotin. Lê her *komek* ne hevokên alîkar in, ji ber ku komekên bê pêveber jî hene.**

**Mînak 419 : Bo hevoka bingehîn û ya alîkar :**

**Rewşen hat ku Dîlan rojnivîskê bixwîne.**

**Di hevoka jorîn de :**
Hevoka bingehîn : **Dîlan rojnivîskê bixwîne**
Ya alîkar : **Rewşen hat**
Hêmana ku her du hevokan bi hev girê dide : **ku**

**Mînak 420/1 : Bo hêmanên alîkar ên gihanekî :**

**Ji ber ku Dîlan ne amade bû, rojnivîsk nehat xwendin.**

**Di hevoka jorîn de :**
Hevoka bingehîn : **rojnivîsk nehat xwendin**
Ya alîkar : **Dîlan ne amade bû**
Hêmana ku her du hevokan bi hev girê dide : **ji ber ku**

**Mînak 420/2 : Bo hêmanên alîkar ên hokerî :**

**Ji ber ku nehatibû, rojnivîsk nehatiye xwendin.**

**Di hevoka jorîn de :**
Hevoka bingehîn : **rojnivîsk nehatiye xwendin**
Ya alîkar : **nehatibû**
Hêmana ku her du hevokan bi hev girê dide : **ji ber ku**

**Mînak 420/3 : Bo hêmana alîkar a cînavka girêkî (*ku* ) :**

***Yê ku* porê te çêdike, di wî karî de xelata yekemîn girtiye.**

**Di hevoka jorîn de :**
Hevoka bingehîn : **di wî karî de xelata yekemîn girtiye**
Ya alîkar : **yê ku porê te çêdike**

**Mînak 421/1 : Di hevokeke hevedudanî ya bi pevgirêdayî de hevokeke bingehîn û çendek jî yên alîkar dibin :**

**Tuala ku di destê wî de bû, bo ku Dîlan bibe, Narîn li ser bixebite.**

**Di hevoka jorîn de :**
Hevoka bingehîn : **Narîn li ser bixebite**
Ya alîkar a yekemîn : **tuala ku di destê wî de bû**
Ya alîkar a duyemîn : **bo ku Dîlan bibe**

**Mînak 422 : Cihguhartina hevoka bingehîn û ya alîkar : Ev bikaranîn kêm in û di berhemên wêjeyî de tên dîtin :**

**Hemû şervan dihatin xuyakirin çawa ku roj hildihat.**

**Di hevoka jorîn de :**
Hevoka bingehîn : **hemû şervan dihatin xuyakirin**
Ya alîkar : **çawa ku roj hildihat**

**Mînak 423 : Hevokên alîkar bê pêveber nabin, lê hin komek dibin :**

**Tuala ku di destê wî de; bo ku Dîlan bibe, Narîn li ser bixebite.**

**Di hevoka jorîn de :**
Hevoka bingehîn : **Narîn li ser bixebite**
Komeka alîkar : **tuala ku di destê wî de**
Hevoka alîkar : **bo ku Dîlan bibe**

**Mînak 424 : Di hevokên kompleks de çend hêmanên bingehîn û yên alîkar tên dîtin :**

Gava ku roj diçe ava, şivan di nav tariyê de wenda dibin û diçin; tam wê gavê, çûkê ku di ser wan re doş dibû, dadikeve ser golê, baskên xwe li ava şîna tarî dixe, piştre ew jî bi şivanan re di nav tariya şevê de wenda dibe.
(Çiyayê Agirî, Y. Kemal, werger : Şerefnaz)

**Veguhastina hevokan :**
**Formên hevokên veguhastî bi alîkariya lêkera "gotin"ê çêdibin û ev lêker bi kêşanên xwe di dawiya hevokên yekemin de cih digire.**
**Li gorî ahenga dem û raweyan gelek hevokên veguhastî tên ristin.**

**Ji aliyê veguhastinê ve hevok du cure ne : Yên yekser û yên neyekser.**

**• Hevokên veguhastî yên yekser :**
**Ev herî kêm ji du hevokan pêk tên. Bi gelemperî, hevoka yekemîn bi xalecotê dawî dibe û ya duyemîn di nava dunikê de bi tîpeke girdek dest pê dike û bi xal, pirsnîşan, baneşan an jî bi sêxalan diqede.**

**• Hevokên veguhastî yên neyekser :**
**Ev hevok hevedudanî ne, bi alîkariya gihaneka "ku"yê pêk ten û dibe ku hevoka duyemîn de kes jî bên guhartin.**

**Digel van hevokên veguhastî yên neyekser ên zimanê rêzimanî, di zimanê gelêrî de hin bikaranînên wan ên cuda jî hene. Em ê wan hevokan jî bi yek mînakan bidin nimandin.**

**Mînak 425 : Li gorî dema niha :**

**Bo hevokên veguhastî yên yekser :**
**Rojhat dibêje : " Ez niha diçim daristanê."**

**Bo hevokên veguhastî yên neyekser :**
**Rojhat dibêje ku ew niha diçe daristanê.**

**Di zimanê gelêrî de bo yên neyekser :**
**Rojhat dibêje ku ez niha diçim daristanê.**

**Mînak 426 : Li gorî dema niha û dema bê :**

**Bo hevokên veguhastî yên yekser :**
**Dîlan dibêje : "Em ê sibehê li ba hevalên xwe bin."**

**Bo hevokên veguhastî yên neyekser :**
**Dîlan dibêje ku ew ê sibehê li ba hevalên xwe bin.**

**Di zimanê gelêrî de bo yên neyekser :**
**Dîlan dibêje ku em ê sibehê li ba hevalên xwe bin.**

**Mînak 427 : Li gorî dema boriya têdeyî û dema niha :**

**Bo hevokên veguhastî yên yekser :**
**Berîvanê ji Nazê re got : "*Em* îşev li otelê namînin."**

**Bo hevokên veguhastî yên neyekser :**
**Berîvanê ji Nazê re got ku ew îşev li otelê namînin.**

**Di zimanê gelêrî de bo yên neyekser :**
**Berîvanê ji Nazê re got ku em îşev li otelê namînin.**

**Mînak 428 : Li gorî dema boriya dûdar û dema bê :**

**Bo hevokên veguhastî yên yekser :**
**Rewşenê ji Narê re gotiye : "Hûn ê li roja çarşemê bên."**

**Bo hevokên veguhastî yên neyekser :**
**Rewşenê ji Narê re gotiye ku ew ê li roja çarşemê bên.**

**Di zimanê gelêrî de bo yên neyekser :**
**Rewşenê ji Narê re gotiye ku hûn ê li roja çarşemê bên.**

**Mînak 429 : Li gorî dema boriya dûdar û dema boriya têdeyî :**

**Bo hevokên veguhastî yên yekser :**
**Rewşenê ji Narê re gotiye : " Me, wê çarşemê hev nas kirin."**

**Bo hevokên veguhastî yên neyekser :**
**Rewşenê ji Narê re gotiye ku wan, wê çarşemê hev nas kirine.**

**Di zimanê gelêrî de bo yên neyekser :**
**Rewşenê ji Narê re gotiye ku me, wê çarşemê hev nas kirin(**e**).**

**Mînak 430 : Bi lêkerên alîkar hevokên veguhastî :**

**Bo hevokên veguhastî yên yekser :**
**Mem ji Narê re dibêje : "Ez dikarim alîkariya te bikim."**

**Bo hevokên veguhastî yên neyekser :**
**Mem ji Narê re dibêje ku ew dikare alîkariya wê bike.**

**Di zimanê gelêrî de bo yên neyekser :**
**Mem ji Narê re dibêje ku ez dikarim alîkariya te bikim.**

**Mînak 431 : Di avaniya tebatî de hevokên veguhastî :**

**Bo hevokên veguhastî yên yekser :**
**Zîlan ji Nalînê re dibêje : “Ez nehatim hilbijartin.”**

**Bo hevokên veguhastî yên neyekser :**
**Zîlan ji Nalînê re dibêje ku ew nehatiye hilbijartin.**

**Di zimanê gelêrî de bo yên neyekser :**
**Zîlan ji Nalînê re dibêje ku ez nehatim**(e) **hilbijartin.**

**Mînak 432 : Di avaniya dançêker de hevokên veguhastî :**

**Bo hevokên veguhastî yên yekser :**
**Dîlan dibêje : “Min bûkaniya xwe da dirûtin.”**

**Bo hevokên veguhastî yên neyekser :**
**Dîlan dibêje ku wê bûkaniya xwe daye dirûtin.”**

**Di zimanê gelêrî de bo yên neyekser :**
**Dîlan dibêje ku min bûkaniya xwe da**(ye) **dirûtin.”**

**Mijar : 28**
**Mijar : Xalbendî**

**Nasîn :**

**Nişandekên ku li gorî hin rêzikên rêzimanî, hêmanên hevokan bi hev girê didin yan ji hev dikin yên ku wekî xal, bêhnok, xalebêhnok, xalecot re *xalbendî*(*niqteşanî*) tê gotin.**

***Pirs : Teksta jêrîn, bê xalbendî û bi xalbendî hatiye nivîsandin, raberî hev bikin!***

**Mînak I : Bê xalbendî :**

Serçavan Fincano Min nizanibû xwediyê min dizane ku ev navê wî ye Fincan ji destê wî girt qehwe kir qurtek û got Nemreya lingê te çiqas e Ez nizanim Bersiva wî ken ji ser lêvên xwediyê min firand Çavên xwe berdan min Min qirika xwe dirêj kiribû Cira lingê min nexweş e di zivistanê de mezin dibin û di havînê de biçûçik dibin Te em şaş kirin bavo Nemreya lingê xwe bêje pişt re tu kîjan solê hildibijêrî tu azad î Xem nake ez ê hilbijêrim

(Mêrê Avis, Helîm Yûsiv)

**Mînak II : Bi xalbendî :**

- Serçavan... Fincano!
Min nizanibû xwediyê min dizane ku ev navê wî ye. Fincan ji destê wî girt, qehwe kir qurtek û got :
- Nimreya lingê te çiqas e?
- Ez nizanim.
Bersiva wî, ken ji ser lêvên xwediyê min firand. Çavên xwe berdan min. Min qirika xwe dirêj kiribû :
- Cira lingê min nexweş e, di zivistanê de mezin dibin û di havînê de biçûçik dibin.
- Te em şaş kirin bavo! Nimreya lingê xwe bêje, pişt re tu kîjan solê hildibijêrî, tu azad î.
- Xem nake, ez ê hilbijêrim.

(Mêrê Avis, Helîm Yûsiv)

## Xalbendî

**Ev nîşandek gerdûnî ne. Di gelek zimanên nûjên, bi taybetî yên ku alfabeya latînî bi kar tînin de tên karandin. Mirov dikare nîşandekan wiha bide rêzandin û dahûrandin.**

**• Xal ( . ) : Jê re *niqte* jî tê gotin û di xwandinê de rawestinekê ya ku bi qasî bêhneke normal şanî dide.**

**Mînak 433 : Bikaranîn :**

**★ Xal tê dawiya hevokê û peyva piştî wê bi tîpa girdek dest pê dike :**

Hemşîreyan ew xist nav nivînan. Canê wê yê germ, bûbû weke sotikê êgir.
(Mirovên Hejar, Victor Hugo, werger : Yakup Karademir)

**★ Di kurtenivîsan de tê ber kurteyê :**

**Doktor → Dr. Mervan Zinar**
**Hesen Mihemed Baran → H. Mihemed Baran**

**her wekî din → hwd.**
**matematîk → mat.**

**★ Di nivîsandina mejûyê de navbarên roj, meh û salê de :**

**21. 05. 2009 →** (**21**’ê meha **5**’an a sala **2009**’an)

**★ Di serbeş û serbendên nivîsanan de :**

**A. Lêkerên alîkar(** beşa **a**yem, lêkerên alîkar**)**
**1. Jimarên bingehîn(** xala yekem, jimarên bingehîn**)**

**★ Di nivîsandina demjimêrê de, di navbera saet û xulekê de :**

**Trêna lezgîn, saet di 10.15’an de radibe.**

**★ Di xaneyên jimarîn de : 15.456.132**

**★ Di matematîkê de li şûna nîşana carandinê :**

**20 x 5 = 100 → 20. 5 = 100**

**• Bêhnok ( , ) : Jê re *bihnok* jî tê gotin û di xwandinê de rawestinekê ya ku bi qasî nîvbêhneke normal diyar dike.**

**Mînak 434 : Bikaranîn :**

**★ Di navbera hevokên sereke û pêreyî de :**

**Nalîn ji cihê xwe rabû, li ber eynikê rûnişt û porê xwe şe kir.**

**★ Di navberên hevokên serbixwe yên rêzkirî de :**

Ji ber ku em têr bûn, min nexwest ku zarokên min, nexwende bimînin û karan bikin.
(Jînenîgariya Min, Cigerxwîn)

**★ Di navberên peyv an komepeyvan de :**

**Wê kulîlkên sor û zer, pelên teze, sepeteke darîn hêvî dikir.**

**★ Di hevokê de li ber peyvên hempeywir :**

**Rojda, Rojbîn, Rojhat û Serdar bi hev re dixwînin.**

★ **Di hin hevokên têkel de li ber kirdeyê :**

**Jinekê, bi her du destên xwe li jinûyên xwe dixist û diqîriya.**

★ **Di banglêkirinê de li ber peyva têkildar :**

**Kurino, em ji vir diçin!**

★ **Di diyalogê de li dawiya hevoka sereke :**

**Mem :**
**- Min ji wan re texsiyek amade kiriye, got.**

★ **Di jimarên pareyî de xaneyên ku li bin sifirê cuda dike :**

**Min 10, 25 kg hingiv kirîn.**

★ **Di destpêka name û daxwaznameyan de li dawiya peyv û komepeyvên xîtabî û navên saziyan :**

**Birêz Mamoste Dilbirîn,**
**Xwendekarên hêja,**
**Ji Yekîtiya Malbatan a Zarokên Dibistanê re,**

• **Xalebêhnok ( ; ) : Jê re *niqtebihnok* jî tê gotin û ew di xwandinê de rawestinekê ya ku bi qasî bêhn û nîvekê ya rîtmekê dimêrîne.**

**Mînak 435 : Bikaranîn :**

★ **Di hevokên hevedudanî û yan ên rêzkirî de :**

Hinan tiştên xwe dixistin hundir, hinan ji hundir derdixistin derve; hinan piştiyên xwe amade dikirin, hin li nava malan li benan digeriyan; hin li kîs û çewalan digeriyan; hin ardê wan xilas bûbû li êrd digeriyan, hinan cil û bergên xwe yên zêde li xizmên xwe belav dikirin.
(Mexmûr, Diyar Bohtî)

★ **Li şûna hin gihanekan(lê, lêbelê, ema...) :**

Hinan digot, em ê çadira xwe bibin, weke din em tiştekî nabin; gaz û sobe tune bin jî em ê çadira xwe vedin û xwe bidin bin. (Mexmûr, Diyar Bohtî)

★ **Di helbestan de rêzên serbixwe û têkildar bi hev girê dide :**

Tu disefînî bi stêr û balinde ve;
Ez ne nexweş im, pir darhal im

(Sewta Berbangê, A. Karabax)

**★ Di destpêka name û daxwaznameyan de weke bêhnokê li dawiya peyv û komepeyvên xîtabî û navên saziyan bi kar tê :**

**Dayika dilbikul;**
**Ji Berpirsiyara Komeleyê re;**

**• Xalecot ( : ) : Jê re *niqtecot* jî tê gotin û di xwandinê de rawestinekê ya ku bi qasî du bêhnên normal dide nimandin.**

**Mînak 436 : Bikaranîn :**

**★ Di ravekirina tiştekî de : Peyva ku piştî xalecotê tê, bi tîpa girdek dest pê dike :**

Mêwe û hêşînahî : Sêv, hirmî, hêjîr, hinar, tirî, wekî herêmên din li vê herêmê jî gelek in. (Cografya Kurdistanê, A. Tîgrîs, N. Razazî, F. Gardawan)

**★ Di vegotinê de bo tiştên tên rêzkirin : Peyva ku piştî xalecotê tê, bi tîpa hûrdek dest pê dike ku di vê bikaranînê de berdewamî sereke ye :**

Fêlên ku li milekî min bin, nedîbar in: nîşan in
Fêrên ku li milekî wan in, dîbar in: hin nîqaş in
(Sewta Berbangê, A. Karabax)

**★ Di hevokê de li ber jêwergiranê : Ew jêwergiran, di dunikê de bi tîpa girdek dest pê dike :**

Di bîranînên Mûsa Enter de peyveka dîroknasê Îngilîz, Armold Toybeeyê heye: “ Ji bo neteweyekê, malkambaxiya herî mezin ew e ku dîroka wan ji aliyê hinekên din ve bê nivîsandin. ”
(Çend Gotin li Ser Ronakbîrên Kurd, Î. Beşîkçî, werger : J. Espar, A. Tîgrîs)

**★ Di diyalogê de li ber navê axivkerê : Peyva ku piştî wê tê, li ber xêzekê yan jî di dunikê de bi tîpa girdek dest pê dike :**

Masiya dê :
- Gelo, tu dixwazî ji vir herî?
Masiyê reş :
- Erê dayê, divê ez herim.
(Avaşîn-2, Masiyê Reş û Biçûk, S. Behrengî, werger : Xalidê Ezîz)

**★ Di nivîsandina demjimêrê de, di navbera saet û xulekê de :**

**Rojda, saet di 08 : 20’an de li ba min bû.**

• **Pirsnîşan ( ? ) : Jê re *niqtepirs* jî tê gotin. Ew nîşandek tê dawiya hevokên pirsiyarî. Di xwandinê de rawestinekê ya ku bi qasî bêhneke normal nîşan dide. Ew nîşandek bi tenê jî bi kar tê.**

**Mînak 437 : Bikaranîn :**

★ **Di helbestê de li dawiya rêzê :**

Êrîş dibin wan hemî hirç û hov
Doza çi dikin ev rengê mirov?
(Kîme Ez/Dîwana Sisêyan, Cigerxwîn)

★ **Li ber jimareke mêjûyî : Ew bi şik û guman e :**

Ji ber ku klasîkên herî mezin ên kurdan, mîna Eliyê Herîrî(1425-1490?), Mela Ehmedê Bateyî(1414-1495), Melayê Cizîrî(1570-1640), Feqê Teyran(1590-1660) û Ehmedê Xanî (1651-1707) ku bi navê "ekola kurmanciya bakur/jorê" tên nasîn, li nav tixubên mîrekiya Cizîra Botan jiyane û eserên xwe anîne pê.
(Destpêka Edebiyata Kurdî, M. Uzun)

★ **Di kevaneyê de li ber peyvekê : Ew tişt ne teqez e :**

Berhemên Osman Sebrî :
...
2- Çar Leheng, 1984, Sûriye(?), 68 r.
3- Bahoz û çend nivîsarên din, 1956, Şam(?), 68 r.
...
(Avaşîn-10, Osman Sebrî jî ji nav me bar kir, Mehmud Lewendî)

★ **Di hevokê de pirsyarî û baneşanî hene û ya pirsyarî li pêş e :**

Gelo pêwîst e xemlandina nalînan
Bi xweşgotinan?!
Tarîkirina armancan
Bi çend felsefan?!
(Di Siya Dûriyê De, Gundî)

★ **Ew bi tenê jî bi kar tê û wisa jî pirsê pêşan dide :**

**Kesê yekem :**
**- Eger kîn û nefret bibarin, pê re jehr jî dibare!**
**Kesê duyem :**
**- ?**

• **Bangnîşan ( ! ) : Jê re *niqtebang* jî tê gotin. Ew nîşandek tê dawiya hevokên baneşanî. Di xwandinê de rawestinekê ya ku bi qasî bêhneke normal dimîne. Ew nîşandek bi tenê jî bi kar tê.**

**Mînak 438 : Bikaranîn :**

★ **Li ber peyv û dengên baneşanî :**

**Wî! wan, mêvanên xwe bê xwarin hiştine.**

★ **Di dawiya hevokê de :**

Ey dil bi êş û derd û jan!
Wek te şivan im ey heval!
(Ronak/Dîwana Çaran, Cigerxwîn)

★ **Di dawiya hevokê ya bê peyv û dengên baneşanî de :**

Ne mostretî ye, heke li hemû bergorên wan
Bi nivîsîna maderî: *kî ne em*, bê neqşandin!
(Sewta Berbangê, A. Karabax)

★ **Di kevanekê de li ber peyvekê yan di dawiya hevokê de : Tinaz û şaşwaziyan bi bîr dixe :**

-Keko, ma bû noqav(!), ma mirov qet saetekê di binê deryayê de dimîne.
(Fîl Hemdî, A. Nesîn, werger : M. Aydogan)

★ **Di hevokê de baneşanî û pirsyarî hene û ya baneşanî li pêş e :**

Jîr û zana û zîz in
Çawa bi me dilîzin!?
(Ronak/Dîwana Çaran, Cigerxwîn)

• **Sêxal ( ... ) : Jê re *nîşandeka bêdengiyê* jî tê gotin û di xwandinê de rawestinekê ya ku bi qasî ya sê xalên normal raber dike.**

**Mînak 439 : Bikaranîn :**

★ **Hevok temam nebûye, tiştên ku bên gotin an nivîsandin hene yan ne pêwîst e ku ew li vir bên aşîkarkirin.**

Kapîtan hêrsa xwe mezintir dike û dibêje :
- Ev çi muxtarî ye! Ca li bejna xwe, li derpê xwe... ca li vî serê xwe î piçûk binêre!
Ma ka muxtarî bi te dikeve?   (Avaşîn-7, Ya Star, Hesenê Metê)

★ **Gelek tişt tên nivîsîn, lê yên bêne nivîsîn hîn hene û li şûna wan :**

**Bihar tê, berf dihêle, baran dibare...**

**★ Li şûna peyvên ku nivîsîna wan(argo, hwd.) nayên xwestin :**

**Apê Dildar jê re dibêje : ”Kuro, ha tu ha k...ê min!”**

**★ Bo jêwergiranê(jêgirtin) : Li şûna hevokên ku nehatine nivîsîn :**

Keç û jin û pîr, xort û mêr û kal
...
(Kela Dimdimê, Jan Dost)

**• Xalên rêzkirî ( .... ) : Ev nîşandek herî kêm bi çar xalan dest pê dike.**

**Mînak 440 : Bikaranîn :**

**★ Bo şanîdana beşekê ya ku li vir nehatiye nivîsîn :**

........

PERDEYA DUWEMÎN

Dotira rojê. Eynî dem. Eynî cih.

Solên Estragon û kabikên wan bi hev ve, pozikên wan dûrî hev, li nêzikî rampê
ne; şewqeya Luck jî li eynî cihê ye.
(Li Benda Godot, S. Beckett, werger : F. Cewerî)

**★ Li şûna demeke bihurî ya dirêj :**
**........**
Çaxa Evdal kor bû, salên wî nêzikî şêştan bû. Niha dinyaya wî guherîbû û heyameke
nû dest pê kiribû; heyama reşahiya dinê û korahiya alemê.
(Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê, M. Uzun)

**★ Li şûna hevok an rêzên ku nehatine nivîsîn :**
........
Eywan li me bûye darê mihnet
Zindan bi me bûye baxê cennet
(Mem û Zîn, Ehmedê Xanî)

**★ Di belgeyan de ji bo tiştên ku bêne dagirtin :**

Nav : ............. Paşnav : ..............

**• Dunik ( “ ” ) an ( « » ) : Gotin û nêrînên ku ji kesên din tên girtin, di dunikan de tên nivîsandin.**

**Mînak 441 : Bikaranîn :**

**★ Bo gotin û nêrînên ku ji kesên din an jêwergiranan :**

Ramaner û fîlozofê sûfî yê mezin, Mewlana wisa gotibû : “ Min çi cil dîtin têde mirov tûne bûn, min çi mirov dîtin bê cil bûn. ”
(Felsefe û Rûmeta Xwezayê, Z. Abidîn)

**★ Di diyalogê de li şûna xêzekê :**

Tanya :
“ Baş e, niha em ê çawa bikin? ”
Lêna :
“ Em ê wî bibin malê.”
(Ristemê Zal, Xurşîd Mîrzengî)

**★ Bo balkişandina peyvekê :**

**Di wê daristanê de “çinar” nehatibûn birîn.**

**• Dubare ( “ ) : Li şûna tiştên ku tên ducarkirin karîger e :**

**Mînak 442 : Bikaranîn :**

**Dahatina meha gulanê : 5345 EUR**
**Daçûna “ “ : 4545 EUR**

**• Yeknik ( ‘ , ) : Jêwergirana ku di dunikê de tên nivîsîn, eger di rêza wê de jêwergiraneke din hebe, ew di yeknikê de tê mêrandin.**

**Mînak 443 : Bikaranîn :**

**★ Di yeknikê de peyvek :**

Bazê dengbêj : “ Qefes daristan e, çûk girtî ne; ‘bilbil’ê te li ku ye? ”

**★ Di yeknikê de hevokek :**

Bazê dengbêj : “ Pêl bi banî ketiye. ‘Bimeşe, riya me dûr e!’ Ev deng ê kê ye?
Belê, yê yara min e! ”

**• Dabir ( ‘ ) : Der barê bikaranîna vê nîşandekê de nîqaşên girîng hene.**
**Em ê li vir li ser bikaranînên wê yên ku karîger rawestin.**
**Ev nîşandek hin peyvên taybet, kurtenivîs û jimaran ji paşgirên ku tên dawiyên wan vediqetîne.**

**Mînak 444 : Bikaranîn :**

**★ Bo hin bikaranîna peyvên taybet ên serenav :**

Zîn’a destana “Memê Alan”, Xec’a “Siyabend û Xecê”, Binevşa Narîn’a “Cembeliyê Hekkarê...”, bi qasî qehremanên mêr ên van destanan, xurt û jîndar in û baş tên salixdan. (Destpêka Edebiyata Kurdî, M. Uzun)

⭑ **Bo kurtenivîsan :**

**Mamoste Soran endamên kongreya YMK’ê silav kirin.**

⭑ **Bo jimaran :**

Kekê min Wesfî di sala 1921’ê de, kekê Muhîddîn di sala 1930’an de, xwişka min Satê di sala 1936’an de ji dayik bûne. (Avaşîn-4, Î. Beşîkçî, werger : J. Espar)

• **Kevanek ( ) : Jê re *kevane* jî tê gotin.**

**Mînak 445 : Bikaranîn :**

⭑ **Bo agahdariyên zêde : Hin peyv û hevok di kevanekê de tên nivîsandin. Kevanek wek bendikekê bi erka navebir jî bi kar tê :**

Rêya meyî dûr bû, bê derd û xebat e
(Însanê bê derd, ji par re dimîne)
(Rewşa Welat, Mele Sadiq)

⭑ **Peyv û gotineke din di nava xwe de dihewîne :**

Ne wekî xwe, mîna hinên din xwe badikin
Bi tilîyên zirav kembera(qayîşa) piştê radikin
(Awaza Serpêhatîyan-II, Evîn Çîçek)

⭑ **Bo jêwergiranê : Di nava xwe de bi sê xalan ve :**

(...)
Tu nebûna dilşahiya min î, ez hebûna kedera te.
(Xezela Warê Germiyan, Z. Abidîn)

⭑ **Bo têbiniyê : Di nava xwe de bi jimarekê ve :**

Welakîn zêde reng û ruyê çavan(2)
Ku me’lûm in ji wan bê hed kînayet

(2) Welakîn zînde rengî û rûyê çavan(D.)
(Dîwan, Pertew Begê Hekarî, werger : Zeynelabidîn Zinar)

• **Nîvkevanek [ ) ] : Perçeya kevanekê ya rastê bi kar tê.**

## Mînak 446 : Bikaranîn :

### ★ Bi jimaran ve di rêzandina beşên mijarîn de :

Ji aliyê peyvsaziyê ve rengdêr li du beşên sereke parve dibin :
1) Yên xwerû
2) Yên nexwerû

### ★ Bi jimar û tîpan ve di testan de :

**1) Ji van lêkeran kîjan li gorî dema niha hatiye kişandin?**

A) Ez dihatim mala we. B) Te şîva xwe nexwaribû.
C) Ewê bê mala we.  D) Ez hinekan tînim gund. E) Wî ew dîtiye.
(Waneyên Rêzimanê Kurmancî, S. Tan)

**• Kevaneka çarçik [ ] : Jê re *kevaneka goşedar* jî tê gotin. Ev ji kevanekê mezintir e û kevanek di nava wê de cih digire. Digel vê kevaneka çarçik weke kevanekê bi serê xwe jî tê xebitandin.**

## Mînak 447 : Bikaranîn :

### ★ Dema ku tiştek bi kevanekê bê ducarkirin, li şûna wê ya çarçik bi kar tê û ew kevanek di nava wê de dimîne :

Mirov bi ser kulîlkan de stûxwar dibe. Kulîlk[giyayî û darîn(kulîlka min berçemî ye), ew tevde narîn û rengîn in] bi hez û nazên xwe payedar radibin.

### ★ Bo têbiniyê weke kevanekê bi serê xwe :

Di salên dawî de hin romanên nûjen hatin weşandin. Ji van ên Mehmed Uzun[1] gelekî balkêş in.
 .....

---
[1]
Siya Evînê
Hawara Dîcleyê
......

**• Xêzek ( - ) : Di gotûbêj û diyalogan de bi peywira dunikê radibe.**

## Mînak 448 : Bikaranîn :

Bi dengekî pir nizm :
- Daniyar, ez hatim. Ez bi xwe hatim, got.
 (Evîna Cemîlê, C. Aytmatov, werger : N. Kutlay)

• **Bendik ( - ) : Ev nîşandek ji aliyê dirûvê ve dişibe xêzekê, lê bi erkên ji yên wê cuda karîger e.**

**Mînak 449 : Bikaranîn :**

★ **Di kîtandin û kîtebirînan de : Dî-lan-ê her-tim is-rar di-kir.**

★ **Di erka navebir de :**

**Çar-pênc kesan nan xwarine.**

★ **Di hevokê de ji bo peyv an raveyên kesayî nîşa dike :**

**Memê digot-bê guman dipeyivî-ku min ew dîtibûya...**

★ **Di rêzkirina beşên mijarîn de :**

Ji aliyê peyvsaziyê ve daçek bi du beşên sereke dabeş dibin :
1- Yên xwerû
2- Yên hevedudanî

★ **Di erka girêyî de :**

**Di navbera mêjûyan de : Ehmedê Xanî(1651-1707)**

**Di navbera peyvên dijwate û bi erkî hevdu temam dikin de :**

**Jin-mêr, wan kincên wisan li xwe dikirin.**

★ **Bo qertafên rêzimanî :**

**pêşgir : bi- } bixwe!**
**paşgir : -bir } darbir**

• **Xêzeka dirêj (—) : Ev kêm bi kar tê. Di navbera rêz û hevokên helbestî de cih digire.**

**Mînak 450 : Bikaranîn :**
Ey cejna şadî ey cejna şadî, — Cejna serbestî, gerdenazadî (Cigerxwîn)

• **Dabeş ( / ) : Ev nîşandek bi peywirên cuda tê karandin.**

**Mînak 451 : Bikaranîn :**

**★ Dikeve navbera du peyvên nêz an hemwate :**

Vebêjinên xwe em piçek dirêj bikin. Gelo yên ku helbestan dinivîsînin/diafirînin, hemî ne helbestvan/hozan in; me li jorê ev pirsa erênî kiribû.
(Helbestvan û Helbest, A. Karabax)

**★ Di navbera rêzên helbestan de :**

Ev helbest gelek xweş û bi tore hatiye danîn û hin gotin û peyvên xweş û ciwan têde hatine. “ Keroşka li nav lema/xezala li ber çema/û kevoka li ber çayê...” (Folklora Kurdî, Cigerxwîn)

**★ Di matematîkê de li şûna nîşana parînê : 50 / 5 = 10**

**★ Di nivîsîna mejûyê de, di nevbarên roj, meh û salê de :**

**06 / 04 / 2012** → (**6**’ê meha **4**’an a sala **20012**’an)

**• Stêrk ( * ) : Ev him di kevanekê de, him jî bi serê xwe bi kar tê.**

**Mînak 452 : Bikaranîn :**

**★ Di kevanekê de bo nîşeya peyv an gotinekê :**

Çend Gotin Li Ser Ronakbîrên Kurd (*)
.....
(*) Komela Mafê Mirovan a Stenbolê, di 15’ê sibatê ya sala 1990’î de, bi navê “Zimanê Zikmakî û Bîryarnameyan” panelek li dar xistibû.
(Çend Gotin Li Ser Ronakbîrên Kurd, Î. Beşîkçî, werger : J. Espar, A.Tîgrîs)

**★ Bi serê xwe di navbera beşên mijarîn de :**

..... Û yek jî, tu dikarî bizanî, ew ê çi bixwezin û çi wext bimirin.

*

Sibetirê, xortekî bi hespekî ve hat ber konê simyagerî. Piştî demekê, Sîmyager xûyabû : Ew jî li hespekî siwarbûbû, di ser milê wî yê çepê de başokek hebû...
(Sîmyager, P. Coelho, werger : Z. Abidîn)

**★ Di navbera beşên mijarîn de sê stêrk :**

.....
Zarokên birca bilind ên wezîr û kizîran, rojên cejn û şahiyan, mîhrîcan û seyranan dihatin di nava xasbexçeyê de kêyf û henek dikirin.

***

Pêgirteka keç û bûkên birc û saraya mezinên Zîqelayê bû, dema ku bihar dihat, tav xweş dibûn, mar û mûr ji kunên xwe derdiketin; wan qîz û bûkan jî cihêz û rihelên xwe dianîn, di nava xasbexçeyê de radixistin, didan ber tavê...

(Ristemê Zal, X. Mîrzengî)

## Xalbendî û hin bikaranînên wêjeyî û taybetî yên kesayî

### • Ev bikaranîn jî di gelek nivîsar û berhemên wêjeyî de tên dîtin :

### ♦ Xalebêhnok

### ★ Bo ravekirin û balkişandinê li ber peyv an komepeyvekê : ( ; ) :

Li mijaran; kêm û zêde, sift û serkî, bi ragihanên dewiyîner ên mêjîdar, nêrîn û tecrûbeya
helbestvanî di bin tav û avingên zîhnî yên hîsî, jiyanî, xwezayî, fikrî,
felsefî... hêjahiyên kesanî û civakî de ne. (Helbest û Mijar, A. Karabax)

### ♦ Pirsnîşan :

### ★ Ji aliyê vegotinê ve hevoka pirsyarî hatiye birîn : (?..) :

- Keçê, taştiya çi, xewna çi?.. Ma kesî seh kiriye, mirov gayê cot ser jê bike?
(Siyabend û Xecê, Zeynelabidîn Zinar)

### ★ Ji aliyê vegotinê ve hevok bi dom e û pirsnîşan tê dawiya tiştên ku bên gotin : (..?) û (...?) :

Helbestvan, hozan û nivîskar... di warê kulturî de helwestên herî girîng,
bi zamanê zikmakî nivîsîn, xwendin û peyivîn in; hûn bi kîjanî dinivîsin,
dixwînin û dipeyivin..? (Helbestvan û Helwest, A. Karabax)

### ★ Di hevokê de wateyên pirsyarî û baneşanî hemtay in û tiştên tên gotin, bi dom in : (?!.) :

**Apê Dildar :**
**- Min di ciwantiya xwe de, darên şêşt kîloyî diavêtin ser milên xwe.**
**Xalê Reşko :**
**- Min jî yên sed kîloyî...**
**Apê Dildar :**
**- Ma giraniya te ne 49 kîlo bûn?!.**

### ★ Di hevokê de wateyên baneşanî û pirsyarî hemtay in û tiştên ku bên gotin jî wisa bi dawî dibin : (..!?) :

- Çima ev neçûn welatê xwe?
- Welatê xwe..!? (Di ber xwe de kire pilepil, lê di xwe dernexist).
Me çiqas israr kir jî behsa welêt nekir. (Avaşîn-10, Hevpeyvîn, Şoreş Reşî)

### ★ Wateya pirsyarî hatiye xurtkirin : ( ?? ) an ( ??? ) :

**Apê Dildar :**
**- Tu dergûşa kurîn a dayika xwe yî û ya şaristaniyê jî çem in.**
**Xalê Reşko :**
**- Çawa??**

### ♦ Bangnîşan

### ⋆ Tişten bên gotin hene, yan ne pêwîst e ku ew li vir bên nivîsîn. Ev bikaranîn wek a sêxalan, dengbirîneкê jî şanî dide : ( !..) û (!...) :

- Tu çi sekinîyî, ehmeq? Bibêje!... Ji wan re bibêje, bila hemû jî çekên xwe bînin! (Avaşîn-7, Ya Star, Hesenê Metê)

### ⋆ Ji aliyê vegotinê ve hevoka baneşanî bi dom e û bangnîşanê dê bê dawiya tiştên ku bên gotin : (..! ) û (...!) :

Heta kengî diltengî...!
Ma ne bes e bê dengî?
(Avaşîn-8, S. Silêvanî)

### ⋆ Wateya baneşanî hatiye xurtkirin : ( !! ) an ( !!! ) :

- Ji meleyê sibehê de erd cot dike.
- Erdê kê?
- Erdê wan.
- Haaa!!!
(Mêrê Avis, H. Yûsiv)

## Çavkanî :


1- Kürtçe Grameri(Kurmanci Lehçesi), E. C. Bedir Han ve Roger Lescot, Institut Kurde de Paris, 1990
2- Hêma Rêzimanê Kurdî, 1.baskı, F. Huseyn Sagniç, Melsa Yayınları, İstanbul, 1991
3- Lehrbuch Der Kurdischen, Dr. Usso B. Barnas, Dr. Johanna Salzer, Înstîtuya Kurdî,

Berlîn, 1994
4- Uygulamalı Kürtçe Dersleri-Dersên Kurdî, B. Rizgar, M.F. Onen, 1993
5- Kurdîzan, F. M. Aykoç, Înstîtûta Kurdî-Berlîn, 1996
6- Türkçe-Kürtçe Sözlük, çapa yekemîn, Zana Farqînî, Kürt Enstitüsü-İstanbul, 2000
7- Ferhenga Kurdî-Tirkî, çapa sêyemîn, Zana Farqînî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2004
8- Ferheng(Kurdî-Tirkî,Tirkî-Kurdî), çapa sêyemîn, D.Torî, Weşanên Deng, Stenbol, 2002
9- Türkçe Sözlük, TDK Yayınları, Ankara, 1983
10- Kurtenerînek li hin beşên rêzimana kurdî, Kovara Mehname, Husein Muhammed.
11- Cînav di Zimanê Kurdî de Kurmanciya Jorîn, Deham Ebdulfettah, Tîrej.info
12- Zimanên Ergatîv, Zekî Bozarslan, Kovara Mehname, Kewçêr, 2003
13- Cours de la Langue et de Civilisation Françaises II, G. Mauger, Hachette, Paris, 1967
14- Lehr- und Übungsbuch der deutschen Grammatik, Die neue Gelbe, H. Dreyer, R. Scmitt, 2000 Hueber Verlag, Ismaning, Deutschland
15- Temel Britannica, Ana yayıncılık A.Ş, İstanbul, 1992
16- Almanca Dilbilgisi, Fono Yayınları, İst., 1996
17- Fransızca Dilbilgisi, Fono Yayınları, İst.,1995
18- Dilbilgisi, Lise : I-II-III, T.N.Gencan, Kanaat Yayınları, İst., 1992
19- Kurtenerînek li Tewîna Lêkerên Kurdî, Husein Muhammed, Mehname, 2002
20- Rêzimanê Kurmancî, çapa berfirehkirî, S. Tan, Enstûtuya Kurdî ya Stenbolê, 2011

---

Ev rêziman li tu derê bê çavkanî nayê bikaranin. A. Karabax